

Ev pirtûka di nav destên we de, semînerêk bihîstbar bû, yek ji zanayên pêşeng ên Kurdistanê re ya, yê li biyarîyê dijî, ew jî Dr. Cemal Nebez e. Pirsgrêka li pêş, di asta herêmi û nûmeteweyî de yek ji pirsgrêkên herî girîng e, wî bi dirûka talî û rastiya talîr re çareser kiriye. Çav û guh jî bo bîhîstin û ditirra rastî û hîwîkeleyan, digel gelaqê pirsan vekirî bûn. Çawa heskirina olê li ba Kurdan hate kêskirin, û bi pîlîtan Ereban, Tirkan û Farsan sêde jê wergirtin, û kurd hîn ji lîan xapandî? Çawa Tirk, Fars û Ereban birayê xwe yê Kurd xapandî û hîn ji bi olê û dilaban wan diuşqîn û birayî mirovî jî mirovan, û malên cîranan li ser cîranîya cîranan, nerraze mañen. Kurdan jî bîr kirin. Û Kurd hişên zanîhê re, û ew parêzvanê agî û misilmantîyê, di seranserê dirûka herême de ma. Û çawa?... Û çawa?

Prof. Dr. Mihemed Salih Gabonî

Wergerandin ji zimanê Erebî:
Dilawerê Zengî

Kurdên Çewisandî û Birayên Wan Ên Misilman

Cemal Nebez

**Kurdên Çewisandî û
Birayên Wan Ên Misilman**

Wergerandin ji zimanê Erebî:

Dilawerê Zengî

Kurdên Çewisandî û Birayên Wan Ên Misilman3

Mafên çapkirin û belavkirinê parastî ne

Navê nivîskar: Dr. Cemal Nebez

Navê pirtûkê: Kurdên çewisandî û birayên wan ên misilman

Pêşgotin: Dr. Mihemed Salih Gaborî

(Mamoste bû li zangoya Riyad "Padîşahiya Si'ûdî ya Erebî").

Wergerandin ji zimanê Erebî: Dilawerê Zengî

Çapa yekemîn a kurdî-kurmancî, Qamişlo 2021

Çapxana Pêla

Di roja Şemiyê, 21ê Avdara 1994an de, di Duyemîn Konferansa Welatên Misilman, ya ji bo Çareserkirina Pirsgerêka Kurdî, ku li ser vexwendina Yekîtiya Misilmanan ya Kurdistanê, li Elmaniya, li Kolnê (Jugendgastehaus) hate lidar xistin, semînerê zanistî hate pêşkêşkirin.

Ji weşanên Kurdbname , London 1997

Çapa diwemîn a Eliktronî , London 2008

Çapa siyemîn a Eliktronî, London 2020

Pêrist

Diyarî.....	7
Agahî	Cewad Mela.....9
Raberkirin	Kamil Jîr.....11
Zindîkirin û nirxandin	Brûska Ibrahîm23
Çawa min bi Prof. Cemal Nebez re... Cewad Mela.....	25
Pêşgotin	Dr. Mihemed Salih Gaborî.....39
Kurdên çewisandî û birayên wan ên misilman.....	43
Dorez û serbêj	143

Pêveka hejmara (1)

Li ser Tevgerên Misilmantiyê yê "Binawangirî"	185
---	-----

Pêveka hejmara (2)

Hin wêneyên ku bi mijara semînerê ve têkildar in	235
--	-----

Pêveka hejmara (3)

Navnîşeyek kurt ya tawanên ku Ereb, Tirk û Farisên	245
--	-----

Diyarî

Ji bo giyanên paqij ên her kesê ku alaya kurdî hildigirtin û xebat di ber azadiya gelê Kurd û serxwebûna Kurdistanê de, dikirin, û di serî de, di nav wan de: Dr.Cemal Nebez û Dr.Mihemed Salih Gaborî re pêşkêş dikim.

Piryariya Xwedê li wan be û cihê wan Bihuşta rengîn be..

Cewad Mela

Agahî

Bi boneya duyemîn salvegera mirina ramanwerê kurd ê gewre profesor Dr. Cemal Nebez, ku di 01/12/1933an de, li bajarê Silêmaniyê ji dayik bû, hemî jiyana xwe ji bo azadiya gelê kurd û serxwebûna kurdistanê da, heya ku li welatekî biyanî çû ber dilovaniya Xwedê, û di 08/12/2018an de, li goristana Sîwan, li bajarê Silêmaniyê hate veşartin.

Her weha bi boneya sêyemîn salvegera mirina ramanwerê gewre yê misilmanî yê Kurd, profesor Dr. Mihemed Salih Gaborî, ku di roja 01/01/1938an de, li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Amûdê ji dayik bû. Di 20/09/2017an de, li Şanşîna Şahînsahiya Si'ûdî ya Erebî, li Mekihê ya pîroz mir û li wir jî hate veşartin. Ew e yê ku hemî jiyana xwe ji bo azadiya gelê Kurd û serxwebûna Kurdistanê da, terxan kir, û ji bo misilmantiya rastîn di bexşandina dewlet û dezgehên xwe de, ji hemî gelan re serdest be, berevajî ya ku îro di parmendbûna Ereb, Tirk û Farisan de, misilmantî tenê ji bo berjewendiyên wan heye, û li ser navê misilmantiyê wan dewletên xwe yê neteweyî ava kirin.

Di bîranîna wan de, hevalan biryar dan ku pirtûka hevalê me Xwedêjêxweş Dr. Cemal Nebez (**Kurdên Çewisandî û Birayên Wan Ên Misilman**) ji nû ve çap bikin û sê gotarên li ser xebat û têkoşîna wî ji hêla hevalên wî Mamoste Kamil Jîr, mamoste Brûska Ibrahîm ve wekî pêşgotinekê ji pirtûka wî ya hêja re binivîsin, ji bilî pêşgotina ku profesor Dr. Mihemed Salih Gaborî di çapa yekem de, di sala 1997an de, nivîsîbû.

Ew Dr. Cemal Nebez û Dr. Mihemed Salih Gaborî bûn,
mezintirîn ramanwer, ronakbîr û zanayên di nav gelê kurd
de ne. Çûyîna wan windahiyek mezin û bê cih e... Piryariya
Xwedê li wan be û cihê wan Bihuşta rengîn be.

Cewad Mela

Raberkirin

Kamil Jîr

Bi boneya duyemîn salvegera mirina zanyarê gewre Dr. Cemal Nebez de, ez kêfxweş im ku axivîna rûpelên hin girêdanên ku 70ê salên min bi wî re girê dane wekî hevalraman û mamosteyekî min, parêzvanekî helbestên min û rêberekî serdanên min ên li Ewrûpayê bû, wekî jêrîn:

1- Ew yekem kes bû ku min di destpêka sala 1959an de, destpêşxeriya damezirandina rêxistineke neteweyî kurdî ye nû pêşkêşî wî kir. Di dema amadebûn û civînên me de, li dikana Profesora Beşîr El-Muşîr, ya bi navê (Rûgeha Hêviyên Kurdistan) hatibû binavkirin. Wî bersiva pêşinyara min da, piştî ku di destpêkê de dudil bû ku wê bipejirîne. Pişt re, ew beşdarî damezirandina wê rêxistinê bû bi navê (KAJYK). Di civîna damezirîner de ya ku di 14/4/1959an de, li Silêmaniyê, digel çend rewşenbîrên din, desteya damezirîner a komeleyê ji van hevalan damezirandin: Cemal Nebez, Kamil Jîr, Ehmed Herd, Ebdula Cewher, Ihsan Fûad, Ferîdon Elî Emîn û Fayîq Arif.



Dûv re, kesên din tevî me bûn. Rêxistin komeleyeke veşartî bû da ku Kurdistanê ji dagîrkeran rizgar bike û dewleteke Kurdî ye serbixwe ava bike. Komele ji alîyê hukumeta Îraqê, herdû partî (Komunîst û Partî), û paşê Yekîtîya Niştimanî Kurdistan jî pir şerê wê bû. Rêzgirtin ji van hevalan re, ji dîrokê re, ji bo şanaziya bi rola wan, serbilindiya ji bo neviyên wan û dilsoziya bi pakrewanên wan re, navên hinan ji wan li gorî rêza tîpên (A û B) li jêr rêz dikim, û ew jî ev in:

Azad Enwer, Azad Qeredaxî, Azad kak Mistefa, Azad Welî, Nebo Bekir Mele Mecîd, Ehmed axa Kerkûkî, Ehmed Emîn Efendî, Ehmed Xolesineyî, Ehmed Dozî Kerkûkî, Ehmed Şerîf, Ehmed Kerîm, Ehmed Neqîb, Ehmed Salih, Ehmed Selam Kerkûkî, Ehmed Mamoste Seyid Ehmed, Ehmed Şemeyî, Ehmed Ebdulah, Ehmed Qadir, Ehmed Bena, Ehmed Mihemed, Ehmed Mehmûd, Ehmed Meto (Şehîd, ji kurdên Libnan), Ehmed Mela Qadir, Ehmed Herdî, Erselan Ehmed, Es'ed Xalid, Ekrem Arif Qereçetanî, Enwer Berzo, Enwer Arif Qereçetanî, Enwer Elî Nekar, Enwer Mecîd Sultan (efser, Şehîd), Enwerî Hemey Qepançî, Omîd Celal, Omîd Kake Reş, Omîd Ebas, Ibrahîm Resûl, Ihsan Sedîq (Şehîd), Ihsan Ebdulkerîm Fûad, Dr. Ihsan, Isma'îl Hemesor, Isma'îl Kerîm Reş, Isma'îl Gulbar, Isma'îl Mihemed, Baba Tayer Şêx Xerîb, Bavê Şêrgo (ji Rojavayê Kurdistanê), Bayizî Şêx Mihemedî Bena, Bextiyar Ehmed Qazî, Bextiyar Hamid Es'ed, Bextiyar Heme Es'ed, Bextiyar Baban, Bextiyar Ebdula, Bextiyar Mecîd xan (şehîd), Bextiyar Welî, Berzan Mihemed Sabir, Berhem Ehmed, Bekirê Hacî Mela Xalid, Bekir Hacî Ehmed, Bekirê Xanim, Bekir Qadir Helaw, Bekir Mihemed Kerîm,

Bekir Mihemed Mewlûd, Bekirê Mela Qadir, Bekirê Mela Mecî, Behmen Zagros, Birayê min Hacî Kerîm, Birayê min Heme Elî, Birayêm Heme Elî Rîşe, Brûska Ibrahim (Endazyar), Berzan Ezîz, Burhan Mam Tewfîq, Bêstûn Mihemed Emîn, Behmen Osman, Peywend (şehîd), Pişkoyê Ehmed axa Kerkûkî, Pişko Emîn, Pîroz-Xan Hacî Pîroz, Talîb Tayer-Kerkûkî, Talîb Mihemed Beşîr, Tayer Heme Emîn Mawetî, Tayer Şêx Izet, Tayer Qadir Çawreş, Tayer Mihemed Murad, Tayer Mewlûd, Taha Heme Se'îd , Taha Mihemed Salih Ezîz, Tewfîq Nûrî Beg (şehîd), Ceza- mamoste Ceza, Cezay Elî nivîskar (şehîd), Ceza Heme Eblaxî, Ceza Reşîd Ehmed Şane, Celal Berdezerdî, Celal Bêtel Birayê Cemal Şarbajêrî, Celal Hacî Husên (şehîd), Celalî Hacî Derwêş, Celal Sed Reşîd, Celal Elî Şapûr, Celal Elî, Celal Derwêş Qadir, Celal Mihemed Qepançî, Cemalê xule Sineyî, Cemal Sabir Ehmed, Cemal Nûrî, Cemal Osman Dayî, Cemalê Se'îd Elî, Cemal Elî, Cemal Elî Qadir, Cemal Xefûr Reş, Cemal Qadir, Cemalê Helaw (şehîd), Cemalê Serac, Cemal Se'îd , Cemal Se'îd Xefûr, Cemal Sabir Ehmed, Cemal Şarbajêrî, Cemal Ezîz (Xizmê Herdî), Cemal Elî Qadir, Cemal Mehmûd Iraqî, Cemal Koncirînî, Cemal Mistefa, Cemal Tewfîq (Dr. Nebez), Cemal Nûrî, Cemal Westa Mihemed- şehîd, Cemîl Mehmûd Iraqî, Cemîl Merdoxî, Çalak Husamedîn, Cewad Mela (Dr. Cewad, Rojavayê Kurdistanê), Cîhangîr Mihemed Emîn, Hamidê Hacî Xalî, Husên Ehmed- Husên Faris, Husên Fethula, Husên Mihemed Ezîz (Dr. Husên), Hekîm Kake Weys, Heme Çiwar Kilaweyî, Heme Reşîd Hemûş, Heme Reşîd Heres, Heme Reûf Husên, Heme Sedîq Naşad, Heme Se'îd Caf, Heme Se'îd Hacî Kerîm, Heme Elî Mihemed Murad (kêmendami),

Heme Elî Ferec, Heme Xerîb (endazyar), Heme Xerîb KakeReş, Heme Qadir (Berzî, endazyar), Hemeyê Hacî Mehmûd, Heme Yadgar, Hemeyê Ame Qole, Hemeyê Şêx Ezîz, Hemeyê Xefûr Şerîf, Xorşîd Hesên (Kerkûkî), Xule Xirre (şehîd), Xesrew Mihemed Se'îd Caf (endazyar), Dara Hesên Yare, Dara Sedîq, Dara Se'îd, Dara Ebdulqadir, Dara Mihemed Emîn, Dilawer Kake Ziyad Koyî, Dilşad Merîwanî (şehîd), Dilşad Sedîq, Dilêr Reşîd Yare, Dilêr Reşîd Mele Elî, Rizgar Reşîd, Rizgar Welî, Ruşdî Xidir (Kerkûkî), Rehîm Hacî Mehmûd (şehîd), Rehîm Xefûr, Recai-Xan Mêqerî (Rojavayê Kurdistanê), Refîq Nûrî beg, Re'ûf Balaberz, Re'ûf Şêx Xerîb, Zahîr Heme Koyî (şehîd), Zahîr Elî, Zeyneb xan, Sacîde xan Badînanî, Salih Ferec, Salih Sîk (şehîd), Sale Pîr, Salih Qadir Helaw (şehîd), Samî Mihemed Emîn, Sedîq Tewfîq, Sedîq Mihemed Fetah, Sedîq Mela Se'îd , Sedîqê Pênedirû (Kerkûkî), Silêmanê Heme Can, Sima'îlê Çayçî Berxaneqayî, Sma'îlê Heme Sor, Sebahê Xalib, Serwet Hacî Izet, Serwet Mihemrd (Dr. Kurdo Elî), Serwer Mihemed, Se'îd Gul, Se'îd Elî Seyid Se'îd , Se'îd Ebdula Pênciwînî, Se'îd Gewher (şehîd), Selah Selam (Kerkûkî), Selah Şêxelî, Selah Mihemid Emîn, Selah Mihemed Ezîz, Sêrwan Cemal, Siwar axa, Soran Osman, Sêrwan Se'îd Mela Ebas, Sêrwan Osman, Şerîf Mehmûd, Şerîf Mewlûd (şehîd), Şemal Ezîz Ebdulrehman (Ciwanemerg), Şerîf Alma (ji Bakurê Kurdistanê), Şewketê Hacî Muşîr (şehîd), Şewketê Şa Mihemed, Şehîd Bêstûn (ji Qeywan), Şehîd Bêstûn (ji Mamexelan), Şehîd Faris (ji Mamexelan), Şêx Ehmed Şêx Kerîm, Şêx Sahib, Şêx Mihemed Hacî Ehmed, Mamoste Şêrzad Fatih (Kerkûkî), Şêrgo Bêkes, Şêrgoyê Şêx Elî (şehîd), Şêrgo Hejar, Abdîn

Kaya (ji Bakurê Kurdistanê), Arif Ehmed-Sor, Arif Qereçetanî, Ebdula Agirîn (Dr. Ebdula), Ebdula Bekir Emîn, Ebdula Ehmed, Ebdula Bekir Emîn, Ebdula Ehmed kornal, Ebdula Cewher, Ebdula Qere Toxanî, Ebdula Mecîd Beg, Ebdula Lale, Ebdula Mehmûd, Ebdula Se'îd , Ebdula Serdar, Ebdula Sen, Ebdulkerîm Arif (parêzer), Ebdulwahîd Heme Bor, Ebey Faris, Eta Sultan, Eta Mihemed Murad (parêzer), Ednan Hacî Pîroz, Erîf Kemal (Kerkûkî), Ezîz Etrûşî, Ezîz Ehmed Ebdula, Ezîz Ehmed Fethula, Ezîz Hacî Kerîm, Ezîz Reza, Ezîz Şefîq (efsêr), Ezîz Ebdulrehman, Ezîz Fethula, Ezîz Qadir Hetîw, Ezîz Mîrza Kerîm, Ezîz Miselem (ji Rojavayê Kurdistanê), Ezîm Hawarî, Elî Ese'ed Mehwî, Elî Begî Caf, Elî Tewfîq (Dr. Serbest), Elî Tewfîq Malye, Elî Tewfîq Sirûçik, Elî Celal Tewfîq, Elî Heme Salih, Elî Heme Law, Elî Hemûş, Elî Reşîd, Elî Sor, Elî Serdar Mela, Elî Seyid Se'îd , Elî Ebdula Xoyê, Ebdula Meto (ji Kurdên Lubnan), Elî Ferec Qeretoxanî (şehîd), Elî Feyzula, Elî Îsa Medîn, Elî Mecîd Kerîm, Elî Mihemed Nûrî, Elî Mardîn, Elî Mame, Elî Mihemed Ehmed, Elî Mihemed Nûrî, Elî Meşxel (şehîd), Elî Menîc, Elî Yasîn, Usmet Berazî (şehîd ji Rojavayê Kurdistanê), Usman Name (şehîd), Usman Ehmed (şehîd), Usman Mihemed, Usman Hacî Salih Xefaf, Usman Hacî Ebdula Ablaxî, Usman Reşîd, Usman Hacî Ehmed, Usman Salih Ezîz, Usman Hemed Ezîz, Usman Derwîş Qadir Qeladizeyî, Usman Se'îd . Usman Serqebzanî, Usman Ebdula (endazyar), Usman Elî, Usman Ferec Daroxa, Usmanê Mela Qadir, Usman Şêx Mihemed Bena, Usman Mihemed Salih, Umer axa, Umer (Isma'îl), Umer Hacî Qadir, Umer Hacî Ebdula, Umer Beqal, Umerê Helaw (şehîd), Umer Heme, Umer Reşîd Qeretoxanî, Umer Heme Salih (şehîd), Umer

Şemeyî, Umer Abdula (mulazim), Umer Ezîz Mehwi, Umer Izet, Umer Ferec Daroxayî, Umer Kerîm, Umer Mihemed, Umer Mihemed Ferec, Umer Mîne, Izet Reşîd (şehîd), Izet Mela Rehîm, Xandî Ezwer Tovî, Xazî Ferho (şehîd, ji kurdên Libnanê), Xerîb Pîre, Xerîbê Fîter, Xefûr Emîn, Xefûr Jajleyî (şehîd), Fatih Şêx Heydar Sazanî (şehîd), Farûq Feqê Reşîd, Fazil Mihemed Emîn Serac, Fazil Mihemed Tewfîq, Fazil Mela Tewfîq Neqşibendî, Fayeç Biraxas, Fayeç Arif, Fayeç Gulpî (Dr.Fayeç), Fayeç Hawarî, Fetah Abdulrezaq, Fetah Ferec Daroxayî, Fetah Mihemed Emîn axa (şehîd), Fetah Nûrî Beg, Fetahe Sor, Ferec Salih, Ferec Rehîm Remezhan, Ferhad Sidîq Simko, Fereydûn Ehmed, Fereydûn Feqê Reşîd Qeşan, Fereydûn Reûf Arif, Fereydûn Abdula, Fereydûn Mecîd, Fûad Sidîq, Fûad Abdula, Fûad Mihemed Emîn Serac, Ferhad Ehmed (Dr. Ferhad), Ferhad Xefaf (şehîd), Ferhad Abdulhemîd, Ferhad Abdulqadir (Kerkûkî), Fereydûn Ehmed, Fereydûn Re'ûf, Fereydûn Usman ((Kerkûkî), Fereydûn Abdulqadir (Kerkûk), Fereydûn Abdulhemîd, Fereydûn Elî Emîn, Fereydûn Feqê Reşîd, Fereydûn Mecîd, Fereydûn Mihemed, Qadir Hacî Hesên, Qadir Hacî Elî, Qadir Şêx Mihemed, Qadir Reşîd Mihemed, Qadir Umer (Westa Qadir), Qadir Xerîb, Qadir Mistefa, Qurbanî Mam Reş (şehîd), Qûsey Alareşî (ji Rojavayê Kurdistanê), Kak Umer (Mamê Reşîd Fetah), Kamil Jîr, Kamil Şefîq, Kamil Mihemed Emîn Serac, Kaûs Ezîz Ferec, Kerîm Dan Zêr, Kerîm Selam (mulazim, şehîd), Kerîm Şêx Hesên, Kerîm Usman (endazyar), Kerîm Umer, Kerîm Mecîd Eslan, Kerîm Mehmûd Xeyat, Kerîm Roj, Kerîm Mihemed, Kerîmî Westa Hesênî Çexmaxçî, Kerîmî Westa Umer, Kovan (şehîd), Kemal Ehmed, Kemal

Ehmed Hesên, Kemal Ehmed Mihemed, Kemal Ehmed Mehmûd, Kemal Fetah, Kemal Mihemed Qepançî, Kemal Tayer Reşîd, Kemal Şêx Mecîd, Kemal Cemal Muxtar, Kemal Tayer Reşîd, Kemal Usman Dayî, Kemal Ebdula Mihyedîn, Kemal Dolpemo, Kemal Elî (Dr.Kemal), Kemal Elî Nanewa, Kemal Mihemed Arif, Kemal Mela Elî Xwê, Kemal (Me'erûf), Kemal Arif, Kemal Fetah, Kemal Hawarî, Gurûnî Sabîre Sûrî Qesab, Gerdûn Umer, Letîf Hamid (Kerkûkî), Letîf Elî (Ciwanemerg), Letîf Qeredaxî (B. Hendirîn), Letîf Mewlûd, Lofirî Nabo, Mamoste Ehmed Zaway Azad Mistefa, Mamoste Sidîq, Mahir Mihemed Emîn, Mihemed Emîn Gulçîn (şehîd), Mihemed Ehmed, Mihemed Elî Alosî-hunermend Newroz (ji Rojavayê Kurdistanê), Mihemed Ceza, Mihemed Celal Tofê, Mihemed Hacî Ehmed (mulazim, şehîd), Mihemedê Ehmedî, Mihemed Hacî Şêx Ehmed, Mihemed Hacî Meroyî (mulazim, şehîd), Mihemedê Hacî Mehmûd, Mihemed Hesên, Mihemed Derwêş Nadir (şehîd), Mihemedê Dartaş (Hemesor), Mihemed Zêrînger, Mihemed Salih (Hoşmend), Mihemed Salih Ferec Hîtler (şehîd), Mihemed Şewqî (mulazim, şehîd), Mihemed Reşîd Hesên, Mihemed Şêrîn, Mihemed Umer, Mihemed Ebdulfetah, Mihemed Ebdula, Mihemed Ebdula Hesên, Mihemed Ezîz (Xale Heme), Mihemed Xefûr, Mihemed Kak Umer, Mihemed Kerîm (Hêmin), Mihemed Ferec Daroxayî, Mihemed Qadir Berzî (endazyar), Mihemed Berzencî (ji Rojavayê Kurdistanê), Mihemed Mistefa (Azad), Mihemed Fethula, Mihemed Mihyedîn, Mihemed Mecîd Eslan, Mihemed Mela Umer, Mihemed Mewlûd, Mihemedê Westa Mecîdî Delak, Mihemed Hadî Ehmed Qadir (Mamosta Hadî),

Mihemed Hersîn (şehîd), Tahir (endazyar), Mistefa Babe Gewre, Mistefa Silêman (endazyar), Mistefa Mîne, Mehmûd Umerî (şehîd), (ji Rojavayê Kurdistanê), Mehmûd Hacî, Mehmûd Xeraman, Mehmûd Şêx Mihemed, Mela Mihemedî Xeyal, Mezin Usman Fayeç, Mensûr Şêx Kerîm Seyid Umer Hefîd, Mehdî Westayî Kaşî, Mehdî Mela Elî, (mulazim Serwet), Nasir Şêx Kerîm Hefîd, Namiq Bira Xas, Nizar Emîn, Nûrî Heme Elî (şehîd), Nûrî Heme Elî Şinirwê, Nûrî Şerîf- (şehîd, Kerkûkî), Nûrî Şêx Isma'îl, Nûrî Ebdula, Nûrî Qadir, Nûrî Kerîm, Nûrî Namiq, Nebez Ezîz, Necmedîn Hesên, Nesredîn Ehmed, Newroz Mela Elî, Newzad Sabir Qeredaxî, Nebîl Nûrî Metî, Nîhad Mehmûd, Amozay Fereydûn Elî Emîn, Werya Ehmed Qazî, Werya Biraxas, Westa Salihê Bena, Hadî (mamosta Hadî), Hadî Îmam, Hadî Ehmed Qadir, Nûrî Helaw (şehîd), Hîwa Muxtar, Hîwa Mistefa, Hîwa Nîzamedîn (endazyar), Yûsif Perî (Qeşe Perî), Yûsif Marif Zend, Yûsif Se'îd, Yûsif Nasiro û bi sedan pêşmergeyên din, ku navên wan di qeydên rêxistinên wan ên leşkerî de hatine rêz kirin.¹

2- Di sala 1960an de, min xwe amadeyî ezmûna derveyî ji bo xwendina amade (Bekelorya) di şaxê wêjeyî de kir û ez, ji bilî matematîkê di hemî waneyan de, ji serkeftinê bawer bûm, ji ber vê yekê rêheval Cemal Nebez, di wê mijarê de alîkariya min kir û serkeftina min bû di stendina wê bawernameyê de, lewma hezar spas ji wî û giyanê wî yê pak re.

¹ - Ji bo bêtir agahdarî li ser KAJYK, binerin: Pirtûka (Yade Kanim) û pirtûka (KAJYKname) ku li Sit (Nimro) hatine parastin.

3- Wî pêşgotinek ji duyemîn dîwana min ya helbestan re, ya bi navê (KURDAYETÎ) nivîsand.

4- Gava ku Dîwana (KURDAYETÎ) ji alî Mihemed Mela Kerîm ve, bi têvedana Partiya Komonîst a Iraqê, rastî rexneyên tund hat. Di sala 1960î de, birêz Cemal Nebez bi navê (Tevger, Bawerî û Rejîm) di belavokekê de bersiva wî da.

5- Dema ku Cemal Nebez li Cinêvê / Swîsra bû, wî xebatkar Dr. Kamîran Bedir-Xan, ê ku erêkirina hukumeta Fransî ji bo damezirandina radyoyek bi zimanê Kurdî stendi bû, dît. Wan pejirand ku ezê wê êstgehê bimeşînim. Ji ber vê yekê, kak Cemal ji min re peyamek şand ku ezê ji bo vê armancê di zûtirîn dem de biçim Cinêvê. Min jî ev daxwaz pejirand, û bi trêne ji Bexdayê çûme Stenbolê. Li wir min hevalekî hêja, Bira Cemal Alamdar, nas kir; wî ji min xwest ku ez hinekî li Stenbolê bimînim da ku bi komek kurd re, ya ku dixwaze Partîyeke Kurdî damezirîne, bicivim. Ji ber vê yekê, ezê wan bi wan armancan rêve bibim, nemaze ji ber ku ew bi hin helbestên min ên ku ramanên min ên neteweperwer radigihînin, nas dikin. Daxwaz hate pêşwazîkirin û me ji bo vê armancê çend civîn lidar xistin, ku du heftiyên dirêj kir. Nemir Musa Antar û kesekî din li ser navê Memo çalak bû, di nav amadekeran de bûn. Dûv re, ez çûm Cinêvê û min Birayê Cemal dît. Wî ji min re got: Li bendê bimînin heya Dr. Kamîran, ji Niyoyorkê, vegere, ê ku çûye ji bo pirsgirêka Kurd pêşkêşî Civata Ewlekariyê bike. Di vê serdemê de, hukûmeta Frensî biryara xwe li ser pirsgirêka radyoyê li ser daxwaza hukûmeta Iraqî paşguh kir. Wê yekê jî kir ku ez biçim kolêja= Fakulteya Aborî ya Zanîngeha

Cinêvê û dest bi xwendina zimanê frensî bikim, û di vê zebatê de jî, wî alîkariya min kir. Lê, em ji daxwaziya hikûmeta Swîsreyê ku em ji Swîsreyê tavilê derkevin, matmayî man. Ev biryara wê bi destêwerdana hukûmeta Iraqî bû, ji ber ku me çalakiyên siyasî û nûçeyên Şoreşa Êlûnê ji medyaya ku li Cinêvê re yê pêk dihat rêdikirin. Ji ber vê yekê em çûn Viyena, paşê Kek Cemal Elmanya hilbijart. Ez jî çûm Şamê ku li kolêje-Fakulteya Hiqûqê bixwînim. Bi vî awayî, bi saya wî, ez hatim Swîsreyê û yekem car bi şaristaniya Ewropî re hatim naskirin. Dûv re têkiliyên me bê navber berdewam bûn, çî bi riya rêkirina nameyan, çî bi têlefônê, çî jî di dema seredana min a dubare ya Elmanya û welatên din ên Ewropî re; her weha jî di dema konferansa pêncemîn a Rêxistina Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, li London, di 2005an de, li ser vexwendina Dr. Cewad. Dûv re, ew û Dr. Cewad û birayê hêja Brûska Ibrahim beşdarî semînera min ya ku li bajarê Kolnê, di 13/8/2011an de, hate lidarxist, bûn. Têkilî û peyamên elektronîkî yê di navbera me de, di rêya Facebookê re hatin veguheztin. Hezar piryarî ji bo giyanê wî yê pak, bi şîna min, ji bo wî, bi van çend gotinên dilnizim, bi zimanê me yê kurdî:

Kake Nebez giyan, ey hawbîrekem

Ger çî diwaçûnit, bo min bûbe xem

Belam Kurdistan toy le amêz û bawêş girtûwe

Erxewanekey girdekey seywan, gulî girtewe

Le naw naporey xoşewîstana, bûyte we mêwan

Bo tu çûnyeke her biste xakê le koy Kurdistan
Neçûy be tenya girdî pawankey
Xolî durûyî, le nêw çawankey
Wek çûn jiyanit sade û xakî bû
Koçî diwayîşt her bê bakî bû
Boye Nebezman wekû hawbîran
Be merdî mird in, be merdî jiyân
Bino be bê xem
Ey hawbîrekem
Xermanî û şew pertûkekanit
Ejîn ta heta wêney jiyanit

Zindîkirin û Nirxandin

Brûska Ibrahîm

Di bîranîna hevalê me yê hêja Dr.Cemal Nebez de, ez dixwazim di derbarê hevkarî û pêzanîna me ya ji bo wî de çend agahdarîyan bi we re parve bikim. Min ew bi xwe di Cotmeha 1962an de, li Miyonixê nas kir, û min hest kir ku ew di danûstendinên xwe de mirovek pir heval, dilnêrm û bawerker e.

Xwendekarên Kurd ên ku di wan rojan de, li Miyonixê dijiyan, bi gelek dîtînan siyasî ve girêdayî bûn ku ramanên serxwebûna Kurdistanê û damezirandina dewleta neteweyî ya Kurd red dikirin.

Kak Cemal gelek tişt li ser çêbûn û damezirandina KAJYK wekî rêxistînek siyasî Kurdî, ji min re gotin, û ez ji armancên wê bawer bûm, ji ber ku berî em bi hevûdu re bicivin, min damezirandina dewleteke neteweyî Kurdî wekî yekane gumana azadkirina gelê Kurd nas dikir. Ji ber vê yekê, ez û kak Cemal pir baş ji hevûdu têdigihîştin.

Di destpêkê de, em endamên Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropa bûn, ku ji hêla Partiya Demokrat a Kurdistanê ve dihat berbendîkirin, ji ber ku ramanên me wekî xapên telezge hatin dîrxistin. Ji ber ku me piştgiriya ji van kesan, ji bo ramanên xwe, hêvî nedikir, min û Kak Cemal biryar da ku em Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên

Kurd li Ewropa (NUKSE) li ser bingeha lêkolîneke têgihîştî ava bikin, û me wiya di 21ê Avdara 1965an de kir.

Di cih de, NUKSE pir çalak bû û weşanên xwe: "Agahdariya Kurdistanê" bi zimanê Elmanî, "Xwêndkarî Kurd" û "Deng û Basî Kurdistan" bi zimanê Kurdî weşandin.


Me bi çapamenî û rojnamegerên cihêreng re têkilî girêdan. Çi nûçeyên ku me ji wan re, û bi partî û rêxistinên siyasî re, belav kir, di heman demê de, me li ser mijara pirsê Kurdistanê jî dest bi sazkirina semîner û civînan kir.

Ji bo dabeşkirina KAJYK li Ewropa, me kurte-agahî li ser navê: "Bangî KAJYK, Banga KAJYK" weşand da ku ji raman û armancên KAJYK re xebatê bike. Çend weşanên KAJYK, hem bi Kurdî û hem bi Erebî, hatin çapkirin û belavkirin. Li ser vê bingehê, hevkarîya me, bi dehsalan dirêj kir û di hevalbendîya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ya li Londonê kûrtir bû. Kak Cemal di jiyana xwe de, ji bo azadiya Kurdistanê xebitî, hejmarek mezin ji semîneran pêşkêş kirin, beşdarî civînan bû û bi zimanên cihêreng pirtûk û gotar weşandin, bêyî ku ji xwe re tiştek bixwaze.

Çûna Dr. Cemal ji me re, ji bo heval û hevkarên wî û doza gelê Kurd re windahiyek bê şûndedanî ye.

Çawa min bi Profesor Cemal Nebez re nîv sedsal nasî û têkoşîn kir

Cewad Mela



Dr.Cewad Mela, Dr.Cemal Nebez û Brûska Ibrahim-

London 29/01/1997

Piştî ku ez beşdarî heftemîn konferansa Partiya Demokrata Kurd li Sûriyê bûm, ku di sala 1968an de, li bajarê Amûdê hate lidarxistin, ji min re hate xuyakirin ku partî ji rêgezên xwe dûr ket. Ji ber vê yekê min devjêberdana kar pêşkêşî wê kir û ez di wê konferansê de, ligel Apê Osman Sebrî bûm, û wî jî devjêberdana partiya xwe, ku ew damezirêner û serokê wê bû, rast dîtibû ... Piştî Apê Osman red kir ku partiyek nû saz bike, ji ber vê yekê min dilkir ku ez ji Sûriyê derkevim û biçim Ewropa, ji ber ku ez dihatim girtin, perîşankirin, û bi tewşî kilhandim. Ji ber ku ez bi Apê Osman Sebrî pir bawer bûm, gava ku ez derketim, wî navên kesên ku li Ewropa dijîn û wî bi wan bawer dikir, da min; wek:

Hemreş Reşo (ji Bakurê Kurdistanê) li Elmanya, Mihemed Bekir (ji Rojavayê Kurdistanê) li Çekoslovakya û Profesor Cemal Nebez (ji Başûrê Kurdistanê) û hinên din ji kesayetiyan Kurd li Ewropa bûn...

Di dawiya sala 1969an de, ez gihîştim Elmanya û bi Hemreş Reşo re her gav di têkiliyê de bûm. Her roj min Kurdên ji her perçê Kurdistanê ku li Berlînê dijîn û serdana wî dikirin, didîtin. Di hevdîtinên wan de, tiştek nû tune bû, heya Profesor Cemal Nebez serdana wî kir. Berî ku ew were, Hemreş ji min re got ku Cemal Kurdekî pir Tundrê û netewperwer e. Ji bo neteweya Kurd, min ji wî hez kirbû, berî ku ez wî bibînim. Min ji xwe re got: Dibe ku ez tiştekî ji wî bibihîzim û birçîbûna xwe têr bikim da ku tîna dilê xwe pê bişkînim, bi rêbazeke nû gelê me ji vê çerxa girêkûtkî ya ku ew tê de dijî rizgar bike.

Gava ku birêz Cemal Nebez hat, me silav û aliyên sohbetê pev re guhertin. Di nav axaftina xwe de, wî da xuyakirin ku alîgirê çareserkirina pirsgerêka Kurd bû li ser riya serxwebûna Kurdistanê. Ew pê bawer bû ku damezirandina dewleta kurdî tenê amêra yekane ye ji bo bidestxistina ewlehî, dilniya û dadmendiya gelê kurd e. Gotina ku ez lê digeriyam ev bû. Ji ber vê yekê, civînên me berdewam kirin, û min bi kêfxweşî nerîn û baweriyên wî dibihîstin, û kêfa min jê re hat ku ez bi şewşenî ji bo wan xebatê bikim ...

Di civîneke me de, Dr. Cemal ji min re baweriyên rêxistina KAJYK û armancên wê di çespendin û aramkirina tevgera neteweyî ya Kurd de, di nav darêjge û bedenek bîrdozî û

bîrnasî de kir. Ji ber vê yekê min li ser tiştê ku di dermafê armancên KAJYK de hatibû nivîsandin, jê pirsî. Wî pirtûkek da min, bi navnîşana "KAJYKname" ku min di şevê de xwend, û ji sibehê ve ez zû çûm û min Dr.Cemal dît û jê re got: Ez bi tevahî amade me û heya kêliya dawî ya jiyana xwe, her tiştê xwe gorî bikim da ku piştgiya vê ramana mezin bikim. Ya ku armanca wê ne tenê damezirandina dewleta kurdî ye, lê ya girîngtir armanckirina gelê me bi ronakbîriyê ye, ku wê bibe sedema parastina dewleta kurdî ji hilweşandinê di paşerojê de. Piştî wê min bernameya rêzîknameyê pir bi baldarî xwend û daxwaznameya kar ya girêdanê pêşkêşî KAJYK kir, û dûv re Dr. Parêzer Kamil Jîr, ku ji Kurdistanê çûbû serdana wî, û (endazyar) Brûska Ibrahîm û yê din.

Ez beşdarî semînerên Profesor Cemal Nebez, yê ku li Zanîngeha Azad a Berlînê li ser zimanê Kurdî didan, dibûm ... Ji wan rojan ve, min hin helbestên helbestvan Hejar Mukriyanî jiber dikirin ku Profesor Cemal li ser nivîsibû û bi kelecana ji xwendekaran re şirove dikirin, nemaze dema ku digihîşt malikên ku digotin: Ezê wek Kurd bijîm û li ser Kurdayetiya xwe bimirim... Ezê bersiva pirsên gorê bi kurdî bidim, û li cîhana din jî dîsa ezê doza kurdayetiya xwe bikim ...

Dr. Cemal bi çend zimanên Ewropî û Rojhilatî de mîna Elmanî, Ingilîzî, Farisî, Sansekrîtî û zimanin din baş zanibû. Wekî zimanê Kurdî, ew bi hemî zaravayên wê zanibû. Wek min ji wî naskir, yekem serkeftina wî ya akademîk di

bîrkariyê de, ji Zanîngeha Bexdayê, di salên 1950an de bû. Di wê demê de, wî çend pirtûkên zanistî bi zimanê Kurdî nivîsandin, û ew yekem Kurd bû ku zimanê Kurdî di şirovekirina bîrkariyê de bikar anî. Mînak, wî peyva Bazin bi kar anî, wateya wê zincîra ku jin li ser zendê xwe digire, ji ber vê yekê wî ew kir peyvek bîrkarî bi wateya xelek, ji destpêkê de, wisa jî lêgerîn, dahêner û nûker di zimanê Kurdî de.

Dr. Cemal ji min re gelek tişt li ser têkiliyên xwe yên bi Kurdên Bexdadê re digotin; weke ku piştî zanîngehê, ew êvarî li terzîxaneyê Beşîr Mûşîr dicivyan; dikana wî bibû mîna civata Kurdî ya bi navê "Rûgeha Hêviyên Kurdan". Carekê, dema ku gengeşeya siyasî û neteweyî gur dibû, Ibrahîm Ahmed, Celal Talabanî û yên din ji dikana wî dihatin derxistin û wî digot: Cemal tenê dimîne ji ber ku ew bi fermî cûdaxwaz e ...

Di sala 1962an de, Dr. Cemal çû Ewropa, û yekem welatê ku ew lê bicî bû Swîsre bû, û ji roja yekem ew bû mêvanê Mîr Kamiran Bedir-Xan. Ewî bi kelecana, di derbarê nûçeyan de, ji Dr. Cemal dipirsî: Gelo rast e ku Kurdan şoreş vexistine!? Heya nivê şevê, Dr. Cemal ji Dr. Kamiran re vegotina pêşmergeyên qehreman, ên şerê wan li dijî leşkerên Iraqê, dikir. Dûv re ew ketin xewê, lê Mîr kamiran ji mizgîniya ku Dr. Cemal anîbû nikaribû razê.. û qet xewa wî nedihat.. Dûv re Mîr kamiran ji nav livînan rabû û bi lez Dr. Cemal şiyar kir û got: Cemal ... Cemal ... Cemal! Dema ku Dr. Cemal şiyar bû, Mîr Kamiran jê pirsî: Ma tivingên pêşmergeyan hene ..? Cemal jê re got: Erê, tivingên wan

hene, û ez ji sibehê heya nîvê şevê li ser şerên di navbera Pêşmerge û leşkerên Iraqê de daxivîm, ma gelo ew bi dar û keviran şer dikirin !!...

Dr. Cemal, di axaftina xwe de, ji min re li ser windakirina baweriya xurt li cem gelê Kurd derbarê destpêkirina bi şoreşê de diyar dikir, ji ber ku ji rûxandina Komara Kurdistanê, di 1946an de, û heya şoreşa 1961ê, tu şoreş nehatibûn vêxistin, ji bilî serhildanek herêmî ya êla Ciwanro li rojhilatê Kurdistanê, ku Mîrê Kurd hêviya xwe winda kiribû, wisa çawa bi gelemperî Gel.

Di sala 1970an de, her çend min sê bexşînên xwendinê wergirtin, lê di heman demê de jî, ez bûm hilgirê ramana KAJYK, ku ez kirim mîna Sûfiyekî ku riya xwe dît û rewş ber bi zelaliya giyanî ve û di pileyên xwe yên herî jor de hilda ... Lewma, min biryar da ku ez dev ji bexşînên xwendinê, li Ewropa ji xwendekarên din ên Kurd re berdim û biçim Kurdistanê ku ramana KAJYK li rojava û bakurê Kurdistanê belav bikim. Gelek hevalên min ên kevin ji tevgera min di redkirina bexşê de, ji aliyekê ve û di hişê xwe de, bêdengiya min ji aliyek din ve matmayî û guman dikirin, ji ber ku KAJYK rêxistinek veşartî bû û qet nabe ku endam endamtiya xwe diyar bikin ...

Ji ber vê yekê min xatirê xwe ji profesor û serokê xwe, Cemal Nebez xwest, û çûm Kurdistanê; û ji bo ku tevgera min bêsînor û azad be, min bajarê Beyrûtê hilbijart, ku yekane mêrga nêzîkî Kurdistanê bû ku bi demokrasiyê radiweste û hemî beşên azadiyê ji yên li Ewropa ne kêmtir

bûn. Bi rastî, Beyrût bû navendek ji bo weşandin û çapkirina ragihandinên KAJYK, û hem jî navendek girîng ji bo têkiliya bi hemû cîhanê re, bi rêya ajansên nûçegihanî, balyozxane û saziyên din ên navneteweyî ku li Beyrûdê ne, bê sansor ji welatên ku Kurdistanê dagîr dikin. Ez, bi profesore xwe Dr.Cemal re, di nav têkiliyê de bûm, û min bêyî agahdariya wî, û bêyî ku çiraya kesê jê wergirim, qet gavek nedavêt, û min xebat li gorî rêwerz û rênimayên wî dimeşandin.

Li Rojavayê Kurdistanê, bi biryara Dr. Cemal, rêxistinên KAJYK hatin ava kirin, û rêxistinên gelêrî yê wekî ciwanan, jinan, xwendekaran, û rêxistinên din ên girêdayî bi KAJYK ve hatin damezirandin. Rêxistina xwendekaran ji tevan çalaktir bû, û di bin navê Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd de dixebitî, û kovara wan bi navê (Hişyar) derdiket, û bi destan li Rojavayê Kurdistanê belav dibû. Ji Beyrûtê ew bi posteya fermî li hemî deverên cîhanê dihate belavkirin. Ji ber vê yekê, min serdana Xwedêjêxweş General Mistefa Barzanî li gundê (Dilman)ê kir, û beşdarî konferansa xwendekaran a li Silêmaniyê bûm. Dibistanek ji bo fêrkirina zimanê Kurdî li Beyrûtê vekir; çalakiyên din ên ku bi rêberiya Dr. Cemal ez pê rabûm, bi mercê ku ev çalakî di bin navê yekîtiya me ya xwendekaran de be, û ne li ser navê KAJYK be, ji bo dabînkirina nepenîtiyê..

Li bajarên Şamê û Helebê, bi dehan Kurd hebûn ku ji Bakurê Kurdistanê dihatin ku zagonên Islamî bixwînin. Salê zêdeyî deh xwendekaran xwendina xwe bidawî dikirin, û bêhtirî deh xwendekarên nû hebûn ku salê li Şamê û Helebê

dest bi xwendina xwe dikirin. Ez li ser rêxistinkirina piraniya van xwendekaran li KAJYK-ê xebitîm, û ew gava yekem bû ji bo belavkirina rêxistinên me li Bakurê Kurdistanê.

Di sala 1978an de, komê kadroyên KAJYKê partiyeke nû bi navê PASOKê li başûrê Kurdistanê ragihandin.

Di sala 1982an de, ez ji Sûriyê derketim û ber bi Ewropa ve çûm, û di rêya Iranê re, ji wir çûme Kurdistanê.

Di salên 1982 - 1984an de, ez endamekî pêşeng ê PASOK-ê û fermanîyê çalakîyên pêşmergeyan, li çiyayên başûrê Kurdistanê, bûm. Ez beşdarî çend şeran bûm, û yê herî girîng jî şerê (Bişt Aşan) di 1-5-1983an de bû. Lê xwedan ramanên neteweyî her dem dihatin qurmiçandin, û hîn jî weha ye. Ez li bajarê (Kerc) a Iranê raserî hewlî kuştinê ya serneketî hatim. Bi alîkarî û piştgiriya pakrewan Idrîs Barzanî bû ku ne ketim nav destê sîxurên Iranê û nehatim girtin. Bi vî rengî, bi aramî û asayî ghiştim Ewropa. Ji ber vê yekê hezar dilovanî li ser giyanê wî yê pak be.

Di dawîya 1984an de, ez hatim Brîtanya. Bi Dr. Cemal re, têkoşînek nû dest pê kir. Ji ber ku ew çîna yekem ji her tevgerê re dilrakêş bû, bi çirûskekê hêvî bû, ku di pêvajoya xebata azadî û serxwebûna gelê Kurd de hin guhertinan pêk bîne, û ji wan evên jêrîn di nav de:

1-Di sala 1985an de, Dr. Cemal yek ji damezirênerên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, ji bo yekîtiya partî û tevgerên Kurdistanê bû, digel General 'Ezîz 'Eqrawî, Dr.

Mihemed Salih Gaborî, Dr. Salah Cemmûr, Dr. Mizefer Bartome, endazyar Brûske Ibrahim, Şêx Letîf Mirîwanî, Şêxê Îzdiyan Derwêşê Heso û hin ji kesayetiyên welatparêz ji her çar perçeyên Kurdistanê, û her yek ji wan erkên xwe hebû, û ez wekî serokê konferansê hîlbijartim, û Dr.Cemal Nebez wekî rawêjkarê yekem ê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê hate hîlbijartin.

2-Di sala 1988an de, Dr. Cemal Nebez, ez handan kirim ku banga Neteweyên Yekbûyî ji bo lêpîrsînê li ser windakirina 8,000 Kurdên Barzanî yên ku di 1983an de, ji hêla rejîma Iraqê ve hatibûn revandin, erê bikim.

3-Dr. Cemal Nebez Akademiya Zanist û Hunerê ya Kurdî damezirand, û ez beşdarî konferansa damezirandina wê, ku di sala 1991an de, li Viyena hate lidarxistin, bûm û tê de hejmarek mezin ji zanyar, nivîskar, ramanwer û hunermendên Kurd beşdar bûbûn. Akademiya gelek pirtûk çap kirine, û Çapxaneya Ferhad Azad li Swêdê çapkirina van pirtûkan wergirt ser milê xwe.

4-Di sala 1995an de, Dr. Cemal ji min xwest ku ez bi daxwaza Parlamentoya Kurdistanê ya li sirgûnê û navenda wê li Belcîka bi cih bînim, ku ez bibim endamê wê.

5-Di sala 1997an de, Dr. Cemal ji min xwest ku ez bi vexwendina serok Mu'emer Qezafî, ya ji bo biçim serdana wî li Lîbyayê, erê bikim.

6-Di sala 2000ê de, Dr. Cemal ji min xwest ku ez vexwendina Serokwezîrê Kurdistanê, Nêçîrvan Barzanî, ji bo serdana Kurdistanê, erê bikim.

7-Dr. Cemal Nebez li hemî welatên Ewrûpa bi dehan semîner lidar xistin. Ez beşdarî piraniya wan bûm, û ji bo semînerên wî yên li Londonê, min tev bi deng û nîgar rêk û pêk tomar kirine, ku li pirtûk û gotarên wî yên pir hêja û bêhempa, ku wekî xezîneyek neteweyî ya bêdawî têne dîtin, zêde bikim. Her weha, min gelek pirtûkên wî li London çap kirine, ji wan pirtûka (Ramana Neteweyî ya Kurd), pirtûka (Nasname û Pirsana Neteweperweriya Kurdî) bi zimanê Kurdî, û pirtûka (Kurd, Dîrok û Çanda Wan) bi zimanê Ingilîzî.

8-Dr.Cemal Nebez beşdarî hemû konferansên giştî yên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê bûye, ya herî dawîn jî di sala 2009an de bû; di her konferansê de; wî pir balkêşî dikişand. Di dawîya her konferansê de, wî çend demjimêran semînerek, li ser rewşa Kurdistanê dida.

9- Daxwazek bêsinor a Dr. Cemal hebû ku serdana Kurdistanê bike, tenê ji bo rojekê jî. Her ku ez diçûm Kurdistanê, wî ji min pirs dikir ku bizanibe berpirsiyar û rêberên Kurdistanê li hember wî û li hember ramana neteweyî çiqas erênî bûn. Ji ber ku Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê bi navgîniya hevalên me li Hawlêrê Şêx Ahmed û li Silêmaniyê parêzer Kamil Jîr gelek hewildan, ji sala 1992-yan û vir ve, çend caran li konferansê li Kurdistanê nivîsgeh û vehesîn fermî hebe jî, lê bê sude û bê rêdan bû, û gava ku ez di serdana xwe ya dawîn a Kurdistanê ya di sala 2012an

de, bi hemî serokên Kurd re civiyam, min pêşwaziya xwe bi gotinên xweş dibihîst, lê min qet kiryarek erênî ji wan nedît. Min ji astên herî jor, ji bo destûrnameyeke fermî konferansê xwestibû, Xwedê giravî wan kêfa xwe anîn. Lê, heya niha konferansê destûr wernegirtiye, û ev e ya ku min ji Dr. Cemal re got: Ew li hember me diyardeyeke erênî nîşan nadin, ango ber bi ramana neteweyî. Ev e ya kir ku Dr. Cemal dudil bibe û neçe Kurdistanê, nemaze piştî wî gotinin ji karbidestên başûrê Kurdistanê dibihîst. Di dema ku ew bi hezarên kîlometran ji wan dûr bû, propagandayên derewîn di derbarê wî de dikirin; lê, pêşwaziya fermî ya cenazeyê wî bi rengê kategorîk diyar dike ku ew ji wî û ramana wî ya neteweyî ditirsiyan.

10- Di sala 1995an de, dema ku min damezirandina Komeleya Rojavayê Kurdistanê ragihand, Dr. Cemal Nebez bilez beşdarî çalakiyên damezirandinê bû. Ji ber ku komele ne xwediyê nivîsgehê bû, lê wê çalakiyên xwe ji mala heval Ferhad Zîn Elûş dest pê kir. Dr. Cemal Nebez bi endamên komeleyê re, di mala Ferhad de, pîryariya Xwedê lê be, li ber nivîsgeha demkî ya komeleyê wêneyek bîranînê kişand. Dema ku diçû kar, Dr. Cemal Nebez di bûyereke tirimbêlê de jiyana xwe ji dest da. Ew di tirimbêlê de rêwî bû, û ji nişkê ve tirimbêl bi tundî rawestî, ku bû sedema ketina wî û şikestina parsûyên wî di sîngê de, ji ber ku ew bû sedema enfeksiyonan. Piştî çend hefteyan, enfeksiyon bûn sedema mirina wî ya ji nişka ve. Berî wê bûyera malikwêran, ew roj ji bo kar û dabînkirina debara jiyana wî di (85) saliya xwe de bû. Erê, Dr. Cemal di tenduristî û hêzek mezin a bîrkarî de

bû, mîna ku ew ji zaroktiya xwe ve, werzê çalakiya xwe ya domdar, hizreke ronak, leza tevger û ramanê, mîna ku ew xortekî bîst salî be, û heke ne ew bûyera bêbext bûya, tenduristiya wî dê alîkariya wî kiribaya ku ji sed salî zêdetir jiyan bikirana.

Ma ne peywira hukûmeta Kurdistanê bû ku mûçeyê xanenişîniyê ji Dr. Cemal Nebez re veqetîne da ku di wî temenî de dev ji çûyîna kar berde dema ku ji wî re guncantir bû ku wî karînen xwe bi nivîsandina pêşeroja geş a gelê Kurd bi rêve bibe. Her çend ez piştrast im ku wî dê mûçe red bikira; ji ber ku Dr. Cemal xwedî kesayetiyek bêhempa ye û ew tu carî napejirîne ku li ser lêçûna kesekî bijî.

Piştî mirina Dr.Cemal Nebez, di 8-12-2018an de, min gelek name ji karmendên hukûmeta Kurdistanê re şandin, û min spasiya wan kir ji bo pêşwaziya fermî ya cenazeyê Dr.Cemal Nebez li Balafirgeha Hawlêr di 22-12-2018an de, û ji bo wan peyvên rêzgirtinê yên li ser nivîsandin û têkoşîna wî hatin gotin. Weke min di nameya spasiyê de got, ya ku Cemal Nebez hişt ji hêla zimanê Kurdî yê petî û ji hêla bawerî û dîtinên xwe ve, ku yek ji ayetên hêja yên ramana neteweyî ya Kurd e, dewlemendiyeke neteweyî têye jimartin. Nivîsarên wî hêjayî giştîkirinê ne û dibin beşek ji bernameya dibistan û zanîngehan. Perwerdekirina mirovan ji avakirina otêl û dîwaran pir girîngtir e.

Bi vî rengî, digel Dr. Cemal, min li ser gelek mijarên di dermafê gelê Kurd û Kurdistanê û tevgera rizgarîxwaza Kurd de, ku Dr. Cemal Nebez li benda bidestxistina wê bû,

sohbetên dirêj me dikirin; û ez ji Xwedê hêvî dikim ku ew pêk were, eger piştî mirina wî be jî, ji bo giyanê wî şad be ...

Niha zêdeyî 400 nameyên Dr.Cemal li ba min hene, ewî bi destê xwe ji min re nivîsîne û rêkirine. Ev bi serê xwe gencîneyek bêhempa ne. Min jî ev rêz tenê bi kurtî nivîsandin. Her bendek jî dikare bibe pirtûkek bi serê xwe.

Apê Osman Sebrî ji 1961ê û vir ve mamoste û rêberê min e, û Dr.Cemal Nebez ji 1969an û vir ve mamoste û rêberê min e, û herdu jî bi ramana xwe ya neteweyî bûne mîna çiyayên bilind, her çend wan nikarîbûn bigihîjin ya ku ji azadiya Kurdan û serxwebûna Kurdistanê bawer dikirin. Lêbelê, ew hene û pir girîng e ku dezgehên desteserker û dagîrkerên ku Kurdistanê dagîr dikin, nikarin wan dorpêç bikin, her wekî ku di pirsgerêka gelê Kurd de kêliyek wan ji radestî û berûjêr tunebû, û hene yên ku paşguh nakin, lê hene yên ku xwe û gelê xwe ji bo berjewendî û malê dinê, difiroşin ..

Ji ber pitewî û paydariya xwe, pir raserî propagandaya sazûmanên mêtînger ên ku Kurdistanê dagîr dikin, dihat. Ji bo kêmkirina biha û nirxên wan, tevî ku wan pir êş kişand jî, ew ji ava kaniyên paqij yên Kurdistanê paktir û paqijtir man, û li deşt û zozanan ji sorgulên Biharê xweşiktir in, û bi kurtahî, ew zêrên 24 karat bûn. Di vê demê de weke wan nîn in.

Di dawiyê de, û di vî warî de, tê bîra min ku min, li ser dîtîna û nerîna wan di hev de, dipirsî; lewma Apê Osman

Sebrî, ji min re got ku Cemal neteweperwerê çîna yekem bû, lê ew hinekî tund û reqî bû. Dr. Cemal Nebez jî ji min re got ku Apê Osman Sebrî neteweperwerê çîna yekem bû, lê ew tund, reqî û hişk bû. Ji ber vê yekê, raya wan bi tevahî yeksan bû, ji ber ku ew du aliyên yek zîvî bûn, ango tund û reqiyên bêsinor di daxwazkirina mafên gelê kurd de bûn. Her çend ew, ji bilî hişkiya li hember dijminan, ew tijî şirîniya danûstendinê bûn, û sohbetên wan bi hevalên wan re balkêş bûn û rûgeş û tim girnijî bûn. Ev e sedema her kesê ku ew nas dikirin, ji wan hez dikirin. Ez tenê dikarim, li ber bejna wan, bi rêzgirtin, bejna xwe bitewînim, û li ber bîranîna wan silavan û rêz û hûrmetê bibêjim. Heya ku ez sax bim, ezê nikaribim wan jibîr bikim.

Ji ber vê yekê hezar dilovanî li ser giyanên wan ên pak be, cihê wan Bihuşa rengîn be, û ji malbat û hevalên wan re saman û aramiyê dixwazim.

Cewad Mela

London 08 - 12 – 2020

Pêşgotin

Prof. Dr. Mihemed Salih Gaborî

Bi Navê Yezdanê Dilovan ê Mihrevan

Hemî spas ji bo Xwedanê hemî cîhanan û silav û aramî ji mirovên çak re dixwazim, û pişt re:

Ev pirtûka di nav destên we de, semînerêk bihîstbar bû, yek ji zanayên pêşeng ên Kurdistanê re ye, yê li biyaniyê dijî, ew jî Dr. Cemal Nebez e. Pirsgirêka li pêş, di asta herêmî û navneteweyî de yek ji pirsgirêkên herî girîng e, wî bi dîroka tal û rastiya taltir re çareser kiriye. Çav û guh ji bo bihîstin û dîtina rastî û hiwîrkeleyan, digel gelek pirsan vekirî bûn: Çawa heskirina olê li ba Kurdan hate kêsûkirin, û bi pîlanan Ereban, Tirkên û Farisan sêde jê wergirtin, û kurd hîn jî tîn xapandin! Çawa Tirk, Faris û Ereban birayê xwe yê Kurd xapandin û hîn jî bi dek û dûlaban wan dixapînin û biratiya mirovî ji mirovan, û mafên cînanan li ser cîrantiya cînanan, nemaze mafên Kurdan ji bîr kirin. Û Kurd hilgirên zanîne ne, û ew parêzvanên aştî û misilmantiyê, di seranserê dîroka herêmê de ne. Û çawa?... Û çawa?..

Çavdêrê bêlayane dibîne ku çi çavên wî dêşîne û dibihîze ku çi guhên wî dêşîne, ji neheqîya berçav ya ku nayê pakirin, derbaskirin û behanekirin, û berge di dermafê birayên me yên Ereban, birayên Tirk û birayên Faris de hene, bêguman dikin, ku ew li gorî têgehên mirovî şovenîstên nîjadperest in,

û ew li gorî têgehên olî setemkarên qubat û pozbilind in, ji bilî ewên ku Yezdan dilovaniyê li wan bike, ew jî hindik in, û ev helawêrdina ji Ereb, Tirk û Farisan, ne tenê ji bo aliyên wan ên welatparêz û netewperest e. Di heman demê de, ji bo aliyên wan ên olî yên misilmanî ye jî, wekî hînkirinên ola misilmanî ya Henîf, jiyana Pêxemberê hêja û hewldanên pêşiyên rast. Ew bûye pêlîstokek di destên gelek ji wan kesan de ku ji misilmantiyê nizanin, piştî derbasbûna zêdeyî çardeh sedsalan li ser derbasbûna wan an derbasbûna wê, û tawana wan mezintir e, heke ew paşguh dikin!.

Divê Kurd, berî her kesî, li vê semînerê guhdarî bikin û vê pirtûkê ji carekê pirtir bixwînin, ne tenê ji bo agahdariyê, lê di heman demê de, wekî bîranînekê jî, da ku xapînokên pir û têra xwe demdirêj hatibin xapandin, û cih ji bo bazirganiya ol, mirovahî, sinçî û nîhad û wijdanan nemîne. Kesên xapînok ewqas bi aram bûn, ji bo demeke dirêj, samana wan jî hema hema bi dawî bû.

Ew dem û soz hatiye ku Mizgîniya Qur'anê ji wan re, ji hêla Xwedayê cîhanan ve ji yê wek wan re têye diyar kirin. Bila dijminên Xwedê, setemkarên qure û pozbilind ji Ereb, Tirk, Faris û yên din tev vê bibihîzin ... û ev sozên Xwedê ne. Bila gelê Kurd ê setembar û çewisandî wê bibihîze, û ev sozê Xwedê ye.

(نريد أن نمن على الذين استضعفوا في الأرض ونجعلهم أئمة ونجعلهم الوارثين ونمكن لهم في الأرض ...) سورة القصص ص385

(Û me divê comerdîyê digel wan bikin, ewên di Misrê de hatine tepeserkirin, ku isra'îlî ne, û wan ji zordariya Fir'ewnî rizgar bikin), û wan bikine pêşî û cihê çavlêkirinê, û wan bikine wêris (mîratgir) (li Misrê) û wan tê da desthilatdar bikin)²

Evana di dema me de Kurd in, û Xwedê delîv, gengazî û derfetê naşikîne.

Kolin 27/10/1995

²-Çavkanî: li gorî tefsîra Jiyan, ravekirina: Isma'îl Sikêrî, lêveger û raskirina zimanî: Isma'îl Taha Şahîn û Şi'ban Kehî, çapa sisiyan, sal: 2008z- 1429h. –Wergêr-

Kurdên Çewisandî û Birayên Wan Ên Misilman

Beşdarên Delal..

Ey Xwişk û Biran...

Ez bixêrhatina we dikim, bi tîrêj û çirûskên ronahiya hezkirin û aştiyê, silavan dikim, bixêrhatineke bihindar, bi gulav û pirjîn û bi şineya evîn û nêwanxweşiyê pêşwaziya we dikim. Ez karbidestên vê konferansê spas dikim, ji bo dilnizmiya wan ku ez vexwendim da ku ez vê semînerê pêşkêş bikim. Her weha ez spasiya beşdaran dikim ji bo vê tevkeriya dilsoz di bihîstina vê axaftina nerm de, hêvî dikim ku Xwedayê Gewre dê ji bo başiya tevaya mirovahiyê alîkariya me bike, nemaze komele û girseyên tepeserdî û çewisandî, yên li vê cîhana tijî xweperestiya zêde û arezûkariya deravî yên bi giraniya çavnebarî, neyartî, kîn û duberekî, girtinhevî, dagîrkarî, pêşbazî, çavbirçîtiyê, talankarî û ji kuştinê têr nabin.

Gelî Xwişk û Biran

Berî ku ez dest bi mijara bingehîn bikim, ez hêvî dikim ku bala we rêzdar ber bi du tiştan ve bixşînim: Ya yekem bi min bi xwe ve girêdayî ye, û ew jî ew e ku ez di vê jiyana cîhanî de hîn bûme ku tiştê ez pê bawer dikim maf û rastiye bibêjim. Gava ku ez bi rêgeza tore û rêzikên azînen rêzgir-

tina ji yên din re di axaftinê de, ez rê nadim xwe ku azînen rêzdarîyê piçekî zîyanê dide çêkirina tiştê ku ez rast û durist dibînim. Vî mafê, ku ez têda aliyê nêzîk an dûr ber çavên xwe nagirim, û ez natirsim ku axivîna wê bikim û piştgiriye bidim wê, û ji bo wî tawanbarî gunehbar bikin bixebitim. Ez ji rewiştên herî xerab heznakim ku xapînokî û durûtî ne, ku bi xwe re kêsbazî, durûtî û dulaneyî di zimên û aliyê sinçî de pêwîst dike. Ji ber vê yekê, ez pêşwext hêvî dikim ku her kes dê şêwazeyê min e rasterû ya têkiliya bi mirov û bûyeran re bi rêkûpêkî nas bike, ew şêwazekî helkewtî, dorhêlî û jîwerî ye, ji keşx û pêwanan di dilxwestin û dilnizmiyê de, ji dorpêçandin û dorpêçkirinê dûr û azad e. Spas dikim.

Ya duyemîn jî têkildarî hemwelatîyên Kurdistanê ye, yên ku beşdarî vê konferansê bûne û îro bi kêf û şahî pêşwaziya min kirin. Lêbelê, hinek ji wan bêhêvî bûn, gava nas kirin ku ezê axaftina xwe bi zîmanê Erebi bidim, ku ew jê serwext nabin, û bê guman mafê wan heye ku vê yekê bikin. Lêbelê, ez ne yek ji çavdêrên vê konferansê me, lê berevajî vê yekê, ez mêvanekî vexwendî me ku bi Erebi semînerê bidim. Dema ku min pêşniyar kir, ku ez semînerê bi zîmanê Elmanî an Ingilîzî bidim da ku sûdeya wê bi gelemperî û berfirehtir be, çunkî em li Ewropa ne, ji min re gotin, "Konferans konferansekî misilmanî ye ku bi taybetî ji bo Misilmanan hatiye sazîkirin û ne ji bo Ewropîyan - û ev jî rast e - û zîmanên fermî Kurdî, Erebi û Tirkî ne. Em bi hêvî ne ku tu semînera xwe bi zîmanê Erebi bidî. Gotinek pêşiyar a Kurdî heye ku dibêje: (Mêvan kerê xudanê malê ye). Ango, divê mêvan tiştê ku jê re tê pêşniyarkirin wek xwarin, vexwarin,

xew, zimanê sohbetê .. hwd, bêyî pêşbirî û bê zarê derbirînê erê bike, û min guh da mêvandar, ji ber ku min vexwendina wî pejirandiye û ji kerema xwe li min biborin. Em hêvî dikin ku em ê bikaribin kurtayîyek lêkolînê bi zimanê xwe yê hêja yê Kurdî pêşkêş bikin⁽¹⁾.

Gelî Xwişk û Birayan

Ew ji xwe diyar e ku em bibêjin: Em bêyî vîna xwe hatine afirandin, û me bêyî ku ji me bête pirsîn, xwe li ser rûyê goga zemînê dîtiye, bêyî ku kesek ji me daxwaziya me jê re, bipirse, û di wiya de vîna Afirînerê Mezin û Herî Berz, di wateyên wê yên her jor û teşeyên her vegotinê de, diyar dibe. Ev di nav bendên mezin ên Xwedayê me de ne, ku erd û ezman û tiştê ku di navbera wan de heye, afirand⁽²⁾ û mirov ji nêr û mê, bi rengê pir gelan û gelên cihêreng afirand, di nav wan de gelê Kurd jî. Erê, Xwedê gelên afirandî - wekî ku di Qur'ana Pîroz de hatiye gotin (ji bo ku hev nas bikin).⁽³⁾ Ango, ku di nav xwe de li hev bikin, şer nekin, an ji hevûdu dûrketin, ne jî yek ji wan pozbilind bibe û yên din qels bike. Di nav bend û ayetên wî de jî cûdahiya di ziman û rengên me de.⁽⁴⁾ Ji ber vê yekê hebûna gelê Kurd, wê çaxê, mîna hebûna gelên din e, babetekî xwezayî û şehrezayîya xwedayî ye, û tu kes nikare xwe ji Xwedayê xwe bawermend baldar bibîne û dûv re bixebite ji bo gelê Kurd tune bike, an xwe bike parêzvanê wan, û bi çarenûs û par û şîyanên wan bilîze, an rok û tava azadiyê ji wan bigire, ew bi çi behaneyan şer û setemkariyê lê dike.

Xwişk û Birayên Min

Gelê Kurd xwedî rabirdûyeke birûmet û kelepûreke dewlemend e, bi hezarê salan kûr e, û welatê wî Kurdistan e, pir şaristaniyan cih û dergûşa pêxemberan û landika sperma mirovan bû. Ew bi saya şayetîdana dîrokê û belgenameya Pirtûkên Pîroz e ⁽⁵⁾. Keştiya Nûh ji bo xwe li çiyayê Cûdî li Kurdistanê, cihekî aram û mayînde dîtiye. Ew di Qurana pîroz de, di dermafê Keştiya Nûh de, di benda 44an a Sûreta Hûd de, hatiye şirovekirin kirin.

”وغيض الماء وقضي الأمرُ واستوت على الجودي وقيل بُعداً للقوم
الظالمين.”سورة هود(44).³

Hîn jî çiyayê Cûdî, ew çiyayê neguhêzbar di orta welatê Kurdan de, hêj mîna çiyayekî serberz asê rawestiya ye; rewşa wî jî mîna rewşa hemû çiyayên Kurdistanê, bi xwîna mirovên xwe hatiye avdan. Îro, ew çiya Kurdên çewisandî û bêçare bi rondik û bi tenê pêşwazî dike, û ew li xwe pessar û pesargeh dibînin, piştî ku ew neçar man ku ji gund û bajarên xwe birevin, û ji neçarî berevaniyê di ber giyan, saman û rûmeta xwe de bikin û xwe biparêzin, ne ji tirs û êrîşên Xiristiyan û Cihûyan, lê mexabin ji wan kesên ku destdirêjî û êrîşên birayên xwe yên Misilman, ên ji Tirk, Ereb û Faris ên pozbilind dikin.

³ - Piştî miletê Nûh pêxember bi tofanê çûn, ji bilî wan ewên di gemiyê de) ferman hate dan, erdê ava xwe vexwe, ezmano tu jî ava xwe ragire û bes ke û av xewrî, û fermana Xwedê bi cih hat (Nûh û yên bawerî di gel înayiyên rizgarbûn û yên dê bi tofanê xendiqîn), û gemî li ser çiyayê Cûdî rawestiya (çiyayeke dikevête kurdistana bin destê Tirkiya) û hate gotin (milyaketan got): Hîlak û binbirî bo miletê setemkar bît. Jêderê berê- Wergêr.

Xwişk û Birayên Hêja

Dîrok nas dibêjin ku ola misilmanî, di hîjdehê koçî, yanî di sala 640z. de, gihaye sînore kurdistanê. Berî ku dagîrkerên Misilman ên Ereba derbasî nav xaka Kurdistanê bibin, wan bi hêzên Emperatoriya Sasanî (211-651) re şer kirin, ku wê demê Kurdistan, Iraq, Faris û Blocistan berbandî dikir, û Tesfun (El-Mada'in) ku li nêzîkî bajarê Bexdadê bû, kiribû paytexta xwe, û bi vê boneyê, peyva "Bexda" ji peyvê hatiye berevajîkirin (Baga Data), a kurdiya kevnar a Iranê, wateya "Dana Xwedê" ye⁽⁶⁾. Lê, hêzên dewleta Sasanî yê bi hêz, bi tîr û kevanan, nekarî li hember êrîşa erebên çolger ên bi şûr tenê çekdar in, dema dirêj li ber xwe bidin, û ev ji ber gelek hokeran e, hûnguliyên wan li vir nayêne der. Bi kurtahî, hêzên dagîrkeran karîbûn ku liberxwedana Sasaniyan bişkînin, piştî ku El-Mada'in, di Adara 637an de, ket destê Misilmanên ku xwe di rastiye de, li Kurdistanê dîtin. Ji ber vê yekê civîn di navbera Misilmanên Ereba û gelê Kurd de pêk hat. Li vir, hêja ye ku mirov xalek girîng destnîşan bike, ew jî ew e ku ciyawazî û cûdahiyê mezî di navbera gelê Kurd û Ereba de, di warê baweriyên wan di derheqê Xwedê û pêkhatina jiyana wan a civakî de hebû. Civaka Ereba berî hatina misilmantiyê - wek ku hûn jî dizanin - civakek bi perestî û perizîna pûtan, çêvanan û xawenan carinan serdest bû, û ji hêla kevneşopî û gerdişên paşverû, çolger û nezana ve dihate rêvebirin, wek zarokkujiya keçan, pevçûnên eşîrî yê domdar, destpêkirina tolhildanê, pelamar û talanbirû, bazirganiya bi koleyan bi wateya koledariyê, jinfirotin, yasayî firejinî û tawankirina pîşesazî, huner û

dûrketin ji cîhana şaristaniyê bû. Di derbarê civaka Kurd de, bi saya olên nepenî yên di nav rêzên wê de belav bûne, mîna: Mîtrayî, Zerdeştî, Cihûtî, Xiristiyanî, Manî û Êzîdîtî, ku bû sedema pêkhatina efsanenasî Senkerîstîk⁽⁷⁾, ji ber ku ew bi baweriya Tek-Xwedayî zindî, xweperestî, ramanwerê zana, locîk, ji mirovan re nediyar û nedîtbar dagîr tî bû. Çandinî, pîşesazî, huner û bazirganî xwediyê pozîsyonek mezin a rêz û hûrmetê bû⁽⁸⁾. Jin xwedî rewşeke civakî ye berbiçav bûn⁽⁹⁾. Ya ku balkêş e jî ev e ku Ereban berê, ji Kurdistanê û Îraqê, ku du welatên Mezopotamyayê ne digotin: "Welatê Reş", wate welatê dar, çem, sebze û qencyê, berevajî Nîvgirava Erebî, ku welatê ziwabûn, xwelî û çolê bû, û ku Xwedê li nihalek din afirandî pê ve şînkati⁽¹⁰⁾. Gelê Kurd, di destpêkê de, li dijî belavbûna ola nû ya li Kurdistanê li berxwe da. Di hin pirtûkên bi navê "Maghazi-Dagîrker" û di hin jêderên Kurdî de jî, nûçeyên dirêj li ser şer û pevçûnên dijwar yên di navbera welatîyên Kurdistanê û hêzên dagîrker de hebûn. Li Kurdistanê hin goristan û derbasgeh hene, ji hinan ji wan re goristanên "Sehaban" an "Pakrewanan" tê gotin, û ji yên din re wekî gorên "Gawiran" tê zanîn wekî "Dolê Sahaban" Geliyê Sehabeyan û "Dolê Kafiran" (Geliyê Kafiran) li Koye û her weha "Girdî Şahîdan" (Girê (şehîdan) di navbera (Qel'e Dize) û (Gihlale) de. Wekî din, rêhevalê navdar (El-Sehabî) Ebû Ubaidah El-Ensarî, li gundê Ebabîlî, li nêzî bajarê Helebçeya pakrewan tê veşartin, û peyva "Ehbab Hîl" ji navê "Ebû Ubeyda"⁽¹¹⁾ tê berevajîkirin, û li bajarê niha yê Suleymaniyê ziyaretgehek perestgehek ji Rêhevalek (Sehabî) "ne diyar e" bi navê (Rêhevalê Spî) tê naskirin. Perestgeha serhildêrê misilmanî

yê navdar Ebû Zur El-Xafarî, li bajarê (Samsûr-Adiyaman) li bakurê Kurdistanê ye. Ev hemî nîşanên ku bûyerên vê heyamê ji dîroka Kurd û misilmantiyê destnîşan dikin. Lêbelê, belgeyên din ên dîrokî hene ku hebûna têkiliyên rasterast di navbera hin ronakbîrên kurd û Muhemed pêxemberê Xwedê (Silavên Xwedê lê bin) de, pêve asê dikin. Gavan/Kaban ê Kurd yek ji rêhevalên Pêxember bû, û wî di derheqê jinkirin û karûbarên din de, gelek fermûdeyên li ser pêxemberê hêja vegotin⁽¹²⁾. Zanyar Mehmûd Şukrî El-Alûsî, rehma Xwedê lê be, di şirovekirina xwe ya ku ji (giyanên wateyê) re tê zanîn ku li ser bingeha "birîna di têgihîştina sehabiyên de", ji hêla gotinbêj Ibin El-Hucur El-Esqelanî ve vegot ku mebest ew e kesên ku di (ayeta-Benda) hêja (16) a (Sûretul-Feth) de hatine gotin:

"قل للمخلفين من الأعراب سئدعون إلى قوم أولى بأس شديد تقاتلونهم أو يُسلمون" سورة الفتح (16).⁴

Ew gelê Kurd in, ku bi setemkarî û dijiwariya xwe têne nasîn. Ji hingê ve, Misilmanên Kurd ji Misilmantiyê û cemawer û girseyên Misilmanan re û ji gel, tîre û berebanên wan ên cûdacûda re raje û peywiran dîhar û averû, bi gelek awayan dikin: leşkerî, siyasî, zanistî, çandî û şaristaniyê jî tê de ye. **Ez ji xwişk û birayên** xwe re bi xemgînî û vekirî bibêjim: Ku gelê Kurd ji ber qencî û regezên xwe yê gîştî bi nankoriya bê nemekdar û şermezar hatine xelatkirin, û li ser qencî û xêrxwaziyên wî yê gewre dan mandelê, û li ser

⁴ - (Bêje evên vemaîn ji koçerên Ereban (ewên ji derveyî bajêran akincî), nêzîk hûnê dê (bo şerê) miletekî bi hêz û şerker bêne daxwazkirin, yan hûnê dê şerî di gel wan kin yan dê bê şer Misilman bin,..). Jêdera berê.-Wergêr-

hezkirin û dilsoziya wî, bedkarîya wî kirin, welatê wî şelandin û nawzirandin û rûreşkirina wî kirin; li ser rêzgirtina wî ji yê din re, bi neviyan û dijminahî li hember wî hate kirin. Ev, ji pola misilmantiyê heya roja îro, bi bêtir poşmaniyê diyar e. Ez ji guhdarvanê birûmet lêbûrînê dixwazim. Ji ber ku ez nikarim dîrokek tijî rajekarî, fedakarî, ciwanmêrî û biratî, ji aliyê Kurdan ve vebêjim. Dûv re jî bi kîn, neyarî û dijminatî digel neheqî û pêşdarazî li aliyê din ku ji hezar û sê sed salî dirêjtir e, û di nav yek an du demjimêran de bibêjim⁽¹³⁾. Lê, tê bîra min, hin nimûneyên tîpîk tenê ji bo bîranînê ne, û dibe ku bîranîn ji bawermendan re sûdeyê bigire.

Ey xwişk û biran, divê em pêşî zanibin ku lêkhelsiwan û nakokiyên neteweyî di misilmantiyê de, ku ji dema Pêxember ve hebûn (570 - 632), dema ku hejmarek ne Erebi tevli Peyamnêr bûn û misilmanî wekî ol pejirandin, ji wan: Bilal El-Habaşî, Selman El-Farisî, Suheyb El-Rumî, û Kaban/Gavan ê Kurd.

Wan peywîrên mezin ji misilmantiyê re kirine. Pêxember ji wan hez dikir, ji wan re hurmet digirt, û ew di nav xelkên mala xwe de (Ehl Beyt) dijimart⁽¹⁴⁾. Dema ku hevalên wî yê Erebi dest bi zelalkirina nerazîbûna xwe ji vê helwestê re kirin, Pêxemberê hêja hevalên xwe yê ne Erebi parastin, û hewl da ku danasînekê ji hatina rêza Erebi re bibîne ku ew pênasêya wî ya nijadî berevajî bike. Kî bi zimanê Erebi baxive, ew Erebi e⁽¹⁵⁾. Ya rast ew e ku, di dema Pêxember de, di navbeyna Ereben Misilman û gelên ne Erebi de, tevli-

heviyek fireh çênebûbû. Ji ber vê yekê, pirsgirêka neteweyî bû pirsgirêkeke giştî ku bala her kesî dikişand da ku Peyamnêrê jîr çareseriyekê jê re bibîne ku, bi binema û rêbîra ola ku wî aniyê re, têkildar be. Pirsgirêka neteweyan di dema dagîr kirinên misilmanî yê li derveyî Nîvgirava Erebî de diyar bû; ango di serdema Xelîfeyên El-Raşîdîn de derket holê, û dûv re pîvanên wê li dû wan dirêj û geş bûn. Ji ber vê yekê, ew di serdema Emewiyan û Ebasiyan de, dema ku dagîrkerên Ereb dest bi rûniştina li welatên dagîr kirî kirin, û ew serwer bûn. Pirsê destpêkê ya ku xwe li vir radigihîne ev e:

Ez dipirsim: Nizanim, gelo Pêxember ew sax û zindî bûye? Dê bi dagîrkerin û bicîkirina wan welatên ne Ereb re pîroz bûbaye, wekî piştî mirina wî rûdayî?

Bala xwe bidinê! Peyamnêr li dijî gîv, qubat û pozbindiya regezî û nijadperestiyê bû. Pir dijwar e ku mirov bersiva vê pirsê bi pendî bide, lê rastiya ku girove, belge û bi cih dike ev e ku xelîfeyên Raşîdîn, Emewiyîn û Ebasiyan qet nikarîbûn çareseriyekê ji pirsgirêka neteweyî ya ku wan raber kirine re bibînin. Lê berevajî wê, ew pirsgirêk û tevlihevtir kirin. Wekî din, welatên din ên ku piştî hilweşîna dewleta Ebasî (1258z) hatin damezirandin û li ser navê misilmantiyê ferwerdar bûn, wek dewletên Osmanî û Sefewî, tevlihevî zêde kirin, û pirsgirêk wekî çareserî û qeyranek heyî ma. Heya roja îro gelê Kurd û hin gelên din ên lawaz û lexer, ên li cîhana misilmanî, ji vê êşê dikişînin.

Xwişk û Birayên Hêja:

Gava ku dagîrkerên misilman ên Ereba dest danîn ser perçeyekî ji Kurdistanê û welatê Farisan, pîrriya gelê Kurd bawerî bi Mizdaîsnî (Zerdeştî) tanîn. Dagîrker neçar man ku pêşî pêwîstî li dorhêl û jîweriya heyî bipejirînin û fermanber û endamên vê olê nas bikin, wekî "mirovên xwedî pirtûk= Ehil Elkîtab", ji ber vê yekê wan "bac-serane= gizît" ji wan standin, mîna "mirovên zimmetê." (Ehil El-Zime), hêjayî gotinê ye, ku peyva "cizye=bac" peyvek kevna e ya Iranî ya Kurdî ye, ku koka wê "gizît" e, û ev peyv hîn jî heye, wateya wê di zimanê Kurdî yê nûjen de dirav an tiştê e ku ji mirovekî tê standin; li vê hevokê binêrin - (Gizî li min kird), beyhûde çû. Her çend di Qur'ana Pîroz de, ji ayeta (256) ji Sûret Beqere wiha tê gotin ku:

“لَا إِكْرَاهَ فِي الدِّينِ، قَدْ تَبَيَّنَ الرُّشْدُ مِنَ الْغَيِّ”

"Di olê de zor nîne, (zanana =bawermendan) ji (nezanan =gawiran) ji hev hatine vavartin û naskirin". Lêbelê, dema dirêj neçû ku dagîrkerên Ereba piştî xwe dane Zerdeştîyan, Kurdan, û li dijî vê olê û gelê wê bê mihr û bê dilovanî û bi tund û tûjî şer kirin, ku bû sedema alozî û têkçûnên bixwînên dijwar û serhildanên tund li dijî deshilatdarên Ereba. Bi derbasbûna demê re, çewisandin tenê bi mirovên civak, bere û tîra Zerdeştî re sînardar nebû, lê ew ji wan sînor û bendavan derbas bû ku tê de Kurdên ku misilmantiya xwe jî ragihandine. Rewş her ku diçû bi qeyran, gîr û girtinhevê, û bê serûbertir dibû, nemaze di serdema Emewîyan de (661-750), ku li pey siyasetek nijadperestî ya neyarî digeriyan.

Wan bi Kurdan, Farisan û hêmanên din ên ne Ereb re bi sewdana serwerê xulamê xwe û xawenê kolê xwe dikirin.

Pêdiviya Emewiyên ku ji bo çespendina desthilatdariya xwe ye qels û netebitî, bi diravên pir bûn. Gizît û bace li ser milên Kurd û Farisên ku derbasî misilmantiyê bûn, danîn. Lê, di serdema Xelîfeyên El-Raşidîn de, wan bac nedidan. Wan dîsa jî (baca zeviyar) li ser wan sepandin. Kurd (û her kesê ne Ereb), ên ku misilmantî wek ol ji xwe re pejirandin, bi navê "Mewle" tê naskirin û pirjimara wî "mewalî" bû, û ev peyv di koka xwe de, ji peyva "Miwalat= piştgiriye" ya ku tê wateya şert û merc, lê wekî peyva "El-besîr" ew di zimanê erebî de yek ji dijberiyar e, wateya "Mîrza" û hem jî "kole" di heman demê de, dide. Ev mewalî, di nav civaka Ereb de, di nav reswakirin û rezîlkirinê de bûn. Ereban li pey melayekî ji mewaliyan limêj nedikirin, û di ceng û şeran de mewalî tenê wekî peyayên leşkerî bikar anîn, û nerazî bûn ku bi wan re bibin siwarê hespan. Ereban bawer kir ku el-mewalî tenê ji bo kar û pîşeyên nizim û bênirx hatine afirandin⁽¹⁶⁾. De ka em bi hev re li helbestvanê navdar ê Ereb Ebû El-Teyib El-Mutenebî guhdarî bikin bê çi dibêje⁽¹⁷⁾:

تُفْلِحُ عَرَبٌ مَلُوكَهَا عَجْمٌ	وإنما الناس بالملوك وما
ولا عهود لهم ولا نهم	لا أدب عندهم ولا حسب
ترعى بعدد كأنهم غنم	بكل أرض وطننتها أمم
وكان يُبْرِىء بِظُفْرِهِ الْقَلَمَ	يستخشن الخز ⁽¹⁸⁾ حين يلمسُهُ

Derbarê jinanîna El-mewle bi keçek Ereb re, ew tawanek nebexşandî bû, û Walî dikaribû wan bi carekê ji hev veqetîne. Keça Kurd an Farisî ya ku ji hêla şervanê Ereb ve dihate girtin, di nav para xwe ya talan û dîlkinê de (girtiyên şer) ji malê yê Ereb bû, û wî çî dixwest bi wê re dikir. Jê re digotin "El-Sirriye" û pirjimara wê "El-Serarî" û peyv ji (El-Sera) hatiye, wateya wê, bihevveçûna di rêwîtiya şevê de ye. Ê Ereb kêf û xweşiya xwe pê dikir, carinan wî pêdikir, û ji pitika ku ji vê cotbûnê çêdibe re "Hecîn= Têkel" hate gotin, peyva (Hecîn) di zimanê erebî de tê wateya "kêmasî, şûreyî". Têkel (Hecîn) ji hêla Ereban ve dihate neyarîkirin. Guhdarî bikin bê helbestvanê Ereb Reyanî çî dibêje:

إن أولادَ السَّراري كَثُرُوا يارَبِّ فينا
 ربِّ ادخِلي بلاداً لا أرى فيها هجينا⁽¹⁹⁾

Wekî din, ji "Mewla" û her kesê ku baladestî û serdestiya Ereban li ser gelên mayî nas nekiriba re "gelnewaz" dihate gotin. Hêjayî gotinê ye ku tawanbariya endambûna gelnewazê tawanbarkirinek pir giran bû, ji ber ku ev dihat wateya "dijminatîya Ereban", û di heman demê de jî, bêbawerî û pirperwerî wekhev dikir, bi vî rengî serê wî li xwediyê wî digirtin.

Guhdarî bikin ka serwerê Erebê nijatperest ê Xurasanê yê Emewî, Nesir lawê Seyar, di derbarê gelê Xurasanê de, li ser Kurd û Farisan çî dibêje:

قوم يدينون ديننا ما سمعت به من الرسول ولا جاءت به الكتب
 فمن يكن سائلاً عن أصل دينهم فإن دينهم: أن تُقتل العرب (20)

Xelîfeyê Emewiyan Ebid El-Melik lawê Merwan yek ji wan xelîfên Emewiyan bû ku herî pir alîgirê demargîriya Ereban a nijadperest bû. Wî di gelek waran de, siyaseta Erebkirinê seband. Lawê Merwan danûstandina bi diravê Romî, ku di wê demê de belav bû, qedexe kir, û li şûna wê diravjenîna Erebî ya nû bikar anî. Wî her weha karanîna zimanê Pehlewî di dîwan û karûbarên kargêrî yên fermî de qedexe kir. Pehlewî zimanekî Iranî bû ku di navbera zimanê Kurdî û Farişî de têkel bû ⁽²¹⁾; ji ber vê yekê, wî Erebkirina dezgehên hukûmeta misilman kir.

Ji ber ku zimanê Erebî, zimanê koçerî ye, neşiya pêdivî, daxwaz, xwestekên danûstandinên fermî li împaratoriyeke pir mezin peyda bike, Ereba neçar bûn ku bi hezaran bêjeyên Kurdî yên nûjen têxin nav zimanê Erebî. Ji ber vê yekê, ev peyv ne erebî ne: el-destûr, el-cemhûr, el-cizye, el-hendese, el-nimûzic, el-sazic, el-serkal, el-dest, el-sulte, el-herif, el-berîd, el-'esker, el-hemle(helmet), el-qelem, el-defter, el-tarîx, el-wezîr, el-firdews, el-cehenem, el-sirat, el-cewleq, el-dîzic, el-dîwan, el-beyan, el-mescid di zimanê kurdî yê nûjen de mizgeft e, el-cem'i, el-şem'i, el-berq, el-ustaz, el-fûlaz, el-babûc, el-xane, el-cewarib, el-muhir, el-xizane, el-dûlab, el-wereq, el-buriq, el-kehreba, el-fen, el-xendeq û bîmaristan (Ev gotina dawîn di dema Selahidînê Eyûbî de, derbasî nava zimanê erebî bûye, dema ku wî cara pêşî tîmargeh li Misrê damezirand. Di vî warî de, tenê ev çend

nimûne ne. Ya ji hemiyar xirabtir ew e ku fermandarên Emewiyan li qenciya Ereben ku li dij û berhingarê siyaseta wan a nijadperestî ya neyartî derdiketin, zînat dikirin, wek: Hamid Qehteba El-Taî û Ibrahîm lawê Mihemed lawê Ebdullah lawê Ebas, bi nasnavê "Îmam" dihate naskirin, û, qaşo, ev yek ji xelîfetiye bû, lewma Merwan lawê Mihemed, ê bi nasnavê "Merwanê ker", dihate naskirin, ew kuşt. Gava tofan gihîşt binî û qîrîn û xîrîn gihîşt qirikê, Kurd tevgeriyan da ku civaka misilman ji zêdegavî, zordarî û bend û qeydên Emewiyan rizgar bikin. Rêberê mezin ê Kurd Ebû Muslim El-Xurasanî (Navê wî yê rastîn "Behzadan" e, ku peyveke Kurdî ye rasteqîn e), leşkerek ji Kurd û Farisan pêk ve dihat, birêve bir, û piştî ku leşkerê Emewîyan, li herêma Ziyê Gewre, li başûrê Kurdistanê têk bir, û malbata Emewiyan a zorkar hilweşand, ew ber bi Bexdayê ve çû. Lê, El-Xurasanî ne ji bo xwe xwedan kesayetiyekê ku zanatirê serdestan bû, û ne jî wî xwe wekî xelîfê misilmanan an serfermandarê bawermendan destnîşan kir. Lê bi dilnizmî, xwe mezin nekirin û bêlafiya bêhempa, ku tê de hemî wateyên fedakarî, comerdî û xwetunekirinê tê de cih digirin, karûbarê femandariyê radestî malbata Ereba lawê Ebbas kir. Ev tevî wê yekê ye ku serokê navborî Ibrahîm, bi navê "Îmam", ku ji malbata lawê El-Ebas û arîkarê El-Xurasanî ye, li ser yekê ji bihintengî û tengijiyê hêrsa xwe, dijî Emewiyan nameyek ji Ebû Muslim re şand û jê xwest ku Ereban li Xurasanê qir bike. Ji ber vê yekê, wî di nameyekê de, bi yek gotinê jê re nivîsand: "... Heger hûn karibin nehêlin kesê Xurasanî bi zimanê Erebi baxive, lê ku çê nebû, wî bikuje, wê hingê bikin û li tiştêkî nepirsin... hwd."⁽²²⁾ El-Xurasanî qet camêrî, mêrxasî û

azayetî ji dest neda. Ji ber vê jî, wî Ereb rûreş nekirin, di dema ku ew di cihê desthilatdariyê de bû jî û serokê serfiraziyê bû; lê berevajî wan bi qencî tevgeriya. Lêbelê, helwesta malbata lawê El-Ebas, piştî ku gihîşte fermanrewayîyê, ji Kurdan û pêkhatayên din ên ne Ereb, wek nimûne malbata Bermekî⁽²³⁾, re bê guman ji helwesta Emewîyan ne çêtir bû. Ebû Cafer El-Mensûr, dema ku li derveyê hukûmetê bû, ji hêla Emewîyan ve dihate çewisandin, pir melaqî ji xelkên Xurasanê ji Kurd û Farisan re dikir, û pir pesnê wan dida û wiha digot: "Ey gelên Xurasanê: Hûn dost û dilsozê me ne, piştgirên me ne, şayan û kesûkarên me ne "⁽²⁴⁾; lêbelê, dema ku ew û malbata xwe bi saya Ebû Muslim û fedakariya Kurd û Farisan paya şûngirî û desthilatî bi dest xwe ve wergirtin, wî bi xinizî û xapandinê xelatek da Ebû Muslim, ew kuşt.

Dûv re Ebû Dulama helbestvanekî Ereb bû (li dora 780an zayînî mir), dest bi nifiran li Ebû Muslim yê mirî dike, wî ew bi "Ebû Mucrim = bavê gunehkar" bi nav dikir, û sixêf û ciwên li wî û li bavên wî yê Kurd dikirin, û digot:

أبا مجرم، هل غيّر الله نعمة على عبده حتى يغيرها العبد؟
 أفي دولة المنصور حاولت غدرة ألا إن أهل الغدر أبأوك الكورد⁽²⁵⁾

Lê, helbestvanê Ereb ê navdar Ebû El-E'la'i El-Me'erî (1058/ 1057z- 974/973koçî) li dû rêbaza rêgeya (Mu'tezîle) bû. Di pirtûka xwe ya bi navnîşana (Rîsalet El-Xufrân) de, dibêje: Ebû Muslim El-Xuresanî û lawê xwişka wî Babak El-Xurrmî⁽²⁶⁾, û her weha serkirdeyê Kurd Xidir lawê Kawis, bi

navê (Efşîn) naskirî ye, ew xwedênenas û bêbext in (Zenadiqe ne). Yekjimara wê (Zendîq) e. Di rastiyê de, peyva (Zendîq) Kurdî-Îranî ye, ji reseniya xwe (Zendîk) hatiye erebkirin, û ew ji Zend hatiye girtin, û Zend ravekirin û şirovekirina Avesta pirtûka pîroz ya Pêxember Zeradeşt e (Silav li giyanê wî be). Lêbelê, di nav Ereban de, ji serdema Ebasiyan û heya roja îro, ji bo bêsinçî, bedkarî, pîrgel û gawir bûye zaravayek. Peyva "Gawir" ji peyva "Gevir" û "Gebir" a Kurdiya Iranî jî tê destêwerdayî û guhartî. Bi rasthatinî, peyva "Goran", navê komek mezin a gelê Kurd li rojhilatê Kurdistanê ye, pirjimara peyva "Gewr" e⁽²⁷⁾. Van tawanbarkirinên pûç û sade ji ber encama nefamî, nezanîn û regeza nijadperestî ye kor û çewt, bi rêvebirina rêveberên Misilmanên Erebi hatiye pêkanîn. Torên sixêf û ciwênên li dijî serkirdeyê mezin ê Kurd Ebû Muslim El-Xurasanî dirêj dibe, û bêjeyên "Mecûs" û "El-Şi'ûbiye", ji hêla Ereben nijadperest ve, heya îro têne dubarekirin. Nivîskarê Erebi, birêz Salah El-Dîn El-Munecid, netewçiyê Erebi, gotarek di rojnameya "El-Hayat" de, ku di 28ê Kanûna 1992an de derketibû, bi navê (Xwînêrêjên Dîroka Me) gotarek nivîsiye. Ji ber vê yekê, wî peyva "Eba Mucrim= Bavê Gunehkar" vegerand sernavê Ebû Muslim El-Xurasanî (Xwedê jê rizamend be), û dibêje ku El-Xurasanî "bi nijada xwe pîs bû," wî bi "tunekirina Emewiyan" tawanbar dike, û bi yek gotinê dibêje: "Hat gotin ku di lawê şûrê wî de şeş sed hezar kes an jî bêtir têk çûn. Dûv re, wî xwest ku li dijî Ebasiyan bizîvire û desthilatê bi dest xwe bigire... hwd. Dûv re ew helbesta Ebû Delame ya ku me xwendiyê radigihîne. Ya rast ew e ku mejiyê birayê El-Munecid yê ku di dawiya sedsala

bîstan de bû, mîna mejiyê mîrzayên nîjadperest ên Ereba e yê ku di dema Ebasiyan de bû. Xurasanî wekî "bi nijadê xwe pîs e" têye gotin. El-Xurasanî ji "mewalî"yan bû, û mewalî "ji koka xwe nizim de", di nav mîrzayên Ereba ên qubata û pozbilind de bûn; ev li jor jî hatibiye gotin. Piştî wê, Mîrza El-Munecid diyar dike ka El-Mensûr ê Eraba çawa Ebû Muslim ê Kurd kuşt, û wiha dibêje: "... Ebû Cafer El-Mensûr di civata xwe de, mirovîn ji bo kuştina wî destnîşan û amade kirin. Gava ku Ebû Muslim hat, wan ew girt, gevizandin û ew kuştin ... hwd. ". Li vir em dibêjin, "Dîdarek ji gelê wî dîdarî kir." Bala xwe bidinê, xwişk û biran, "şêwaza mêraniya" Xelîfeyê Ebasî, yê ku "bi nijadê xwe bi comerdî" ye ji bo kuştina dijberê xurt ku Kurd e û "koka pîs" e. Duh mîna îşev e!

Rêberê Kurd, Profesor Ebd El-Rehman Qasimlo, serokê Partiya Demokrata Kurdistanê li Viyêna hate kuştin, di dema civînek ji aliyê nûnerên rejîma misilman ya Iranê ve jê hate xwestin da ku pê re peymaneke aştiyê pêkbînin. Serkirdeyê Kurd ê mêr Ebû Muslim El-Xurasanî jî tê kuştin di dema bi mêvandarî, û li gor vexwendina Ebû Cafer El-Mensûr jê re da ku pê re nan bixwe, tê serdana wî di mal de. Di derheqê Birayê El-Munecid de, ku li ser "Xwînmijên di dîroka me de" dinivîse, wî bi yek peyvê behsa Sedam Huseyîn, koka wî û kiryarên wî nekiryê, ne jî ji bo xatirê qurbanên Enfal û Helebçe li Kurdistanê yek tîp nivîsiye. Hêjayî gotinê ye ku min di heman rojnameya El-Hayat de, bersiv da kurtenivîsên birêz El-Munecid. Lêbelê, di 18/01/1993an de, regezperestekî din ê neteweperwerê Ereba ku navê wî Dr.

Ebdul Karîm Maşhedanî ye, nameyek ji rojnameya navborî re ji El-Wecde re (El-Mexrib) nivîsand: Di dîroka 27-02-1993an de, daxuyaniyên El-Munecid dubare kirin, û li ser vê yekê got ku Xurasanî "Kole" bû, û di rajeya mîrzayên xwe yên Ereb de kar dikir. Yên ku li gundê El Hemîme li Urduna îroyîn "Asêgeh bûn" şoreş ji wir birêve dibirin, û Ebû Cafer yek ji "serwerên herî têgihiştî û dijwar yên cîhanê" tê naskirin. Li ber van birayên Ereb ên xwendî seyr e, ez nizanim ev bira di kîjan serdemê de dijîn? Ebû Muslim, ku pêşengê meydana şer û cengan bû, wî wekî kole "Di peywira mîrzayên xwe yên Ereb de" dibînin. Di derbarê rêzdarên rûniştî "asêgeh bûn" de, li gundê El-Hemîme, ew serwer bûn – wekû ew dibêjin – şoreşa Kurd a Farisan a agirgeş li Xurasanê dijî zorkarî û nedadmendiya Emewiyên qubat û pozbilind bû. Xwedayê gewre di afirandin û karûbarên Xwe de baş dinase. Ji bîr mekin Dr. Meşhedanî tevgera rêberê mezin û ramînerê Kurd Babik El-Xermî wekî "bersivê ji Mecûsan" dibîne, û li ser wî dibêje ku "armanca wî ji şoreşê ew bû ku, misilman-tiyê ji holê rake û Mecûsîtiyê vejîne û vegere destwerdana bêsinor di jinan û diraviyan de! Ji ber vê yekê, ew dixwaze Mezdekiyê vejîne. Bedkarî bi şoreşgerekî mezin, ku pêşengiya tevgereke gelêrî dike û daxwaza avakirina sîstemeke bê çîn, dike".

Xwişk û Birayên Hêja,

Binihêrin li vê tevliheviya seyr û matmayî ya "Mecûsî û Mizdekiyan û destwerdana bêsinor di jinan û diraviyan de" mîna ku van navan ji bo bêje û hevtayan hemwate an

temamker in. Ma tenê ev bêhişî nezanînek sepandî ya dîrok, ol û tevgerên siyasî û civakî ye, an têkel û tevliheviyek seyr e ku, bi zanebûn ji hêla regeza neteweyî ya kor ve tê palder û gerandin? Dr. Meşhedanî yê qubat, pozbilind û qure bi çavkaniyên Kurdî û Farisî bawer nabe, tenê dîrokzanên Misilmanan dibîne - û bêguman mebesta wî dîrokzanên Erebe - "yek ji dîrokzanên herî dilsoz ên cîhanê û li rastiye digere!" Mîna ku ew karîbû hemî hilberên "Dîrokzanên Cîhanê" bixwîne. Herweha, wî ew bi hev re danberhev û ev darizandina dawîn encam da. Di dema ku ew baş dizane dîroknasên Erebe ên Misilman ew kes in ku koka Kurdan ji cin û dêwan dibînin, wekî ku dê di demek kurt de were axaftin. Bira Meşhedanî ma gelo ev "duristî û daxwaza rastiye ye"?!

ومِنَ الْبَلِيَّةِ شَرٌّ مَنْ لَا يَرَعُو عَنِ جَهْلِهِ ، وَخَطَابُ مَنْ لَا يَفْهَمُ

Ji belayê xirabiya kesê ku şivantiyê nake

Ji ber nezaniya wî, û axaftina yên ku libernakeve

Bi kurtî û di encamnameyê de: Gelê Kurd ji bêçareyî li dijî zorkarî û bêdadiya serdest û desthilatdarên lawên El-Ebas li ber xwe dan⁽²⁸⁾.

Ji ber ku serwerên Ebasiyan nikarîbûn li hemberî girseyên serhildêran li ber xwe bidin. Ew xwe dispêrin hin êl û eşîrên Tirk ên ji Asyaya Navîn koçber bûbûn, nemaze di dema serdestiya El-M'utasim Billah, ku di ((218 koçî -833 z)) de Şûngiriya Ebasî girtibû, ji bo ku helwest û rewşê zalgeh bikin. Ji ber vê yekê şervanan dest danîn ser, tirk gav bi gav, di nav

dewletê de, bûne xwedî desthilat û tawanên hovane li Kurdistanê kirin, ku ji tirsê wan xelk dilerizîn û porê lawan sipî dibû. Di dema ku Tirk xurt dibûn, wan li dijî Xelîfe El-Mutewekil pêlangêrî û binvekolan dikirin û ew di sala 247 koçî (861-862z) de kuştin, bi hêviya helwest, paye û posta xelîfetiye bi dest xwe ve bigirin. Piştî demekê gihîşte destê wan. Gendeliya bêserûber a li dewleta Ebasiyan bû sedema derketina rêzeyek şoreş û serhildanên li Kurdistanê, bi rêberiya serokên wek navborî Babik El-Xuramî, Cafer lawê Mîr Hesên El-Yezîdî (Êzîdî) û Mihemed lawê Ebdullah Hazar Mîrdî. Babek û alîgirên xwe berxwedanên bi qehremanî li çiyayên başûrê Kurdistanê nîşan dan. Bi dirêjîya salan e ku ew doza damezirandina dewletekê dikin ku tê de cûdahiyên çînan, pergala koletî û bendestiyê ji holê rabe, û tê de zordariya mêran li jinan bi dawî bibe. Ew qencî û armancên bilind û pîroz, ên ku qubatek û pozbilind Dr. Meşhedanî wekî "Destwerdana bê sînor û bê perde ya li jinan û deravan" bi nav dibe.

Hêjayî gotinê ye ku Kurd, ji bilî şoreşên xwe yên cûrbecûr, beşdarî hemî tevgerên ku ji hêla pêkhatiyên Faris û Ereban ve di jiberiya desthilatdariya Ebasiyan bû bûn: Şoreşa Zinc (225 koçî - 270 koçî), Serhildanên Ye'qub El-Seffar (262 koçî) û Serhildanên Xewaric û Şî'a'a⁽²⁹⁾. Ya ku li vir balê dikişîne ew e ku, di wê heyamê de, nîşanên neyarî û bêzandina ji bo tuxmê Kurd derketin holê û dest bi şopandina koka wî ber bi dêw û cinan ve kirin. Dîrokzanê Misilman yê Ereb El-Mes'ûdî di pirtûka xwe ya bi navê "مروج الذهب ومعادن الجوهر" (Beyrût 1966, r. 249)⁽³⁰⁾ nivîsiye ku gelê Kurd ji ber zîneyê di

navbera Şeytan û keçên kole yê pêxember Silêman de, çêbûne. Helbestvanê navdar ê Farisî Ebû El-Qasim el-Firdewsî, di pirtûka xwe de ya bi navê: "Şahname" (940 / 941-1030), koka Kurdan bi wê koma xortên ku ji ber zordar Dihak reviyabûn girêdide, û bi xêra xwarinpêjên dilsoz ên ku di rajeya Dihak de kar dikirin, lewma ew reviyên serê çiyên û gelê Kurd ji wan çêbûn⁽³¹⁾.

Bidawî-anîna zînata pozbilindan û zordariya wan, û digel ku alîgirên derewan in jî, li gelek aliyên Kurdistanê gelê Kurd bi ser ket. Dema ku girseyên Kurd Mûsil ji pîsîtiya serdestên biyanîyan ên setemkar rizgar kirin, helbestvanê Erebb El-Ecînî dest bi qîrînê kir û got:

ما رأى الناس لهذا الدهر مذ كانوا شبيها

ذلت الموصل حتى أمر الأكراد فيها⁽³²⁾

Bala xwe bidinê! Mîna ku fedî û şermek e ku Kurd li welatê xwe, li Mûsilê, ku jê re qedexe ye ferman dar be, lê ji biyaniyan û destdirêjkaran re destûrdar e! Ji ber vê yekê, biramin!

Dem a ku Kurdan bi saya şoreşên xwe yê bi hêz û serhildanên xwe yê mezin û li pey hev, dikaribûn zînatkaran têk bibin. Wan dest bi damezirandina hin dewletên serbixwe kirin, û yê herî girîng jî ev in:

Dewleta Hesnewî (dora 959z), dewleta Dostikî li Kurdistana Naverast (990-1096), Dewleta Marwanî û yê din⁽³³⁾, lê wan bêyî Kurdan şerê Erebb û Misilmanan nekirin.

Lê berevajî, belê wan bi raje û karûbarên xwe ew pêşxistin. Mîrên Kurd û rêveberên wan di nav warên xwe yên dibin bandora xwe de, bi zagonên yasayî yên misilmanî ve girêdayî bûn; û zanayên gelê Kurd ji wêjeyên zimanên Erebî, û Farisî û zanistên misilmanî re raje û vatinî dikirin, ku pir tişt li binesaziya wê zêde dikirin. Lewma di nav wan de, divê zana û hunermendên mezin bin ku di gelek zanist û huneran de pispor in, û gelek pirtûk nivîsîne. Tê bîra min, tenê weke mînak, di nav sedên navan de: Lawê El-Esîr El-Cezerî û (Mirina wî di 630 koçî de), Lawê Xelkan El-Erbîlî û Ebû El-Wafa El-Eyûbî (1273-1331)⁽³⁴⁾, muzîkjenê navdar Eshaq lawê Ibrahîm El-Mûsilî û lawê el-Hacîb (nivîskarê " El-Kafiye û El-Şafiye" Rêziman), û gelê Kurd ji rûmet û serbilindiya ku Imam Mihemed el-Xezalî dibêje (450koçî – 505koçî= 1058z –1111z) : ku çanda misilmanî li ser milên çar stûnan hatiye danîn, sê ji wan zanyar in: El-Şehrezûrî, El-Emadî (Amêdî) û El-Deynûrî⁽³⁵⁾, û vana ji gelê Kurd in. Kurdistan digel gelek enstîtuyên xwe yên zanistî û zanîngehên navdar, di Rojhilatê de, navenda tîrêj û tîşkdanên rewşenbîrî û çandî bû. Gelo di nav zanayên misilman de, kî bi Harranê nebihîstiye, ku ew di dilê Kurdistanê de ye û nêzîkî bajarê Urfa (Ruha) ye, ya ku ji bo zanistên cihêreng ên derûnî û veguhastinê re bû çira, ku ji wir felsefe, pendyarî û zanistên Yewnanî veguheztî Iranê û tevaya cîhana misilmanî bûn. Gelek zanyarên misilman ên birûmet li Harranê, li ser destê wan hîn bûn û xwendin; weke nimûne Farabî, ne bi vê ve tixûbdar e. Her weha, lawê Teymiye ji Harranê ye. Yewnanîyan (Romên Rojhelat) berî hatina misilmantiyê, hin deverên Kurdistanê dagîr kirin, û zanyarî û hunera wan li wir

belav bû. Li Kurdistanê hin çiya, gelî û kavil hîn jî bi navên resen ên Yewnaniya ne. Kurd zencîreya danasîna zanista Exrîqên Rojavayî bi gelên misilman ê Rojhilat re bûn. Peywirên mezin, ên ku ji hêla gelê Kurd ve ji Misilmanan re, nemaze ji birayên Ereb û Faris re, hat dayîn. Li ser aramiya pêşeroja neteweya Kurd bû, ku îro di rewşek ne diyar û nenas de, û li ser sêwîbûna ziman û wêjeya Kurdî, ya ku zanayên Kurd ên Misilman ji ber zimanê Erebî, Farisî û Tirkî paşguh kirin. Di nav gelê Kurd de, tiştek nemabû ku ji kultûra xwe ya neteweyî re peywirê bike ji bilî wê beşa ku ola misilmanî nepejirandî. Lê li ser baweriyên xwe yê kevin mabûn, wekî: Elewî⁽³⁶⁾, Êzîdî⁽³⁷⁾ û Kaka'î (Yarsanî)⁽³⁸⁾. Pirtûk û ayetên pîroz ên van olan û rê û resmên wan bi zimanê kurdî ne. Lê, Farisan - berevajî Kurdan - hewildanên xwe li ser rajekirina ziman û wêjeya xwe ya Farisî hiştin. Lewma wan dest bi nivîsandina bi yek ji zaravayên Farisî kir ku ew di danûstandinê de bikartînin; û di wê demê de, ew kirin zimanê nivîsandinê, û alfabeya Erebî bi rengekî ku li gorî dengên zimanê wan heya radeyeke guncan pêş xistin. Li şûna ku Misilmanên Ereb van qurbanî û kiryarên xêrxwazî yê Kurdan binirxînin, wan dest bi guman û pirskirina niyaza baş a birayên xwe yê Kurd kirin ku di gelek zanistên derûnî û wergêrî de diyar û xuya bûn, û di warê wêjeya Erebî û farisî de, ji wan çêtir pêş ve çûne. Ji ber vê yekê wan pêşveçûna Kurdan û behredariya wan wekî "pelhawêştina binvekolane" di nav civaka Erebî de nirxandin, û armanca wê têkbirin û ji hundur ve hilweşandina wê bû. Helbestvanek Ereb dibêje:

Hay ji mar û dûpişkê nebin, lê heger kurd bên erebkirin hay ji xwe hebin.

Zikreşî û neyariya veşartî ya li hember Kurdan di kûrahiyê de, pir hûr û kûr bû, heya ku hişt birayên Ereba Kurdan bi koma xişokan û kêzikên bi ziyandarî û zîrarên ku li ser erdê têkderî û gendeliyê dikin, dipîvin. Gotina pêşiyên a Ereban: "Sisê li cîhanê li ser gendeliyê ne, Kurd, kûçik û kulî ne." Ew ne mesela rasthatineke zehî û bêgane ye, û ne şaşiyek nawaz û ne rêkûpêk e, belkî derbirîn û vegotinek zelal a ku di kûrahiyê de, giyan li xwe digire. Ji ber ku ew jî girove û belgeyan dixê destên zikreşan û kesên ku dilên wan nexweşiyek heye û armancek ji bo wan radibe, bi qirkirin û tunekirina Kurdan, û Kurd, bi dîtina wan, ne mirov in. Ji ber ku "Kûçik û kulî" divê bêne qirkirin, kuştin û ji kokê ve rabin. Wekî ku wan berê bi kurdan re kirin, û hîn jî heya roja îro bi wan re dikin. Kiryarên "Enfal" ên ku ji hêla rejîma Be'is a Ereba a Iraqî ve li başûrê Kurdistanê pêk hat, ku nêzîkê çarîyek mîlyon Kurd kuştin. Bombabarankirina bajarê bi ewle Helebçe bi gazên jehrîn ji hêla leşkerên Be'is ve, di nav çend hûrdeman de, bi hezaran Kurd hatin kuştin. Rêbazên jenosîdê ne, û ew tenê bi "Kulî û mişkan" re têne bikar anîn, ne bi mirovan re. Ji bîr mekin ku cîhana Ereba û misilman - ji bilî pir hindik li ser tiliyên destan têne jimartin- mîna mirîyan li hember van tawanên hovane yê kirêt bêdeng bûn. Wekî gotina ereban dibêje: "Bêdengî nîşana razîbûnê ye".

Xwişkino ... Birano...

Kurd ne xema birayên wan ên Misilman, Ereb û yên din bûn. Berevajî, xebatên wan ên xêrxwazî û zanistî her domandin. Belê, xebatên wan ên zanistî û xêrxwazî ji bo xatirê misilmanî û misilmanan di seranserê sedsalên dûrû-dirêj, û heta rojgar û serdemên dereng de jî dom dikin. Gelê Kurd xwedan buhredarên mezin e, mîna Şêx Ebdul Qadir El-Geylanî, Xews El-Azam, Weys Qernî, Mewlana El-Hekîm Idrîs El-Bedlîsî, Yehya El-Mizûrî, Mewlana Xalid El-Neqşebendî, Ebdul El-Rehman El-Kewakibî, mîrza Mihemed El-Medenî El-Berzencî, Şêx Mihemed Ebdo, Osman Diqne, Mihemed Feydî El-Zehawî, Me'erof û El-Nûdehî El-Berzencî, Ebdula El-Bîtûşî, Bedî'i El-Zeman Se'îd El-Newresî, Ebdil-Rehman Qeredaxî, Mihemed Cemal El-Dîn El-Mardînî, El-Heyderî El-Maweranî, Ebdul-Rehman El-Rojbiyanî, Şêx Hesên Gelzerdî, Şêx Ziya El-Dîn El-Usmanî El-Neqşebendî, Mela Mihemed El-Qizlicî, Mela Mihemed El-Kobyî, Ehmed Miftî Zade Senendecî, Şêx Emced El-Zehawî, Şêx Mihemed El-Xal, Ebdul-Kerîm El-Muderis, zanyar Mihemed Salih Gaborî û bi sedan yên mîna wan hene...⁽³⁹⁾.

Peywirên gelê Kurd ji misilmanî û misilmanan re, di nav tixûbên zanist û huneran de, ranewestiyane, lêbelê berevajî awayê xwe yê kevin, di warê berevanî û leşkerî de jî berdewam kirine. Dema ku hêzên Xaçparêz di 1095an de, êrişî Rojhilata misilmantiyê kirin, li tola misilmanan, nemaze Ereban digeriyan. Serkirdeyê mezin ê Kurd, Sultan Selah El-Dîn El-Eyûbî - Xwedê jê rizamend be (1137-1193), leşkerek

gewre ku piranî ji eşîrên Kurd û rêberên Kurdan pêk dihat, amade kir û bi saya serkirdayetiya wî ya jîr, aza, û mêrxasiyeke bêhempa ji leşkerê xwe, wî karîbû Xaçparêzên qure û pozbilind têk bibe. Piştî hin paşkeftinên demkî zora wan bir û ew ji xaka pêroz derxistin. Ji ber vê yekê, wî misilmantî û misilman ji bobelata gewre û tengaviya mezin a ku ew êşandibûn û hebûna wan gef kiribû, rizgar kirin. Weke hûn dizanin, Selahedîn ji ber xwemezinnekirin û dilnizmiya xwe ya berçav, mêraniya xwe ya bêhempa û diltenik û hevaltiya bi dijminê lawaz re, ji deriyên fereh, derbasî dîroka misilmanî û Xiristiyanîyê bû. Li gorî gotina pêşyan a Kurdî ku dibêje: "Êşkencedana dijminekî lawaz ew ji sincê pûçmirovê bînirx e" ⁽⁴⁰⁾. Dema ku Selahedîn dewleta Eyûbî li Misirê, Şam û Kurdistanê damezirand, wî taybetmendiya xwe ya Kurdî li ser niştecihên Misirê û Şamê sepandin nekir, lê beramber û jêknegirtina Emewîyan û Ebasîyan ên qure û pozbilind wî bi gel re bi dadmendî, wekhevî û biratiyê, danûstandin kir. Hemî tiştên ku Selah El-Dîn di warê karûbarên taybet de, ji gelê xwe yê Kurd re peyda kir damezirandina destûrek hêsan bû. Wî li Mizgefta El-Ezher, bi navê "Rewaqa Kurdî", ji bo piştgiriya bidin xwendekarên ku ji Kurdistanê tên, bi bexşînek kêmezêde, di dema ku ew li wir xwendina zanîngehê dibînin. Hêjayî gotinê ye ku, ev Rewaqa ku berê ji bo xwendekarên Kurd li Qahîreyê bû û nêzîkê hezar salî jiyabû, ji hêla mîrê berê yê Misirê, Enwar Sadat, hevalê Şahê Eyrane yê hilweşiyayî ve hate asteng kirin. Wekî ku di nûçeyê de hate ragihandin: Sadat, mîna hevalê xwe Boteflîqa yê Cezayîrî, endezyar û mîmarê Peymana Cezayîr ya xirab bû, di navbera Sedam

Huseyn û Şahê Iranê de, di Adara 1975an de, ku bû sedema bobelat, atafek û bêtarek mirovahî li Kurdistanê, û tê de bi hezaran Kurdên belengaz hatin kuştin. Ez naxwazim li ser kiryarên Sadat, Boteflîqa û Şahê Iranê bipeyivim, ji ber ku - wekî hûn jî dizanin - wan mirina xwe dît û bi Xwedayê xwe re rûbirû man; ji ber vê yekê bila em rewşa wan ji Xwedê re bihêlin, çunkî her ew tolestîn û dadwerê rasteqîne ye.

Ey Xwişk û Birayan,

Ka em werin hinekî vegerin ser serkirdeyê xwe yê pîr Selah El-Dîn El-Eyûbî (Xwedê jê rizamend be) ku hema hema hezar sal berê ew vatinî û peywirên mezin pêşkêşî Ereb, Faris, Tirk û birayên din ên misilman kirin. Bi vî rengî hebûna misilmantiyê ji nav lepên mirinê rizgar kir û li ser çarenûsa gelê xwe yê Kurd ku ji hêla birayên wî yên Ereb, Tirk û Faris ve, piştî wî re, tepeser bû. Di ser re ew neramiyan û qencyên Selahedîn û Kurdan jibîr kirin. Rastiya bi êş a ku îro em tê de ne, bibînin. Ji ber vê yekê, em hin serkirdeyên Ewropî dibînin ku wan jibîr nekirine, bi poşmaniyek zêdetir, tiştê ku Selahedîn bi serê wan kiriye û wan ji xaka pîroz û Rojhilata Navîn derxistine. Bi bêwijdanî, wan Kurdistan di nav Ereb, Tirk û Farisan de perçe kirine. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem ku bi serfiraziya wan a li ser Empiretoriya Osmanî bi dawî bûbû. Herweha jî, wan ji gelê Kurd re malwêraniya tirsnak ku îro em tê de dijîn, afirandin. Herweha seyr e ku giyanê tolhildanê piştî nêzîkî hezar salî, hîn jî di kêrahiya hindurê wan de, geş dibe. Mînakek li ser vê yekê ew e ku - serfermandarê Frensî, General Xoro - ku hêzên wî piştî Şerê

Cîhanê yê Yekem bi serfirazî ketibûne Şamê - çû serdana ziyaretgeha Selah El-Dîn El-Eyûbî kir, û li ber gora wî bi pozbilindî rawestiya û got: " Va ye em li vir in, em vegeriyan, Selahedîn". Gava ku ev bûyer tê bîra min, yekser tê bîra min ku helbestvanê mezin ê Ereb, Mihemed Mehdî El-Cewahirî, di helbesta şîna gorbihuştî Cemal El-Dîn El-Efxanî de digot, dema ku hestiyên wî di sala 1944an de, di rêya Bexdadê re ji Stenbolê ta Efxanistanê veguheztin:

نَصْرَتْ لِرَقِطَةِ الْحَقِّ السَّهَادَا فَلَوْلَا الْمَوْتُ لَمْ تُطِيقِ الرَّقَادَا

Bê guman, Selahedîn di gorê de veşartî bû, nikaribû bersiva vî generalê fransî 'Tirmezin' bide. Ez ji bo bikaranîna gotineke Kurdî ya ne bi terzûrêzê bi peyva quretiyê ve têkildar e, tika û lêborînê dixwazim. Em Kurd, ji mirovê pozbilind, şanazîbixwekirin û bixweşa re dibêjin "Tirmezin", wate "Tira xurt" dibêjin. Lêbelê, ez dixwazim bersiva Selahedîn boçûn û mezende bikim heke wî dikarîba bersiva neviyên dijberên xwe bida. Ma wî digot: "Erê, hûn vegeyriyane, ji ber ku em Kurd ne li gasînê ne û ji vê yekê ne berpirsiyar in." Îro, gelê Kurd pêşengiya cîhana misilmanî nake. Ew bi saya birayên xwe yên pozbilind gelekî lawaz e, "An jî wî ji wî re got:" Goro! Ez ji ber tiştê bûyî xemgîn im. Ez Kurdekî xwedî dilekî pak im, min mercên pêşerojê bi tevahî lêkdanewe û mezinde nekir. Hûn in, êrîşkar û zorkarên ku we hilme û êrîşî me kiribûn, û tevî weha jî, min sewdayeke bi rûmet bi dijminê dijberê xwe re kir, û dîroka we dîdarê vê yekê ye. Lêbelê, piştî hezar salan hîn jî we dilê xwe pak nekiriye. Dilên xwe ji zikreşiyê paqij bikin, ji ber ku em hemî

birane, û wê roj were ku hûn jî, mîna min di gora xwe de razin; lê hûnê nikaribin weke min bersiva dijberên xwe bidin. Wisa "Tirmezin" nebin. Bi rastiyê, dijwar e ku mirov rewşa helwesta Selahedîn di derheqê rewş û bûyerên heyî yê li cîhana misilman de, dadbar bike, heke ew zindî bûya û heya roja îro dijiya û gelê xwe yê Kurd di vê tengaviya zor û vê tengezaya dijwar de, bi çavên serê xwe bibîne ku birayên wî yê misilman Kurdkêm kirine. (Têbînî: peyva "Kurdkêm" piştî mirina Salah El-Dîn El-Eyûbî, Misriyan li Misrê, li dijî Kurdan şer kirin "wekî bersivek ji qenciya wî re dan" û "naskirin û danpêdana spasdariyê bû." (Istikrad, kesê nizim, kurdê kêm) û wisa jî filan filankes kêm kir. Ev tê wê wateyê ku filan bi bêvan re sewdakirinek kirêt kir, wekî kesek bi kurdan re danûstendinê dike).

Ey xwişk û birayên hêja! Dema ku dewleta Ebasî di sala 1268an.z de kete xwarê, li dû hilme û êrîşa Mexolî-Tirkan, li ser Bexdayê, xwîna Ereba û Farisan di çeman de herikî, Kurd bi vê yekê şad nebûn; lê li hember hilme û êrîşên Mexolan li dijî gelên misilman liberxwedana qehremanî, bi Ereba û Farisan re hevkarî kirin da ku metirsiyên li dora welatê misilman dûr bixin. Lêbelê, piştî hilme û êrîşa Mexolî, koçberiya ji ber eşîrên Tirkan, ber bi Asiya piçûk û hin herêmên kurdî li Ezerbeycanê ve hat şopandin. Ji ber vê yekê, êlên Tirkan bandor û desthilata xwe fireh kirin û gelek herêmên kurdî li Ezerbeycanê tirkkirin, piştî ku beşek ji wan ola misilmantiyê pejirandibûn. Dûv re, yek ji van êl û eşîran, di dawiya sedsala sêzdehê zayînê de, li Bakurê Rojavayê Asiyaya Piçûk û li ser erdên Bîzansê yê desteserkirî,

mîrnişîniyek bi navê "Mîrnişîniya Osmanî" di derbarê bapîrê wan ê tîreya serdest de, hate damezirandin. Osmanî di 1453yan de, Qestentînê desteserkirin û navê wê varî û ligorî xwe guhertin, kirin (Stenbol) ⁽⁴¹⁾. Ji hingê ve wan dest bi tiwêjê kirin ku ew parêzvan in, û misilmantiyê li ser tîreya Sunî diparêzin. Ji ber vê yekê, Sultan Selîm ê (Osmanî) posta cihnişîniyê ji cihnişînê Ereba El-Mutawakkil 'Ele-Allah, cihnişînê dawî yê Ebasîyan li Misrê bû, desteserkir. Piştî dagîr kirina Şam û Misrê, Osmanî gav bi gav xurtir bûbûn. Ji ber vê yekê, wan hilme û êrîşê gelên Xiristîyan ên Ewropaya Rojhilat û welatê Yewnanistanê kirin, û siyaseta xwe ya berferê a berfirehker û pozbilind domandin. Di destpêka sedsala şazdehê zayînê de, li Ezerbeycanê mîrnişînek bi navê Mîrnişîna Sefewî hat damezirandin. Di derbarê Şêx (Isma'îl) El-Sefewî de, mezinê malbata Sefewî, ku Sunî bû û şêxê derwêşên Kurdan yên ku li herêma wî bûn, ew bû Şî'î û bi tundî Şî'îtiya xwe dajot. Wekî encam, pevçûnên bi xwîn ên qirêj di navbera şopînerên Sefewî û şopdarên Osmanîyan de çêbûn. Di van şeran de, bi hezaran misilmanên herdu alîyan di encama nezanî û damergêriya tîre ya kor de hatin kuştin. Ji ber ku piraniya misilmanên Kurdan wê demê bi tîreya Sunî ve girêdayî bûn, Kurd rasterast bûn armanca hilme, êrîş û zordariya Sefewîyan û kiryarên wan ên tawankar, û bi hezaran Kurd hatin kuştin. Osmanîyên Tirk ev derfeta zêrîn bi dest xwe xistin û karîbûn zanyarê Kurd ê mezin û jîr Mewlana Idrîsê Bedlîsî (di sala 1520an de mir), ku ji hilme û êrîşên Sefewîyan bêzar bûbû, bi dest xwe bixin. Ew bi navîniya di navbera Sultan Selîm ê Osmanî û mîrên Kurdistanê de razî bû. Hewldanên Bedlîsî ghiştin astek

serfiraziyê, heya ku welatên Kurd bi Osmaniyan re, di çek û şeran de, bûn wek birayên hev. Ji ber vê yekê, Kurd û Tirk hilme û êrîşî Sefewiyan kirin, û di sala 1514an de, şerek dijwar di navbera herdu aliyên de pêk hat, ku tê bi şerê "Çaldêranê" (Derbarê gundê Kurd ku bûyer lê rûdayî). Safewiyan ew winda kirin, û paytexta wan Tebrîz bin ket destê Kurd û Tirkan. Di heyama piştî vê serfiraziya mezin de, Bedlîsî navînçiya xwe di navbera Tirk û rêberên gelê Kurd de domand, û navînçiyê berdêl da û berê wê ghişt. Ji ber vê yekê hevgirtinek di navbera Kurd-Tirk di dewletek federal (Tirk-Kurd-Osmanî) de, di Tebaxa 1515an de, hate damezrandin. Bi vî rengî Şahinşahiya Osmanî hate avakirin. Ya ku karibû piştî demê kurt Memlûkiyan ji holê rake û Sûriyê di 1516an de, Misir di 1517an de, dagîr bike, û kilîtên K'ebê, di Tebaxa sala 1517an de, bistîne û ya rastîn weha çê ne dibû eger Kurdên desthilatdar, ji zanayên xwe yê misilman re rêz nedidan. Idrîsê Bedlîsî yek ji xudanê pir şiyar û mejî bû û bandoreke wî ye xurt di nav mîrên kurdan de hebû. Di "El-Şeqaiq El-Ni'maniyê" de hate gotin: "Ew yek ji bijareyê çerx û demê û peyvên serdema bû, peyamên wî yê seyre hebûn di daxwazên cûda de ku nayên jimartin".⁽⁴²⁾

Siltanên Osmanî, ango birayên Tirk rêzê ji serxwebûna navxweyî ya Kurdan re nedigirtin, belkû ji bo wan pîlan û bekirokî yê ku dihûnanin da ku her cûreyek ji cûreyên serxwebûna gelê Kurd ji holê rakin. Belge û giroveya ku Tirkên Osmanî bi qasî ku li ser firehkirina Sultenet û warên xwe yê desthilat diramiyan, li ser biratiya misilmanî neramiyane, ev e ku Siltanê Tirk (Silêmanê Qanûnî) ji waliyê

yekem yê Tirk re li ser herêma Diyarbekir (Amed) a Kurdan, "feremanek" nivîsiye, ya ku tê de besteka Farişî "Kurd Bidnihad" wateya wê (Kurd ne resen in) ⁽⁴³⁾ hate derbas kirin. Bi rastî, wî û hemî siltanên Osmanî yên ku piştî wî re hatin, siyaseta belavkirina tovê duberekî, jêkvebûn û nakokiyên di nav mîrên Kurd de belavkirin. Heya bi alîkariya Dewleta (Prusya- Elman), wan karibû di nîvê sedsala nozdan de, mîrnişîniya Kurdî ya paşîn (Baban) hilweşînin ⁽⁴⁴⁾. Ji ber vê yekê çiraya zanîn û zanyariyê li Kurdistanê vemirandin. Her kes dizane ku ev mîrnişîniyên Kurd ji ola misilmanî re, bingeh û keleha zanist û kelepûra wê bûne, ji nav wan Mîrnişîniyên Botan, Baban, Badînan û Soran, bûne. Mîrê Kurd Mîr Mihemed ê Rewandizî, bi nasnavê "Mîrê Kor e" mîrê Mîrnişîniya Soran di nîvê yekem ji sedsala borî de bû, ji ber vê yekê wî dewletek misilmanî ye serbixwe li devereke berfireh a Kurdistanê damezirand ku wekî Dewlet tê zanîn ya Soran, û Siltanê Osmanî nikarîbû wê ji holê rakin. Ji bilî bikaranîna xinizî, bekokî, derew û bikaranîna çeka olê ku ji hêla dijminên gelê Kurd ve hate bikaranîn û hîn jî tê bikaranîn ⁽⁴⁵⁾. Vê yekê, her çend dijminahiya tîreyî û rêgehî ya neyarî ya di navbera Suniyên Tirkên Osmanî û Şî'iyên Farişî yên Sefewî pir dijwar û bertek bû. Lêbelê, çendî ku herdu aliyên hevrik şer, pevçûn û dijayetiya hev dikin jî, lê herdu alî ji ber demargêriya neteweyî ya kor, li dijî Kurdan dibûn yek. Di sala 1639an de, rêveberên Şî'î û Sunî yên Farişî û Tirk li hev kirin ku Kurdistanê di nav xwe de parve bikin, di peymanek ku wan bi peymanê "Zêr" derbarê bajarê Kurdan "Zihawo", yê ku ew tê de civiya bûn, dane naskirin. Gava ku Kurd ji rewşa xwe ya têkçûyî agahdar bûn, wan dest bi

ramîna çarenûsa xwe ya xemgîn kirin. Ji ber vê yekê hin zana û serekên misilman, di nav wan de, derketin ku ji bo hişyarî û perwerdekirina gelê xwe gelek bixebitin. Di sedsala şazdehê zayînê de, zanyarê Kurd ê mezin Şeref El-Dîn El-Bedlîsî pirtûka xwe ya hêja bi navê "Şerefname", ku li ser dîroka dewlet û mîrnişînên Kurdan di serdema misilmanî de nivîsiye, amade kir⁽⁴⁶⁾. Xuyakirina tixûbên Kurdistanê ku berê ji peravên Deryaya Hurmuz (ango ya ku îro jê re Kendava Farisî an Kendava Erebi tê gotin) ya li teniştê Deryaya Hindî (okyanûs) dest pê dike û di xeta rast de heya wîlayeta Meletî û Mereşê. Li aliyê bakurê vê xetê dewleta Faris, Iraq a Ecem⁽⁴⁷⁾, Ezerbeycan, û herdû Ermîniya a Piçûk û ya Mezin⁽⁴⁸⁾ heye, û li başûr bi Iraqa Erebi, Mûsil û Diyarbekir⁽⁴⁹⁾ ve tê tixûbkirin. Hin zanyarên din jî dest bi ramana rajekirina zimanê xwe yê Kurdî yê paşguhkirî kirin. Ji ber vê yekê, Elî Teremaxî di 1000 koçî (1591z) de rêzimana yekem a zimanê Erebi bi Kurdî nivîsand⁽⁵⁰⁾ û Mela Yûnisê Helkitînî (1785 mir) sê lêkolîn li ser rêzimana Erebi bi zimanê Kurdî nivîsîne⁽⁵¹⁾. Di vê serdemê de, helbestvan û şehrezayên mezin derketin, ên wekî: Melayê Cizîrî (1570-1640), Elî Herîrî (bûyîn:1425), Feqiyê Teyran (1590-1660) û Mele Ehmedê Bateyî (1414-1495). Ev in ên ku ziman û wêjeya Kurdî bi berhemên xwe yên hêja û nirxdar dewlemend kirin, û berê cemawerê kurd dane kultûra neteweyî û daxwaz ji wan kirin ku xwedî lê derkevin.

Melayê Cizîrî bi helbesta xwe şanaz û serbilind e, ew helbestên xwe ji helbestên helbestvanê naskirî yê Farisî

Hafizê Şîrazî berkeftîtir, xweşikîtir û ciwanîtir dibîne. Ew dibêje:

"Ger lu'lu'ê mensûr ji nezmê tu dixwazî

Wer ş'irê Melê bîn te bi Şîrazî çî hacet"

Wate:(Eger tu li peyvên dur û giran ên kêşayî digerî, helbestên Mela bixwîne, pêwîstî bi helbestên Hafiz çî ye?).

Ya ku li vir tê dîtî ew e ku Cezîrî ne tenê bi helbestên xwe xwe dibîne, lê her weha, xwe bi welatê xwe, Botan (Buhtan) û welatê xwe Kurdistan jî dilzîz dike, lewma ew dibêje:

"Gula baxê Îremê Buhtan im

Şebçiraxa şebêd Kurdistan im"

Wate:(Ez li baxê Îrem ê Buhtan gulek im

Ez di şevên Kurdistanê yên tarî de ronak im)⁽⁵²⁾.

Vê heyama demê, bi raman û bîrûboçûnên buhredar û ramînerê Kurdê rahijmend Ehmedê Xanî (1650-1651/1706-1707), tê xemilandin, nivîskarê pirûka "Mem û Zîn" a şakar e, ku bi çîroka "Romyo û Coliyêt" a Lolîm Şikispîr têye hevsengîkirin û pîvandî. Di pêşgotina çîroka xwe de, Xanî bang li gelê xwe dike ku cûdakarî û nakokiyê red bikin, û li dora rêberiya kesayetiyê navdar e Kurd bicivin, ji bo damezirandina qewariyê Kurdî serbixwe ku tê de dewlet û ol biserpake bin, biser 300 sal berê.⁽⁵³⁾

Ez dixwazim di vî warî de diyar bikim ku em îsal (1994) û sala bê (1995) bi boneya 300emîn salvegera afirandina vê şaheser û şakara wêjeyî ya bêhempa ahinganê lidarxin. Ekađemiya Kurdî ya Zanistî û Hunerê dê îsal bi alîkariya Komeleya Dostên Gelê Kurd a Nemsawî, çapa duyemîn a wergera elmanî ya kurtkirî ya "Mem û Zîn"⁽⁵⁴⁾, a ku min di 1969an de bi dawî kir, û di heman salê de, ji hêla " Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewropa "(NUKSE) digel pêveka deqa semînera ku min êvara 22yê Çirî 1993an li Mala Wêjeyê li Viyêna li ser " Mem û Zîn " û Ehmedê Xanî (Xwedê jê razî be) xwendibû, belavkirin.

Ey Xwişk û Biran

Xunkarên Tirk û padîşahên Farisî, ji sedsala şazdehemîn ve, xwe rûbirû û pêşberî serhildanên gelê Kurd, ên ku serî li ber wan netewandin û li ber xwe dan û xebitîn ku xwe ji bin nîrê koletiyê rizgar bikin. Piştî ku hate xuyakirin ku ew ola misilmanî, ji bo berjewendiyên xwe yê neteweyî, kesayetî, ezperestî, xweparêz û êrişker, li hember Kurd û welatê wan Kurdistan, bikar tînin. Qubat û pozbilindan serî hildan da ku ola misilmantiyê dîsa wekî çekê li dijî Kurdan bikar bînin. Ji hestên olî yê bihêz ên ku ketibûn kûrahiya girseyên misilmanên Kurd, kêsû kirin û çewisandin. Hevrikê bi navê Xewace Se'ed El-Dîn (1537-1599), Muftiyê Imperatoriya Osmanî û mamosteyê xunkarê Tirk ê Osmanî Murad Xan, di pirtûka xwe ya bi navê "Tac El-Milûk" de ya ku bi zimanê Tirkî ye, ev tişt nivîsiye:

"Kurd xwediyê dîtinên zorkariyê ne, her yek ji wan alaya bêhempatiyê bilind dike, ji bo hezkirina xwe ji azadî, xwe-rûmet û serxwebûnê re, ew li serê çiyana xwe diparêzin, û ew di yek tiştî de li hev nakin, lê ji bilî peyva yekperestiyê. Derbarê sedema dabeşbûnê û duberekîya vî gelî û nebûna yekîtiya wan, di nav xwe de, wekî ku wî vebêjî: ("Gava ku çira pêxemberîtiya Mihemed (Silavên Xwedê lê bin) hat gerandin, û weşana peyama Pêxember belav bû, tirs ket dilê gelên cînanan, û ji hêrsa belavbûna navûdengê wî, padîşahên cîhanê û xunkarên gelan tirsîyan. Tev bezîn ku xelesa koletiya ji bo wî şikodarî di guhê kin, karûbarê serçimandin, xulamî û guhdariya wî xoşewîstî, li ser milên xwe hilgirin. Axoz-Xan yek ji xunkarên mezin ên Tirkistanê bû, li ser xwesteka wî yek bi navê (Bixdoz) ji nav navdarên Kurdan hate hilbijartin ji bo çûna ba Pêxember. Ev zîlam zîlamekî neşêrîn, bejinûbalek dêwekî,⁽⁵⁵⁾ rûnexweşik û di afirandina xwe de, xwîntal rengtarî û kirêt bû. Ew rêkirin ba Xwediyê Peyamê, serwerê herdu gerdûnan û serwerê du ezmanan (kurtêlxwer), ji bo wî çêtirîn nivêj û rêz û silavên pêkhatî, ku derbirîna xwe bi ola misilmanî û dilsoziya xwe bi wî re diyar bike, lewma dema ku ew delegeyê bi tîpê xwe yê ne xweşik, gihîşte ba cenabê Pêxemberê çêtirîn mirov, ew ji tîpê û bejinûbala wî mirovî veciniqî û di derheqê êl û eşîra ku ew bixwe jê ye jê pirsî, wî mirovî bersiva wî da ku ew ji gelê Kurd e, ji ber vê yekê Pêxember got: ("Ya Xwedê, wan neke yek û wan lihevneyîne, ji ber ku lihevhatina wan wêranbûna cîhanê ye")⁽⁵⁶⁾ Ji wê rojê ve, tenê gengaz e ku vî neteweyî dewletek mezin û desthilateke gewre ji pênc tîreyan ava bike ... hwd⁽⁵⁷⁾.

Xwişk û Birano...

Ya ku li vir tê dîtin, ew e ku di dîroka gelê Kurd de kesek bi navê "Bixdoz" tune ku çûbe ba Pêxember. Di serdema Pêxember de, Kurd ne di bin desthilata Tirkan de bûn, û bêjeya ku ji hêla olzanê Tirk ê Osmanî Xewace Se'ed El-Dîn ve ji Pêxember re hatî vegotin, bê guman, ne ji gotinên Pêxember in. Pêxember bi devûziman û peyvdar bû, û ew bû yê ku digot: "Ez ji Ereban ronbêjeyîtir im, lê ez ji Qureyş im." Gotin û fermûdeyên Pêxember bi kirinên qenc ên rewanbêjiya bêjeyî yên sipehî û xweşik hatine xemilandin. Hevok li vir pêkhatî ji pêkvedan û çêkirina wan kesan e ku bi zimanê (Erebî) nizanin. Ji bo peyva "bejinûbalek dêwekî"; li vir, ew jî tîne bîra me ku dîroknasên Ereb ên pêşîn, wek mînak El-Mesûdî, di derheqê koka Kurdan de vedigerand (Dêw û Cinan), wekî ku berê di semînerê de hate gotin.

Derbarê Farisên Sefewî yên pozbilind de, wan bi demargêriya tîreyî û rêgehiya Şîî ya kor ve tînen girêdan; ji ber vê yekê wan pir leşker şandin Kurdistanê. Tim şer û pevçûn di navbera Kurd û Sefewiyan de lidar bû, û yê herî girîng ji van şeran, şerê (Keliha Dimdim-1606) bû, ku wekî destanek neteweyî kete nav dîroka gelê Kurd de. Ferman-darên Farisî û alîgirên wan ji (Axwend, melayên Farisî yên Şîî) gelê Kurd û zimanê Kurdî şermezar dikirin. Di vê serdemê de, hin pirtûk û helbest derketin holê û pir bi kirêtî, bêrûmetî û bêbextî li Kurdan dikirin. Li vir emê nimûneyekê ji helbesteke Farisî pêşkêş bikin ku wan zimanê Kurdî reswa kirin û nîrxê wê sivik û piçûk kirin, ku tê de, xwemezinkirina

neteweyî û quretiya Farisî di pozbilindiyên xwe yên herî zelal de xuya dike:

"اللغة العربية هي الأولى والآخرة

أما اللغة الفارسية فهي حلوة كالسكر

واللغة التركية هي آية من آيات الفن

أما اللغة الكوردية فهي ضرطة الحمير"⁽⁵⁸⁾

Zimanê Erebî yekem û paşîn e

Zimanê Farisî wekî şeker şêrîn e

Zimanê tirkî yek ji ayetên hunerê ye

Ya zimanê kurdî, ew tira kerê ye."⁽⁵⁸⁾

Ji bextê sipî ye ku Kurdan bi heman rengî bersiva van bêjeyên vala nedan, û ew neçar man ku wekî yên din bi bêjeyên bêhiş, bêbext û derew, û bi vegotinên çêkirî cîranên xwe piçûk, reswa û rûreş nekirin, lê wan dîsa jî rêz ji yên din re girtin bêyî ku xwe bi tevahî jibîr bikin. Tenê li gotina pêşyan a Kurdî guhdar bin, ku dibêje:

"Şam şeker e, welat şêrîntir e".

Her weha guhdarî li helbesteke helbestvanê Kurd ê mezin Xanayî Qubadî (1700 - 1759), ku zimanê Kurdî şirove dike û wî bi Farisî re hevseng û danberhev dike. Diyar e ku Qubadî

bi zimanê Farisî helbestvan bû, û di wêjeya Kurdî û Farisî de jî jêhatî bû. Li vir ew dibêje:

"Her wekî dibêjin ku çendî zimanê Farisî wekî şekir xweş e, lê ji bo min Kurdî xweştir û xweşiktir e. Tê zanîn ku li vê cîhana tijî ramanên sik û kirêt, her giyan bi ya ku ji zimanê xwe yê neteweyî heye, dilşad dimîne."⁽⁵⁹⁾

Di Derbarê helbestvanê navdar ê Kurd Şêx Riza Talabanî (1837- 1909) de, ku helbestvanekî behre û jêhatî bû, wî helbestên xwe bi zimanên Kurdî, Farisî, Tirkî û Erebî divehandin û diristin. Ew di warê pêzanîna xwe ya ji bo Ereban de dibêje : "Gelî Ereban, ez qenciya we jibîr nakim, hûn bêtir alîgirê me ne, lê Selahedînê ku tevahiya cîhanê bi dest xwe ve girtibû Kurdekî Babanî bû"⁽⁶⁰⁾.

Tevî van hemî helwestên dijminan, yê ji destê cîranên Ereb, Faris û Tirkan hate dîtin, lê gelê Kurd û zanayên wan ên payebilind qet lêmiştta peywirên xwe ji çandên Ereb, Faris û Tirank re û herweha ji bo kultûra misilmanî, ranewestandin; lê, wan bêtir bi hemî hêz û hunera biryardariya xwe rajeya wan kirine û zimanê xwe yê Kurdî pir paşguh kirine. Nivîskarê Tirk ê Osmanî Seyîd Şems El-Dîn Samî, ku di sedsala nozdehemîn de jiyaye, wekî beşek ji lêkolînên xwe yê li ser gelê Kurd, di (ansîklopediya) rêbera xwe ya ku bi navê "Ferhenga zanyaran" tê zanîn de nivîsiye û vê rastiyê vedibêje: "Her çendî gelek zanyar ji nav Kurdan derketine, lê wan bi zimanê Erebî û Farisî nivîsîne û zimanê xwe yê Kurdî paşguh kirine"⁽⁶¹⁾.

Ka em niha ji sed nimûneyên berbiçav ên vê yekê yek mînakê vebêjin.

Ka em zanayê kurd ê gewre, Şêx Me'erûfê Nûdhî yê Berzencî (1752-1838), rêberê rêbaza Qadiriyan li Kurdistanê, li sedsala nozdehan, ji xwe re mînak bigirin. Vî zanyarê mezin di zanist û hunerên cihêreng de pirtir ji /46/ pirtûkan, bi herdu zimanan, Farisî û Erebi, afirandine, di nav de:

(الْقَطْرُ العَارِضُ فِي عِلْمِ الفِرَائِضِ), (الفِرَائِدُ فِي العِقَائِدِ), (تنقيح العبارات في توضيح الاستعارات), (وسيلة الوصول إلى علم الاصول), (فتح الموفق في علم المنطق), (أزهار الخمائل في الصلوات المشتملة على الشمائل... الخ).

Şêxê me yê birûmet pirtûkek piçûk bi navê "Ehmadiya di wergerandina Erebi bo Kurdî" Nivîsand. Ew ferhengokek piçûk bi erebi-kurdî ye, ne ji bo ku ji zimanê kurdî re peywirî û rajeyê bike, wî û piraniya zanyarên kurdên din ên misilman, zimanê Kurdî paşguh kirin -Xwedê gunehên wan derbas ke- lê tenê ji ber sedemên kesane, ji bo lawê xwe hînî zimanê Erebi bike.

Ka em bi hev re guhdarî bikin bê Şêxê dilsoz di pêşgotina pirtûka xwe de çi dibêje, ku helbestek tevlihev ji malikên erebi û farisî ne:

Spasdarî ji Xwedê re ji bo ku wî da

Wî em rêberî zimanê Ereban kirin

الحمد لله على ما وهب هداانا إلى لسان العرب

در این رساله بکوردی زبان کتم زبان عرب را بیان

تاکه فرزندم احمد بی تعب شود دانای لغات عرب⁽⁶²⁾

Wateya du malikên Farisî bi Erebî ev in: "Di vê nameyê de, ez zimanê Erebî bi Kurdî şirove dikim, da ku kurê min Ehmed bi hêsanî fêrî bêjeyên Erebî bibe." Ji ber vê yekê şêx ji pirtûka xwe re got "Ehmadiya", wekî ew di malikeke din de dibêje:

لهذا ناوم نا "احمدية" والله أرجو صلاح النية⁽⁶³⁾.

Di sedsala bîstan de jî, em dibînin ku mezintirîn nivîskar, helbestvan û ramanwerên ku ji kultûra Erebî, Farisî û Tirkî re raje kirine, Kurd bûn.

Wek nemûne, Ehmed Şewqî, Me'erûfê Resafî, Cemîl Sidqî yê Zehawî, Mehmûd Teymûr, 'Aîşa Teymûr, Bilind Heyderî, Xêridînê Zirkilî, Mihemed Kurd Elî, Ebasê E'qad, Mistefa Cewad û Selîm Berekat bi erebî, Reşîd Yasimîn, Mihemed Mukrî û Mihemed Qazî bi farisî, nivîskarê navdar û naskirî Yeşar Kemal li ba Tirkan... Navine navdar in pêdivî bi destnîşankirina wan nîne.

Ev helwesta Kurd û zanayên wan li hember birayên Misilman ên ji Ereb, Tirk, Faris û yên din bû, û hîn jî heye. Helwesta van bira û zanyarên wan ên hêja li hember gelê Kurd û mafên wan çi bû? Ka em hinekî din jî di pirtûka (غرائب الأثر في حوادث الربع الأول من القرن الثالث عشر الهجري),

bixwînin, ya ji aliyê Xwedêjêrazî Yasîn El-Omerî de hatiye nivîsandin, ew bixwe misilmanekî Erebe Sunî ji xelkê Mûsilê ye, wate ew ji hindikahiya Erebe li başûrê Kurdistanê:

”معاشرة الاكراد تورث الفساد. حتى ما رأيت الكوردي أميراً فارتقب الساعة. الحماسة في الاكراد والجهالة في السواد. سلامة الابدان باجتتاب اكراد بهدينان. معاشرة الاكراد تورث الاحقاد. لا تعاشر كوردي ولا تصاهر هندي. اترك الأكراد ما تركوك وابعدهم ما قربوك“.

"Hawdengiya bi Kurdan re akamekî gendeliyê ye. Eger kurdekî bibînê bûye mîr, çavenêriya çerxê bike. bêhişî di Kurdan de û nezanî di neteweyê de. Ewlehiya laşan bi dûrketina ji Kurdên Behdînan. Têkiliya bi Kurdan re zikreşiyê werdigire. Bi Kurdekî re dostaniyê neke û jinan ji Hindiyan neyne. Ji Kurdan dûr keve, bi qasî ew lê dûr in, dûrî wan here, her çendî li nizîk bin". Di rûpela 108an a heman pirtûkê de, helbestek Mela Qasim lawê Rawiya heye, ku wekî "El-Ramî" tê naskirin, û ev hemî bêtoke û gotinên sik, sixêf û dijûn ku li gelê Kurd tene kirin û bêyasayî, bi rengêkî birîndarkirin, kirêtkirin û şoreyîkirina li Kurdan dike.

Berevajî vê kêş û tevgerê, zanyarên Kurd û torevanên wan berê li ser Ereban pirtûk dinivîsîn, "qenciya" wan tekez dikirin, û banga qedexekirina hezjênekirinê li wan dikirin. Îmam El-Hafiz Zeyn EbdilRehîm El-Mîranî (El-Mihranî), ku wekî "El-Iraqî" tê naskirin, di bîst beşan de pirtûkek mezin bi navê "محبة القرب إلى محبة العرب" nivîsiye, hewl dide ku vegotinên xwe bi hin fermûde û çîrokan bi çespîne. Ev pirtûk hîn jî destnivîs e, di Mala Pirtûkana Misirê de, li Qahîreyê di bin jimare 162 de hatiye parastin).

Di sedsala bîstan de, û bi xwe di piştî Şerê Cîhanê yê Yekem de, dema ku împêratoriye Osmanî û Qacariyan ketin bin giraniya gunehên xwe, Erebb, Tirk û Farisan karîndewletên xwe yêneteweyî yênetçêkirî bi rejimên kevneperest û nedemokrat damezirînin, û karîbûntixûbên xwe yênetçêkirî heta roja îro biparêzin; vana hemî jî bi alîkariya dagîrkerên Rojavayî yênetku "demokrasî û azadiyê" dixwazin û bi piştgiriya dewleta Soviyetê ya hilweşandî û dawakera "sosyalîzm, pêşveçûn û aşîtiyê" bû. Van dagîrkeran Kurdistan di nav Tirk, Erebb û Farisan de dabeş kirin. Ji ber vê yekê, serdest û fermandarên Tirk, Erebb û Farisan bi Kurdan re wekkole û dijminan tevdigerin. Di rastiyê de, ne tenê gelê kurd jî mafê xwe yêrewa, di çarenûsa pêşeroja xwe bixwe û avakirina dewleta xwe ya neteweyî ya taybet mîna wan bêpar man, lê berevajî vê yekê, ew şerê gelê kurd kirin û şerê ziman, kelepûr, hebûn, xak û rûmeta wî jî dikan. Ji ber vê yekê wan bi darê zorê Kurd jî welatê wan, Kurdistan, koçber kirin û koçber dikan dema ku ew xwîna Kurdan bi roj li ber çavên mirovan dirijînin, zarokên wan dikujin, jinên wan talan dikan, namûsa wan li erdê dixin, û xêr û xweşiya welatên wan ên neft, av, kanza, û ... hwd wêran dikan. Bi çekên herî dijwar mitayî jî yênetbihên û hawirdin ku jî Rojava û Rojhilat hatine anîn, û bi amûrên herî nemirovane wan qir dikan. Ji bo cemawer û girseyên misilmanan Erebb, Tirk, Faris û yênetdin jî, ew ker lal û kor in, mîna ku balindeyek li ser serê wan be, ew bêdeng in. Ji damezirandina Komara Tirkiyeyê di 1923 û vir ve, fermandarên Kemalîstên Tirk jî bo tunekirina gelê Kurd hemî çekên mirinê bikar anîn. Dewleta Tirk di 1937an de, li Dêrsimê (Tuncelî) gaza jehrê li dijî

Kurdan bikar anîn, lê birayên misilman ên Tirk ji bilî çend kesan, li hember vê gunehbariya pir kirêt, bêdeng man. Îro, em dibînin ku hin partî û rêxistinên Tirk, eger em nebêjin tev, li rex rejîma serdest ya li dijî gelê kurd dişopînin, û li bakurê Kurdistanê siyaseta komkujî û xaka şewitandî û bi çekên welatên pozbilind, nemaze Elmanya û Emerîka şer dikin.

Dema ku Sedam Huseyn û zîlamên xwe gazên jehirkirî li dijî bajarê ewlekar yê Kurdistanê, Helebçe, bikar anîn û bi hezaran ji wan di nav çend hûrdeman de hatin kuştin. Hemî welatên erebî yan li rex Sedam bûn an jî bêdeng man, û bêdengî jî nîşana dilxweşiyê bû. Bê guman, wek gotina Erebi dibêje, û heta rêxistinên desthilata Filistinî di tengasiya gelê Kurd de, li teniştê wan nemabûn. Lê, serokên wan Sedam hembêz kirin. Ji bo cemawer û girseyên Ereb, wan jî tiştê nekîr, heta bi zîmanê xwe jî negotin, ew bawerîya herî qels e.

Aniha emê guhdarî li birayê Ereb, Ebdul Rehman El-Raşîd, sernûserê El-Mucele, rojnameyek xwedan û ji bo layî îslamiyet, çî dibêje, helwesta Ereban di derbarê şerê qirtirin û tunekirinê yê li dijî gelê Kurd vedibêje. Mamoste El-Raşîd di kovara "El-Mucele"-yê de, di hejmara 584an de, ku di Nîsana 1991an de, derketiye, gotarek nivîsiye ku em jê hin bendan veguhêzin da ku kesek me bi vekirina birînan û gilî û gazinan tawanbar û bertekên bê nîşan, girove, belge name û raberiyê tawanbar neke:

"Gelek televîzyonên Ereban çavên temaşevanan li tiştên ku li çiyayên Kurdan dibin, girtin. Wêneyên pir bi tirs û saw ên bi sedhezaran mirovên koçber, ku bi hezaran ji wan mirine, dilên herî hişk êşandin û tevizandin. Ez bawer dikim ku ew wêneyên herî diyar ên bextreşîya mirovî ne. Wêneyên ku me ne li Libnanê û ne jî li Filistinê û ne jî li Hindistanê dîtine. Televîzyonên Rojavayî ew wêne belavkirin ku ew dîtine dilê gelean azar kirine û şewitandine. Ger em ji neçûna Ereban ji bo piştgiriya birayên xwe yên Kurd derbas bikin, û pirsgirêka parastina Iraqê serwext bikin û hewldanên perçekirina wê red bikin, wekî ew dibêjin, lê pir dijwar e ku meriv ji mirovên ku li ser lingên xwe yên qeşagirtî û seholgirtî radiwestin û şîpiya dimirin, saxletên xinizî û derbirînên pêlangêrîyê bê verastkirin, bê tawanbarkirin û girovegirtin. Mafê van mirovan ê jiyane mîna mafê Ereben din e, û mîna mafê hemû gelên cîhanê ye. Şovenîzma Ereban di van rojan de, ghiştiye qonaxek ku di astên xwe yên herî nizim deye, ku jê mirov dikare pirtir dakeve xwarê. Hin Ereban, di daxwaza xwe ya Erebtîyê de, amar û taybetmendiyên mirovahiyê ji holê rakirin, û bi wan re nêzîkî giyanewerparêziyê bûn ..." Ew dibêje:

"... Heta yên ku alaya misilmaniyê hildane, yekpeyv jî negotin, her çend ew erzan e û bihayê wan nade jî, ji bo derbirîna dilsoziya xwe bi wan kesên ku li çiya û geliyan dimirin diyar bikin ...". Dûv re ew di dawîya gotara xwe de dibêje:

"... Mafê Kurdan di nav Komela misilmantiyê de heye. Vêca çima ew alîkariya wan nakin, an jî bi kêmanî di tengaviya wan de piştgiriya û alîkariya wan bikin, ji bo li ser riwê jiyane sax bimînin! Di gotarek din de ku ji hêla kek Ebdil-Rehman El-Raşid ve di hejmar 625 ya heman kovara "El-Mucele" de, di 6/2/1992an de hatiye weşandin, ew axivîna "Bêdengiya Ereban di Mafên Kurdan" de dike, ku me berê diyar kiribû, û dibêje:

"...Tengaviya Kurdan, li Îraqê mixabin rewş û helwesta me ya sinçî ber çavan tazî dike û radixe; ew bi rasteqîne û dilpakîya giyanê bijarte nîşan dide, dema ku em bi pirsgirêkên xwe re mijûl dibin, ji hev cihê dikin. Em tev diwêrin li hember reftara Israîlî ya li hember Filistîniyên Erebbî û gazinan bikin, ji ber talan, destdirêj û xinizîya ku ew tê de ne, û em jibîr dikin, di beramberî wê de, çî tê serê Kurdan li welatê wan, li Iraqê, bi destên hêzên Erebbî ên bê mafê yasayî di piraniya wê de û di wê zînatê de, tu herêmên Erebbî ji şerê Xaçparêzan ve tişteke weha nedîtiye û nebînaye. Li vir pirsê çemekî ev e: Ma pirsgirêk li gorî arezo, xaş û daxwazên me an xomilbûn, hatinarêzê û girêdanên me di nirxê xwe yê sinçî de, ji hev cûda ne? An jî ew bi sînoren herî kêr û herî zêde mijarek weş û manende ye? Wijdana Erebbî, mebesta min wijdana wî kesê Erebbî ye ku di civaka xwe de saxletek taybetmendî jê re heye, nemaze ew rewşên bîrê ku bi navê xwe navdar e û xwedan dîtinek gedêr û bihîstbar e, û dibe ku rajêrên wî hebin ku li benda helwesta wî ne, da ku helwestên wan biryarê bidin...

"Piştî van xerabiyên, tevaya neteweperestên Ereban, Tirk û Farisan ola misilmantiyê wekî berê çekê li dijî gelê Kurd ê têkçûyî weberhênan kirine û hîn jî rencxorî dikin. Neteweperestên Ereban timûtim peyva "Erebî û Misilman" bi hev re bikar tînin wekî ku Erebbûn û misilmanî du tiştên ku ji tewzim û neçarî bi hev re têkildar in. Neteweperestên Ereban Ereban wekî "gelê Xwedê yê bijartî" dibînin, û ew di vê yekê de gotinên misilmanî xaş dikin. Ka em nuha perçeyek ji gotinên Sedam Huseyn, ên li ser Ereban û misilmantiyê bixwînin, di axaftina ku wî "di dema şîva taştê ya ji bo oldarên payebilind" de, di 28-6-1983an de, (Li rojnameya "El-Sewra", di hejmara xwe de, di 29-6an de, 1983 p. 3 binêre), ji ber ku yek ji "merivên Olê yê rêzdar" bi yek peyvê bersiv nedan. Sedam got, ji nav hevokên ku got:

"... Yê ku kir Xwedayê Mezin Ereban ji bo rola serkirdayetiya ji bo mirovahiyê hildibijêre, ji ber ku Ereban çemekî ne û ji ber ku ew dikarin hizirkirin û boçûn bikin, û bi diyardeyên piçûk gihastina bendên giştî û rastiya ku Xwedê ji dest û dîtîna nayê destnîşankirin, lê ji hêla mêjî ve têye agehkirin, û em bi wijdana bawermend digihîjin wê. Ev taybetmendiya li Ereban xelatek ji hêla Xwedê ye, û ew cihê baweriya wan e ji ber ku di gihandina peyaman de jî rola wan a serkirdayetiya heye. Li ser ka çima Quran Ereban ye û bi zimanê Ereban ye. Ji ber ku Xwedê, di vê peyamê de, Ereban ji bo rola pêşeng veqetandine, lewma wî hilbijart ku Quran Ereban be û bi zimanê Ereban be. Ê ji ber ku zimanê Ereban bi tena serê xwe kariye bi zelalî û bi ramîna Ereban û bi hişmendiya ku lênihêrîna Ereban di vê rola ku me gotî de

kiriye û ne wekî roleke berevajî ye, vebêje. Bi vê têgihiştinê, em dikarin wate û nîşaderên Qur'ana Pîroz nas bikin." Xeyrelah Tulfah, Xal û zavayê Sedam Huseyîn e, di pirtûka xwe ya bi navê "Gelnewazî, yekem dijminê Ereban"e de dibêje:

"Xwedê di nav neteweyên erdê de cihekî bêhempa daye Ereban, di rewîşt, sinçî, zanîn, comerdîtiya hevjiyan de, serbilindiya rûmet û pêşengiya şaristaniyê û her ku bêtir jê hez dike, rûmeta wê ji hêla misilmantiya rasteqîne ve, ola mirovahiyê ve hate nimûnekirin. Vê yekê çavnebarî û hêrsa zikreşan, bi taybetî gelnewaziya Farisan, dijminê sereke yê Ereban e. Ji ber wisa jî, yekê wan (Gelnewazan) rageyandin ku misilman doza wekheviyê dike û wateya dîhar û berçav a hin ayet û fermûdeyan dubare dikin. Wate: (li ba Xwedê Merdîtirîn kes Xwedênastirîn kes in) "إن أكرمكم عند الله أتقاكم" "ليس لعربي فضل على أعجمي إلا بالتقوى" Wate: "Tu qencîya mirovê Ereb li ser mirovekî ne Ereb (Ecemî) ji bilî xwedê-giravî pêbawerî nîn e". Bêyî navnîşankirina rastiyên ayet û fermûdeyan ji zikreşiya xwe ya li dijî Ereban derdixînin, sûdeyê ji wateya serve û diyar werdigirin. Di Derbarê fermûdeya ku gelnewazan biyanûgirî de kirine, ku dibêjin, wekî ku ew dixwazin dikin: Wate "Qet tu çakiya yê Ereb li ser yê biyanî tun e."

“ لا فضل لعربي على أعجمي قط ”

Em dibêjin ku ew fermûde hatiye guherandin, girove û belgeya me ew e ku Pêxemberê Xwedê gotiye: Wate "Ew

kes ne ji me ye yê ku bixwaze nezanîn berdewam be û bigerîne" "ليس منا من دعا إلى جاهلية" "

Wê hingê ji bilî Erebi tu kes ne Kurd, ne Faris, ne Hindî û ne tu neteweyên din jî namînin, ji ber ku misilmanî ew serbilind kirye, li gorî gotina Xwedê: Wate "Min Quran bi zimanê Erebi daxist da ku hûn bizanibin"⁽⁶⁴⁾.

" إنا أنزلناه قرآنا عربيا لعلكم تعقلون "

Di rastiye de, ez naxwazim li vir bersiva van gotinên pûç û vala bidim, tenê ev kêmbûna hiş û sewdan, kêmbûna rewîşt û him nezaniyek li ser zimanê Erebi û wêjeya Quranî ya Erebi sepandî nîşan dikin, ji ber ku di bersivdanê de, windakirina demê û hem jî windakirina rencê ye. Lê ez dixwazim li vir xalek din destnîşan bikim, ku ew jî hewildana neteweperwerên Erebi e ku rajeyên mezin ên ku gelê Kurd li dirêjahiya sedê salan û serdeman ji zanist, huner û şaristaniya misilmanî re pêşkêş kirine, nadar dikin. Wehareng e ku nijadê hemî zanyar, torevan û pêşengên Kurd vedigerînin nijada Erebi, û kî ji van gotinan bawer nake, bila ew bi bihinfirehî vê pirtûkê bixwîne. ("Erebîxwaziya zanyar û ferzendeyan ên li welatên Rom, Cezîr, Şehrezûr û Ezerbeycan ji welatên biyaniyan re payepal in"), ji hêla Dr. Nacî Me'erûf, profesorê Zanîngeha Bexdadê hatiye nivîsandin. Di pirtûka xwe de axivîna Erebi xwaziya Selah El-Dînê Eyûbî, lawê El-Esîrê Cezerî, Şêx Me'erûfê Nûdhî ye Berzencî û Şêx Mehmûdê Hefîd, Padîşahê Kurdistanê di destpêka bîstan de bû, dike. Her weha, tiwêja pêkenokî ya

Erebkirina piraniya eşîrên Kurdan, ên wekî tîreya Mizûrî, ku ew ji "Muder" e, û êlên Dawûdiyê û Caf, û yên din jî dijmêre.

Ji Kurdan re cih û war nehiştin pêvî ku kortikekê bikolin û têkevin hundurê wê, ji bo wan wekî goristanekê be. Divê em li vir jî jibîr nekin ku neteweperwerên Ereb, nemaze di nav wan de Be'esî, ji bo rewakirina tunekirina gelê Kurd, bêjeyên Quranî û misilmanî cûda bikar tînin. Mîna kiriyara (El-Enfal) ku tê de, bi sedhezaran Kurd bûne qurbanî, tenê mînakek e.

Derbarê neteweperwerên Toraniyên Tirk de, ew bi dirûşman dibêjin: "Riya me Qura'an e, armanca me jî Toran e. "Li vir, em dibînin ku hemî rêxistinên Tirk bi navê "komeleyên Çandî yên Misilmanî" yên li Elmanya û welatên din ên Ewrûpa dimînin, di rêgezeke neteweyî ye nijadperest ya dijminahiya her tiştê ku Kurd be tevdigerin, û piştgiriya Hikûmeta Tirkiyê dikin, a ku van rojan li dijî gelê Kurd şerê qirkirin û tunekirinê bi rê ve dibe, û Tûranî mînaka Tirkiyê dubare dikin û dibêjin: "Kurdek li gorî Xiristiyane tenê Misilman e. ("gavura göre kurt müsülmandir."). Gotinek pêşiyên Tirkan heye ku dibêje: (" Gasikê agir ji dar nabe, û Kurdek ji bo paşabûnê ne guncan e"), wekî serperişt, "ağçatan maşa olmaz, kürttan paşa olmaz" Wekî din, Toraniyên Tirkuman,⁽⁶⁵⁾ ên ku li başûrê Kurdistanê dijîn jî hewl didin, wekî nijadperestên Ereb, ku nijadê êlên Kurdan vegehrînin ber bi koka Tirkan ve. Bi embazî, efserê Turanî Şakir Sabir bi helkefta şanenavkirina (îmzekirin)a hevpeymanî Bexdadê ya di navbera Tirkiye û Iraqê de, di nîvê

salên pêncî de, rencxorî kir, û wî nameyek bi zimanê Erebi bi navê "Kurtedîrokeke Tirkumanan li Iraqê" nivîsand û di wê de wî tiwêj kir ku êlên kurdî yên wekî Dawûde, Cebârî, Bacelan û yên din bi nijadê xwe Tirkumanî ne. Partiyên neteweperwer ên Tirkuman jî li ser vê tiwêja pêkenok, kawêj man û ev dîtinên pûç û vala belav dikirin. Toraniyên li başûrê Kurdistanê nişteci ne, bi reswakirin û rûreşkirinê li gelê Kurd dinêrin, Izedîn Qocewe nameyek ji rojnameya "El-Heyat" re (di 15/4/1993an de, hate weşandin) nivîsand û tê de wiha gotiye:

"... Lêbelê, gelek dîrok nas axivîna ku Tirkuman û Tirk dewleta xwe ya yekem li Îraqê, berî 3000 sal berî zayînê damezirandine, û ew Somer in ..." Ya nifûsa Tirkumanan li Iraqê, ew ji didu û nîvan, ne kêmtir, mîlyon e. "... Ez ji bo dîrokê dibêjim ku Kerkûk hezar salî berê, bajarekî Tirkumanî ye ... dema ku Kurd hemwelatîyên çîna duyemîn bûn, li ba dewlemandên Tirkuman karên hêsan (koletî) dikirin, û ji ber vê yekê em ji derketina vê girêkutek û vê zikreşiyê zehî namînin ku dest pê kiriye, niha di nav hin siyasetmedar û nivîskarên kurd de xuya dike. "Her weha me dît ku bêjeya "Kurdistan", ji pêvî li ba Kurdan û Ingilîzan, di tu bêje an ferhengêkan de nîn e".

Derbarê gotgotên wî de, ku dibêje Somer (Samî) Tirk û Tirkuman bûn, ew gotinek rê tê ser, ji hêla Mamoste (Qocewe) ve, ji ber ku Turaniyan û Bira (Qocewe) di nav komên wan de, gotgotikan dikin ku nijadê mirovan ji Tûran e, û zimanê Tirkî "zimanê rojê" ye. Ji ber vê yekê, bêtir

pêdivî bi gotinê nema. Di derbarê serjimarkirina Tirkuman-ên li Iraqê de, ku bi du mîlyon û nîvan tîn texmîn kirin, wê hingê em ji mîrza Qocewe dipirsin: Gelo serjimarkirin û nifûsa Iraqê bi tevayî çend e?. Wekî tê zanîn ku Tirkmen ji tevaya daniştîyan 2% ne! Gelo nişteciyên Îraqê sed mîlyon in?! Di derbarê "girêka Kurd" û "zikreşî"ya ji bo Kurdên ku "hemwelatîyên çîna duyemîn ji dewlemen-dên Tirkuman re raje dikin", di bîra birêz Qocewe de bînin rojên ku ew wekî penaber li çiyayên Kurdistanê li ba hêzên(Pêşmerge) bûn, li ser sifra Kurdên belengaz dixwar, xwe di nav nivînên cotkarên Kurd de dipêçand û bi comerdî û lêborîna Kurdî kêfxweş dibû, bêyî ku li helwestên xwe yê dijminane li hember gelê Kurd mêze bike. Mexabin, birêz Qocewe ji bilî li ba Kurdan û Ingilîzan peyva Kurdistan di tu bêje an ferhengokê de nedîtîye, û dema me naskir ku Mîrza Qocewe bi zimanê Italiyan nizanîbû em bi bîra wî tînin ku, nivîsandina geştiyar û gerokê navdar ê îtalî (Marco Polo) bixwîne. Wî nêzîkê hezar sal berê, li ser Kurdistanê nivîsiye. Ji ber vê jî, em jê dixwazin li "Ferhenga Zanyaran" vegere, ku ev pirtûk rêbereke girîng e bi zimanê Tirkî ku di sedsala borî de, ji hêla nivîskarê wê yê Osmanî Şems El-Dîn Samî ve hatîye weşandin. Da ku bêtir agahdarî li ser nasnameya Kurdî ya Kerkûk û Mûsilê, û li ser welatê "Kurdistan" bibîne⁽⁶⁶⁾.

Her weha wêneyê "welatên Kurdan" li ser nexşeya cîhanê ku ji hêla nivîskarê Tirk Mehmûd Kaşxerî ve, di pirtûka xwe ya bi navê "Nivîsgeha Zimanên tirkî" de, di 466 koçî- 1073z de, ango bi 922 sal berê, û pirtûk di 1940î de, li Enqereyê

hatiye çapkirin, dibêje: "Kurdistan rastiyekek dîrokî, xaknîgarî û mirovî ye û qet nayê nadarkirin". Derbarê dewleta Tirkan de, ew di 1923an de, hate çêkirin, bi saya serperîştên Komunîstên Êrîs/Rûsî û siyasethedarên Ingilîzî, ew Ingilîzên ku Qocewe pir ji wan neyartî dikir, û ji wan pir hez nedikir. Lê, ew tu kêmasiyê nabîne ku li welatê wan bibe penaber, û li ser xêra wan bijî ... ji ber ku ew di nav Kurdan de penaber bû. Wî xwe bi wan diparast, û tevî dijminahiya wî ji wan re, li ser sifra wan xwarin dixwar. Di derbarê neteweperwerên Farisî de, ew dibêjin ku Kurd bi tevahî gel pêk naynin, lê ew tîrek ji tîrên Êranî ne⁽⁶⁷⁾ ku di vê wateyê de, ji hêla misilmanên Farisî yê demargêr û regezperestan ve têne piştgiriye-kirin, ango wateya ku jê re tê gotin (Isûlî) raperêstî, rehperestî⁽⁶⁸⁾.

Xwişk û Birayên Hêja

Ka em werin ser pêşniyarek kurt a helwestên misilmanên binawangir û rehperest, di nav wan de, Erebi, Tirk, Faris, (Şîî û Sunî), û partiyên wan ên cihêreng ku hem doza damezrandina "Dewleta Misilmanî" dikin, hem jî ji bo sazkirina "Dadmendiya Misilmanî" dixebitin. Binihêrin, ka ew di derbarê rastiya gelê Kurd ê pelçiqandî û mafên mirovan ên desteserkirî de çi dibêjin. Ez, ji bo kurtayîya ji ber tunebûna dem û biwarê neçar im ku bişopînim û lêborînê dixwazim, xwe tenê bi hin nimûneyên tîpîk tixûb dikim. Piştî hilweşîna rejîma Şahişahî, di sala 1979an de, Komara Misilmanî li Iranê hate damezirandin. Dewleta misilmanî ya Tehranê, bi gotinên serkirdeyên xwe, "soz li ber Xwedê, li ber xwe û li

ber hemî mirovan" dan, ku mafê gelê Kurd bi tevayî bidinê û li Irana ku bi navê "Dadmendiya Misilmanî " saz bikin⁽⁶⁹⁾. Lêbelê, demek dirêj derbas nebû ku leşkerê Îrana misilman, û li ser fermana Rûhullah El-Xumeynî bixwe û nijdevanên din ên Iranê, ew ji Axwendê Faris û Tirk ên Ezerbeycanî bûn, dest bi daxîşîna li ser rojhilata Kurdistanê ya ku ji hêla Iranê ve hatiye desteserkirin bû, ji bo talankirina welêt û yexmebûna mirovan, balafir û çekên giran ên duristkirî yên Emerîkî û Ewropiyar bikar anîn⁽⁷⁰⁾.

Rûhullah Xumeynî li Qumê, di 30/8/1979an de, li ber Ayetullah Taleqanî û Haşim Sebaxiyan, Wezîrê Karên Navxweyî, gef xwar ku "Ger dijmin bi lezgîniyek zû têk neçe, ewê bi xwe here Kurdistanê"⁽⁷¹⁾. Wan gelê Kurd - wey li vê zehî û sersamiyê - ji bo Emerîkî û Sehyûniyan bi "nokerî" tawanbar kirin. Tiştê ku Kurdan li welatê xwe ye talankirî Kurdistan xwestine, ev e ku dayîn û bexşîna mafê wan bide wan ku karûbarên xwe yên navxweyî bi serê xwe birêve bibin, û bihêlin ew bi heman awayê xwendin û nivîsandina zimanê xwe yê Kurdî, wekî hemî gelên cîhanê, bikar bînin. Her çend Xumeynî daxuyaniyek di (26ê Abana 1358/26, Zîl-Hicah, 1399/17ê Çirîya Paşîn 1979an) de, belav kir, ku tê de deqa jêrîn diyar dike:

“Misilmantiya gewre ji hemî cûreyên duberekî û ciyawazkarî neraziye, wî ji bo çînek, tiwêjek û civatekê re tu nayab û bijareyên wê yên taybetî çê nekir. Xwedêparêzî û dilsoziya bi misilmantiyê re pîvanên rêzgirtina mirov in. Di bin sîwana misilman û Komara misilmanî de, mafê her çînek

ji çînên gel, bi embazî birayên Kurd, heye ku karûbarên xwe yên navxweyî birêve bibin, û her cûreyên zordariya çandî, aborî û siyasî ji holê rabin. Dewleta Komara Iranî sozdar e, û soz dide ku vê yekê di zûtirîn dem de bicih bîne, û yasa û biryarên pêwendîdar, dê di pêşerojek pir nêz de, bi rêdana Xwedayê gewre, werin nivîsandin."⁽⁷²⁾.

Ev daxuyanî heya roja îro mîdad û diwêta li ser kaxezê maye. Di dema ku rejîma Iranê tevgera rizgarîxwaza a gelê Kurd bi "Handanek Emerîkî ya Sehyûnî" ve tawanbar dike, ev heman rejîm têkilî û danûstendinê digel hemî rejimên ku wan dijminê misilmantiyê dibîne, û bi wan re li dijî gelê Kurd têkildar e. Em dibînin rejîma Iranê, herdu rejîman (Etatirk û Be'es) dijminê misilmantiyê dibîne, û Etatirk wekî "Cihû" û "Mîşêl Efleq" wekî Xiristiyan hilme û êrîş dike. Ew bi hukûmeta Tirk re ye ku bîrdoziya Etatirk dimeşîne, hevkar e, û hevkarîyê bi hukûmeta Be'esên li Sûrîyê, yên ku bîrdoziya 'Efleq li dijî gefa ku jê re dibêjin Kurd bi cih tîne. Tu astengi-yên wê tune ne ku bi rejîma Seddam re jî li dijî Kurdan hevkarîyê bike, û diyar e ku em di van rojan de dibînin ku rejîma Iranê gund û bajarên ewledar ên başûrê Kurdistanê bombebaran dike, misilman û jinên misilman li herêma di bin rêveberiya hukumeta Kurdistanê de tîn kujtin, li devera ku ji hêla hêzên navdewletî ve tê parastin, ango hêzên welatên Xiristiyan in. Bala xwe bidinê ku her du partiyên desthilatdar (Partiya Demoqrata Kurdistanê û Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê) li wir, di dema şerê Îran û Îraqê de, bi salan peywira rejîma Îranê kirine, û di encamê de xwîna cemawer û girseyên Kurd kirine qurban. Bajarê Helepçe bi

çekên kîmyayî ji hêla rejîma Be'es ve hate bombebarankirin, û bi hezaran kes, di nav çend hûrdeman de pakrewan ketin. Weku berê jî hate gotin, ji piştî ku Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê rê da cerdevanên şoreşa Iranê (Pasdaran) ku derbasî Helebçeyê bibin. Ji ber vê yekê, Sedam ew kir bihaneyek da ku Helepçe ji serê xwe qir û tune bike. Mafê me heye ku em nuha bipirsin: Gelo ev bombebarana domdar a van rojan ku li başûrê Kurdistanê dibe, ji hêla rejîma Îranê ve, xelatekirina gelê Kurd e li başûrê Kurdistanê, bi şêweyê "Misilmanî", ji hêla Farisên pozbilind, qure û hevkarên wan ji Tirkê Ezerbeycanê?.

Derbarê helwesta misilmanên raperês, binawangir û rehperest, li hember Şî'eyên Iraqî yên Ereb ku di "Encûmena Bilind a Şoreşa Misilmanî ya Iraqê" de kom bûne (û navenda wan Tehran e). Di derbarê pirsgirêka Kurdî de, ew mixabin, ji helwestên Rêberên Iranê li hember Faris û Azeriyên Tirk û helwesta Be'esiyên Iraq û Sûriyê tu cudayî nîne. Pêşewayê wan, birêz Mihemed Baqir El-Hekîm, di Sibata sala 1992an de, daxuyaniyek da rojnameya "El-Hayat" ku tê de wî Iraq "Welatek Ereb, Misilmanî û Beşek ji Neteweya Erebî ya Misilman", dibîne (El-Hayat 25/2/1992), û banga "yekîtiya Iraqê wekî gel, ax û hikûmet" kir. Banga wî ya ji bo "yekîtiya Îraqê: Gel, xak û hukûmet" tê wê wateyê ku ew hukûmeteke kurdî ye federal li başûrê Kurdistanê jî napejirîne, vêçe çawa dewletek serbixwe ye kurdistanî wê hebe. Ya ku divê were zanîn ev e ku ev daxuyanî di demekê de tê ku birêz Hekîm li Îranê wekî penaber dijî. Ji ber vê yekê, dê helwesta wî çi be heke em guman bikin ku ew rojekê li Îraqê ferman-

dariyê bike? Bila birayê Hekîm piştrast be ku kurdên zana, yên ku ji malbata wî re pir⁽⁷³⁾ mirovên dilsoz rêz digirin, bi destûra Xwedê, nahêlin cemawerên kurd pozbilindekî bi qureyekî din veguhêzin.

Birayên wî yên Kurd ji Farisên pozbilind, sexteçî û bêperwa bi wî re rastir û dilpaktir in.

Helwesta Partiya De'ewa ya Misilmanî mîna ya Mîrza Hekîm e. Rojnameya "El-Cîhad" di 11-8-1986an de, berdevka "Partiya De'ewa ya Misilmanî" di jimara 250î de, (rûpel 12) gotarek bi navê "Têgihîştinên De'ewa ya misilmanî li ser pirsgerêka Kurd" weşand. Tê de hate gotin: "Zimanê Erebi zimanê Qura'anê ye, û li Îraqê zimanê fermî ye. "Wate ku ew di çarçova nerêk û nakokiyê de ye ku zimanê Kurdî nikare bibe zimanê fermî, ji ber ku ew ne zimanê Qura'anê ye". Û "Îraq beşek pêkve ya welatê misilmanî ye û herêma Kurdistanê jî parçeyek pêkve ya devera Iraq û yekîtiya siyasî ya Îraqê ye." Di Hejmara 303 de, ku di 24-8-1987an de, hatiye weşandin (rûpel 6), di bin serenava: "Şiwîna Siyasî, Pirsgerêka Kurdî û Mijarên Girîng", Şêx Mihemed Mehdî El-Asfî (yê Iranî), berdevkê fermî yê Partiya De'ewa ya Misilmanî, ji bo "pêşinyarên siyasî" yên pirsgerêka Îraqê nivîsand: "1- Yekîtiya gelên Îraqê. 2- Yekbûna xaka Iraqê. 3- Yekbûna serweriya Iraqê". Ev nêrînên neteweperwerên Erebi ên pozbilind û xwemezindî in ku bi tevahî ji raman û nerînên Be'esiyan ne cuda ne. Hêjayî gotinê ye ku Partiya De'ewa ya Misilmanî di rêbaza xwe de nivîsandibû ku ewê mafê "otonomî" bide Kurdên ku di wîlayetên Silêmanî,

Hewlêr û Duhokê de dijîn; lê ew bêdeng e, mîna Be'esiyan û neteweperwerên Erebb, di derheqê Kurdên li Kurdistanê yê mayî (wekî: Kerkûk, Mûsil, Diyala, Kût, deverên Amara, wîlayetên Selah El-Dîn û nêzîkî zêdetirî milyonek Kurd li Bexda dijîn). Wê hingê çima divê neteweya Kurd li benda "Bexşîn û dana" Partiya De'ewa bimîne?

Di derbarê helwesta (Civata Birayên Misilman) de, ku ew partiyek misilmanî ye kevna û navdar "Raperês, Rehperestî =binawangirî" ye, ew ji helwestên serkirde û rêberên şî'iyên Iraqî yê binawangir û rehperest û Partiya De'ewa ciyawazî nîne. Ev bi xwendina hin birge û bendan ji daxuyaniyek ji hêla birêz Mihemed Hamid Ebû El-Nesir, Rêberê Giştî yê (Birayên Misilman) ve, di dîroka 27-4-1991an de, di derbarê bikaranîna gazên jehrî li dijî gelê Kurd ji hêla Sedam ve di bihara 1988an de. Ango, ya (Civata Birayan) daxuyanî nêzî sê salan ji karesata Helepçe hat weşandin. Di daxuyaniya xwe ya navborî de, Birêz Ebû El-Nesir, Kurdan bi "Handana ji alî mêtîngerî" tawanbar dike, da ku "tevgerên cûdaxwaziyê di gewdê Iraqî de" bike, û ew dibêje:

"Ji çemeka jêrdestkirina Emerîkî ya li ser herêma, gelên bakur û başûrê Iraqê hatin handankirin ku tevgerên cûdaxwaz di laşê Iraqê de pêk bînin. Ev tevger ji hêla şiyana berhingarî û rûbirûbûna sipahê Iraqê ve ne amade ne, yê ku bi fermana serwerê xwe yê Be'esî dikin. Vê yekê ji bo hêzên Emrîkî û Rojavayî derfetek çêkir ku bi behana parastina mafên gelê Kurd, parastina wî ji qirkirinê û piştgiriya rewatiya navneteweyî dîsa destwerdanê bikin.

Gelî guhdaran, li ser van gotinên ku ji rêberê giştî yê (Birayên Misilman) ên li Misrê ne, hinekî bihizirin. Ew gelê kurd carekê wekî "gelên bakurê "Iraqê" û dîsa "Gelê Ekrad" bi nav dike. (Hêjayî gotinê ye ku peyva "Ekrad" li ser kêşa "E'erab" e, û El-Ekrad "Kurd" in, Kurdê koçer û bêjeya kurd ji bo forma pirjimarî rast e, û yekjimara wê kurdî ye an kurdê ye- li gorî zimanê Erebi). Rêberê Giştî, Tevgera Rizgarîxwaz a Kurd wek "Tevgerêke cûdaxwaz di laşê Iraqê de" binav dike, û ew baş dizane ku başûrê Kurdistanê bi tevahî ne beşek ji "laşê Iraqê" bû, lê berevajî wê, ew perçeyek ji welatê Kurdan e ku mêtîngeriya Birîtanî ew bi dewleta çêkirî ya ku nav lê kirin (Şanşîna Îraqê) ve hate girêdan. Ya ji hemiyar xerabtir ew e ku Mîrza Rêberê Giştî parastina Emerîkî û Rojavayîyan ji gelê başûrê Kurdistanê re ji êrişên leşkerên Sedam yê hovane, destêwerdanek di karûbarên Îraqê de dibîne, û ew bi teqezî dizane ku bêyî vê parastinê, dê gelê Kurd di beşa başûrê welatê wan de, di nav çend rojan de, hatibaya qirkirin. Ka em niha ji birêz Rêber bipirsin: Gelo ev helwesteke îslamî ye, an helwesteke neteweyî, Erebi, dijberî, Sedamî û pozbilind e?

Bira: Ez naxwazim li ser vê mijarê re biqevizim, ji ber ku torevan Şêx Omer Xerîb, Xwedê temenê wî dirêj bike, bersivêk pir bihêz weşand, li ser van durûtiyên ku bi navê olê tene gotin.

Derbarê Dr. Mihemed Emara de, ew nivîskarekî navdar "Rehperest- binawangir" ê Misirî û Misilmanan e, û endamê Civata Bilind a Karûbarên Misilmanî li Misirê ye. Ew qet ne

bi mafê gelê Kurd re ye - li gorî raya wî – ew netewa "Kurd", wekî: "Eqeliye = hindikayiyek" binav dike, û dibîne ku "Projeya Piraniî" û "Projeya Neteweyî û Misilmanî" asteng dike. Dibêje:

"... Rojhilatnasiyê berê xwe dida hemî bizavên li ser tevgerên larê, nawaze û kesayetiyan nîgeranî da ku me aşop bike ku dîroka me yekî tê de nîn e, ya ku Israyîl niha dike, û hene yê ku di mijara hûrgelan de pisporî dibin û axivîna federalîzm û konfederaliyê di nav cîhana Erebi de dikin. Hûn navan dizanin, lê ne pêwîst e ku hûn navên wan bibîr bin. Ev nexşeya ku dixwaze me aşop bike û bixapîne ku alav û hêmanên yekîtiyê ne li ser bingeha rawestîna li ser pirsgerêkên hûrgelan e ku projeya piraniyê asteng dike. Ez bawer dikim ku ya li Sûdanê dibe, bi sitûrkin û pêşvekirina Xiristiyanî li Sûdana Başûr nimûneyek e. Li vê herêmê, misilman ji Xiristiyanan pirtir in. Ev jî di derheqê hindikahiyên neteweyî de wekî Kurd û yê din dibe, ji bo astengiya projeya neteweyî û projeya misilmanî, ku ew projeya piraniyê ye ... hwd. (Rojnameya El-Heyat 15-4-1994, rûpel 7, Ber bi Nûnertiya Siyasî ya misilmanî, 1 ji 5).

Derbarê rojnameya "El-Nehde El-Islamiye" de, ku devoka "Tevgera Pêşkeftina Misilmanî" ye, li Cezayîr, ku tevgera misilmanî ya rehperest û binawangir e. Wê di hejmara 13an a di 16/5/1991an de, gotarek ji kesekî re bi navê "Ebû Bilal", bi serenava "Pirsgerêka Kurdî û Rengrêjiya Rojavayî ya Dabeşkirina Iraqê", weşandiye. Di wê de, "Misilmanê raperêst, Binawangir û Rehperest" Ebû Bilal li Iraqê rejîma Be'esiyên

Sedamî parast. Ew gelê Kurd û Şî'eyên Iraqê, di ber têkçûna leşkerê Îraqê de, berpirsiyar dibîne. Di baweriya wî de, ku Iran, Tirkiye û Amerika, Kurdan li dijî Iraqê handan dikin. Ew dibêje ku pirsgerêka Kurd "ji hêla mêtîngeriya Rojavayî bi xwe ve hatiye çêkirin, û yek ji gelek pirsgerêkên rêgehê û regezî ye ku ji hêla welatên mêtîngerî ya di cîhana misilmanî de, hatiye çêkirin" û Misilmanê binyadparêz "Ebû Bilal" hebûna pirsgerêka Kurdî nadar dike. Ew di heman demê de, kuştîyariya Partiya Be'es, li dijî Kurdan jî nadar dike, ji ber vê yekê ew dibêje: "Guhdana çapemeniyê ya pir lêfane, ya li ser êş û azarên Kurdan, li hundurê Iraqê û ji ber xwe çêkirina derewan derbarê komkujiyên bi tirs ên ku hêzên Iraqî li dijî wan pêk anîne û pêk tînin.". Mînakê Ebû Bilal jî wek mînakê Naziyan Elman e ku, Nazî danpêdana bi komkujîya Cihûyan nakin. Ew jî danpêdana bi komkujiyên leşkerên Sedamî li dijî kurdan nake. Ew dibêje: "Tiştê zehî ev e ku arîşeya Kurdên ku Emerîka van rojan bar dike, tenê di derheqê Kurdên Îraqê de hatiye raberkirin, her çendî ku gelê kurd li Sûrî, Tirkiye û Iranê jî heye, û çî kurd êş û azaran li van welatan dikişînin, ji êşa birayên wan ên li Iraqê pir mezintir e. Ger bi rastî êş hebe ". Ka em ji gotara wî perçeyekê veguhêzin, çimkî ew belge û rêbera herî mezin a ramanên şofînê ên vî misilmanê "Binawangir û rehperest /Isûlî" raperêsi ye:

"Piştî têkçûna nexşeya yaxîbûna çekdarî li başûr û bakur, ji Emerîka û hevalbendên wê re çare nemabû ji bilî pejirandina pirsgerêka Kurd ku bi salan e li ser masê bû, û

wê wek fişarekê, di dabeşkirina Îraqê de, piştî sernekewtina rûxandina rejîmê, bikar anîn..".

"Têgihîştina Rojavayî ya şerê wan li dijî Îraqê dajotin, li ser bingehe ku ewê bibe şerekî revîner, ne bi rojan an bi hefteyan bêtir, wê pir dirêj neke. Li ser bingeha ku ewê karibin rejîma heyî ya Îraqê hilweşînin, û li şûna wê pergaleke nû li ser pîvana Rojavayîyan ava bikin, ligel çekên kîmyayî yên di dest wî de wêran bikin. Geryana biyabanê, çawa ku Rojavayîyan ew sawêr dikirin weha derneket, li ber pilanên leşkerî yên jîr, ku sipahê Îraqê pêk tanîn, veguherî erk û karekî dijwar ...".

Ey Xwişk û Biran...

Piştî guhdarîkirina li van daxuyanî û gotinên piralî, gelo em nabêjin ku piraniya tevgerên îslamî, yên ji wan re " Binawangirî raperêsi/El-Isûliye" tê gotin, tevgerên neteweperest ên Ereb, Tirk û Faris in ku bi kincên misilmantiyê pêçayî ne? Erê, û li gora vê siyasetê, Misilmanên raperêsi "Binawangir û rehperest" ên Misir û Sûdanê jî daxwaz kirine ku gelek welatên Ereb ên jiyarî ('Ilmanî), wekî Iraq, Cezayîr û yên din, di 12ê Gulana îsal de, li Qahîreyê kongira ku dibin navê "mafên hindikahiyên li cîhana Erebî" lidar nexin in, ya ku wê bi alîkariya "Navenda Ibin Xeldûn" lidar keta, ew jî wekî Dr. Huseyn Silêman Ebû Salih, Wezîrê Karên Derve yê Misirê ye, yê ku "armanc û dema kor û semînerê" rexne kir⁽⁷⁴⁾.

Derbarê "Rêxistina Kongirê Misilmanî", ya ku di dema civata serokên dewletên misilman de, li Rebatê di 1969an de, hate damezirandin piştî ku Mizgefta El-Eqsa li Qudsê hate şewitandin û Cedda kirin navenda xwe, û pirtir ji çil welatî wekî endam tevî wê bûn. Hêjayî gotinê ye ku Rêxistina Rizgariya Filistînê endama Kongira Misilmanî ye, û hukûmeta Tirkên Qibrisê jî, ku ji bilî Tirkiyê, welatekî din danpêdan pê nekiriye. Lêbelê, di vê rêxistinê de navê Kurdistan û gelê Kurd nayê bibîranîn. Komela Misilmanî jî, ku di 25ê Gulana 1962an de, bi pêşengiya Şah Si'ûd lawê Abdul –Ezîz li Mekkehê hate damezirandin, heya nuha bi yek gotinê gelê Kurd bibîr naniye.

Derbarê karên xêrxwaziyê yên li Mekkehê ku ji hêla dezgehên misilmanî ve ji bo laxerên Misilmanên li çar aliyên cîhanê têne rêvebirin, gelê Kurd jê bêpar û bêpal e.

Şahinşahiya Erebestana Si'ûdî ku welatê herî dewlemend ê Misilman e, di navbera salên 1973 û 1987an de, zêdeyî 5 mîlyar riyal vatinî da welatên perestîn ên cîhanê.

Lê "Xwedanê Du Mizgeftên Pîroz = خادم الحرمين الشريفين", mîna birayên Kuweytî, yên ku bi salan alîkariya rejîma Sedam dikirin, li Kurdistanê yek dibistana seretayî an tîmargehek çênekirin, ji xwe hîç zanîngehek ava nekirin an alîkariya mayekî û wateyî, di biwara navdewletî de, neda Kurdan. Bi ser de, Erebestana Sa'ûdî, Kuweyt û welatên Kendavê bi guman û xilûpil li vê qeware û sazûmana piçûk a Kurd, ku piştî cenga Kendavê, li başûrê Kurdistanê çêbû, dinerin û ew ne qewareyek û saziyek serbixwe ye, lê

xweseriyek piçûk e herêma rêveberkirî û devera wê ne serbiser ya sêk a herêma başûrê Kurdistanê ye ku bi zorê bi Iraqê ve girêdayî ye. Ezê mînakekê Li ber çavan raxim. Birêz Yûsif lawê Elawî lawê Ebdullah, Wezîrê Dewletê yê Karûbarên Derve yê O'manî, rojnamevanê rojnameya (El-Heyat) jê pirsî: "Hin kes bawer dikin ku welatên Erebi hewilên tên xwestin nedane, ku rê li ber (Riftara navneteweyî) bigirin, ji bo parastina yekîtiya Îraqê, ma we li O'manê li ser hukumeta Kurdî li bakurê Îraqê dilgiraniyek heye? Wî bi gotina jêrîn bersiv da: "Derbarê pirsgirêka Kurdan, ew têkildar û tijî têkel, nerîn û dîtînen cîyawaz di derheqê wê de ne. Rast e, heke bakurê Îraqê ji welêt were veqetandin, ev veqetîn dê di vê xalê de neseke, lê dê berdewam bike, nemaze ku li herêmê hindikahiyên cûrbecûr hene. Lê, her kes ji kirina tiştêkî wisa xwe aram nabîne. Em di Encûmena Hevkariya Kendavê de, di her rûniştinek ji rûniştinên xwe de, ji bo her qisûriyek di yekîtiya Iraq û yekîtiya xaka wê de, nerazîbûna xwe diyar dikin. Ev bîrûbaweriyek pêdar e."⁽⁷⁵⁾

Bi kurtahî, helwestên dijminên Sedam ên Ereb, di derbarê pirsgirêka Kurd de, heman helwestên Sedam in. Derbarê arîkariya mirovî ya ji bo Kurdên çewisandî, ez vekirî dibêjim: Cîhana misilmanî, ku xelkên wê digihîjin nêzîkî yek mîlyar mirovî - li gorî texmînên Rûhullah Xûmeynî- alîkariya gelê kurd nekirin, wan yek ji sedên alîkariyên ku dêrên Xiristiyan li Ewropa pêşkêş kirin, nedan gelê Kurd ê di êş, azar û tengasiyên xwe de bûn.

Ji bilî arîkariya arişî ya ku di asta navneteweyî de, ji hêla xwişka Xiristiyanî, rêzdar Xanim Daniyêl Mîtiran ve, hevjinâ Serokomara Fransa, ji gelê Kurd re hate kirin.

Gelî xwişk û biran, win dibînin ku birayên me yên Kurd li Israîlê, dilxwaziya xwe nîşan dane ku 200 zarokên ji Kurdistanê, piştî bobelata Helebçe bav û dayikên xwe winda kirine, lixwe bigirin. Lê hukûmeta Tirk red kir, ku van zarokên sêwî veguhezîne Israîlê, û Tirkîye ya tenê derbasbûna sînorî ku herêma ewledar a Kurd bi cîhana derve ve girê dide.

Vê yekê û piştî ku me ji nêz ve nêrînek pozbilind a birayên Misilman ji Ereb, Tirk û Farisan, li hember gelê Kurd ê çewisandî û qelskirî di seranserê dîroka misilmantiyê û heya roja îro de, divê em axivîna rastî ji dîrokê re bikin. Helwestên hin mirovên baş ên dilsoz ji wan gelan, helwestin xweşik û hindik in ku ji riya pozbilindiya giştî dûr ketine. Van kesên hêja pîrsgirêka Kurd di pîvanên xwe yên rastîn de, bi dilaweriyek mezin pêşkêşî raya giştî kirine. Hêja ne ku em spasiya wan bê kirin. Ji bo wê, wan zehmetiyên bi azar û cefakêşiyên dijwar, pîrsgirêk û tawanbarkirinên cûrbecûr ji mirovên pozbilind ên gelê xwe kişandine. Xwedê wan bi qenciyeke comerd xelat bike. Di nav wan de nivîskar û profesorên tirk hene: Isma'îl Beşikçi, Yalçın Kuçuk, Behîce Boran, têkoşer Kemal Pîr û Haluk Gerger, yên ku bi salan e ji bo parastina gelê Kurd ketine girtîgehan de. Di nav Ereban de, mamosteyê nemir Azîz Şerîf, serokê sosyalîstê yê navdar ku seranserî çil salî, wî li dijî rêça Komunîst û neteweperweriya Îraqî rawestiya ye. Tewjima Komunîst a Îraqî tewji-

mek Sovyetî bû ku dijayetiya mafê gelê Kurd dikir, ku dewleta xwe li ser xaka xwe, Kurdistanê ava bike. Azîz Şerîf – Xwedêjêxweş - piştgiriye da wî mafê rewa ye gelê Kurd.⁽⁷⁶⁾

Mu'emer Qezafî wekî serokê şoreşa Erebî û serokê Komara Lîbyayê tê naskirin, di nav serkirdeyan cîhanê de tenê ye, ew ji dawîya salên heftêyan ve doza damezirandina dewleta Kurdistanê ya serbixwe dike. Di 18 Çile 1979an de, Qezafî ragihand ku neteweya Kurd mîna neteweya Îrlandî ye (lê vegere: Rojnameya fransî Le Monde Paris 22-1-1979). Kanûn 1980, bi boneya civînek navdewletî ya li Medrîdê, ji bo lêkolîna ramana Mu'emer Qezafî û "Pirtûka Kesk", Qezafî got: " Ez Ereb im û yekîtiya xaka Ereban û yekîtiya neteweya Ereb bala min dikişîne, lê ev nahêle ku ez rastiyê paşguh bikim, wê pêşdaraz bikim û ne jî reftarê bikim reftarek nijadperestî û mêtîngiriyê bikim. Kurd Ereb nîn in û em nikarin wan neçar bikin ku bibin Ereb. Heger ew bi vîna xwe bixwaze bibe Ereb, Ji ber vê yekê, bi xêr hatî ... û heke ew xwe bi xak û gelê xwe ve girê bide, wê hingê ew azad e ... çima em şerê wî dikin? Ne hewce ye ku bi Kurdan re şer bikin da ku vî gelî tune bikin. Ez bawer im ku pir dijwar e bi kujtinê dawîya wan were. Van şeran û van pirsgerêkên bi Kurdan re ne çare ne, ji ber ku tekoşîna Kurdî dê berdewam bike heta ku neteweya Kurd serbixwe bibe û bi ghiştina belavbûyî re bibe yek. Çareserîya dawî ya pirsgerêka Kurd di damezirandina dewleteke serbixwe de, li ser xaka Kurdistanê - welatê neteweya Kurd e. Ez piştgiriye didim tekoşîna Kurdan ne wekî dijberîya welatên Ereban, Iraniyan an Tirkan, lê ji ber ku Kurd bi xaka xwe neteweyekê ava dikin. Divê

azadî ji wan re were hiştin ku li ser xaka xwe dewletekê ava bikin. Ji ber ku Kurd xwediyê xaka xwe ne û ew neteweyek bira ne, divê em jê re rêz bigirin. Ez li dijî binpêkirina wan im. Ez li dijî zordariya ku li wan dibe û li dijî belavbûna wan li cîhanê me. Ez tekoşîna Kurdan ji bo neteweya Kurd ku li Rojhilata Nêzîk cihê xwe li teniştta gelên Ereb, Iranî û Tirk digire, piştgiriya didim".

Di civînekê de ku li bajarê Terablusê, di 2ê Adara 1985an de, hate saz kirin da ku serkirdeyekî neteweyî were damezrandin ji bo birêvebirina hêzên şoreşger ên Ereb, Qezafî destnîşan kir ku : "Neteweya Kurd ya bi rûmet ji gelê Ereb re gelek bira ye", û bêguman kir ku ew ji ber sedemên xaknigarî, siyasî an dîrokî li rex gelê Kurd nasekine. Belê ji ber ku dîroka gelê Ereb pir êş û azaran dikişîne, ev dibe sedem ku ew parastina gelê Kurd ê perçebûyî, dagîrkerî û çewisandî mîna gelê Ereb, bike ... "(Radio Terablus).

Di Nîsana 1995an de, Qezafî dûbare pişt rast kir ku "Kurd têne çewisandin û mafê wan heye ku welatekî serbixwe ava bikin." (Ajansa Nûçe ya Jamahîriye ya Lîbî) diyar kir ku Qezafî di hevpeyvînekê bi TV-ya Elmanî re, di yekemîn şîroveya xwe ya li ser hilme û êrîşa Tirk li başûrê Kurdistanê (Bakurê Iraqê), ji bo rahêlana çekdarên PKK de got: "Divê Neteweyên Yekbûyî Kurdan biparêze û piştgiriya bide lêgerîna wan a serxwebûnê." Wî lê zêde kir û got, "Divê ez tiştêkî li ser kiryarên ku li dijî gelê Kurd rûdidin bêjim, û ez dixwazim helwesta xwe li ser vê arîşeyê dubare bikim. Mafê vî gelî heye ku mîna her gelî li ser xaka xwe bibe netewe-

yeke serbixwe." Wî got, "Ez li dijî kiryarên ku li dijî Kurdan têne kirin im, çi ji hêla Ereban, Tirkan, Îraniyan ve, an jî welatek din be." Wî diyar kir, "Ez pirsgirêka Kurdî wekî pirsgirêka Filistînê (...) wekî pirsgirêkek pîroz dibînim. Kurd di dawiyê de dê bi têkoşîna xwe serxwebûna xwe bidest bixin." Wî got jî ku hemî neteweyên cîhanê "Divê piştgiriye bidin tekoşîna gelê Kurd û ne rast e ku meriv vê têkoşînê wekî kiryarek bizdê bibîne. Derbarê neteweyeke ku dixwaze serbixwe be, têkoşîna wî pîroz e û ne bizd e, û em bawer dikin ku hemî kiryarên li dijî wan têkdiçin û mafê hemî neteweyên li herêmê tune ku fişarê li neteweya kurd bikin. Ew ji gelên ereb û tirk re gelekî bira ye." (Rojnameya El-Heyat di 20.04.1995an de).⁽⁷⁷⁾

Bi wêrekiyek bijarte û mêrxasiyek bêhempa, şoreşgerê Erebi Mu'emir Qezafî di payîza 1996an de, li ber mêvanên xwe yên Tirk (Nejm El-Dîn Erbakan, Serokwezîrê Dewleta Tirk û hevalên wî) ku bi rengek fermî serdana Lîbiya (Cemahîriya El-Uzma) kiribû, got: "Siyaseta hukûmeta tirkan li hember gelê kurd siyasetek çewt e ... û mafê gelê kurd heye ku wekî dewletek serbixwe di bin asmanê Rojhilata Navîn de, li rex neteweyên ereb û tirk, cihê xwe bigire.

Ev daxuyaniya qiselerû, suxerû û deqerû girovek gumanbirîn û belgeyek geş bû ku rêberê şoreşa Erebi ne tenê pabendî wan binçîne û rêbêrên ku wî ji destpêka şoreşa El-Fateh ve ragihandiye. Heta di demjimêrên herî dijwar û mercên tarî yên sepandina dorpêçkirina mêtîngerî ya nemirovane û xiniz li ser gelê Lîbiya-Cemahiriya, lê ew bi

tevahî ciyawaziyê dixê nav sinçên dîplomatîk ên resen û rêzdarî û xweşkirina qirêj de. Derew û durûtî, xoşxoşk û şelafî ne ku ew sinçek ji sinçên taybetmendiya piraniya serokên dewletan di dema niha de ne. Gotar û lêdiwana Qezafî, ya ku ne mêvanên wî yên Tirk û ne jî dijberên wî hêvî dikirin, wekî bombeya (Newewî) nuklerê ya siyasî heta ku wî ew li pozbilindên sexteçî û dûvikên durû yên bazirganên siyasî, li seranserê cîhanê teqand, û alavên wê yên xwendeyî, dîtbarî û bihîstwerî ew çend hefteyan deng veda bi nîgeraniya têgihelkirina bi daxbar, mendehoşî û matmayî man.

Bi boneya seredana şandeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê bi serokatiya siyasetmedarê Kurd ê navdar birêz Cewad Mela, Sekreterê Giştî yê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, seredana Mu'emer Qezafî li ofîsa xebata wî li Terablusê, di 25/01/1997an de, kir. Şandeyê Alaya Kurdistanê wekî diyariyekê pêşkêşî wî mirovê ku dixwaze ji sembola neteweya Kurdî bike sembolek ji bo dewleta Kurdistanê jî. Serok Mu'emer aliyek ji yek serî hilgirt û mamoste Cewad ew ji aliyekî din ve hilgirt, dûv re Mu'emer ala tewand û pêça û ew maç kir û li ser serê xwe danî. Wî hişt ku endamên şandê li ber lehengê Ereb û Rojhilat, Mu'emer Qezafi, bi newaziş, serçemandin û rêzgirtinek awarte hest bikin.

Yek ji çêtirîn nivîsarên li ser mijarê gotara ku Dr. Fehmî El-Şenawî, di kovara "El-Muxtar El-Islamî" de, weşandiye

(hejmar 24 sala şeşan 1985an) bi navê "Kurd Sêwiyên Misilmanan in", dibêje:⁽⁷⁸⁾

"Piştî hilweşîna Şûngirî û rabûna rejîmên jiyarî ('Ilmanî) ên netebitî ve, tu regez ji nijadên ku neteweya Misilmanan pêk tîne, bi setem û zordariya li dijî Kurdan re rû bi rû nebûye. Kemal Etatirk dest bi helmet û pelemarê kir. Ji ber vê jî, wî ew ji rojhilatê Tirkiyayê ber bi rojavayê wê ve veguhest û ew ji hev belavkirin, û pêvajoyek tirkkirinê ya bêkêmasî pêk anî. Vê kirdara pûç û tamsar, û hêj dirindayetîtir, li bakurê Iraqê hate dubarekirin. Vêga, Kurdek wekî hevkarê xwe perwerdehiyê nabîne, di kar de nayê peywirdarkirin û mîna mirovên din, ji bilî şerên domdar ên ji bo tunekirinê, şansên jiyane ji wî re nayê dayîn. Lêbelê, ev Kurd di dirêjahiya dîroka xwe de û heya kêliya paşîn şervanên misilmantiyê bûn..." (R. 5).

"Ger Kurd şer û xerabiya bêzariyê dikişînin, wê hingê ev perçeyek ji neheqî, setem û zoriya giştî ye, ku li dijî wan ji gelên misilman û tevgera misilmanî ya cîhanî hatiye rêvebirin. Hêz û hinera desthilata talankirî û heyînên ji mirovên ne xwedî maf re biriye û bi kesek hişê binve re dixebite; hiş û hestek dizek ku divê desthilata talankirî radestî gel were kirin, hema ku gel şiyar bibe. Ne xwedan, nexweşxane, dibistan, dadgeh û mafên gelekî tev nîn in, û dîsan jî yê ku li ser çavkaniyên petrolê yê li Rojhilata Navîn radizê ew e. Sêwiyek ku digel dewlemendiya xwe ji temînên hêzdarên re diçe, ku di berdêla çek, qerz, radestî, xuyangî, şahî û destdirêjîya şermokî de dewlemendî radestî dijminê dijminên xwe dike" (R.5).

"Kurd dê winda nebin jî mafê wan winda dibe. Ew dê bibin pêşengê tevgera îslamî ya cîhanî. Serbor ne di pîrbûn û şîyanan de ye, lê ew di xurtî, liberxwedan û domdariyê de ye. Yê ku zora demê dibe biser dikeve. Ew ji misilmantiyê pê ve ne zor û ne pêdarî li ber tiştêkî nasekinin. "Ev zayendê Misilman, tu carî şer li dijî birayên xwe yên Misilman bikar naniye, ji bilî di dema neteweperweriya Erebi de, tenê ji ber ku wî di wateya xwe ya xwezayî ye temîz de, tê ghişt ku ew dozek taybet e, heke li dijî misilmantiyê be, wê hingê ew rêyek ne rêya wî ye. Eger ji mafê Ereban be, ku li ser neteweyek û dewletek wan hebe, kar dikin û dixebitin. Ma çima wê ji kurdan re jî nebe, wekî ku ji Ereban re dewletek neteweyî hebe?. Tiştêk ji setem û zordariya Ereban a li hember birayên wan ên Kurd zelaltir nîn e. Ji vegotina Misirî ya pîr xweşik zelaltir nîn e. Di dema ku ew mafê bira, cîran an hevalê xwe paşguh dikin, dibêje ku ew wî (istikrad) dike; ango, ew wekî Erebi bi kurdan re sewdakirin û tevdigerin. Ev şayetîdan û şehda mirov, xelkê gelêr û bêguneh a her armancê ye ... "(r.6)

Di nameyek ku Dr. Fehmî El-Şenawî ji Kongreya Niştimanî ya Kurdistanê ya Yekem re şandibû, di Tebaxa 1989an de, li London hate lidarxistin û ji hêla kovara "Cûdî" ve hate weşandin, berdevkê Partiya Misilmanî ya Kurdistanê "Hejmar 13, di sala 11/1991an de, ku tê de hate gotin:

"**Ey birayên Kurd:** Min berî çend salan nivîsandibû ku Kurd Sêwiyên Neteweya Îslamî ne û mafên wan baweriyek e di stûyê vê neteweyê de. Divê hûn li wan vegeîn, û dem

hatîye ku vê bawerîyê vegeerîn. Lê, her ku zanîna min li ser doza we zêde bû, rastiya jêrîn ji min re diyar bû:

"Hûn serê rîma îslamê ne. Ger hûn yek bin, dê azadî were gerandin. Heke hûn ji hev perçe bin, ewê bigihê laşê rimê bi tevayî û wê dawîya wê jî bê. Hûn civakek îslamî ne paqij in, bêkêmasî ne. Hûn civaka misilmanî ya herî temîz, birûmet, û herî xanedan in. Hûn nûnertiya rastbûn û parastina misilman û raje û peywira wê de ne, an ez pêxemberiyek bivênevê ku pê pêşbînîm:

Hûn dê vî gelî bikin yek. Ango, yekîtiya neteweyî ji yekîtiya we dest pê dike. Berevajî vê yekê jî rast e. Heke netewe yek be, hûn dê bibin yek, û di her du serûber û bûyeran de jî, hûn ji bo gihîştina vê yekîtiyê pîvan in.

Ji wê yekê ve rastiyeke bivênevê derdikeve holê ku her serwerê jiyarî yê ku dewleta xwe bi rûxandina misilmantiyê re ava dike divê ew lêkdankirin û ji bo tunekirina we bixebite. Ev rastiyeke fîzyolojiya misilmantiya siyasî ne. Ev di misilmantiya siyasî de, destwerdanek hevkeşî ya bingehîn a bîrkariyê ye. Ev ABC ya damezirandina dewleta misilmanî ye ku divê her siyasethedarek misilman, çî fermandar an fermanbarek be tê bigihêje.

Di dawiyê de, ez ji we tîka dikim ku hûn li ser têgihîştina tevahî neteweya misilmantî, nemaze serkirdayetiya wê bisekinin, ku ji bilî bi yekîtiyek Kurdî yekîtiyek misilmanî tune ye, û ev çareseriyê rast a pîrsa misilmanî ye. Yekîtiya Kurd maf, erk û peyamek dîrokî ye. Xwedê bi we re ye û

Xwedê ji wanên ku piştgiriya didin wî re bibe alîkar. Xwedê hêzdar û xoşewîst e".

Kovara Misilmanî El-Telai'i (El-Raid), ku bi serperîştîya Dr. Selah El-Dîn Necdî, ya ku ji hêla Mala misilmanî ya ragihandinê ve li Vîrzin, Elmanya tê weşandin, di hejmara /34/ 1991an de, gotarek di bin sernavê (Bobilata Gelê Kurd ê Misilman), ku tê de hatiye gotin:

"Dijminên Misilmanî û Misilmanan, bi takekesî û bi komî, ji bo ku gelê misilman perçe bikin û gelên wê ji hev tarûmar û veqetînin, bi rêbazên cûrbecûr ji bo bindestkirina wî ji hêzên pozbilindiya cîhanî re tevgeriyan.

Van çalakiyan hemî ji nexşeyek bi tevayî hevkar û pêkvehatî, derketin ku şerê misilman û mirovên wê bike, û dixwaze welatê wan bi dest xwe bigire û dagîr bike, çavkaniyên aboriya wî yê bingehîn û ji hemî serxak û binxaka wê mifa bibîne...".

"... û xelesa wê nexşekêşê bi demê re dom kirin û bi dagîr kirina rasterast a welat û desteserkirin û zalgehkirina aborî, rewşenbîrî, siyasî û ragihandinê ve bi dawî bûn. ...".

" ...Dema ku gelç, gelacî û bişêwine, di nav gelên Misilman de, derdikevin dagîrkerê rojavayî sûdeyê jê werdigire. Ger gel qels bibe û têk biçe, ew êdî di pêşerojê de, ji bo Rojava metirsî nîn e. Ger ew pîşesazî paşmayî û têk biçe, di cîhana pîşesaziyê de, ji bo Rojavayê pêşketî, di rewşek peyrewkirî û paşkoyetî û pêdiviyê de dimîne. Eger

şer û ceng di navbera wan de derkeve, ew dibe sûk û bazarek çekan re ku ji hêla kargehên çekan ve li Rojava têne duristkirin û berhemdayîn ...".

"... axaftina me ya di derbarê gelê Kurd ê Misilman de, mînakek berbiçav e ya her tiştê ku me diyar kirye. Piştî dabeşkirina welat û danîna sînoran, xuya bû ku gelê Kurd ê Misilman li pênc welatan hate dabeşkirin: Tirkiye, Iraq, Iran, Sûriye û Ezerbeycan. Li her beşekî ji welatê perçebûyî (Kurdistan), ji aliyê gelê serdest ve ku li welatê kurdan, bi hev re dijîn, an li dervî welêt cînarê wan in, rûbirû setemkariyê li wan dikin. Her welatek ji van welatan hewl dide ku kî ji nav kurdan karibe dijminên xwe li welatên cîranan bixe, di berdêla sozên vala de ku tiştêk pêk nayê. Rewşa kurdan bûye ku ji van sînoran wêdetir, têkiliya Kurdan wek mirovê noqbûyî, binavbûyî be ku ji her derê bi mirinê dorpêçkirî bûbe. Bi hêviya rizgarbûnê, ew destê xwe davêje her tiştê ku pêrgî wî dibe. Tiştêk xwezayî ye, ev rewşa gelekî be, ji pêvî rizgarbûnê, cihê rêdana ramaniyê di jiyana xwe de, nabîne. Heke pêlên deryayê wî bavêjin aliyekî ji peravan, ew xwe di nav lepan girtî û di binê hêrsên nerazî ji xwe ya ji ber alîgiriya xwe ya li hember dijminê xwe dibîne ...".

"... û komin ji vî gelî dûrî misilmantiyê ketin û pêşveçûn, ji ber giraniya şalaw û hilpekî, û bênerixkirin û wêrankirinên ku ji mêj ve li gelê Kurd ê misilman, ji alî Misilmanan bûne, bi mebesta ku nasname û kesayetiya wî ji holê rakin. Komên wî li pey dirûşmên xapînok ên bang û daxwaza Markisî,

neteweperwerî û jiyariya (İlmî) ku hewl didin van koman bikişînin ji bo berjewendîya Rojava di bin diruşim û perdeyên cûrbecûr de ...".

Di hevpeyvînekê de, digel birêz Mehfûz 'Ezam, parêzerê ku ji 19/21 Çile 1990ê de, li Kolon, Elmanya, di Yekemîn Konferansa Misilmanî de, ya ji bo doza kurdî, Partiya Karkeran a Misirî nûnertiya wê kir. Partiya Karkeran yek ji wan partîyan bû ku tevgera misilmanî ji 1987 ve dameziran-dine. Birêz 'Ezam helwesta xwe di derbarê pîrsgirêka Kurd de wiha ragihand:

"Pîrsgirêka Kurd ne pîrsgirêkek bû ku di nav pisporên karûbarên misilmanî de agahdarî an guhdanek gelemperî an tevahî bibîne. Dibe ku ev ji derfet û sedemên dorpêçkirinê be. Ev ji hêlekê ve, û ji hêleke din ve, berî ku ez bêm konferansê, ez neçar mabûm ku hemî agahdariyên ku ez dikarim li ser vê pîrsê bidim hev, berhev bikim. Ev tiştên ku min kom kirin her çend ne bes bû ku ez ramanekê têr û tije ya pîrsgirêka Kurdî bidim. Lê têgihîştina min ji vî konferansê re, ew hewldanek e ji bo berhevkirin an komkirina têgeheke an diruşmeyeke misilmanî ji bo tevgera Kurdî ye; û min jî hest kir ku di navbera gelek rûbaran de, hevrikiyek pîr mezin heye ku ev tevger di navbera çep û rast de şer dike. Mixabin, di nav vê nakokiyê de, di nav wanên ku şerê tevgerê dikin, ji hundirê tewjima misilmanî bixwe ne. Ez bawer dikim ku karê me yê bingehîn ew e ku em rûbarên ku ji pêwîstiya çareserîya misilmanî ya di nav tevgera Kurdî de

bawer dikin yek bikin, û piştgiriyeke wateyê ya têra wê bike, bidinê... ".

Di hevpeyvînekê de, ku ji hêla "Kovara Kurdistan a El-Mucahid" ve ji aliyê Partîya Misilmanî ya Kurdistanê ve, bi birayê Filistînî Dr.Hemdî Murad, ji Pakistanê ye, ji bo doza Filistînî û Kurdî, hejmar: 2. Adar. 1992an, rûpel: 57, hatiye weşandin. bira Hemdî got:

"Bi rastî, dema ku em li ser pirsgerêkên Misilmanan daxivin, pirsgerêka Kurdistanê wekî yek ji pirsgerêkên vî gelê westiyayî û birîndar derdikeve pêş. Ew ji bo kesên ku di derbarê pirsgerêkên Misilmanan de dizanin, ne veşartî ye ku Kurdistan êş, azar û nehametên xwe hema berî pênc sedsalan dest pê kir, û piştî hilweşîna Şûngirî derket holê. Em dibînin ku hilweşîna Şûngirî di 1918an de, bi rengekî sade pêk hat, û ku bi rengê xuyanî di dema daxuyaniya Etatirk ê Cihû, di 1924an de bû. Dabeşkirina Kurdistanê ku di sala 1918an de, bi zordarî û dijminahî hate kirin, perçeyek ji nexşekêşa Xaça Navneteweyî, Cihûtiya cîhanî, û dijminên misilman û mêtîngeran bû ku, koş û hewlên neteweya misilmanî ji hev belav bikin. Desthilatdariya li ser gelê Kurdistanê yê misilman û dabeşbûna wî ya li pênc welatan, ji bo bînirxkirina gelekî misilman bû, ku di dîroka misilmanî de bi hişkbûn, pêdarî, serbilindiya bi ola xwe û bi serhişkiya xwe naskirî ye. Li beramberî her destdirêjiya li dijî mal û rûmetên misilmanan, pîroziyên misilmanan, û tekoşîna bi rengê ya Selah El-Dîn, ne li ser gel û dîroka wî, di veşartî an dûr de nîn e. Ji ber vê yekê mêtîngerî bi rastî dizanibûn ku

wateya gelê Kurdistanê yê misilman e heke ew dewletek serbixwe damezirîne, ji ber ku ew li ser tixûbên wê nesekine û bi qeşmeriya mêtîngeran di dabeşkirina neteweya misilman de nepejirandî ye; lê dê bixwaze van sînoran bişkîne û lihev veke da ku, yek welatê misilmanî û yek neteweya misilmantiyê pêkbîne, û nexşekêş û planên dijminên misilmantî û Misilmanan hilweşîne. Ji ber vê yekê, ev nexşeya dabeşkirî nexşeyek kirêt bû ku li hember hevûdu misilmanan bihevboxin; hewildanek e ji bo zelîkirin û bindestkirina vî mirovê tund, û her weha ji bo desthilatdariya dûvikên vê mêtîngehkariyê ku wî hişt zilamê wî zordariyê li vî gelê Misilman bike. Vêca, em hay ji dûriya metirsdarî, armanca qirêj a mêtîngerî û nexşeya dijwar û çetîn a ku li dû wê bû, piştî belavbûna vî gelê Kurd ê misilman li pênc dewletan, hemî rêzgirtin û pîroziya misilmanek an ola wî nakin.

Em dibêjin erê ew bi rastî kiryarek berevajî misilmantiyê ye, û cihê mexabiniyê ye ku van hikûmetan, çî li Tirkiye, Sûriye, Iraq, Îran an Rûsyayê bin, tucarî di peywira dijminê misilmaniye de kêmasî nekirin. Ziyane didin vî gelê Misilman, wî perçe dikin, hewl wî didin paşguh bikin, û jêbirin û sirîna ruxsar û taybetmendiyên wî yên misilmantiyê, dîrok û şaristaniya wî ya ku ji şaristaniya mezin a neteweya misilmantiyê ya gewre nayê veqetandin, ji holê rakin. Ji ber vê yekê, wî hest kir ku yekirina van pênc beşan dikare ji van welatên ku li ser vî gelî serdest in, pêşniyazkirina mirovahî bîne. Di derbarê siyaseta kotekî û destavêtinê ya ku gelê Kurd dikişîne, Dr. Hemdî Murad dibêje:

"Bi rastî, ya ku me di pirsek berê de, li ser tiştê ku li Kurdistanê hatiye dabeşkirin, têr kir. Em careke din dibêjin ku destdirêjayî û bêsinciya di misilmantiyê de, bê guman yek ji wan azîna oltêgehiyê ye ku di têgehiştina têkrajî û zagona lihevkerinê de rûdayî ye. Zanayên gel bi yekdengî li hev dikin ku destdirêjayî qedexe ye. Destdirêjî zînat e, û şerê li dijî mêtînger têxwestin û pêdivî ye an têrbûnek û desthilatiyeke takekesî ye, li gorî gengaz û pêkana paşve-xistin û vegerandina zor û setema mêtînger e. Heke mêtînger kok û bingeha mêtîngerî bi xwe yê ku Kurdistan parçe kiriye be, wê hingê ne gengaz e ku kesên doza misil-mantiyê dikin berdewamiya vê destdirêjayî û desteserkerinê bi cih bikin.

Ji bo pirsek li ser helwesta wî di derbarê projeya Partiya Misilmanî ya Kurdistanê de, ji bo damezirandina dewleteke misilman e, Dr. Hemdî Murad dibêje:

"Ez poşman im ku hin Misilman, bi awirek netêgihîştî, diramin û banga tevgereke misilmanî an partiyeke misilman ku li welatê xwe misilmantiyê saz bike, li tixûbên wê neçar bûn an tixûbên wê jê qut bûn. Heke ew li ser tixûbên din be, wekî ku ew bangê herêma ye. Ya rast ev e ku kî rewşa misilmanan hizirtêkirin, bi tevahî durist e ku gengaziya bicihanîna banga damezirandina Şûngiriyek ji bo yek milyar û du sed milyon misilman bangê e ku tenê bi rahênanî bi gavên tevdirkirî, wekî projeya Partiya Misilmanî ya Kurdistanê ye. Ez bi rastî bi haydarbûna vê partiyê û têgihîştina wê ji hêla qonaxeka bi bandor a çalakiya misilmantî û veguherîna wê

di pêkanîn û sepandina têgehên misilmanî de, bi regekî ku bi rahênanek ber bi armancên vê olê ve, di damezirandina dewleteke misilman der dilxweş im. Dewleteke berfireh a Xîlafe, bi rêdana Xwedê, li ser bingeha ku her gelekî misilman tevdigere, dide, fedakar dibe, tê dikoşe, û dewleta xwe ya misilman, a bi rastî azad saz dike, yê serbixwe, bi rastî bi heyber be, bi rastî delal be; dûv re deriyê alîkariyê ji birayên xwe yên li dora xwe re vedike û hwd. Da ku dewleta mezin a misilman, a ku tê xwestin, û bi hêviya Xwedê, ku ji hemî cîhana misilmantî tê de cih digre. Ji ber vê yekê, ez bi rastî dibêjim ku ez bi vê haydarbûnê kêfxweş im, û dixwazim her kesê/a ku dihizire an guman dike ku ev daxwazek herêmî ye an regezî ye. Ez hizir dikim ku wî nehingavt, li armancê neda û çênebûya ger wî ew tiwêje bikira çi li ser navê birayên me yên li Kurdistanê, an jî her gelekî misilman ku dixwaze dewleta xwe ava bike. Li vir pirsek min jî heye: Gelo çima li ser birayên me, li Kurdistanê, ev gotin tê gotin ku ew herêmparêzî an demarîbûnê dikin? Dema ku ew vê yekê dibêjin, çi li ser vê yekê hate gotin dijî hemî kesên di warê misilmanî de, li welatên misilmanan de, dixebitin? ...

Nêzik e, ne dûr e ku Efxanistan dewleta xwe ya misilmaniyê ava bike, Xwedê bike. Ma gelo dibe ku meriv piştrast bike ku hene yên peydakirina rastiyê dikin ku tekoşîna gelê misilman li Kurdistanê, û daxwaza wê bernameyên herêmî, regezî an bernameyên din in? nabe. Ma gelo li ser misilmanên ku li Filistînê ne wisa bê gotin û piştrast kirin, tişteki rast e?. Ew qet nabe û hwd! Xwedê gavên projeya Partiya Misilman ya Kurdistanê pîroz bike.

Em ji Xwedayê mezin daxwaz dikin ku ew di zûtirîn dem de bicih bîne, da ku hikûmeta misilman li Kurdistanê were damezirandin û bi hêza Xwedê, ji bo xweşî û aştiyê, wê bibe maka tevgera misilmaniyê ya cîhanî û yê derdora wê..".

Kek Ebdul-Hemîd Mehmûd ji Cezayîrê ye, endamekî çalak ê Encûmena El-De'ewe ya Misilmanî ye. Di bersiva xwe ya pirsekê de: Gelo ew piştgiriyê dide dewleta Kurdî heke misilmanî be? got: "Ez hizir dikim ku li ser vê yekê nakokî nîn e. Ez hizir nakim ku yek ji misilmanan wê binpê bike û ku ev dewlet di nav dewleta xelîfetiye ya mezin de be. Baş e ku Kurd xwedan dewleteke misilman bin, mîna dewleta ku nuha heye, û çima Kurd careke din wek Selahedîn pêşengtiya xelîfetiye nakin, û ev jî gengaz e. Em bi dewleta Kurd a misilman re ne, eger ew di şêweyê xwe yê îroyîn de be, yan jî dewleteke misilman di nav dewleta Şûngirî ya mezin de be. Ez dibînim pêwîst e ku Kurd berê xwe bidine gelên misilman, ji ber ku gelek ji gelên misilman pirsgirêka Kurdî nasnakin; û ji bo vê yekê, divê ew pêwendiyê bi birayên xwe re ava bikin, û ew hewl bidin ku, bi riya danûstendinê doza xwe bi wan bidin naskirin.

Birêz Ehmed Behcet, ji beşa El-Ehram li Qahîre, pirsek di derbarê yekem Kongreya Misilmanî ya li ser pirsgirêka Kurdî jê hate kirin, got:

"Kongir bobelata gelekî Misilman diyar dike. Ew jî gelê Kurd e, û ew hewl dide ku, bi riya ramanên cihêreng ên celebên cihêreng ên beşdarên re, di nav wan de, hejmarek mezin ji zanyar, ramanwer, parêzvan, dadger, û kesên ku

dixwazin çareseriyekê ji pirsgirêka Kurd re peyda bikin. Pirsgirêkek rasteqîne ye. Pêşî li bext û wijdana misilman re wek yek e berî ku ew bi bext û wijdana cîhanî û nirxên jiyane yên pîroz re yek bin, ê ku ji her gelî re berdest e ..".

Mamoste Îmad El-Dîn El-Huseynî ji bo Kovara Kurdistan a tekoşer, jimara 5an, gotarek bi navê "Carek din: Bi Kurdan û Doza wan re" nivîsî û tê de got:

"Ez di destpêkê de, dipejirînim ku min wek tê xwestin, girîng û baş bala xwe neda pirsê Kurd, êşên wan ên tûj û arîşe û mafê wan ê wînda yê desteserkirî. Di dehsalên borî de, ew ji du welatên Ereb - Sûriye û Iraq - Tirkiye û Iran, êş kişandine. Ew welatên ku di her welatekî ji wan de, perçeyek ji xaka Kurd û welatê wan bi navê Kurdistanê tê parvekirin. Sedem ew e ku min ji nerîn û dûrbînek çewt ve li pirsgirêka Kurd mêze dikir. Mîna wan kesên ku gazin û rexneyan li min dikin re dihat dîtin, û hîn jî gelek bi vê dûrbîna çewt û bi pîvaneke berevajî li pirsgirêka birayên Kurd dinêrin. Bi dadperwerî û dadmendiye lê mêze nakin! Berevajî ya ku ew li pirsgirêkên neteweya misilmatiyê û bobelatên wê dipîvin, wek pirsgirêkên Filistin û Efxanistan - berê - û Keşmîr. Bosna û Hirsik dinêrin. Bo nimûne, tevgerên misilman di cîhana misilmanî de, bi hemî piştgiriya giraniya siyasî, ragihandin, çapemenî û diraviyê, pirsgirêkên navborî, di nav wan de, serxwebûn û mafê van gelan e xwe bi xwe birêve bibin. Çarenivîsa xwe diyar bikin û dewleta xwe li welatên xwe saz bikin û êrişker û dagîrkeran ji wan derxînin. Ev helwestên birûmet û herheyî ne. Lê sed

mixabin, tevgerên misilman pirsgirêka Kurd di çerxa ku tê de pirsgirêkên navborî lê hatine danîn, nabînin. Lê belê, ew bi dilsoziya mirovî razî ne, bi nîşana carinan an daxuyaniya li carên din ku gumana Kurdan û (cûdabûn)ê heye, gef li ewlehiya gelan e, û yekîtiya wan û dewletên wan di metirsiyê de ne. Ew bi du qapanan dipîvin."

Ew dibêje: "Bi vî rengî, min gelek caran bi birayên Kurd ên xwedî ramanên jiyarî re hevdiîtin kirin û bi wan re peyivîm, û di derbarê pirsgirêka Kurd de, bi min re axivîn, û min gelek tiştên ku ji me, lawên tevgera misilmanî re, pir encamên girîng dan, di nav de, ku birayên Kurd ên tevlî nav refên partiyên çep û yê din bûbûn. Ew bûn sedemên ku tunebûna haydarbûna misilmanî û têkçûna tevgera misilmanî ya ber bi wan ve, ne pejirandin, û parastina pîrsa Kurdî û berevaniya mafên rewa yê Kurdan û daxwazên wan, ên dadperwer, di mafê çarenûsî de, ji aliyê siyasî ve..."

Ew li cihekî din berdewam dike, "Divê em vê rastiyê ji dest xwe bernedin ku îro di nav Kurdan de, wekî duh, kesayetiyan misilmanî yê baş ên zana, ramanwer, zanayên zanistî û daxwazên bilind hene ku ji nêrîna misilmanî ji bo doza xwe dixebitin ...".

Mamoste Îmad El-Dîn El-Huseynî bawer dike ku divê pirsgirêka Kurd bi çareseriyek misilmanî were çareser kirin. Ew dibêje: "Her çend pirsgirêka Kurd bûye pirsgirêkek navneteweyî ye girêkûtî, lê ew bi misilmaniyê û çareseriyên wê dikare were çareser kirin. Eger em di mafên neyînî yê Kurdan de, dadmendiya pêk bînin, û ev ne xêrxwazî ye,

em dikarin xêra bidin wan wek ku ew misilmanên Sunî û civatî ne di pirraniya wan de. Ew jî perçeyek ji welatê mezin ê misilmaniyê ne, û armanca ku Kurd dixwazin çi ye? Yekbûna parçeyên Kurdistanê û damezirandina dewleteke siyasî ji bo wan e. Kîjan welat wan dike yek û wan ji êrişkariyên dijminan diparêze, ji bo digel cîranên xwe yên Ereb, Tirk û Faris, li ser vê yekê bi aramî, aştiyane û rêzgirtinê bijîn; û tu nemerdkirin û hewesên wan di axên van gelan de nîn in. Belê, dewleta serdest a li ser van gelan ew e ku xaka Kurdan û deverên welatê wan dagîr dike, û di welatê wan de, wan tarûmar û talan dike; bi komkujî wan dikuje. Rojekê ji rojan, me nedît û nebihîst ku Kurdekî êrîşî Erebeke li Şamê, Besra an Bexdadê kiriye, ne jî êrîşî Tirkekî an Farisekî, li bajar û warên wan kiriye. Rastî ev e ku ew di parastinê de bûn, û hîn jî hene, setemkarê ku hilme, êrîş û zorê li wan dikin û xaka wan vegirt û dagîr dikin, ew xwe ji wan dûrdikin û xwe diparêzin...".

Birêz Hesên El-Elewî, nivîskarê Be'esê Iraqî yê berê, li ser Kurdan dibêje: "Kurd carek jî daneketine şerê Ereban, lê ew desthilata neteweyî ye ku tê bi wan re şer germ dike."

Li ser erkê tevger û hêzên misilmanî li hember gelê Kurdistanê, mamoste Îmad El-Dîn El-Huseynî dibêje:

"Erkê yasayî peywir dike ku tevger û kesayetiyan misilman, û welatên Misilman jî, bi xwerist û wêrekî pirsgerêka Kurd bipejirînin û serxwebûna Kurdistanê û piştgiriya wê ya giştî û fermî ji bo wê yekê bipejirînin, da ku wê ji dagîr kirina dewletên cîranên xwe rizgar bikin. Kurd dewleta xwe

ya serbixwe damezirînin. Ji bo misilmanan, hukûmeta Kurdan, digel hukûmetên gelên din ên misilman, dê bibin beşên şûngirî, xelîfetiya gewre û dewletên wê, li cihê ku Kurd ji tekoşînên xwe yê rabirdû, rojgar û niho, vêgavê armanc digirin. Çareseriyeke dadmend bi vî rengî, û wekheviya rastîn a bi gelan re pêk were, û misilman sembola wekhevî, dadmendî, biratî, yekîtî û yekbûna gelên neteweya misilmanî ye ku, ji hev bi dek û dolab û pîlanên mêtingera Rojava hatine veqetandin.

Kovara Kurdistan a tekoşer, Hejmar 3, li ser pirsgirêka Kurdî û çareseriya misilmanî bi mamoste Îmad El-Dîn El-Huseynî re hevpeyvînek weşand, ji ber vê yekê mamoste Îmad El-Dîn rastî gelek şer û tawanbariyên mezinkirina riwîdanê-neteweperestan hat. Şêx Mihemed Huseyîn Fedilallah, yek ji zanyarên Libnanî, di peyamek bihîstwerî ya ji bo serkirdayetî û hevalên tevgera misilmanî li Kurdistanê de, ku ji hêla rojnameya "Kurdistan" ve hate weşandin, Hejmar 4 di Nîsanê 1994an de, ku ji hêla Navenda ragehandina Kurdî li Nerwêcê ve hate weşandin, dibêje:

"Ez guman dikim ku gava gelê Kurd ê Misilman dest bi liberxwedanê dike, ew ji helwesta veğerandina setemkariya ku li mirovahî û çanda wî tê kirin, dibe, ne ji tentêla nîjadperestî dest pê dike ..." (r. 4)

Ew jî dibêje:

"Em dibînin ku gelê Kurd bi çewisandinê re di asta siyasî, aborî û çandî re, ji yekê pirtir war jiyaye. Her weha li

herêmê gelên din jî hene ku çewisandî jiyane. Li gorî nîr û mercên ku setem û zordarî vediguhestine, li aliyekî û li ser aliyê din rê venekirine. Geşedanan nîr û mercên nû çêkirine gihîştine asta ku herêma kurdistanê veguheriye mîna herêmeke xweser. ” (Çavkaniya berê).

Birêz 'Adil Selman ji London "Sedemên Bobelata Kurdî", li ser rûpelên kovara El-Islah, Hejmar 157 Zul-Qude di 1411an de, dibêje:

"Bobelata birayên me yê Kurd sê hêman û alav hene ku sê kirdar li pişt wan radiwestin: Ev gel gorî û qurbanê yek ji wan hukûmetan e (mebesta wî hukûmeta Iraqê ye) ku misilman êşandine. Ew hukûmetên ku bi hemwelatîyên xwe xwedê li Xwedê negirtin û peywira ewlekariya ku ji wan re hat spartin pêk nanîn ku bi dadê mijarên xwe bixapînin, rûmeta xwe, maf û berjewendiyên xwe biparêzin. Tiştê ku bi çavên serê xwe me dît, bê desthilat çî bi serê welatîyên xwe dike. Lê ew mînakek berçav ya desthilatê ye tiştê ku Xwedê daye gel di warê mafê rawêjkarî, sansorkirin û arastekirinê de digire dest. Ev nimûne, her çend ne tenê ya ku di cîhana me ya misilmanî de vê rêbazê digire jî, lê mînakeke tundrê ya ji bo ramalîn ji rêbaz û nêzîkatiya Xwedê ya di desthilata gel de ye. Pergalên ku kesayetên mezin û bi rûmet dikin, û doza raspardeyê li mirovan dikin, nirx, hejî û şayena gelê birêvebirina karûbarên xwe, biryara çarenûsa wê, û rêbaz û riya wê rezîl dikin. Pêdivî ye ku pergala van taybetmendîyan wêneyên têkçûn û hilweşînê çêbikin, û wêneyên bobelatên li dijî hemwelatîyên xwe xurt bikin, wekî ya ku

me dîtiye, hestên me hejandiye û hestên nerazîbûn û hêrsbûnê di hundirê me de derxistiye holê. Wekî duyemîn hêmana ku bûye sedema bobelata Kurdan, ew ramana neteweyî ye û dilsoziya ji nijad re ku rêbaza gelek welatên herêma me li ser wê bingehê digire, ew ramana ku bi dilsoziya bi misilmaniyê û biratiya olê re dilsoziya bi nijadî xomilbûn û hatinarêzê ya ji bo bineçe û xanedanî re ketin şûna wê, wan welatan girêdana misilmaniyê re ya ku Xwedê çêkiribû bi gotina: (Bawermend birayên hev in) (إنما المؤمنون إخوة) helweşandin. Pîvana ku misilmaniyê ji bo berawirdkirinê pejirandî paşguh kir ((إن أكرمكم عند الله أتقاكم)) wê neteweperwerî kir bingeh, û hatinarêza regezê bû pîvanek. Lewma, kesê Kurd li welatê xwe bû biyanî an jî hemwelatîyekî ji çîna duyem, mîna ku ew ne misilmanê ku Xwedê ew bi misilmantiyê re rûmetdar kir, û bi rûmet jê hez kir ku bibe yê wî. Kurd, Ereb, Tirk û Faris bi dirêjîya demê wek birayên hev bûn û ji hev hez dikirin, di bin sîwana alayê misilmaniyê de jiyane. Tu qenciya Erebekî ji yê ne-Ereb, ji pêvî ayîndarî nîn e. Roja ku misilmanî ji rastiya jiyane hate derxistin, û xîlafeta wê hate rûxandin, mêtîngerî tovên wê dara pîs li welatên Misilman avêt. Pilana perçekirina cîhana misilmanî li ser navê ramanên neteweperwer hate cîbicîkirin, ku ji bilî girtinhevê û kîna di navbera misilmanan de, û setem û zora li ser komekê ji wan, bi sedema van tiwêjên sexte tiştekan nehilberand.

Di çêkirina vê bobelatê de, hêmana sêyemîn berjewendiyên sereke ne ku qeyranan dafirînin, tovên nakokî û pirsgirêkan diçînin, paşê werin encamên xwe veberhênin û

rastiyên xwe di berjewendiya armancên nêzîk û dûr de ji bo wan bigirin. Van berjewendiyan çav ji bobelata gelê Kurd a di gelek salan re derbas bûye girt, roja ku hesabên têvil bi pergala ku Kurd bi dijwarî û tundî êşandin, hebû.” (Binihêre:Rû. 30-31, kovara El-Islah 157-1411).

Mamoste Xalid El-Qaşînî di derheqê gelê Kurd de, di Rojnameya El-Şerq El-Ewset, hejmar 4534, di 21. 4. 1991an de, di gotara xwe de, wiha dibêje: “... û di nav gelên din ên misilaman de, min jî dît ku Kurd di kûrahiyê de, bêhempa ne, ji baweriya wan û dilpakiya wird, nivêj û peristiya wan ên yekane ne. Ji ber vê jî, ez kûrbûn û dilpakiya baweriya wan erê dikim ...”. Ew di derheqê giyanê kurd de ku setem û koletiyê red dike û dibêje:

"Di nav dehan ji tawanbarên ku anîn dadgeha Mehdawî (û ew axivîna dadgehên tunekirina dijberên siyasî di dema setemkar Ebdul Kerîm Qasim li Iraqê dike). Tu kes bi qasî dilêrî û mêrxasiya ku siyasetmedarê Kurd Se'îd Qezaz kir û wêrek ma, nebû. Iraqî hîn jî gotinên wî yên li dadgehê bibîr tînin: "Ezê bi sêdarê ve bême dan û di bin lingên xwe de kesên ku nehêjayî jiyanê ne bibînim. El-Mehdawî bersiva wî da û got: Ev gel e. Wî jê re got: Ev xirpîn, herçî û perçiyê gel in ... "(78).

Mirov hewes dike: Gelo misilmanan bi gelemperî bi mezinahiya bobelata ku gelek tûşî wê dibe (ev taybetmendiyên zarokên wî ne) tê digihêjin. Ma ew dikarin sawêr bikin ku dê çî bibe heger ew hezkirina birayên xwe yên misilman, û têgihîştina wan ji pirsgerêk û bobelatên wî yên

ku ji her alî ve dorpêç dikin û wan rojane dijîn, winda bike? Pexîşnameya Misilman û Filistînê, di hejmara xwe ya 25an de, li ser Şe'ban 24, 1410/ di 21ê Adara 1990an de gotarek li ser pirsgirêka Kurd û pirsgirêka neteweyî bi serenava: "Pirsgirêka Neteweyî li Cîhana Misilmanî: Mînak Kurdistanê", dibêje:

"Ji ber sedemên derveyî (Saykis-Bîko) Kurd û Filistînî ji projeya nûjen a dewletê ya parçekirinê derxistin. Ji ber ku Birîtanî ji destpêkê ve pîlan û nexşekêşek ji bo Filistîn welatek neteweyî ji Cihû û tevgera Sehyûnî re be danî. Kurdistan jî, ji ber herêma Kurdan di nav erdnîgariya herî aloz û girêkûtkî ya ku cîhanê nas kiriye de, hate dîtin. Beşek jê di hundurê Iranê de bû, ku wek dewletek berî (Saykis-Bîko) hebû; beşek jî, ku ya herî mezin e, ji serkirdayetiya Tirkiya nûjen re hat dayîn da, piştî wê hilweşandina Şahîşahiya Osmanî û tunekirina xelîfetiye pejirand. Beşa din a mezin, li gorî têgihîştina taybet li ser mijara çalên neftê, di nav tixûbên Iraqa Birîtanî de, hat danîn. Parçeyên Rûsî û Sûrî ji wê çarçova giştî derneketin. Bi gotinin din, dayîna kurdan dewleteke bi serê xwe tê wateya tevliheviyek mezintir di tevahiya projeya dabeşkirinê, ya ku ji hêla du welatên serkeftî ve, Brîtanya û Frensa, hate kirin. Wan herdiwan dît ku ew pêdivî nîn e. "Di derbarê tekoşîna neteweyî ya Kurd de, Pexîşnameya Misilman û Filistînê wiha domand:

"Di şêst salên borî de, hêzên Kurd ên neteweperwer ji bo mafên neteweyî yên Kurdan şer kirine. Çemeka wê di pir

rewşan de, di dadweriya wê de, berbiçav bû. Eger herê mê pergala neteweyî-welatî ya dabeşkirinê pejirandiye, wê hingê çima gelê Kurd ji mafê damezirandina dewleta xwe bêpar e?

Bijareyên neteweyî yên Kurd ên jiyarî, di pir qonaxên tekoşîna xwe de, baş zanibûn ku tixûbên Saykis-Bîko, bi destê hêzên derve çêbûne, û rejimên herêmî tu têkiliya wan bi vê yekê nîn e. Ji bilî têkiliya cerdevanê dilsoz bi biryara derveyî ya sepandîkirin re ye. Ji ber vê yekê, di pir rewşan de, daxwazên Kurdan bi xweseriyê an bi teşeyek ku di dûr de ye, di navbera yekbûn û veqetînê de bi sînor bûbûn. Li ser gelê Kurd - di teşeya xwe ya neteweyî de - ev nakokî û milmilaneya Misilmanan bûye sedema gelek bobelatên mezin, ji talankirina bi hezaran jiyar bigre heya zindan, êşkence, hejarî û bêparkirina ji mafê xwendin û jiyaneke guncan de, dikişîne. Di dehsalên paşîn de, hilme û êrîş li dijî gelê Kurd ê Misilman zêde bû, ew jî bi sedema pirsgerêka wî ku pir belav bûye û deng daye, tu carî weha diyar nebûye. Ev - nemaze - digel rewşa pêşketin û vejîna misilmanî ya hemî deverên dewleta perçebûyî ya nûjen di cîhana misilmanî de, girtibû ..".

Bi vî rengî, em dibînin ku sedemên perçebûna Kurdistanê, ji bilî sedemên taybet yên li Kurdistanê, sedemên derveyî û dervî viyana gelê Kurd in. Li ser vê mijarê, birêz Ebdullah Abdul-Rehman di kovara El-Islah de, di hejmara 156 ya Şewal 1411ê koçî de, gotarek bi navê "Pirsgerêka Kurd, di

Navbera Rêjeya Neteweperest û Çareseriya misilmanî de" nivîsand, ku tê de dibêje:

"Koka dabeşbûna herêma kurdî di serdema nûjen de, ji ber nakokiyên ku di navbera Şahişahiya Osmanî û hukûmetên Farisî (Sefewî) de, rûdane ye. Kurdistan bi xwe bûbû meydana şerên di navbera van her du welatan de rûdidan, û yek ji bandorên wê perçekirina Kurdistanê û ji holê rakirina mîrnişînên Kurdan yê serbixwe ku mabûn. Ji ber ev mîrnişîn xwedan serxwebûnek berbiçav bûn. Ev mîrnişîn hin caran diyar dibûn û hin caran jî winda dibûn. Ev jî li gorî derfet û mercên siyasî yê wê serdemê ne. Lêbelê, bobelata Kurdan bi ketina mirovê nexweş (Şahişahiya Osmanî) kûrtir bû. Lewra jî, hêzên mezin ên mêtînger, di wê demê de, malûmilkên wî li gorî peymanên nepenîtiyê de belav kirin. Kurdistan di nav wan bermayên Osmanî de belavkirî bû. Ji ber ku ew jî perçe bû, hin ji wan perçeyan ketin bin destê mêtinkerên Brîtanî û bi Iraqê ve hatin girêdan, hin ji wan jî ji hêla mêtinkerên Fransî ve bi pêvekirina xwe bi Sûriyê ve, û hin ji van deverên Kurdî di bin bandora Tirkîye û Iranê de, ku wê demê bi Birîtanya re pêgir û pabend bûn.

Li ser bandora hentêşeka neteweperest a nijadperest a neteweyên serdest di tevgera siyasî ya Kurd de, ew dibêje:

"Ji ber belavbûna ramanên neteweperwerî di nav Ereban û Tirkan de, ku gelên cîranên Kurdan in, û ji ber pejirandina baweriya neteweyî li welatên ku Kurd lê dijîn (Bîrdoz û rêbaza Be'es li Iraqê, Turanî neteweperwerî û rêbaza

xwedannenas a li Tirkîyeyê, netewperwera Farisî di nav malbata Pehlewî û pêşiyên wê de). Ji ber rastiya jîweriya perçebûna ku Kurd tê de dijîn, nebûna dewleteke siyasî ye serbixwe ji bo wan, û wekî bertek li hember kiryarên nijadperestî yên li dijî wan ku ji hêla tevgerên din ên neteweyî (Tirk, Ereb û Faris) ve dihatin gurkirin. Tewjima neteweperwer di nav Kurdan de geş bû, û ramana neteweyî ji hêla beşên mezin ên gelê Kurd ve hate pejirandin."

Mamoste Ebdul Hemîd El-Belâlî di rojnameya "El-Qebes", di 4ê Çiriya Paşîn a 1991an de, di bin serenava "Kurdên Kuweytê" de, gotarek nivîsand, tê de hatiye gotin:

"Em gelekî bindest bûn, ji bo heyama heft mehan tenê. Me hemû rengên zor û setema, ku nayê bîra mirovan, kêşand. Zordariya li ser me ne weke hate bihîstin an dîtin. Ji ber vê yekê, em gel in, bawer dikin ku yek ji aliyên erênî yên tengijiyê ev e: Me çêza bêdadiyê kir û em ji yên din bêtir hestên bêdadiyê bûn. Me guman kir ku em li hember bindestan hestiyar bin. Nemaze yên ku bi me re dijîn, û çêza wan mîna ku me çêz kiriye, û di nav wana de "Kurdên Kuweyt"ê jî hene, ewên ku ji hilweşîna Şahinşahiya Osmanî ve ji pê vê çêza tehliyê tu tişt çêz nekirine. Ta vê serdema me, hemî cîranên wan li pey hev li wan didin. Her yek rola xwe di tunekirina vî gelê belengaz de, ji neviyên rizgarkerê Qudsê, "Selah El-Dîn El-Eyûbî" re dilîze. Di her lêdanekê ji cîranan, ew bi tawanbarek ku komelkuja wan rewa dike, têne tawanbarkirin. Carek, sîxurên Tirkîyê li dijî Iraqê, an sîxurên Iranê li dijî Tirkîyê, û wisa jî rêza êşkence û êş û

azaran ji bo vî gelê bindest domdar e. Di dema qeyran û tengijîna Kuweytê de, ew di nav kesên ku li derveyê welêt, û di hemî konferansên me de, piştgirî didan me bûn. Di derheqê tawanbara Iraqî û ya ku wî çî bi wan kiriye, û rastîna wî xuya kirin. Wan bi helwesta me ya pêşîn a di piştgiriyekirina tawanbar de, gazin dikirin. Dema ku ba û baran li dijî me radibe, di dema ku em mafê xwe yê talankirî, li dervî welêt diparêzin, hûn pêşî wan dibînin piştgir, pejrandin, û yên ku boçûn û helwestên me piştgiriye dikin.

Piştî ku qeyran bi xêra Xwedê qediya, û ji Xwedayê me serfirazî heye, Iraqî û rêzên alîgirên wan ji xaka me derketin, ji pêvî Kurd li Kuweytê man, ji ber ku ew ne xwediyê parastgehekê ne ku li Iraqê ew tê de bijîn û xwe biparêzin. Gunehtar, ew ji welatê wan derxistin, gundên wan şewitandin, û ew bi çekên kîmawî qir kirin, çî berî qeyrana "Helebçe", çî piştî wê. Lê, mixabin, ew çawa bi yên din re hate kirin, wehareng e jî bi wan re kirin. Wan em ji hev tarûmar kirin, wek noka tu li kevir xîne, em belav kirin, bi perîşanî û xizanî, li ba xêrxwazan, li pariyê nanê xwe digeriyan.

Em spasdarê Xwedayê gewre ne! Divê em serî li van mirovên bindest bidin, û nebin beşdar di zêdekirina bextreşiyên wan de; ne kêmî dabeşkirina mûçeyan ji wan re, û jiyaneke guncan ji wan re peyda bikin da ku dûrî zordarî û rûreşiyê bijîn; pêdivî ye ew hest bikin ku Kuweyt welatê wan ê duyemîn e heya ku zordar nemînin û ew jî vegerin welatên xwe.

Derbarê birêz Feysel El-Zamil de, wî di "El-Qebes" de, di 2-12-1991an de, bi navê "Kurd" û di beşa "axaftina rasterast" de nivîsand. Wî got:

"Min ragehandinek ku ji hêla civata Kurd li Kuweytê ve hat weşandin xwend, û ji ber vemirandina agirên neftê Payeberz Emîr û gelê Kuweytê pîroz dikim.

Em û Kurd êşa rejîma Be'es jiyane. Cûdahiya di navbera me de ev e ku bi dehên salan e ew vê tengaviyê dijîn; û cûdahiya duyemîn jî ev e ku di demekê de, me alîkariya vê rejîmê dikir ku ew dikujtin û xwîna wan dirijand.

Kuweyt lêborîn xwest ji her kesê ku ew bi piştgirîkirina rejîma Be'es tengezar kirin, û ev lêborîn rûmetê bînpê nake. Belê, ew hemî wêrekî ye, bêyî ku sedema wê alîkariyê di ber çavan re derbas bike, ew e ku Kuweyt ji bo helwestek êrişkar ji aliyê Ereban a hema hema giştî, neyê veqetandin ku piştgiriya da wê rejîmê an bizda wê ya li dijî welatê me ya piçûk û teniştî tixûbên wî ye; ev tişt e ku welatên bi hezaran kîlometre dûrî wê ne êşê dikişînin, an gefên welatên din ku şoreşê hinarde bikin.

Bêguman ji van rastdariyan, û çemek û vaciyên wan, Kuweyt bi wêrekî ji bo wê helwestê lêborîn xwest, û ew wêrekiyek e ku ji wan re peyda nebû, di dema êrişên wî yên ser Kuweytê de, digel Sedam rawestiyabûn, û şikestina wî û eşkerebûna hemî tiwêjên wî here li vir ew îro di bédengî û şermê de ne. Ew wêrekiya wan jî hebû ku lêborînê bixwazin, wekî Kuweytê.

Kurd hîn jî di bin agir û hovîtiyê de ne. Em li Kuweytê wan li gorî kaxezên nasnameya Iraqî dibînin. Ev êş e, û ne pêdivî ye ku vebêjin ka encamên wê dê çi bin.

Ezê rêyên ku êşên wan sivik bikim pêşniyar nakim. Lê, ew rêbazek e ku divê li ser were lihevkerin, her çend ne gengaz be ku ew li ser rûpelên rojnameyan hûrgilî were kirin.

Bira Ebd El-Rehman El-Sumît çend roj berî êrişkariya li Iraqê çûbû gundekî Kurdan, û ew ji melayê mizgeftê matmayî mabû ku ji wî re axivîna bobelat û êşên Kurdan dikir. Ewî Melayî hemî waneyên mijaran didane zarokên gund. Lê dema li ser zimanê Erebî jê hate pirsîn, veciniqî û got: (Na, na em ji ereban û ji zimanê wan hez nakin). Me sedemê vê bersivê nas nekirin, dema ku me ji Dr. Sumît (berî 2-8-1990) pirsî. Lê, ka em tiştê bikin da ku êşên wan li Kuweytê sivik bikin, û bi navgîniya saziyên xêrxwazî yê navneteweyî li bakur, Iran û Tirkîye, tiştê ku em jê lêborînê dixwazin (Selahedîn) ê ku li dirêjaya rojên Konferansa Medrîdê, di gora xwe de digiriya, û Ereban ew li Medrîdê kuştin û neviyên wî jî li bakurê Iraqê, li çiyayan tarûmar kirin.

Ey Xwişk û Biran...

Piştî ku min bi kurtayî helwestên birayên misilman ên Ereb, Tirk, Faris û yê din, pozbilind û aştîxwaz, li hember gelê Kurd ê lexe, qels û çewisandî û helwesta gelê Kurd li hember misilmanî û Misilmanan pêşkêş kir. Mafê Misilmanê

Kurd heye ku Misilmanên ji Ereb, Tirk, Faris û yê din, û ji wan re bibêjin: Gelî mirovan! Hûn dizanin Tu kes li vê dinyayê zindî namîne, her kesê ku li ser e nemayî ye, hûn dê herin wê dunyayê, zû an dereng, neçar e. Û hûn bi ayetê dizanin:

(وكل إنسان الزمناء طائره في عنقه ونخرج له يوم القيامة كتابا يلقيه منشوراً.
اقرأ كتابك كفى بنفسك اليوم عليك حسيبا) (الآية 13 سورة الإسراء)⁵

Bersiva we çi ye, heya ku hûn ji kerema xwe, roja darizandinê dema ku Xwedê ji êrîşkarên we dipirse: Çima we bi xelkên min ên çewisandî ên Kurd re hew qas setemkarî û pozbilindî kir, wê hîngê ew ji bêdengî dipirse: Çima we li hember pozbilindan dengê xwe bilind nekir û li teniştê lawaz û lexeran ne rawestîn? Ma di Qurana pîroz de nehatiye gotin:

(ومالكم لا تقاتلون في سبيل الله والمستضعفين من الرجال والنساء والولدان...،) (سورة النساء الآية 75)⁵

Ma we nizanibû ku yê li hember rastiya bêdeng be, Ehrîmenek lal e? Bira, gava ku mirov nêzî hesabê xwe bibin, dema ku ew nehîşmend û lawaz in, dê bersiva we çi be?

Ey Xwişk û Biran...

Ez nuha vedigerim ser mêr û jinên gelê xwe yê Kurd ê bindest ku ji wan re bibêjim:

"Hûn, Kurd, baweriya xwe bi Xwedê û bi xwe biparêzin, û niyaza xwe ya baş bi yê din re bigirin. Rêzên xwe bikin yek û rê nedin kesî ku we ji bo armancên taybet û mebestên xwe bi kar bînin. Rê nedin cangiranî û bêhêvîtiyê di dilê we de rêyekê bibînin. Bizanin ku gelê Kurd yê bi vîna Afirîner (Xweda) hatiye parastin, destê xelkê nikare wan tune bike.

Her çend îro hûn di nav lexa, çewisandin û lawazan de ne, ji bo we hêztir û mayîntir nîn e jî, pêdivî ye ku serfirazî rojekê bibe hevalbendê we, da ku bend û ayeta hêja pêk were:

(ونريد أن نمن على الذين استضعفوا في الأرض ونجعلهم أئمة ونجعلهم الوارثين) (الآية سورة القصص)⁵

Yên qure û pozbilind in Xwedê dê ji wan pirseke diwar bipirse, û ewên yê ku bêdadî li wan hatiye kirin, wê bizanibin, ka ew dê kîjan rû guhêrek guhêrîn in.

Di encamê de, ez dixwazim pêşniyarên jêrîn pêşkêşî vê konferansa bêhempa bikim, û ez hêvî dikim ku ew cihê erêkirin û pesendkirinê ji beşdaran werbigire, û Xwedê li pişt akam û daxwazê ye:

(1) Pejirandina bi tevahî ku pirsgirêka Kurd pirsgirêka gelekî bindest e, ku ew gelê Kurd e, pirsgirêka welatekî desteserkişî û perçekişî ye, ku Kurdistan e, û ne pirsgirêka kêmetewekî an regezî, an hewildana cûdaxwaz ji hêla

⁵ Û me divêt keremê digel wan bikin ewêt di Misrê de hatîne tepeserkin ku Israîlî ne, (û wan ji zordariya Fir'awnî rizgar bikin), û wan bikeîne pêşî û cihê çavlêkirinê, û wan bikeîne wêris (li Misrê). –Jêdera berê- Wergêr-

mêtingerî û Sehyûniyetê, an bi navê "rêxistinên bizd" (Rêxistinên Tirskar-terror) ve tê livandin û handankirin.

(2) Danpêdana mafê gelê Kurd di çarenûsî de pejirandinek tekez û bêveger e, û li welatê xwe yê dîrokî, Kurdistan, di nav tixûbên erdnîgarî yên rastîn de, bi azadî û serwerî, bi xwe re bijîn û awayê jîyana ku ew dixwaze bijî, bêyî destwerdana ji kesî tê de bibe.

(3) Derxistina fetwa (bersiv û biryara olî) ji aliyê zanayên Misilman ve qedexekirina şerê çekdarî li dijî gelê Kurd û berçavgirtina êrişkerên dijî gelê Kurd li derveyî vîna Xwedê ku ji ber reng, ziman, zayend û neteweyî, niştimanî û regezî cûdahî naxe navbera mirovan. Girêdan ji pêvî xwedêgiravî, çareserkirina pirsgirêka Kurd tenê bi rêyên aştiyane û naskirina mafê gelê Kurd ku hebûna xwe, xaka xwe, rûmeta xwe, nan, azadî û ewlehiya xwe li hember êrişkarên gunehkar li gorî ayeta hêja biparêze:

(فمن اعتدى عليكم فاعتدوا عليه بمثل ما اعتدى عليكم واتقوا الله واعلموا أن
الله مع المتقين) ⁶ (البقرة 194)

Wê hingê dabînkirina hevgirtina misilmanî bi gelê Kurd re li dijî êrişkarên gunehkar û giringpêdan wê wekî raspardinek rewa bibîne.

(4) Bidawîkirina rencxorî û bikaranîna ola misilmanî ji bo mebest û armancên êrişkerên Erebb, Tirk, Faris û neteweperestên din li dijî gelê Kurd, an jî her mirovên din ên

⁶ Û heçî destdirêjî li ser hewe kir, hiwîn jî ka çawa wan destdirêjî kir, destdirêjiyê li ser bikin û ji Xwedê bitirsin û bizanin Xwedê digel parêzkarane. –Jêderê bera-Wergêr.

çewisandî, yan komek din a lexe û lawazan bi diyarkirina van armancan û mebestan, û gelç û gelacîyan, çî bi dizî û çî eşkere, li dijî gelê Kurd têne girêdan da ku zîyanê bi wan bike.

(5) Xebat ji bo vejandina zanistên olî bi handankirina lêkolîn û vekolînên zanistî yên misilmanî yên resen, û şerê nezanî, paşverûtî, tundî û demargêriya kor di şerekî bêrawest de.

(6) Piştgiriya Korî Zanistîya Misilmanî ya ku di (1409 koçî/1989z) de hate damezirandin, piştgiriya bi bandor be ku bikaribe wê bigihîne armancên wê yên di bernameya wê de, hatine nivîsandin. Bi hêzkirin û xurtkirina têkiliyên zanistî di navbera wî û Akadîmiya Zanist û Hunerê ya Kurdî de, ku di Tebaxa 1985an de hate damezirandin.

(7) Deriyê (îctihadê), deriyê têgihîştin û zîrekî di dana fetwe de (bersiv û biryara olî), ji bo derxistina biryarên bi guman ji hêla zîrek, oldar û zanayên ku dikevin nav kûrahiya zanistên ayînê, pir vekirî be.

(8) Xebat ji bo damezirandina komeleyeke cîhanî ya zanayên misilman li her deverên cîhanê, di rengê desteyeke zanistî ya navneteweyî ku civînên vedor ên birêkûpêk û semînerên salane lidar bixe, û rola şewirmendê rêber û pêbawer ji cîhana misilmanî re bilîze. Xebatkirina vekirina rêyek rast ji bo anîna xalên hevdiştinê di navbera rêgehên Şîî û Sunî û hemî rêgezên misilmanî de, û ji holê rakirina bêbaldirîjiya demargêriyên rêgehî, regezî û neteweyî, ji bo çareserkirina pirsgerêkên cîhana misilmaniyê bi regek babetî û rast, ji karanîna zor û zeber û bizdê dûr be.

(9) Cextkirina rêzgirtin, parastin û sexbêriya mafê firesiyasî, pîrzimanî û sivîliyê di civakê de, cûdahiya yekdem, yekdil û migêzan, ew dilovanî û qeşengî ye, ne tolvekirin an gumrayî û xapînok e.

(10) Bi Xiristiyan, Cihû, Zerdeştî û yên bi hemû olên li Kurdistanê re têkildar in, û bi her bawermend re deriyê danûstendina ji dil û giftûgoya avaker a biratiyê vekirî be, ji bo gotina Xwedê bi cih bike: (إنما المؤمنون إخوة)
"Bawermend birayên hev in." Ev di çarçoveya lêborîn, mihrevanî, lêgerînek bêrawestan a rastiye de, û tevahî pabendbûna bi rêzîne ye:

(لا إكراه في الدين قد تبين الرشد من الغي) (سورة البقرة 256)⁷.
Pejirandina ku bawerî û pêbendbûna bi olê tenê bi riya razîbûnê tê, ne ku bi riya givaştin, tirsandin û zirawbirdinê re.

(11) Li ser bingeha wekheviya mirovane, û li gorî gotinên Pêxemberê Pîroz, "Derbarê jinan de ji Xwedê bitirsin." "اتقوا الله في النساء" ji cîhana misilmanî re çareseriyên rahênan yên bingehî peyda bikin.

Di dawiyê de, ez ji hemî xwişk û birayan re serbilindî, hêjabûn, tenduristiyeke xweş, qenciya gelemperî û dilşadiya tevahî ya li dinya û diwîmahiyê dixwazim. Her weha ez hêvî, ji xwişk û birayên dûr ketine û rê windakirine, û riya rast rêberiya riya qencî û rasterêbûnê dikim. Çimkî bi Xwedê,

⁷ Kotekî û xurtî di dînê de nîne (bi xurtî xelk bête misilmankirin) bi siwînd (bawerînan) û nerastî (Gawirî) jêk hatine vavartin (jêk hatine niyasîn), vêca kesê piştî xwe bide te serê gawiriyê (ewê şiwîna xwedê di ête peristîn) û baweriyê pê netînî, û baweriyê bi xwediyê bînît ewî xwe bi çinbelê (qulpa) mukum ve girt (ango rêka serferaziyê) ku veresiyan bo nîne û Xwedê guhdêr û zana ye. –Jêdera berê-Werger.

tevî helwest, raman û biryarên wan bê dilê min in jî, lê ez ji wan pir hez dikim, Baş haya min jê heye ku di Qurana Pîroz de hatiye gotin:

” إنك لا تهدي من أحببت و لكن الله يهدي من يشاء وهو أعلم بالمهتدين“ (سورة القصص الآية 56)⁸

Silav li yê bê zîyan berê xwe daye Xwedê û rêya rast û durist dişopîne.

Serkeftin ji azadî, wekhevî û biratîyê re, û ez ji dil û can gelek spasiya we dikim.

Birayê we yê Kurd

Dr. Cemal Nebez

⁸ Û tu neşeyî ewê te bivêt rasterê bikey, Xwedê ye yê bivêt rasterê diket, û ew çêtir dizanît ka kî dê baweriyê înit, û ka berê kê li rêka rast e. –Jêdera berê- Wergêr.

Dorez û Serbêj:

1- Di pend û gotinên pêşiyên Kurdan de, cûrbecûr nimûneyên mêvanî û mêvanperweriyê hene, wekî: "Mêvan mêvanê Xwedê ye" û "Mêvan xulamê mêvandar e."

Têbînî: Derfet nebû ku kurtasî û kurdkirina vê semînerê pêkbînim.

2- Di vê gotinê de nîşanek ji bend û ayeta hêja:

”الذي خلق السموات والارض وما بينهما في ستة ايام، ثم استوى على العرش الرحمن، فسئل به خبيراً“ (سورة الفرقان، الآية ٥٩)^٩

3- Di vê gotinê de nîşanek ji bend û ayeta hêja:

”يا ايها الناس انا خلقناكم من ذكر وانثى، وجعلناكم شعوبا وقبائل لتعارفوا، ان اكرمكم عند الله اتقاكم“ (سورة الحجرات، الآية ١٣)^{١٠}

4- Di vê gotinê de nîşanek ji bend û ayeta hêja:

”ومن آياته خلق السموات والارض واختلاف السننكم والوانكم، ان في ذلك لآيات للعالمين“ (سورة الروم، الآية ٢٢)^{١١}

⁹ Ewê erd û ezman û hindî di navbera wan da heyî, di şex rojan da dayîn, paşî bilindbûye ser erş (bilindbûneka hêjayî wî, û bê çawayî), ew Xwedayê dilovan e, vêca ji wî bixwaze, ewê şareza ye(yan pisyara xwe di rasta Xwedê da, ji şarezayan bike). –jêdera berê- Wergêr.

¹⁰ Gelf mirovan, bi rastî me hiwîn ji nêr û mêr yekê(angoyê zêlam û jinekê ku Adem û Hewa ne) yê dayîn, û me hiwîn yê kirîne millet millet û eşîr eşîr da yêk û du binyasîn, bi rastîyê ji hewe hemiyar pitir bi rêz û riwîmet li dev Xwedê, ewe yê ji hewe hemiyar teqwatir (ango yê ji hewe hemiyar pitir ji Xwedê ditirsît), Xwedê zêde zana û şareza ye. Jêderê berê- Wergêr.

¹¹ Û ji nîşanê meznatî û desthelatdariya wî, çêkirina erd û esmanan û cudayî û newekheviya ziman û rengê hewe ye, bi rastî ev e nîşanê aşkera ne(li ser meznatî û desthelatdariya Xwedê), bo mirovê zana û têgehîştî. Jêdera berê- Wergêr.

5- Tewrat bi navê kevn ê welatê Kurdistanê, ku welatê Mediya ye, bibîr tîne, û Tewrat Med (wekî mebest Kurdên kevnare e), wekî gelên şaristaniya kevnare, wekî şervanên ku bi mêrxasî û tûjiyê lihevborîn dibin, mirovên ku ji dilpakiyê hez dikin, bi soz û peymanan ve girêdayî ne, û ji mêvan û biyaniyan re rêz digirin, destnîşan dike. Ahîda Kevin (Tewrat) çîroka tofanê (Avrabûna mezin, lehiyên pir bi coş) û keştiya Nûh vedibêje û axivîna çiyayê Araratê dike ku keştiya li ser wê radiwestand. Ji ber vê yekê, qenciya Xwedê ya bi Nûh Pêxember û diwîvelankên wî re, lewma wî tofan sekinand, paşê ferman da wan ku li ser erdê şên bikin, û tê de pir bibin. Xwedê bi wan re soz da ku ji mirovan re tofêk din neşîne (binihêrin "Çîroka Afirandinê", beşa heştan, ayeta yekemîn heya heştan û beşa nehan, ayeta yekemîn heya ayeta şazdehan). Ev di beşa heştan, ayeta çaremîn a Tewratê de hate axivînkirin: "Di roja hefdehan a meha heftan de, keştî li çiyayê Araratê rawestiha." Tewrat, çapa Elmanî bibînin.

6- Di zimanê kurdî-Îranî yê kevin de, wateya peyva **Baga** "Xweda" ye. Peyv hîn jî di awayê serenavek rêzgirtinê de heye. Tirk **Beg** bikar tînin, û **Bey** vê peyva Kurdî di şeweya **Beh** an **Bêg** de, ji hêla hin Ereban ve, ku **Bêg** (li Misrê) wateya wê "Mîrza" ye, bikar tîne. Her weha, peyva Misirî "Bêcûm" di zimanê Kurdî de tê wateya "Xatûn" û "Bacî", wateya "Xwişka Mezin" e.

7- Mebesta me ji peyva Senkretîzm (Bi zimanê Ingilîzî Syncretism), yekbûna di navbera têgînên cihêreng ên Xwedayî û hêmanên olî yên cihêreng de ye, yekbûnek ku baweriya nû pêk tîne. Ev heyîna nû bi tevahî ji olên tîkel

cuda ye. Ez ola Senkretîst mîna gurzek ji kulîlkan dibînim, ji ber ku her kulîlkek bi tîp û rengê xwe ji hevalên xwe cûda dibe, lê ew bi gulên mayî re, yên ne wek hev, an bi tena serê xwe bînin girtin û bi her kulîlkê re ne yeksan in, lê bi hev re gurzekî çêdikin. Di heman demê de, ez dikarim wê pêkhateyê mîna korsa muzîkê bibînim, çimkî di korsê de, muzîkvan beşdar dibin dema ku ew gelek amûrên muzîkê bikar tînin, ku her yek ji wan awazên cûda ji awazên amûrên din radibin, radibe; û gengaz e ku mirov cûdahiyê bide gava ku ew wê bixwaze. Lêbelê, ev awaz bi tevahî yeke nû çêdikin, ku ew perçeyek tevahî ya muzîkê ye, bi awaza yekê ji wan amûran re li hev nayê.

8- Di derbarê koka peyva (Goran) de çend gotar û şîrove hene, piraniya wan ji nivîskarên biyanî ku çûne Kurdistanê ne, bi Goraniyan re civiyane û di derbarê mijarê de, têra zanîna wan nebûye. Di nav vana de, rojhilatnasê elmanî Oskarman û rojhilatnasê Iskutlendî Miknizî, "Goran" wekî gelekî xwedî zimanek taybetî ku ji zimanê kurdî cuda ye, pejirandine. Wekî din, zanyar û lêkolînerê navdar ê Kurd mamoste Mihemed Emîn Hewremanî li ser "Goran" ê lêkolînên hêja weşandine ku tê de axivîna koka peyvê, Gor (Gihor) e, kiriye. Ew navek e ku di destpêka misilmantiyê de, ji kesê ku misilmanî, ji bo wî, oleke nepejirandî re hate danîn. Ji ber vê yekê, ew bi ola Zerdeştî ve girêdayî dimîne, bacê dide û ji koma peyvê (Goran) e. Binêre: Dr. Mihemed Emîn Hewremanî: Bersivê demkî li hevpeyvîna ku Dr. Kemal Fuad bi kovara "Serwe" re, hejmar 38 û 39, di (Mamosteyê Kurd) Hejmar 20, 1993-1994, rûpel 14 -21.

9- Rewşa civakî ya ku jinên Kurd jê xweş dibin, nemaze di nav hin êl û eşîrên kevnare de, bala gerok û geştiyarên biyanî, yên ku di sedsalên cuda de, serdana Kurdistanê dikirin, kişandiye. Her çend jin di têkiliya bi mêran re, li her deverên cîhanê, kesek bindest e, û zordariya ku jin pê re rûbirû dibînin, bi dîtina min, "pîsiyek cîhanî" ye, ne tenê bi welatekî an gelekî ve girêdayî ye, lê kêma zêde cûdahî hene. Ka em ji nav sedan li vir dîtî û nerînên du biyaniyan yên di derheqê jinên Kurd de vebêjin: Zanyarê Rûsî Vasîlî Nîkîtîn dibêje: Bêguman, jin di nav Kurdan de xwedî kesayetiyeke naskirî ye (binihêrin Basîl Nîkîtîn: Les Kurdes, Paris 1956, r.99) û zanyarê Gurcî Xalfîn dibêje: "Gelê Kurd ji jinan re rêz digire, berevajî gelên din ên rojhilat, bi rêz û rûmetek mezin. "Binihêrin: (Têkoşîna li ser Kurdistanê), bi zimanê rûsî, Moskov, 1963, r. 23, û hunermenda navdar a Ereb "Zeyneb" di derheqê jinên kurd de wiha dibêje: Min li ba jina Kurd zîrebûn û giyanê pêşveçûn û serbestiya rastîn dît ku ji barê koletiya kevneşopîyan xwe diparêze. Ew mînakê zindî ya ku divê jin li welatê min bibe, û ez jî hevî dikim ku keçika Ereb dê bi kêmanî beşek ji vê azadiya ku keça Kurd jê dibîne, bibîne û bi dest xwe bixe. Binêre li daxuyaniyên lîstikvana Ereb Zeyneb di hevpeyvînekê digel rojnameya Iraqî, El-Nûr, Hejmar / 218 / Bexdad 9-7-1969an de. Zanyarê Kurd Mela Mehmûdê Bayezîdî, di destpêka sedsala borî de, di pirtûka xwe ya bi navê: "Adat û rusûmatnameê ekradiye (erebî; عادات و رسوماتنامہ اكرادية), bi kurdî Adetên kurdan an jî Adab û risûma kurdan" de ev tişt nivîsiye : "Bi rastî, radestkirina jinan ji mêran re ji bo Kurdan ne gerdeşek e. Jin û keçên wan ji kesî şerm nakin. Ew bi qasî hevpişeyên xwe,

yên di nav gelên Ewropî de, azad bûne (r. 190) ... Jina Kurd di şer de, mil bi mil bi mêrê xwe re şer dike (rûpel 194-193).

10- Di vê gotinê de nîşanek ji bend û ayeta hêja:

"ربنا اني اسكنت من ذريتي بوادٍ غير ذي زرعٍ عند بيتك المحرم" (صورة
ابراهيم الآية 37)¹²

11- Peyva Ebabeylê ji navê Ebdullah lawê Eyûb (Ebû Ubeyda) El-Ensârî, ne ji navê Ebû Ubeyda El-Cerah, guhartî bûye, berevajî agahdariya me ya berê di vî warî de, binihêrin: Cemal Nebez: Li ser pirsgerêka Kurd, weşanên Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewropa NUKSE p.7 Ev heye, Serkeftinên misilmanî li Kurdistanê di dema Omer lawê El-Xettab de, piştî dagîr kirina Misir û Şamê, li Kurdistanê pêk hat. Li gorî nûçeya ku Mihemed lawê Umer El-Waqidî (130koçî -208 koçî= 747 / 748-823 / 824 z) di (Fattuh Bilad El-Sawad) de, ji me re şandiye, çapa Kilkutayê 1855-1862 şîrove kiriye. Di wê serdemê de, Kurdistan ji hêla şahên bi hêz ve dihate birêvebirin, di nav wan de, Danîkor, şahê Pişder. Di çavkaniyên erebî de, navê Pişder bi awayê Şîdre, û şah Malik lawê Hejder bi şah Duguman, û şah Firox lawê Ebran bi şah Mirge hatine gotin. (Di çavkaniyên Erebi de, Navê Mirge bi rengê Mircîn hatiye) şalaw û pelamara li dijî Kurdistanê bi serperîştîya Xalid lawê El-Welîd ve hate birêvebirin. Dema ku supahê Misilman hilme û êrîşî Hewlêr/Erbîl kir, xelkên bajêr bi tevayî ji malên xwe derketin

¹² Xudayê me bi rastî min hindê ji diwîndeha xwe (Ismâil û biçiwîkêt wî), yêt li nihaleka bê şîkatî li dev mala te ya muherem (Kebeyê)akincî kirîn, Xudayê me, dakû nivêjan (têda) bikeyn, vêca dilê hindê mirovan bi nik wan ve bibe (biçîne dev wan, û ew bi tinê nemînin), û fêqîyêt reng reng bi rizqê wan bike da şukra te biken. - Jêderê berê-Wergêr.

û li hember şerê dagîrkeran rawestîn. Di destpêkê de supahên Erebiyên misilman şikestin. Ji ber vê yekê ew çû gundê Hatekan, û Ebdullah lawê Cendel çû gundê Hirmûte/Ermûte. Ebdullah lawê Cendel jî di nav de, gelek hevalên Pêxember hatin kuştin. Di salixdanê de hate ragihandin ku xelkên Mîrza Rustem leşkerê Misilman pêşwazî kir. Dûv re Xalid lawê El-Welîd El-Sehabî Ebû Ducane şand ba şah Firox ku jê bixwaze ku misilmantiya xwe ragihîne. Ji ber vê yekê Ebû Ducane di rê de, ji hêla mirovekî Kurd ve hate kuştin. Ew mirov hate girtin û li xwe mikur hat ku wî Ebû Ducane kuştîye, wî guman dikir dijminek e. Şah Firox misilmanên Erebiyên agahdar kirin ku ji welatê wî derkevin, û wî bi "Agir" sûnd xwar (wate Ronahî - û Roj peywend kir, li gorî kevneşopiyên ola Mîsrayî, ji Kurdan re pîroz e ku tolê ji wan bistînin heger ew ji welatên wî derneketin. Sekreter/nivîskarek şah Firox bi navê Qestûr hebû, ku ew bi her du zimanên Erebiyê û Romanî zanibû, û ew çûbû serdana Şamê; li wir, bi rahîbên xaçparêzî re hevdiîtin kiribû. Lêbelê, Qestûr bibû Misilman û di nav Kurdan de dest bi sîxurîkirina ji Misilmanan re kir. Gava şah Firox lê haydar bû, wî ew bi mirinê siza kir. Hêjayî gotinê ye ku xwişkê padîşah Firox hebû bi navê Ezmira, ku bi zîrebûn û zîrekiya xwe navdar bû, û wê berê bajarekî tev desthilatdarî dikir. Navê Çiyayê Ezmira li bajarê Silêmaniyê yê îroyîn ya wê mîreka Kurd e. Girgir wê demê yek ji pêşengên mezin ên Kurd bû. Di civînekê de ku ji hêla serokên Kurdan ve dihate lidarxistin, wan biryar stand ku li dijî dagîrkeran li ber xwe bidin, û şerên dijwar li Kurdistanê rû dan. Hejmarek hevalên Pêxember hatin kuştin û di nav Kurdan de jî: Weraşîle Omer

El-Temîmî, Se'edî Saed El-Qurayşî, Cundebe lawê Ebdullah Elî, Miqdad lawê Eswed El-Kindî, Wayîle El-Esqifî, Qeqa lawê Umero, Zirarî lawê Ezro, Umer lawê Hatimê El-Ta'l, Omer lawê Ediyeh. Li ser Miqdad lawê Eswed el-Kindî, yê ku mîrek kurd kuşt, tê vegotin ku wî ji kurdekî ku bi temenê xwe ghiştî pirsî: Ew li ser misilmantiyê çi dibêje. Gava pîremêr ev gotin bihîst, bi hêz rabû ser xwe û got: Ger min hêza xortaniya xwe ragirta, minê hezar mirovên mîna te bikuşt, minê tola padîşahê kuştî hilanya, û pîremêr rûyê xwe ber bi rojê ve kir û got: "Ez wê Ronahiyê diparêzim, ez ola xwe bernadim." Miqdad fermana kuştina pîremêrê Kurd da, û cihê ku ew mêr lê hatî kuştin heya nuha tê zanîn. Xalid lawê El-Welîd hewl da ku serokên Kurdan derbasî ola misilmantiyê bibin, ji ber ku li gorî gotina wî, ew mirovên herî mêrxas ên li ser rûyê erdê ne, û wî ji Pêxember (silavên Xwedê li giyanê wî bin) bihîst ku vebêjîna mêrxasî û dijiwariya wan û xurtiya wan dike. Lê, şer di navbera her du aliyan de berdewam kir, piştî ku gelek hevalên Pêxember di şerê li Semaqolyan hatin kuştin. Xalid lawê Welîd ji serokên misilmanan re nameyek nivîsî û ji wan re got ku li Semaqolyanê çi rûdaye, û gotiye: "Hûn ji xapandin û fenên Kurdan neserwext in. Ew di cengan de mîna cinawirên goştخور in". Gava ku salixdan ghişt destê serokên misilmanan, wan dest bi girîna (şehîd)ên Semakolyanî kir û vebêjer dibêje: Xalid lawê El-Walîd û Ebdullah lawê Omer poşman û bêhêvî û şikestî vegehiyan. Gava ku ew ghiştin çemekî di navbera Mûsil û Hewlêrê/Erbîlê de, wan jinek pîr dît ku li perava çem rûniştibû, wan jê pirsî ka ew li wir çi dike?. Pîrejinê got: "Ez Misilman im û dixwazim avê qut bikim, lê

ez ditirsim". Ebdullah lawê Omer jinik li ser pişta dewar siwar kir. Xalid ew di derheqê xapandina jinan de hişyar kir, lê Ebdullah lawê Omer gotinên Xalid paşguh kirin. Gava Ebdullah ghişte nivê çem, jinikê kêrek dirêj derxist û li sînga Ebdullah xist. Ji ber vê yekê, xwîn ji sînga wî herikî, û gava ku Xalid ew bi rûyekî zer dît, wî jê pirsî ka çi rûdaye, lawê Omer jê re got: Te ez rawêj kirim, lê min paşguh kir, û Xwedê ku tiştek dike, biryar dide. Gava ku Xalid pîrejin û Abdullah anîn peravê, Ebdullah mir, û Xalid pîrejin ji bo tohildana Ebdullah kuşt. Ji bo agahdariyên bêtir li ser mijarê, hûn dikarin li pirtûka "(Kurdistan û Ola Misilmanî) ya zanyarê Kurd Mela Babiker Mela (Re'ûf) Selîm Hiwîzî - Çapxana Zanîngeha Bexda 1970ê binihêrin. Zanayê mezin Hiwîzî ev pirtûk li ser bîngeha hêjatirîn pirtûkên Mexazî (pirtûka azînen şerkinê), ku tê de nivîskarê el-Waqidî jî hatî axivîn) çêkiriye. Têbînî: Gotina "bi ronahiyê sînd xwarin" an "agir" di nivîsa berê de hatibû axivîn. Li vir hin kes bi şaşî dozîne dikin ku Kurd berî hatina misilmantiyê "rojperest" an "agirperest" bûn. Ya rast ev e ku ola Mîtra ya ku li Kurdistanê belav bûbû "Roj" ne kir xwedayê xwe. Belê, Mîtra, Mîsra, an Mîr, ew Pêxemberê ku ola belavkirî bi navê wî tê naskirin. Wî xwe ji tîrêjên rojê çêbûyî dipejirand. Ev rêbîr û bîrûbawer pêşdikeve heya ku mirov Mîtra bixwe wekî ronahiyek an rokê dipejirîne. Gava temenê Mîtra ghişt qûnaxekê û ew piştrast bû ku riha ji mirinê nema, wî nexwest li nav hevalên xwe bimire da ku mirov laşê "Lawê Rojê" yê mirî li erdê vezilandî nebîne, û rok jêder û çavkaniya ronahî, agir û eksîra jiyanê ye. Ji ber vê yekê Mîtra vegehiya çiyê û li wir mir. Ji ber vê yekê têgihîştina

bawerî ku Mîtra vegeryaye rojê. Vê têgihîştinê li ser bandora hişê hemî mirovan xebitiye. Wekhev jî em dibînin ku her kes bangî Xwedayê xwe dike ku pêdiviyekê ji bo wî pêk bîne, serê xwe ji dil ber bi ezman ve, ango bicihkirina rojê radike. Wekî din, desthilatdariya ola Mîtrayî ya li Kurdistanê, di serdema Medan de, gihiştîye asta herî jor. Îro em bermahiyên vê ola kevnare ya ku bi hezaran sal berê li Kurdistanê di rê û resmên olî yên olên Kurd de wekî Elewîyan, Êzîdiyan, Kakaîyan (Yarsanî) û yên din ... belav bûyî dibînin. Ola Mîtraya li hejmarek welatên Ewropî belav bûye, bandorên wê hîn jî hene.

12- Kurekî "Capan" hebû, navê wî Meymûn bû, ku bi Bavê Besîr dihat naskirin, û wî hin fermûde (hedîsên Pêxember) vegotin û wî ew ji bavê xwe bihîstibûn. Bigerin: Dîroka Mezin a Buxarî, li şiroveya "Lawê Ksîr" û şirovekirina "El-Mîzan" û li El-Tabaranî di "Musnedê Mezin û Piçûk" jî binihêrin.

13- Piştî ku gotarbêj gotara (semîner)a xwe ji bo demek yek demjimêr xwend, ku ew dem ji bo her gotarekê re veqetandî ye, wî ji serperîştkarên civînê pirsî, gelo ew dixwazin guh bidin yên mayî ji semînerê an na; li ser vê pêşinyarê dengdan çêbû. Piraniya pir deng da ku xwendina gotarê (semînerê) berdewam bike, ji ber vê yekê gotarbêj dikaribû piraniya tiştên ku wî nivîsandî bixwîne. Mijar li ser vîdyoyê jî hate tomarkirin.

14- Pirtûka "Munteha El-Meqal" ku wekî "Rical Bû Elî" tê zanîn ji hêla Ebî Elî Mihemed lawê Ismail lawê Ebdul-Cebbar lawê Se'ed El-Dîn ve ev tişt diyar kir: "Di rastnivîserê El-Sadiq (Silav lê bin) de ev: Selman zanista pêşî û paşîn zane,

û ew deryayek e ku nalive û ew ji Xwedanê malê ye (Yek ji Mala Pêxember e), li dawiya gotarê binihêrin: Rical Bû Elî, Ebû El Mihemed lawê Ismail Ricalî Mazindiranî Hairî, çap (1302 H.Q).

15- Elî Husnî El-Xerbûtlî: Neteweya Erebi ji berbanga sibê heya danê nîvro, bêyî ku dîroka weşanê bêje, Mala Vejîna Pirtûkên Erebi, rû. 52, û her weha Ebd El-Rehîm Fode: Misilmanî û Neteweya Erebi, (دار احياء الكتب العربية) Mala Vejîna Pirtûkên Erebi 1961, r. 15.

16- Elî Husnî El-Xerbûtlî: Çavkaniya berê, rûpel 95, û hêjayî gotinê ye ku ev "xulam" hîn jî ji destê "birêz" Ereban, ji bêdadî û çewisandinê dikişînin. Bi rastî, li "Yemen Bixêr" tîreyek mezin heye ku jê re dibêjin "El-Exdam" û peyv ji "El-Xadim = Xulam" hatiye girtin. Ew Misilman in mîna Ereban, lê ji hêla Ereben Yemenê ve, wekî mirovên hawşan û pileya çaremîn û pêncemîn in.

17- Ebû Teyib El-Mutenebî: Dîwana Mutenebî, çapa Bombay 1271koçî -1855z rûpel 323.

18- Xiz tê wateya hevrîşim, û ew, di reh û binyata xwe de, peyvek Kurdî ye, ku ji navê "Xiz" hatî ye, wateya wê xweşik an şemitok e, û lêkera Xizîn şilokî ye. Bêjeya "kurmikê Qez" jî ji Xiz û Xihzik hatiye hildan, ango di zimanê kurdî de wateya "kincê ji hevrîşim" e.

۱۹- حسين علي ممتحن: نهضت شعوبية، جنبش ملی ایرانیان در برابر

خلافت اموی و عباسی، تهران 1975 = 1354 ص 125 – 126

20- Lawê Ebid Ribe El-Endelusî: El-uqid El-Ferîd, Qahîre 1367 H.Q= 1947/1948z beşê duyemîn, rûpel 353. Herweha Xêr El-Elah Telfah: Yekemîn dijminê Ereban gelnewaz e. Bexdad 1972, rû: 130

21- Rojhelatnasên Ewropî berê ji zimanê Pehlewî re digotin "Farisiya Navîn". Xebatên min ên lêkolînê di van salên dawî de, rêberiya min kirin ku ez derewiya vê ramanê bibînim. Zimanê Pehlewî zimanekî serbixwe û bi serê xwe ye, û ew bêhtir ji Farisî nêzîkê zimanê Kurdî ye.

22- Ibin El-Esîr El-Cezîrî: El-Kamil fi El-Tarîx, çapa duyemîn 1387/1967, Dar El-Kîtab El-Erebî, Beyrût, rû 37. Têbînî: Hêjatirîn pirtûkên dîrokî diyar dikin ku Kurd li deverên ku îro wekî herêma Faris a li Îranê tê binavkirin, ku navenda wan Şîraz e, bi pirranî hebûn. Ji ber vê yekê, heke em li "Farisname" a Ibn Balxî û (المسالك والممالك) Ebû Ishaq Ibrahîm El-Istexerî, û "صورة الارض" ya Ibin Hewqel û (البلدان) Ibin Feqîh El-Hemedanî, ji Xirdabe re. Em dibînin ku ew navên eşîrên kurd ên ku li van deran dijiyan tînin ziman. Her weha deverên din ên Iranê yên li derveyê Kurdistanê. Mînak, Xiresan, ku li Xiresanê hîn jî herêmek fireh heye jê re dibêjin "Kurdistana Xiresanî". Nêzîkî yek mîlyon Kurd tê de dijîn, û ew bi zaravayê Kurmanciya xwe ya bakur a balkêş bi Kurdî daxifin.

23- Têye gotin ku Beramike an "Bermekî" malbatek Kurd bû ku bi merivên xwe yên têgihiştî û ronakbîr navdar bûn. Vê malbatê peywîr û rajeya malbata Lawên Ebas dikir. Lêbelê, Ebasiyan Bermakî ji kokê qir kirin, û Bermekiyan bi "kesê ku ji Xwedê re hevalan çê dikin", "Gawir" û "el-Mizdekî" hatin tawanbar kirin, ji ber vê yekê helbestvanê Erebê demargêr Esmâ'î dibêje:

Ger di civatê de vebêjîna pir-baweriyê were kirin, rûyên lawên Bermek ronî dibin. Heke ayetek ji wan re biha-

ta xwendin, wan fermûde li ser Mizdik tanîn. (Biner li: Xêr-Elah Telfeh: (الشعوبية عدو العرب الاول), çavkaniya berê, rûpel 82.

24- Ebû El-Hesen Elî lawê El-Huseyn El-Mesûdî مروج الذهب
، beşê duyemîn, rû 190, û El-Mesûdî li Bexdê
hediye dinê, sala 956/957z li Misrê miriye.

25- Şêx Kemal El-Dîn El-Dumeyrî، باب من حياة الحيوان الكبرى،
beşê yekem، Misir 1330 koçî, rû12. Her weha
، دار الكتاب cildê çaremî الكامل في التاريخ El-Esîr El-Cizerî
، Beyrût 1967، rû335. Ewî ji ber lawê El-Kesîr
wergirtiye.

26- Zanyarê kurd ê mezin Ebû Henîfe El-Deynûrî, di
pirtûka xwe ya hêja de (الأخبار الطوال), çapa yekemîn, Laydin
1888z, rû 338 dibêje li ser malbat û mervantiya di navbera
Ebî Muslim û Babikê Xermî dipeyive.

27- Li lêkolîna mamoste Mihemed Emîn Hewremanî,
dorez: jimar/8/ vegere.

28- Yek ji diyardeyên siyaseta Erebkirinê ya ku Ebasî li pey
wî hat ew bû ku Misilmanê Kurd an Faris neçar bû ku ji xwe
re navên Erebi bibijêrin, Erebi fêr bibin û bi Erebi binivîsin ...
hwd.

29- Binêre: Cemal Nebez: Ji bo pirsgirêka Kurd, ji weşan-
ên Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewropa
NUKSE 1969K w7.

30- Hinan ji wan digot: "Kurd tîrek Cin in ku Xwedê pêça
wan diyar kiriye." Binêre Diyai Kok Elb: Salnamey - Wîlayetî
Diyarbekir (salnameya salane ya wîlayeta Diyarbekirê bi
Tirkiya Osmanî), Amed 1301 koçî - 1884z.

31- Abû El-Qasim Ferdewsî: Şahname, Vullers Laydin 1877, Beşê 1ê, rû. 38-37, El-Bîtan 37-38.

32- Ibin El-Esîr El-Cizerî: (الكامل في التاريخ) cild: şeşemîn, çapa 2, 1967/1387, Dar El-kutib El-Erebiye, Beyrût ,rû73.

33- Ji bo bêtir agahdarî di derbarê van welatên Kurdî de, hûn dikarin serî li van du çavkaniyan bidin: Mihemed Emîn Zekî: Dîroka Welatên Kurd û Mîrnişînên di Serdema misilmanî de, Wergerandin ji hêla Mihemed Elî Ewnî ve hatiye nirxandin, Qahîre 1367koçî-1948 Z. Ebdul Reqîb Yûsif jî binihêrin: Şaristaniya Dewleta Dostikî li Kurdistana Navîn, Bexdad 1975.

34- Helbestvanê mezin ê Farisî Hakîm Senaî ku di sedsala pêncemîn a koçî de jiyaye, di pesnê Ebî El-Wefa û zanyarê kurd ê Sofiyatî Ewîs Qirnî de bi van gotinan:

(قرنها باید که تا از پشت آدمی نطفه ی

(بو الوفاء کرد) گردد یا (أویس) قرن)

Wateya wê di zimanê Kurdî de: Divê sedsal dem werin qatkirin da ku ji tovîk û spermê kurên Adem kesek mîna Ebû El-Wefa yê Kurd an kesek mîna Ewîs Qirnî xuya bibe.

35- Di demekê de ku zanayên Kurdan û serokên wan ev raje û peywirên hêja pêşkêşî misilmanî û misilmanan dikirin, serokê Emewiyan Welîd bin Ebdul-Melik bin Merwan Qur'ana Pîroz perçe perçe dikir û bi helbestî digot: Heger Xudayê te roja komkirinê (Roja Heşrê) ji te pirsî, bêje, ya Xudan, El-Welîd min perçe perçe kir.

36- Elewî şopdarên ola "Elewî" ne, ku li bakurê Kurdistanê û Anadolayê belav in, û bi mîlyonan Tirk hene ku

vê olê hembêz dikin. Yê n ku wan di nav Şî'eyan de dipejirînin, hene, û yê n din jî wan ji Nuseyriyan dipejirînin. Ya rast ev e ku têkiliya Kurdên Elewî û Tirkan bi Misilmanên Şî'e re tune. Ev Elewîbûn olek serbixwe ye, û ez bawer dikim ku navê olê wateya "Elewîtiyê" ye, sedema vê dozîneya ku ew Şî'î ne. Lê di rastiyê de koka peyva "Elawîya" ji peywendiya bi serwer Elî Ibn Ebî Talib (Xwedê jê razî be) wekî peyva "Êzîdî" dûr e, ji Yezîd bin Mu'awiye re têkildar be. Di ronahiya lêkolînên zanistî yê n ku min di vî warî de kir, ji min re diyar bû ku ev têgeha "Elewî" ji peyva Halav û Halav ya Kurdî tê. Halav, hilm û boxa ava kelandî ye mîna agirê gur, û her weha pêt û rivîna xwe jî. Ew bi Kurdî halavê agir tê gotin, wateya wê çirîsk û tîrêja agir û ronahiya wê ye. Zimanê tirkî ev peyv ji kurdî biriye. Ew wê teşeya Alev dide, tê wateya pêta agir bikar tîne, û peyva Alevî di zimanê Tirkî de wekî têngînek xomilbûn û hatinarêzê ya vê olê tê bikaranîn. Elewîbûn, mîna xwişka xwe ya Yezîdî/Êzîdî, Kaka (Yarsan), Şebekî û olên din ên li Kurdistanê û dergûşa wê ya li Çiyayên Zagros belav bûne. Di nav ola Sensekrîtî de ne. Mebesta Sensekrîtî (Syncretism), mebesta me li vir yekbûna hêmanên olî yê n cihêreng e, ku ji baweriyên olî yê n cihêreng, bi hevûdu re û yekîneyek bawerîya olî ya nû bêkêmasîbûyî çê dikin. Ev celeb û cureya yekîtiyê ji kirdara tevlihevkerin û têkelkerinê cuda dibe. Di kirdara tevlihevkerin û têkilkerinê de, hêmanên cûrbecûr di nav hev de tî n bişaftin. Di yekîtiya Senkirîtî de, hêmanên yekbûyî parastî dimînin. Lêbelê, nimûneya bi koma xwe ew yekeyek nû ye ku bi tevahî ji her binyatek ji binyatên pêkhatyên wê yekîtiyê cuda ye. Mebesta me ji peyva Senkrîtstî (Bi zimanê

Ingilîzî Syncretism), yekbûna di navbera têtîngên cihêreng ên Xwedayî, û hêmanên olî yên cihêreng de ye ku yekbûnek baweriya nû pêk tîne. Ev heyîna nû bi tevahî ji olên têkel cuda ye. Ez ola Senkrîtst mîna gurzek ji kulîlkan dibînim, ji ber ku her kulîlk bi tîp û rengê xwe ji hevalên xwe cûda dibe, lê ew bi gulên mayî re, yên ne wek hev, an bi tena serê xwe bêtir girtin û bi her kulîlkê re ne yeksan in; lê gurzekê bi hev re çêdikin. Di heman demê de, ez dikarim wê pêkhatayê mîna korsa muzîkê bibînim, çimkî di korsê de, muzîkvan beşdar dibin dema ku ew gelek amûrên muzîkê bikar tînin; her yek ji wan awazên cûda ji awazên ku ji amûrên din radibin, radibe, û gengaz e ku mirov cûdahiyê bide gava ku ew wê bixwaze. Lêbelê, ev awaz bi hev re yekeyek nû çêdikin, ku ew perçeyek tevahî ya muzîkê ye ku bi awaza yekê ji wan amûran re li hev nayê. Di nav van olên Sansekritî û welatê wan ê xweristî de, û hîn jî welatê Kurdistanê ye, em hêmanên baweriyên Mîtraî, pîrozragirtina ji ronahiyê û Zerdeştîyê, rêbîra başî û qewxeyê wekî bingeha afirînê (hebûna çêkirî), û sêyemîniya jiyanî dibînin: Ramana baş, gotina baş û kiryarên baş, û Manîparêzî: Ronahî, wateya giyan û tarî, wateya mak û madeyê, ya yekem ber bi ezman ve û ya duyemîn jî ber bi xakê ve, û têtîhiştîngên Mizopotamyayê di warê jinûve vejandin û guherîna giyan de, ev hêman bi hevûdu re dibin yek û oleke nû bêkêmasî ava dikin. Yek ji van olan nayê têtîhiştîng heke ew wekî komek ku ji hêla amarên hevpar ve têtîye diyarkirin, neyê xwendin. Di nav baweriyên bingehîn ên van olan de, baweriya bi Xwedayê Yek, Jîndar, Ramyarî, çemekî, Afirînerê gerdûnê û tiştên tê de. Lêbelê, bi wan re

Xudan rasterast serweriyê li gerdûnê û tiştên tê de ne nake, lê bi saya xawendarên ku jimareya wan 7 ferîşteyên nêz in, û her şahek- ferîstek karûbarên taybetiyên xwe birêve dibe, û yek ji van şahan serikê wan e. Di nav Êzîdîyan de, Tawusê Melek, ji Kaka'î, Pîr Binyamên, û ji Şabek Pîr Simaîl, û ji Elewî Pîr Sultan e, û hwd. Ew di heman demê de, bi kirasguhertina giyan (Tenasux) jî bawer dikin, û kirasguhertina giyan ew amêra pakirina giyan e ji giyanên (Donadon) ku ji pîsetiyên makê yên pê ve girêdayî ye. Ew bi hebûna Ehrîmen bawer nakin, lê ew her derûn wekî Ehrîmen bi xwe dipejirînin, û efsaneyên olî yên vê komê li welatê Kurdistanê tên gerandin. Li wir çiyayên û çemên pîroz hene ... hwd. Ji bo bêtir agahdarî di vî warî de, hûn dikarin gotara ku min bi zimanê Kurdî li Emstirdam, ji hêla Akademiya Zanist û Hunerê ya Kurdî ve hatiye çapkirin, binirxînin. (Awirek revîner li ser mîtolojiya Kurdan) Cemal Nebez.

(سهرنجدانينيك له ميتۆلۆژيای كورد)

(لمحة خاطفة عن ميثولوجيا الكورد) 2598k-1986z

37- Êzîdî: "Yezîdî: (Ew şopdarên ola Êzîdî ne) (Êzîdî) li hin deverên Kurdistanê belav bûne û navenda wê Şêxan û Jengar (Sincar) e. Navê rast ê ku alîgirên vê olê bikar tînin Êzîdî ye, ne Yezîdî, wekî ku di nav raya giştî de hevpar e. Misilman û Xiristiyan bi nezanî an bi zanîn wan bi Yezîd bin Mu'awiye ve girê didin, û wan bi "perestvanên şeytan" tawanbar dikin. Bi rastî, têkiliya Yezîd bin Mu'awiya bi vê olê re tune. Navê "Êzîd" ji peyva kevn a Kurdî "Yezd" tê wateya Xwedê, ango ku ew "perizînên xwedayê Yezd" in. Ji ber vê

yekê, ew ne perestvanên (Ehrîmen) Şeytan in; û dûv re ew bi hebûna Şeytên ku li jor vegotî bawer nakin (li doreza 36 binihêrin) û Êzîdî guman dikin ku ji destpêka afirandinê ve, padîşahek-ferişteyek hebû ku Xwedê jê hez dikir û jê re rêz digirt lê ku wî guneh kir, Xwedê ew bi dojhê seza kir, lê ew poşman bû û 1001 sal giriya ta ku wî agirên dojhê bi hêstirên çavên xwe vemirand, wê hingê Xwedê wî dibaxşîne û wî dîsa nêzîkî xwe dike. Ji hingê ve, ne Şeytan û ne jî dojhê heye. Şeytan (wateya xerabiyê) li gorî wan di giyanê mirov bi xwe de dimîne. Rastiyek girîng heye ku ez di van salên paşîn de gihaştim wê baweriyê, piştî ku min xwe spart lêkolîna vê koma olên nepenî (Senkirîtî), ew e ku peyva Şeytan di zimanê Erebî de, ji "Satan" ya "Ibrî" hatiye wergirtin, ne wek ya peyva "Şeyta" di zimanê Kurdî de ye. Peyva "Şeytan" ya Kurdî pêkve ji du bêjeyên "Şa" (wateya Xwedê an Padîşah e) û "Ten" (wateya laş e) û "Şaten" tê wateya "laşek Perî", û peyv hate guhertin bû "Şeytan", û ev bêje pêkve varêbû ji (Şaten), ne tenê di nav Êzîdiyan de, lê di nav Kaka'îyan de jî heye. Di destpêka vê sedsalê de, yek ji zanayên Kakayî û rêberê wan ê giyanî û li vir mebesta me Hacî Ne'met Ellah Mukrî Ceyhûnabadî (Cunawayî) ye ku rexne li Kurdên (Goran)ê digire û dibîne ku cûdahî nexistine navbera "Şeytan" û "Şaten". Binihêrin: Şahname Heqîqet (Dayika Pirtûka Rastiyê) bi zimanê Farisî, ku ji hêla Hacî Ne'met Ellah Mokrî (Mecrum) ve hate rêkxistin û nivîsandin, û ji hêla Dr. Mihemed Mokrî ve hate lêvegerandin, serastkirin û derhênerkirin. Paris 1966, rûpel 120-121. Û ola Êzîdî du pirtûkên pîroz bi zimanê Kurdî hene, ango Meshefa Reş û Celwe (Siroş). Ayetên pîroz hene ku jê re dibêjin

"Qewl/gotin", ew bi zimanê Kurdî ne, û çavkaniyên hêja ne ji bo têgihîştina rastiya vê olê. Hevalê me yê hêja Şewqî Isa, ku lêkolînerê ola Êzîdî ye, komek ji van gotinan bi şîrove û ravekirinên pêvek bi zimanên Kurdî û Elmanî berhev kirin. Rêzgirtin û avinde ji milav û xebata bira Şewqî re, min jî pêşgotinek bi zimanê Elmanî jê re nivîsand û ez pir spasiya wî dikim. Heft ferîşte li gor Êzîdiyan hene, ku her şahek-ferîşte bi yekî ji Şêxên wan re têkildar e. Serekê van ferîştan Padîşah Tawûsê Melek e, yê ku giyanê wî bi laşê çakerê olî yê mezin Şêx Hadî (Adî) re, di riya (Mezherî) re têkildar e; ango, ji bo demek diyarkirî di laşê heyînek din de dikeve giyanê heyînek diyar û di xuyangek din de xuya dike. Ev Tawûs ne balindeya (Tawûs) ya ku tê zanîn e. Ya rast ew e ku jêderka peyvê li peyva kevin "Hindo-Cermanî" were vegerandin, ku di gelek zimanên ewropî de, bi cûrbecûr celeb xuya bûye, di nav wan de "Theos" yûnanî ye bi wateya Xwedê, û "Dieu" bi firensî tê wateya Yezdan. Li gorî vê yekê, "Melek Tawûs" "Qiralê ku Xwedê ew ji jor daxistiye", û ew li gorî efsanenasî "mîtolojî"ya Êzîdiyan yekem çêbûyê zindî ye ku ji hêla Xwedê ve hatiye afirandin.

38- Kakayî: Ew şopînerên ola ku li başûrê Kurdistanê (Kerkûk û derdora wê) û li rojhilatê Kurdistanê (Kirmaşan, Pawe û Hewraman) wekî "Kakayî" têne zanîn, ku ew wekî "Ehil-ElHeq" an şopdarên ola Yarsanî ne, û pirtûkên wan ên pîroz bi zimanê Kurdî (Zaravayê Goranî) ne, di nav de Dewreyî Behlewî û Defterî Pirdîwerî têne gotin ku pirtûka paşîn gotinên siltanê Sahak bi xwe ne, ku li ba şopînerên vê olê xuyangê Xudan e. Xudan yekemcar di teşeya Xawendkar de, her weha di teşeya Siltanê Sahak de, bi kirasguhertina

giyan û (Mizherî) xuyangiyan re xuya bû. Xudan vê dinyayê bi navgîniya heft ferîşteyan rêve dibe, yê herî mezin Pîr Benyamîn e, û di nav wan de jinek jî heye, navê wê Dayika Rêzwar e, li ba wan ew pir cihê pîroziyê ye. Ola Kakayî mîna ola Elewî û ola Êzîdî ya rast olên civakî ne, wate ew bi aliyên civakî yên mirovan re têkildar dibin, û têkiliya mirov û mirov ji bo wan a pêşîn e. Ola Yarsanî (Kakayî an Ehil El-Heq) bi "Elî Îlahî" re tu têkilî nîn e.

39- Ji bo jînenîgariya jiyana van kesayetiyan, hûn dikarin li du çavkaniyên jêrîn vegerin: Mihemed Emîn Zekî: Di serdema misilmantiyê de Navdarên Kurd û Kurdistanê, ji hêla Mihemed Elî Ewnî ve wergerandin, Qahîre 1366 koç / 1947 Z. Ebd El-Kerîm Mihemed El- Muderis: "Zanayên me di peywira Zanist û Ol de", ji hêla Mihemed Elî El-Qeredaxî ve hate weşandin, Çapa Yekem, Dar El-Huriye ya çapkirinê - Bexdad, 1403 koç / 1983 Z.

40- Binêre: Şêx Mihemed El-Xal (Pend û Bêjeyên Kurdî), çapa duyemîn, Silêmaniyê 1971ê.

41- Di nivîsê de peyva "desteserkirin" li şûna "vekirin" hatiye bikaranîn. Ji ber ku Osmanî xwe wekî misilman diyar dikirin. Lê tenê hinekî pê dikin, eger em nebêjin qet pê nedikirin. Di derbarê peyva "Stenbol"ê de, ev têbîniya me ya jêrîn heye: Neteweperestên demargêr ên Tirk tiwêj dikin ku peyva "Astana" ji Stenbolê ji "Islam Pol" a Tirkî ye, ango "welatê Misilmantî" an "cihê misilmantî" û ev guherîn û şêwandina rastî û dîrokê ye. Bêjeya "Stenbol" ji navê Yûnanî "Konstantinopolis" hatîye berevajîkirin, û bajar berî ku bikeve destê Tirkan ji hêla Yûnan û Kurdan ve hatibû niştecihkirin. Di navbera dewleta Bîzans û dewleta Kurdê

Dostkî, ya xwedan şaristaniyek birûmet de, têkiliyên dîplomatîk û bazirganî hebûn (Binihêre: Ebd El-Reqîb Yûsif: şaristaniya dewleta Dostkî li Kurdistana Navîn) Jêdera berê.

42- Binêre: Wergerandina jiyana Mewlana Idrîsî Bedlîsî, di pirtûka "Zanayên Me di Peywira Zanist û Olê de" ya Ebdulkerîm El-Muderis (jêdera berê).

43- Dr. Bilêc Şêrgo: (القضية الكوردية، ماضي الكورد وحاضرهم) Ji weşanên "Xoybûn Civata Neteweyî ya Kurdî" ye, Belavoka Pêncemîn 1930î- Çapa Duyemîn, Dar El-Katib, Beyrût 1986an rûp. 45 Dr. Bilêc Şêrgo nasnavê Mîr Celadet Bedir-Xan e, ku berê bi çend paşnavên din dinivîsand, wekî Herekolê Azîzan. (Ya Rastir navê Sureya Bedir-Xan e. Sureya birayê Celadet ê mezin e) (Wergêr).

44- Dewleta Brusya ya Almanî, di sedsala borî de, hevalbenda Tirkên Osmanî bû. Mîrnişînên Kurd di bin giraniya êrişên leşkerî yên ku ji hêla hêzên Osmanî ve bi çekên Elmanî hatibûn destpêkirin, hilweşîyan. Serbazên Elmanî pêşengiya van şeran dikirin, ji wan efserê Elmanî Hêlmot von Moltkê jî, ku pişt re di sipahê Elman de bû Fêld Marşal. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, Elmanya carek din bi Şahinşahiya Osmanî re, û bi rastî jî bi Rêxistina Tirk a Ciwanan a faşîst re, ya ku Sultan Ebdul Hemîd bi alîkariya dewleta Elmanya hilweşand. Ji ber vê yekê, hêzên Rêxistina Ciwanên Tirk Ermenî ji holê rakirin û li Kurdistanê komkujiyên bitirs saz kirin. Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, Tirkiye li kêleka hêzên Elman ên Nazî neket şer, lê serokên rejîma Etatirk bi dizî bi Hîtler re li hev kirin ku ji Çînê heya Qefqasiyayê dewleta Turanî ava bike, xewnek e ku rêberên Tirkiyê îro hewl didin ku bi xapandina Emerîka û Ewropa

biserkevin. Di 18-6-1941an de, Tirkîye bi Elmanya Nazî re "Peymana Dostanî û Hevkariyê" şanênav (îmze) kir. Ji nameya nihênî ya ku ji hêla Baron Ernst Faytizker, wezîrê almanî yê karûbarên biyaniyan, ji wezîrê karên derve yê almanî Rîbenterop re şandî, diyar dibe ku di civînekê de, Hîtlêr û nûnerê Tirkîye Nûrî Paşa beşdar bûn peymanê damezirandina dewleta Turaniyê hate encamdan.

45- Pirtûka me ya li ser Mîrê Kor e, ya bi Elmanî ku di 1970an de, li Hamburg hate weşandin, bibînin. Derbarê wergera erebî de, ew li Hewlêr, paytexta Komara Federal a Kurdistanê di 1994an de, hate çapkirin, bi vî rengî: Cemal Nebez: Mîrê Kurd Mihemed el-Rewandizî, bi nasnav "Mîrê Kor" li ser rûpela awêneya girove û şayetiyan Rojhelat û Rojavayî, alîkariyek zanistî ji bo lêkolîna dîroka Kurd, ew di rengê vekolîneke zanîngehiyê de hate çapkirin. Di 1970an de, ji elmanî bo erebî hate wergerandin: Fexrî Silahşor. Ji weşanên Ekaademiya Zanist û Hunerê ya Kurdî, Hewlêr/Erbîl 1994an.

46- Mîr Şeref-Xan El-Bedlîsî: El-Şerefname di dîroka dewlet û Mîrnişînên Kurdî de: veguheztina wê bo zimanê Erebi, Mela Cemîl Mela Ehmed El-Rojbiyanî, Bexda 1372 koçî / 1953z, rûp. 21.

47- Iraq El-'Acem welatê çiya ye, ku yek ji parêzgehên welatên Iranê ye ku dikeve ser sînorê Iraqa Erebi (çavkaniya berê) Hejmar 46, rû.21.

48- Ermenistana Piçûk welatekî bi navê wîlayeta Adna - Kîlîkya û Ermenistana Mezin e. Berê jê re digotin welatê rojhilatê Gola Wanê û çiyayên Qefqasiyayê, di nav de bajarê Aran (Yêrêvan), (çavkaniya berê) . jimar:. 46, rûpel 21.

49- Iraqa Ereb, li rojava û başûrê Iranê ye. Derbarê Diyarbekirê de, ew bajarekî navdar ê Kurd e, û navê wê yê resen Amed e, ku cihê Mediyana diyar dike. Li Kurdistanê gelek bajar û dever hene ku paşeroja Mediya nîşan didin, di nav de, Amedî. Ereban ew, berevajî, kirin " 'Amadiye", ji ber ku wan navê "Amed" kirin "Diyarbekir", û navê Amede= Amîde bi "Amûda" guhertin.

50- - 51- ji bo bêtir agahdarî di derbarê vê heyama demê de, hûn dikarin semînera ku min bi zimanê Ingilîzî li Zanîngeha Parîsê di 28/11/1993an de, bi boneya konferansa navneteweyî ya di bin navê (zimanê Kurdî di dawîya hezarsaliya duyemîn de):

Cemal Nebez: The Kurdish Language from Oral Tradition To Written Language, Lecture given on 28 November 1993 in Paris at the Conference: The Kurdish Language Towards the year 2000, Conference organised by Sorbonne University and the Kurdish Institute of Paris 28-29-11-1993. Her weha semînera ku min di 7-2-1994an de, li Elmanya di (Theodor-Heuss Akademir Gummersbach) de, di bin navê Ziman û Wêjeya Kurdî de (Die Kurdische Sprache und literatur) bi elmanî da, lêkolîna ku min bi almanî di bin navê " Zimanê nivîsandinê li ba Kurdan "di Ferhenga Lêkolînên Îranî de, Leiden 1975, rûpel 97-122: Cemal Nebez: Die Schriftsprache der Kurden, li Acta Iranica, Monumentum H. S. Nyberg, (deuxieme Serie, Volum II, Leiden 1979, s. 97-122.

52- Mela Ehmed lawê Mela Mihemed ê Buhtî ê Zivingî

العقد الجوهري في شرح ديوان الشيخ الجزري، الجزء الثاني، قامشلي
1959، ص428 .

53- Ehmedê Xanî, dema ku ew 44 salî bû di 1061ê koçî (1694-1695z)an de, sala nivîsandina vê pirtûka hêja bi dawî dike, û xwendevanê zimanê almanî dikare semînera ku min li Literaturhaus Viyana di êvara 22-10-1993an de, li ser vexwendina ji hevalên gelê kurd ên Nemsayê bibîne. Gotar di çapa duyemîn a wergera almanî ya Mem û Zîn de, ku ji hêla Komeleya Dostên Gelê Kurd û Akademiya Zanist û Hunerê ya Kurdî ve di 1994an de, bi alîkariya Wezareta Hînkariyê ya Federal û Huner li Nemsayê belav bû. Bala xwe bidinê ku ev şaheser yekem car di 1960an de, dema ku ez li Zanîngeha Hamburgê xwendekar bûm, hate wergerandin û ew ji hêla Rêxistina Nukse ve di 1969an de hate çapkirin.

54- Binêre: Doreza⁽⁵³⁾.

55- Bala xwe bidin peyva " Dêw" û wê bidin berhev bi gotina kevin a El-Mesûdî û yên din re ku dibêjin "Kurd rêgehek ji cinan in ku Xwedê perda veşartî ji ser rakiriye."!

56- Heman tiwêj e di "Salname, Welayeta Diyarbekirê" ya di sala 1884an de hatiye kirin (li jêr dorezê hejmar 30 binihêrin).

57- Binihêrin: li El-Bedlîsî: El-Şerefname, çavkaniya berê, rûp. 2.

58- Bi zimanê Farisî:

زبان عرب اول و آخر است فارسی شکر است

ترکی هنر است کوردی گوز خر است

59- Bi zimanê Kurdî:

Herçend mewaçan farisî şekiren, Kurdî celay min bes şîrîntiren Malumen ce dewir dinya bedendêş, Dilşaden herkes be zimanî wêş.

60- Bi zimanê Kurdî:

Ereb înkârî fezlî êwe nakem, efzelin emma, Selaheddîn ke dinyayî girt, le zumrey Kurdî Baban bû.

61- Şemseddîn Samî: Ferhenga zana, beşê pêncemîn, Stenbol 1314 koçî, 1896-1897z, rûpel: 3842.

62- Şêx Marifî Nûdê, Şêx Me'erûf el-Nûdihî Ehmedî, çapa duyemîn, Silêmaniyê, (Çapxaneyê Jiyan) 1935.

63- Şêx (Me'erûf)î Nûdihî, Şêx Meerûf El-Nûdihî, jêdera berê, pêşgotin: Ji bo bêtir agahdarî li ser zanist û qenciya Şêx Meerûf, mirov dikare pirtûka: "Şêx Meerûf El-Nûdihî El-Berzencî" ya Şêx Mihemed El-Xal , Bexdad 1961.

64- Xêr Ellah Telfah: Yekemîn dijminê Ereban gelnewaz e, çavkaniya berê, rûpel 14-15, rûp. 17.

65- Ya Tirkmen, ew gelê Asya Navîn in ku yek ji zaravayên Tirkî diaxivin, ku mîna hemî zaravayên din ên Tirkî, bêjeyên Erebi, Kurdî û Farisî tê de hene. Koka regeza Tirk û Tirkmen ji Çiyayên Altay e, ji ber vê yekê zimanê wan, di warê dabeşên felolojî de, zimanê Tayî ye. Koçberiya Tirkmen û Tirkan ji welatê xwe yê resen ber bi welatên xîlafeta misilmanî ve, ku Iran, Kurdistan, Iraq, Anatol, Şam, Hicaz û yên din tê de bûn. Di serdema Xelîfeyê Ebasî El-Mu'tesim

Billah de, dest pê kir, yê ku di 833 zayînê de, xîlafet bi dest xwe xist. Dema ku vê yekê hejmarek Tirkên ku li Xuresan û li welatên li pişt çem dijiyan, anîn Bexdadê, û hêzek şervanî ya wan di rengê çeteyên kirêdar de, bi navê "Ciwanên Tirk" ava kir da ku xwe li hember dijberên xwe ji Ereban, Farisan, Kurdan û Romanan biparêze. El-Mu'tesim ev çeteyên, ku ji hêla du Tirkên xwîn mij, (Itax û Wasîf) ve dihate rêvebirin, da ku welat talan bike û gel tazî bike. Nemaze li Kurdistanê, û herwekî di salên şoreşa şoreşgerê Kurd Babik El-Xirmî de, ku di vê semînerê de û her weha di vemirandina serhildana serokê Kurd ê Êzîdî Cafer lawê Hesên (Mîr Cîjin) de, li Mûsilê hate bibîranîn.

Gava ku El-Mu'tesim gihîşt "armanca xwe ya xwestî", ew ji hev belav kirin û ji hev veqetandin. Ji ber vê yekê, hin ji wan veqetandin welatên xwe, û hin ji wan li Kurdistan û Iranê bûn çete, û beşek piçûk ji koma Beyat û El-Efşar li Kurdistanê bicih bûn. Dema ku dewleta Biweyhî di destpêka sedsala çaremîn a koçî de hate damezirandin, û Kurdistan, Iraq û Iran desteser kir. Tirkan raje û peywirên xwe pêşkêşî serokên wan kirin, û bûn kirêgirtiyên Biweyhîyan. Ji ber vê yekê, wan Xelîfê Ebasî El-Mustekfî Billah kuşt, û wir wêrankirin û pir gendelî belav kirin. Lewra du serokên kurd ji bo wan derketin holê, yek jê dewleta Hesnewî ya li Kurdistanê bû, ku tê de herêmen Rolistan û Xuzestanê hebûn. Ya duyemîn jî mîrnişîniya Kurd a Şahînî li herêmen El-Kût û El-Ehwar hebû. Di destpêka sedsala pêncemîn a koçî de, Tirkên Selcûqî, bi pêşengiya Elib Arslan, karîbûn mîrnişîneke bi hêz ava bikin. Ji ber vê yekê, wan deverên di

bin bandora herdu dewletên navborî yên Kurd, bi dest xwe xistin, û her weha warên di bin bandora Biweyhî û Xiwarizmî jî desteser kirin. Piştgirî dan xîlafeta Ebasî. Dûv re êrîş û pelamarên Cengîz-Xan ê Mexolî (1203-1226), û Holako yê Teterî (1258), ku xîlafeta Misilmanî ji holê radikirin. Ji ber vê yekê xwîn wekî çeman li Kurdistanê, Bexda û Iranê herikîn. Ji hingê ve, Tirkmen li hin deverên Kurdistanî yên Azerbeycanê bicîh bûne û ji bo Tirkkirina wan dixebitin. Her weha li Bexdad û Kurdistanê, Amed (Diyarbakir), Kerkûk û Şehrezûr, hin rêveberiyên piçûk ên Tirkmen hatin damezirandin. Gava ku Tîmûrleng ê Mexolî (1332-1369) xuya bû, wî hemî rêberiya navçeyên Tirkmen ji holê rakirin, û şerê hukûmeta Osmanî kir ku li bakurê rojavaya Asyaya Piçûk, di dawiya sedsala sêzdehê zayînî (1299) de, hatibû damezirandin, û di sala (1401/1402z) de, Tîmurling ê Mexolî Sultan Bayezîd ê Osmanî dîl girt. Kurdan karibûn dîsa xwe bigihînin hev û Tirkmenên dagîrker ji Kurdistanê derxînin. Ji ber vê yekê, wan li Mîrnişînên Buhtan, Bitlîs, Mukriyan, Ardelan, Şehrezûr û Badînan gelek mîrnişînên serbixwe saz kirin. (li pirtûka "Şerefname" ya zanyar û mîrê Kurd, Şeref-Xan El-Bedlîsî, ku di vê semînerê de, hate bibîr anîn vegerin). Dema ku Sefewî di destpêka sedsala panzdehê zayînî de, li Iranê xuya bûn, û ew bi koka xwe ji malbatek Kurd bûn, û şêxên derwêşên Sunî bûn; lê ew bûn Şîî, û piraniya supahên wan Tirkmen bûn. Pevçûnên dijwar û bixwîn di navbera Sefewî û Kurdan li aliyekî û di navbera Sefewî û Osmanîyan de, ji aliyekî din rûdan. Sedemên berçav yên vî şerî demargêriya rêgeyî ya kor (Şîî - Sunî) xuya dike. Sefewîyan hewl dan, wekî ku di vê semînerê

de hate gotin, serweriya Kurdan ji holê rakin. Kurd bi Osmaniyan re li hev kirin û di cenga navdar a Çaldêranê de, Sefewî têk birin. Di sala 1523/1524.z de, serokê Kurd, Zulfiqar Gulhor, karibû Bexdad dagîr bike û heya 1555/1556.z serweriya wê bike, û wî ew bi dilxwazî radestî Siltanê Osmanî Silêmanê Qanûnî kir. Piştî vê heyamê, Tirkmenên mayîn yên li Kurdistanê û Iraqê tevî Osmaniyan bûn, û ew li herêma (Toz Xurmat), bicih kirin, ku navê wî li gorî lêkolînên zanyarê Kurd ê mezin Mihemed Cemîl Rojbiyanî, ku di zimanên Kurdî, Erebi, Farisî û Tirkî, û di dîroka gelên misilman û têgehiştina misilmantiyê de, baş zana bû. Di zimanê Kurdî de, (Xwê Lên) wateya wê "xwê" ye, û di zimanê Tirkî de, (Toz) jî wateya wê "xwê" ye, û di zimanê Erebi de, bêjeya (Xwê lên) hatiye guherîn (Xulincan = Xulingan). Ji bo Tirkan, wan li ser peyva xwê (Toz) du peyv (Xurma = xurme) bi zimanên kurdî, farisî û tirkî û (Tû) zêde kirin, ku ew sê tişt in ku Tîmor Ling bi xwe re hilgirtibûn. Derbarê Sefewiyan de, di dema şerên wan dijî Osmaniyan û Kurdan, û dagîr kirina wan ji Iraq û başûrê Kurdistanê 1502-1524 re, wan Tirkmenên Şîî ji Azerbeycanê anîn û li hin deverên başûrê Kurdistanê bicih kirin, wek Kifrî - Taze Xurmato - Qure Tû - Beşîr – Lihîlan, û wan bingehê leşkerî ji wan re ava kir, û deverên navborî deverên berdar û ji çandiniyê û xwedîkirina ajalan re bikêrhatî ne. Gava ku Sefewî piştî têkçûna xwe ya şermezarker vegeriyan welatê xwe, Tirkmen bi wan re venegeriyan, ji ber ku debara wan baş bû. Di serdema Osmanî de, Osmanî dixebitîn ku zimanê Tirkî li Kerkûkê belav bikin, û piraniya malbatên Kurd ên kevnare zimanê Tirkî di danûstendin û axaftina xwe de

bikaranîn. Tê zanîn ku gelek demargirtiyên Tirkmen bi reh û koka xwe Kurd in. Hene, wek Şakir Sabir, ku dihat gotin û bi navê Şakir Nanhiwa (Nanpêj), û her weha malbata Hacî Ata axa li Erbîl/Hewlêr, ku ji êl û eşîra Gihirdî ya Kurd e.

Ji damezirandina dewleta Iraqê ji hêla Ingilîzan ve û heya dawiya dema Şahane li Iraqê 1921-1958, Tirkmenên bi bandor ku li başûrê Kurdistanê dijîn, tu rola wan tune bû, ji bilî dilsoziya tevahî ya dewleta Tirk dikirin, û dewlemendên wê bazara deverên ew lê dimînin, di destê wan de bûn, û dema ku Hevpeymanî Bexdadê ya mêtîngiriyê li dijî gelê Kurdan û tevgera rizgarîxwaz a Ereb bi hemû hêza xwe ve, hate şanavkirin (îmzekirin) û ji hêla Tirkmenan ve hatin piştgiriya kirin. Ji ber ku dewleta Tirk yek ji endamên hevalbendê wê bû li rex Iran, Pakistan, Birîtanya û Iraq. Yek ji serokên wan, ê ku berê me gotî, Şakir Sabir, pirtûkek bi navê "Kurteya Dîroka Tirkmenan li "raqê" nivisand da ku pesnê Hevpeymanî Bexdadê ya êrişker bide û tê de, wî jî tiwêj kir ku hin eşîrên Kurd bi reh û koka xwe Tirkmen in (kurtêlxwer).

Dema ku serok Ebdul Kerîm Qasim di 14ê Tîrmeha sala 1958an de, Şahane li Iraqê hilweşand û pergala komarî ragihand, Tirkmenên Toranî ji roja yekem de, li dijî wî sekinîn. Gava yek ji pêşengên wan, kolonêl Omer Elî, serhildana li dijî raperînê ragihand, yekser ew hate girtin û pêşkêşî "Dadgeha Gel" hate kirin. Dema rêberê Kurd nemir Mustafa Barzanî ji penaberîya Yekîtiya Soviyetê vedigere, di dawiya cotmeha 1958an de, serdana Kerkûkê kir û li wir bû

mêvanê Yaneya Efseran. Turaniyan hewl dan ku li Kerkûkê dijberiyê çêbikin, lê girseyên gel û leşkerên Kurd ên li Kerkûkê bilez agirê gelç, gelacî û dijminatîyê vemirandin. Tirkmenên Toranî li dijî femandariya Qasim bi Be'esî û dijminên Qasim ên din re hevkar bûn ji ber ku wî doza hevkarîya Ereb-Kurd li Iraqê dikir, ji ber ku peymanax Bexdadê her û her hate rûxandin. Yek ji serokên wan, Nazim El-Tebeqcelî, ku serfermandarê dabeşkirina Kerkûkê bû, digel kolonêlê Be'esî Ebd El-Emîr El-Şewaf, femandarê wîlayeta Mûsil, beşdarî di geşkirina agirê tevliheviyê "Pîlana Şewaf" li Mûsilê kir. Di 14ê Tîrmeha 1959an de, serokên Tirkmenên Toranî, digel Be'esî û ajanên pardariya Petrolê ya Iraqê, ji bo xapandina Komunîstan, pîlanek kirêt lidar xistin. Yê ku piştgiriya didan Qasim ketin xefikê, û Komunîst jî rastî ketin davê, û pevçûnên birakujîyê di navbera Toraniyan û Komunîstan de rûda, û ev bû sedema kuştina hejmarek Tirkmen, ku ji hêla Toraniyan û Be'siyan ve, wekî kirasê Osman, li dijî tevgera demokratîk a Iraqî û çalakiyên siyasî yê Kurdan dihatin bikaranîn. Piştî wê, hevkarîya Toranî û Be'esî pir nêz bû, ji ber ku Turaniyan, bi hevkarîya Be'siyan, li Kerkûkê komên çete yê çekdar damezirandin ku hejmarek mezin ji Komunîst, Kurd, demokratên Ereb û heta hin têkiliyên wan bi Komunîstan re tune bûn, ew jî kuştin, di nav de Sidîq Bilokîni, sernûserê "Ray Gel" li Kerkûkê, yê ku berpirsê şaxê Kerkûkê yê Partiya Demokrata Niştimanî ya Iraqî bû bi serokatiya -Xwedêjêrazî- Kamil El-Çadirçî. Gava ku me, komek mamosteyên Kurdistanê, bi navê "Mamosteyên Azad" yadaşteke pêşkêşî Qasim û wezîrê perwerdehiyê wî Dr.Cabir Omer kir, tê de wan daxwaz kir ku

gelê Kurd mafên xwe yên çandî ji hêla damezirandina Rêveberiya Zanîna Giştî ya Kurdistanê ku bingeha wê li Kerkûkê be. Toraniyê navborî, Nazim El-Tebeqcelî, ku paşê hate bidarvekirin, bi me re şer kir (binihêrin Bîranînên El-Tebeqcelî). Tevlihevî û gelaciyên wan dijî mafên çandî yên gelê Kurd dom kir heya radeya ku wan konferansek bi navê "Konferansa Mamosteyên Tirkmen" lidar xist, û tê de wan dane xuyakirin ku Tirkmen naxwazin li dibistanan bi zimanê xwe, lê bi zimanê Erebi bixwînin, ne ji hezkirina ji zimanê Erebi û Ereban bê guman, belkû neyarî ji bo gelê Kurd û dijberiya bê rûmet, li hember biryara Civata Mamosteyên Kurd, civîn li Şeqlawa di 11-13/ 9/1959an de, hate lidarxistin û biryarek derxist ku zimanê Kurdî li Kurdistanê bibe zimanê perwerdehiyê. Fatih Beg, rêveberê dibistana amadeyî ya Kerkûkê di wê demê de, li ser vê yekê serbêj kir. Ew yek ji Tirkmenê hêja yê neteweperest bû di heman gotina pêşyan a Kurdî de ku dibêje, "Kerê kotî, dixwest ku mirina wî tenê zirarê bide xwediye wî" û wî got, "Dijminatîya Kurdan ew kor kiriye. " Ji xelkên wan dîdevanekî dîdevanî kir.

Piştî wergêrana Be'esiyan a bextreş di 8ê Sibata 1963an de, Toraniyan di nav Tirkmenan û komên Be'esiyan faşîst de, ku wekî "Parastina Neteweyî" tê zanîn, li dijî Kurdên bêguneh bi her şewazên cûda re peywir kirin. Lêbelê, Be'esî û serokê wan Sedam bi tu mafê wan aşartin nekirin. Bê dudilî dest bi kuştin, zindankirin û koçberkirina wan kirin. Ji ber ku Be'esiyan ew ne wek hemwelatîyên Tirkmen ên ku mafê wan e ku ji mafên xwe yên neteweyî sûd werbigirin, didît. Lêbelê, wan ew wekî sîxurên dewleta Tirk didît. Hin

serokên wan xwe spartin herêmên rizgarkirî yên Kurdistanê û di bin parastina şoreşa Kurdî de dijiyan. Dema ku di Adara 1970an de, di navbera hikûmeta Be'es û serkirdayetiya rehmetî Mistefa Barzanî de, Peymana Adarê hate şanavkirin, Be'esî neçar man ku Mafê Rêveberiya Xweser a gelê Kurd, heya demekê be jî, erê kirin. Ji ber ku mafên Tirkmenan di Rêbazên Şoreşa Kurdistanê ya Kurd de, hatine destnîşankirin. Be'esiyan hin mafên çandî dane Tirkmenan, ku ji hêla herdu aliyan ve, Be'esî û Toraniyên Tirkmen bi heman rengî, li dijî gelê Kurd hatin bikaranîn, ji bo ku herêmên Kurdî perçe bikin. Lê, piştî ku şoreşa Kurdî di Adara 1974 de dîsa geş bû, Be'esiyan ew maf, gav bi gav, ji Tirkmenan paşve kişandin, û ew li dû çalakvanên Tirkmen bûn yên ku neçar man birevin û xwe li serkirdayetiya şoreşa Kurdî li çiyayên bakurê Kurdistanê yên bi rûmet bigrin. Serkirdayetiya Kurdî ew hêmin kirin, ji birçîbûnê têr kirin, û ew ji tirsê parastin, di nav wan de jî Izedîn Koçewe, wekî me diyar kir. Di serhildana girseyî ya birûmet ya di Adara 1991an de, li Kurdistan û Iraqê li beramberî rejîma Sedamî ya xwînmij û azadkirina piraniya herêmên başûrê Kurdistanê, di nav de deverên ku ji hêla hindikahiya Tirkmen ve hatine niştecihkirin, Kerkûk jî tê de, Tirkmen tu rola wan tune bû. Piştî şikestina Sedam ya kirêt li Kuweytê, berê leşkerê xwe da Kurdistanê. Bi hêzeke mezin û giran, û ji nû ve dest bi qirkirinê (Enfal) kir, û bi pozbilindî, pir xwedîtîn û çavsofî êrîş kir. Li gorî gotina pêşiyana a ku dibêje (Yê qûnek li ber xalê xwe mêrxas e), ku bû sedema koçkirina du mîlyon mirovên Kurd ji tirsê çekên kîmawî, û hemî cîhanê berê xwe da qurbanên girseyî yên ku gelê Kurd li gorîgeha azadiyê

daye. Ji ber vê yekê, ji bo Kurdan herêmek bi navê "herêma ewledar" hate damezirandin û hindikahiyek pir piçûk a Tirkmen lê dijîn. Gelê Kurd çî ji destê wan hat berê xwe didin Tirkmenên li herêma dimînin û yên koçber bûne. Ji ber qencî û dilpakîya xwe ku tim pê serbilind e. Di şev û rojekê de, Tirkemen bûn xwedan dibistanên taybet bi zimanê xwe, radyo û televizyon, kovar, rojname û heta partiyên siyasî, tevî gefên Sedam li Bexda û alîkarên wî yên li Kurdistanê. Li şûna ku serkirdayetiya Tirkmenên Toranî rûmetek nû ya biratî û hevgirtinê ji gelê Kurd re spas bikin û ji bo bi qencî û comerdiya kurdan rûnên û başiya wan li wan vegeştin, ew ji dewleta Tirk a ku bakurê Kurdistanê desteser kiriye û dijminê her tiştê Kurd e. Ew dewleta ku hîn jî bi lingên leşkerên xwe yên barbar mafên bêtirî bîst mîlyon Kurd bîpê dike. Tirkmen li dibistanên xwe dest bi fêrkirina zarokên xwe bi sirûdên faşîstên Tirkan kirin, yên ku mebest ew e ku ji hêmana Tirkan bilindtir û xurtir bikin, û her pesnê Etatirk bidin, ew zîlamê ku Hitler li ser wî gotibû, "Etatirk mamosteyê min e." Her weha ew rewşa aborî ye xirab a gelê Kurd li başûrê Kurdistanê rencxorî dikin; ji ber vê yekê ew dirav û xwarina ku ji dewleta Tirk digirin, li nav Kurdên belengaz ên li Hewlêrê belav dikin, li beramberî ku ji wan înzeyên ku ew "Tirkmen" in, werdigirin, ku ew di domandina siyaseta Tirkkirinê ya tawanbar de ku Tirk ji damezirandina xwe ve di 1923an de, heya îro şopandiye, pêvajoyeke Tirkperest û faşîst bi rê ve dibin. Ev hemî li ber çavên tevahî serkirdayên Kurdên ku başûrê Kurdistanê bi rê ve dibin, û bi hev re di nav nakokiyê de ne, pêk tê, da ku rojnameya "Iraq", rojnameyek e ku li ser navê Kurdên

dilsozên rejîma Sedam Huseyn daxive, gotarek belavkir tê de hate gotin ku sîxurên Tirk, di rê de, "damezirandina dibistanên Tirk ji bo Tirkkirina Kurdan û belavkirina çanda tirkî û peydakirin û serbazgirtina xinizan" çalak bû. Ji hêla rojnameya El-Şerq El-Ewset ve, hatiye veguhestin: "Bexdad Enqereyê bi Tirkkirina Hewlêrê tawanbar dike." Nebûna şerm û fedî, û dijminahiya ku di dilê Toraniyan de, li dijî gelê Kurd hatî veşartin gihiştîye radeyeke ku nûnerê bi navê "Eniya Tirkmen a Iraqî" Ismet Qocaq ji nûçegihanê "El-Şerq El-Ewset" re û rûşûştî û bêserûçav, dibêje: "Em red dikin ku ji bakurê Iraqê re bibêjin Kurdistan." Wî hizir dikir ku li "herêma bakurê Iraqê tu Kurd bi tenê najîn, lê Tirkmen, Suryanî, Zêbarî, Êzîdî û Ereba hene. Di heman çarçoveyê de, Tirkmen wekî beşekî ji "neteweya Tirk" hate berçavkirin. Wî tiwêj kir ku jimara Tirkmenan li Iraqê %21 gelhe û nifûsa giştî ya Iraqê ye. Erê, Qocaq Beg napejirîne ku ji Kurdistanê re bêje Kurdistan, ji ber ku li Kurdistanê çend hezar Tirkmen hene. Lêbelê, dewleta çêkirî "Tirkiye" tevî ku bi mîlyonan Ereba, Yûnan, Laz, Çerkez, Ermenî û Aşûrî hene û zêdeyî bîst mîlyon kurdên xwecihî yên resen hene, ji mafê wê ye xwe wekî "Tirkiye" bi nav bike. Bi rastî, wekî ku tê gotin, "Şermî dilopek e". Wekî din, berçavkirina Zêbarî, ku ji bilî Kurdan êlek Kurdî ya resen e, û berçavkirina Êzîdiyên ku ji bilî Kurdên Misilman, ji bilî Kurdan resentir in, nezanîn sekêş û debengî ye berî ku ew demargêriyeke kor be. Mayî pêkenîn e ku Tirkmen %21 gelhe û nifûsa Iraqê ne. Ger hejmara giştî ya Kurdan du caran Tirkmen baya, wê hingê dê rêjeya Kurdan % 42 baya; ango Kurd û Tirkmen %63 gelhe û nifûsa giştî ya Iraqê pêk tînin, û li Iraqê neteweyên din jî hene, wek

Aşûrî , Firis û Saibî ... Gelo dê Qocaq beg ji sedî çend bide Ereben "xizan"? Tirkmen bi giştî li Iraqê herî zêde ji dused hezar kesî pêk nayên.

66- Heya ku mijara bajarê Kerkûkê têkildar e, di ferhenga zanyarî de hate vegotin ku gelhe û nifûsên Kerkûkê sî hezar kes bûn (23 hezar ji wan Kurd bûn û 7000 jî Tirk, Cihû, Kildanî, Ermenî û Ereb bûn).

67- Li pirtûka "Efsaneh Xalqhaî Iran" (Efsaneya Gelên Iranî) ya M. Makan, Florens, Îtalya 1969, (Bentah Intîşarat Mizdek), rûpel 3-10, binihêre, ku hebûna gelên Iranî tenê nadar dike, lê Kurd, Tirk, Azerî, Bilûc û yê din wekî "Êlên Farisî" û zimanên Kurdî û Azerî "Zaravayên zimanê Farisî" dibîne. Her weha, li kovara "Nehdet" (Raperîn), binihêrin, ango ya ku ew ji xwe re dibêje (Raperîna liberxwedana neteweyî ya Iranê). Şapûr Bextiyar Serokwezîrê dawîn ê Iranê ye, di serdema Şahê rûxandî de, li Parîsê hate kuştin. Vê kovarê, di hejmara xwe ya 50an de, ku di 6. 10. 1983an de, hatiye weşandin, gotarek bi navê (Kurd, kurs û mîrza Mukrî) nivîsiye ku tê de tiwêj kir ku Iran ne welatekî pirnetewe ye, û Kurd ne gel in. Di vê yekê de, ew li gorî pênameya Stalînî ya netewe, ku "aboriya hevpar" stûnek ji stûnên neteweyê dibîne. Gotar ji Kurdan dipirse "... ku pênameya neteweyî ya Stalîn bipejirînin da ku Iran ji şerê perçebûnê riha bibe"! Di derbarê van desteserkeran de, tiştêk sosret e! Ma ne mat û sosret e ku Bextiyar û hevalên wî ku di nav dijminên herî stûr ên Markisî û Komunîstê de ne. Ji Kurdan dixwazin ku nêrîna Stalînî ya neteweyî

bipejirînin da ku ew bikaribin xwe ji "Şerê perçekirina Iranê" riha bikin. Gotara navborî her weha tiwêj dike ku Kurd "Şaristaniya wan tune" û şaristaniya wan Farisî ye. Hêjayî gotinê ye ku rojnameya "Kîhan", ku li London tê weşandin û nûnertiya komên dilsozê rejîma Şahinşahî ya veşartî û hin Sawakî dike; ew ji xwe re dibêjin "hêzên dijber" li dijî rejîma Xumeynî li Iranê, li pey hev gotaran li dijî Kurdan dinivîse û wan wekî beşek ji Farisan dipejirîne. Di kovarek din de, ku bi navê "Viyam Ma Azadgan", ji hêla Neteweperestên Farisan ve, li Parîsê tê weşandin. Peyama Me Em Azad in, bi serperîştîya Dr. Hesên Ebasî, Dr. Korş Arya Munş, di hejmar 275, 29. 8. 1995an de (Gotarek ku ji lawê Mihemed Reza re hat şandin, Şahê rûxandî yê ku wî amaje bi mafê Kurdan kir ku xwedan rêveberiya xweser bin: "... Di nûçeyê de hate gotin ku Reza Pehlewî got ku" Kurd "azad in ku zimanê xwe li kêleka zimanê Farisî bikar bînin." Mirovên nezan ên ev name nivîstîne ji zimanzanên zimên û zimanê farisî nezan in, ew ta radeyekê nezan in ku "kurdî û Bilocî" yên wekî Cîlkî, Mazenderanî, Xurasanî, Şîrazî û ... hwd zimanên Farisî ne, hemî yên şaxên dayikekê ne, ku li deverên cûda û di awayê zaravayên cihêreng de, xuya bûne. Li Xuresanê, ji agir re Ateş", li Azerbeycanê "Azer" û li Kurdistanê jî "Ar"... hwd dibêjin. S.4). Vî doktorî jibîr kir ku tiwêj bike ku Elmanî û Ingilîzî ji Farisî ne. Ji ber ku keç di zimanê Farisî de "Dixter", di Elmanî de "Tuxter" û di Ingilîzî de "Doter" e ku bêjeyên nêzê hev in! Ez vê bêwatetiyê tomar dikim da ku xwendevanê birûmet ji asta zanistî û çandî ya bilind a van bijîşkên Farisî agahdar bibin, ku ew yên din bi nezaniyê tawanbar dikin, û ew tundrewên nezan û demargêrên rastîn in. Lêkol-

Înên Iranî xwecihkirine - Nivîskarê van rêzikan taybetmend û têgihîstekî di lêkolînên Îranî de ye - ku zimanê Kurdî bi serê xwe zimanekî serbixwe ye, û ew zimanekî Îranî pir kevnare ye. Her ew kovarê dîsa vedigere û piştî ku piştrast dibe ku neteweya Kurd a perçebûyî nikare li hember zordariyê bêdeng bimîne. Belê, ew dixwaze ji bin nîrê setemkarî û çewisandinê were rizgar kirin, û dê Kurdistan, çi zû çi dereng, azad bibe. Ji ber vê yekê, di hejmara xwe ye 279, di 24-10-1995an de hatî weşandin, ew gotarek di bin serenava "Bijî Kurdistana Îranî ya Mezin" de dinivîse. Kurd banga rizgarkirina welatê xwe ji Ereb û Tirkan dikin û wê didin Iranê ji ber ku "Kurd Iranyên resen in", û belgeya wî ji bo vê yekê ev e ku mezintirîn perestgehên "Anahîta" li bajarê Kengawer li Kurdistanê ne. Derbarê rastiya ku Kurd iranyên resen in, ne cihê danûstendinê ye. Kurdan di sedsala heftemîn B.Z. de, li ser navê Imperatoriya Medeya li cîhanê Imperatoriya herî mezin ava kirine û ne cihê nelihevkirinê ye. Lêbelê, rêjeya Kurd, Faris, Bilûc û gelên din ên Iranî bi Iranê re heman rêjeya Alman, Frensî, Swêdî û gelên din ên Ewropî bi Ewropa re ye. Dê ji mirovek Nemsawî were pejirandin ku ji hemî Ewropîyan bixwaze bibin yek û bibin parêzgeheke Nemsawî ji ber ku ew Ewropî ne? An jî gelo, tiştê rast e ku nêzîkê 40 mîlyon kurdên ku li welatekî ji Çiyayên Qefqasiyayê heya Deryaya Sipî, û ji wir jî heya Kendava Kurd a Ereb-Farisî dirêj dimînin, bibin yek û bibin parêzgehek Iranê? Gelî birayên Faris! hinek hiş û fedîkarî gerek e!.

68- Li jêr em perçeyên ji axaftina Dr. Ata Allah Muhaciranî, Arîkarê Serokatiya Komara Islamî ya Îranê ji bo Pirsgirêkên Mafên Mirovan, ku wî di konferansa ku payîza 1976an de, li Senendec, rojhilatê Kurdistanê, ji bo rêzgirtina ji 13 zanyarên navdar ên Kurdistanê. Nivîsara axaftinê di hejmara 123-124 de, rûpel 18-21 ji kovara "Serwe", ku bi zimanê kurdî li bajarê Urmiye, li rojhilatê Kurdistanê, bi alîkariya darayî ya hukûmeta îranî tê weşandin. Muhaciranî li ser pirsgirêka xomilbûn û nasnameyê dibêje: "...Ya yekem, em Misilman in, ya duyem em Iranî ne; piştî van her du xweyeyên resenî, ev xweyeyî ya şaxî tê ser maseya lêkolînê û em wekî Kurd, Faris, Tirkmen, Bilûc, Azerî ne û... hwd. Min ev pêşgotin pêşkêşî we kir ji ber dibe ku ew rengê sêgoşeyî berevajî di hişê me de bikişîne, wate ku rêjeya van sê xweyeyan bi rengê berevajî dibe. Di vê rewşê de, em nikarin bigihîjin damezirandina şaristaniyeke nû û Qiltûreke nû di qonaxa niha de, li cîhanê. Di beşek din a axaftina xwe de, Muhaciranî hewl dide ku vê nasnameya Kurdî ya "Şaxî" bi renegekî mayînde ji holê rake da ku li şûna wê xweyeyiya "şoreşger" dibêje:"... û em, wekî misilmanên Iranê, dema em rêzgirtinê li bîranîna mezin û zanyarên xwe digirin, ji ber ku di serî de em Misilman in, em xwedan pêşwaziyên şûnewar, şaristanî ne, û ji ber ku me Iranî paşnavên Qiltûrî yên rûmetdar in. Weke Kurd, em li vê parêzgehê dimînin û di vê demê de, di bin hin helûmerc û rewşên destnîşankirî de, dijîn. Em xwediyê nasnameyeke sêyemîn in, ango şoreşa misilmanî; ji ber vê yekê, em Misilman, Îranî û şoreşger in. Ev sê xweyeyên bingehîn in ku me bi hev ve girêdidin." Ji vê reftariya bêjeyan diyar dibe ku xweyeyiya Kurdî tu roleke

bingehîn an jî duyemîn nalîze, belkî di binê xweyeyiya "Iranî" û ya "şoreşgerî" de, winda dibe. Her çend Muhaciranî berî "nasnameya Iranî" bi "nasnameyeke misilmanî" tê, lê ev tenê mirovên sade dixapîne. Di Zagona Bingeîn a Iranê de hatîye diyarkirin ku, divê Serokê Komara Iranê mirovekî bi nijadê xwe Iranî be. Ango, kesek misilman ku li Iranê ji dayik bûye, mînakî, ku neteweya wî Iranî ye, heke bi nijadê xwe ne Iranî be, nikare bibe serokê komarê. Nimûneyek vê yekê Celal el-Dîn el-Farisî ye, bi nijadê xwe Efxanî ye, ku xwe ji bo serokatiya komarê kir berendam, û Xumeynî wî red kir ji ber ku ew "bi nijadê xwe ne Iranî bû". Wekî din, ev sîwan û pêça misilmanî ya sexte ku nasnameya Iranî dorpêç dike, dê yekser têk biçê dema yek zanibe ku dewleta Îranê dewleta Şî'îyan tenê ye û ne dewleta Sunî û Şî'îyan e; ev bendeke xêzkirî ya Zagona Bingeîn a Iranê ye. Wekî din, nasnameya Iranî ya berî nasnameya Kurdî her dem tê wateya nasnameya Farisî, ne nasnameya gelên Iranî ye. Ji ber ku zimanê Farisî li Iranê tenê ji bo perwerdehiyê, li beşan, dadgehan, sipahê, û... hwd ye. Qanûna Bingeîn a Iranê vê yekê destnîşan dike. Ango, Komara Islamî ya Iranê pêşaniya reha dide zimanê Farisî. Lê, misilmanî ji bo tu ziman, welat an nijad pêşaniyê napejirîne. Pêşengî tenê ji bo rastbawerên û dîndariyê ye. Wekî din, Hikûmeta Islamî ya Iranê, mîna şovenîstên Faris, tixûbên "Iranê "pîroz" dibînin û doza "yekîtiya xakê" dikin, ku Faris jê re dibêjin "temamîta erdê" û Qanûna sezayê ya Iranê destnîşan dike ku her kesê daxwaza qutkirina beşekî ji xaka Iranê dike, yan heke ev kes li derveyî Iranê bijî, yan ew biyanî be û doza wê dikir, tê sezakirin. (Li koma sezayên ku ji hêla Encumena Şewirmend

ya Islamî ve di 22ê Hezîrana 1997an de, hatiye pejirandin, binihêrin. Paşê hukumeta Iranê sê giravên Tûnba Mezin, Tûnba Piçûk û Ebû Mûsa yên li Kendavê dinirxîne, ku ji hêla hêzên Şah ve hatibûn dagîr kirin (1973) wekî "perçeyek ji xaka xwe" ya Iranê dibîne, û hizir nake ku wê li Îmarata Erebi yên li Kendavê vegeîne).

69- Tu dikarî li daxuyaniyên ku ji hêla Rûhllah Xumeynî û hevalên wî ve hatibûn weşandin, dema ew li sirgûnê li nêzîkî Parîsê bûn, demek kurt berî û piştî hilweşîna rejîma Şahinşahi, vegeî.

70- Rojnameya Farisî "Kîhan Heway", di hejmara 331ê de, li Tehranê tê weşandin, pesnê xwe dide êrîşa Supaha Islamî ya Iranê ya li ser Kurdistanê bi balafirên şer, top û tankan, ku li Iranê an li welatek misilmanî nehatine çêkirin lê di dema şahê jicirakirî, ji Emerîka û welatên Rojavayî hatiye hawirdin, û wê bi gotinê got.: "Bi balafirên şer, top û tankan, supahê êrîşker li Kurdistanê şikandin." Bi gotinek din, gelê Kurd ku doza mafên xwe dike "êrîşkar" hate binavkirin.

71- Xumeynî bi zimanê xwe yê Farisî û di nivîsa jêrîn de wiha got:

”اگر مختصر کوتاهی در امر کردستان به عمل آید و دشمن را هر چه زود تر سرکوب و منکوب نکنند، شخصا به کردستان حرکت خواهم کرد “ کیهان هوائی شماره 332، 14 شهریور 1358، 5-9-1979.

72- Kovara "Armanc" sala pêncemîn, hejmar 25, meha befranbarê 1367 koçî, Ş.1409, H.q, 12 Azer 1358 (kanûna

yekemîn 1979, rûpel 8-9). Ev kovar kovareke îslamî bû ku ji hêla dewleta Iranê ve li Tehranê dihate weşandin. Ew di weşandina xwe de rawestiya.

73- Hevdîtina min û (Rûniştevanê Bihuştan), birêz Muhsin El-Hekîm, (Xwedê ji wî razî be), di payîza sala 1959an de, dema ku ez li Dibistana Amadeyî ya Ce'eferî li Bexdadê, û dibistana Amadeyî ya Ce'eferî mamoste bûm, di wê demê de nêzîkê "Hafiz el-Qadî" li Bexdadê bû, û ew dibistaneke Şîî ye taybet bû, û kargîrê dibistanê Hesên Zilzileh bû. Piştî guherîna Qasim li Iraqê, di 14ê Tîrmeha sala 1958an de, Karûbarên min ji vê dibistanê re çend wane di bîrkarî û matematîkê de hatin kirin.

Di derbarê serdana min ji birêz El-Hekîm re, hevalê min ê hêja, Şêx Ebdul Zehra El-Sexîr bi min re bû , mamosteyê zimanê Erebî û ola misilmanî li dibis-tana navborî bû. Mîrza El-Hekîm ez bi germî pêşwazî kirim û ji min re got: "Silavên min ji xwişk û birayên min ên li Kurdistanê re hene, û ji wan re bibêje: Roja rizgariyê nêzîke û dewleta meymûnan dirêj nake." Pişt re wî ji min xwest ku ez li ser rewşa Kurdistanê raporekê jê re binivîsim. Dema ez vegehiyam Bexdayê, min raporek bi zimanê Erebî, li dora 70 rûpelî, li ser rewşa gelê Kurd û daxwazên wan nivîsand. (Niştecihê Bihuştan) di dawiya salên şêstî de, fetwa xwe derxist, ku şerê di navbera gelê Kurd û leşkerê Iraqî de bêbehrkirin û qedexe dike, (Xwedê giyanê wî şad bike).

74- Binêre: Rojnameya El-Heyat ya Si'ûdî ku li Londonê tê weşandin (19-4-1994).

75- Binêre: Bin Elawî, El-Heyat: (Em bi Iraqê re navinçiyê nakin û di navbera dewletên Kendavê de tu cûdahî tune), El-Heyat, 26/4/1994. Rû.6.

76- Ezîz Şerîf: (Pirsa Kurd li Iraqê). Profesor Ezîz Şerîf ê rehmetî di destpêka 1950an de, bi dizî û bi navlixwekirî û bernavek xwe ev lêkolîn weşand.

77- Daxuyaniya El-'Eqîd Qezafî bi boneya seredana Necim El-dîn Erbekan ya Cemahîriya, di 1996an de hat, û Hevdîtina El-Eqîd Qezafî jî bi şandeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê 1997an re hat, û ji ber ku hîn gotar nehatiye çapkirin, me çêtir dît ku em van du bûyerên girîng li deqê zêde bikin.

78- Ew li ser bingeha gotina hin perçeyên ji bêjeyên nivîskaran bû, yê ku di rûpelên jêrîn ên berhevoka gotar û daxuyaniyên ku Kurdaxî di pirtûka xwe ya "Misilman û Pirsa Kurdî" de, ji weşanên Cûdî, 1994an berhev kirî, xuya bû.

79- Dengê Emerîka-beşê Kurdî, di roja 24-7-1995an de, Nûçeya ku civînek ji hêla Kurdan ve li Waşintonê pêk hat, gelek biryar û pêşniyar derxistin. Yek ji wan ev e ku birêz Se'îd Qezaz, Wezîrê Navxwe yê Iraqê ya di bin dema Şahatiyê de, yê ku ji hêla hukûmeta Ebdul Kerîm Qasim ve hate sêdarkirin piştî guhertina 14ê Tîrmeha 1958an, bi bêdadî hate kuştin, ji ber ku ew Kurd bû hate bibidarvekirin, ji çemeka rêzgirtin û vegerandina rûmetê ji rehmetî Se'îd Qezaz re wekî pakrewan hate pejirandin.

Pêveka hejmara (1)

Li Ser Tevgerên Misilmantiyê yên "Binawangirî-Raperês", Ên di Nav Kurdan û Kurdistanê de

Di gotara xwe de, min bi kurtî mijara têkiliya Kurdên Misilman ên çewisandî bi birayên wan ên ji gelên misilmanî re kir, û bi kurtasî li ser peywirên mezin ên ku gelê Kurd di her astê de, ji misilmanî û misilmanan re, seranserê dîroka misilmantiyê pêşkêş kirine, kir. Her weha min babeta ku gelê Kurd ji birayên xwe wekî xelata dilsoziya xwe wergirt, şirove kir.

Niha, ji bo dûmahîkirina mijarê, ez dixwazim kurtedîtinek têkiliya Kurdan bi tevger û rêxistinên misilmanî re ku li welatê Rojava ji wan re "Misilmana Binawangirî-Raperês" tê gotin, pêşkêş bikim. Ez derbirînek ne rast û durist dibînim. Ji ber vê yekê "Misilmana Hukûmî" an "Dewleta Melan" vegotina herî rast û zelal a wateya "Misilmana Binawangir" e. Bêjeya "Wilayet El-Feqîh = Xawendariya oltêgehî" a ku ji hêla Farisên Şîî'î ve tê bikaranîn û ew tê wateya "Dewleta ku ji hêla El-Feqîh=oltêgeh ve birêve dibe," nêzîkê rastiyê ye. Ger em dîroka Kurdan bi zelalî binirxînin, em dê nas bikin ku piraniya mîrnişînî û dewletên Kurdî yên ku piştî serkeftinên misilmaniyê li Kurdistanê hatine damezirandin, pabendî qanûn û pîvanên misilmanî bûne, û heya dewleta Soran jî di serdema mîrê wê yê mezin Mîr Mihemed ê Rewandizî, bi nasnava "Mîrê Kor" 1813-1836, yasa û pîvanên tixûbên misilmanî jî bikar tanî, zanyarên misilman di dayîna fetwa û şîretkirina Emîrê dewletê de, xwedan roleke berbiçav bûn.

Binihêrin Cemal Nebes: Mîrê Kurd Mihemed ê Rewandizî, bi nasnav "Mîrê Kor" li ser rûpela awêneya girove û şayetiyên Rojhelat û Rojavayî, alîkariyeke zanistî ji bo lêkolîna dîroka Kurd, ew di rengê vekolînek zanîngehiyê de, hate çapkirin. Di 1970an de, ji elmanî bo erebî hate wergerandin: Fexrî Silahşor. Ji weşanên Ekademiya Zanist û Hunerê ya Kurdî, Hewlêr/Erbîl 1994. Ji bilî wê, hin zanyarên Kurd, wekî Bîrkarînasên Kurd, Ebdul Rehman El-Kewakibî û Şêx Mihemed Ebdo, hewlek cihê pesnê ye ku Konferansa Raperîna Misilmanî li Mekehê, di 1316an koçî de, ku banga yekîtiya Misilmanî bi girîngiyek li ser serxwebûna rêveberiyê ji bo her neteweyên gelên Emperatoriya Osmanî, dan. Binêre: Tomara bîranînê ya Komela "Um El-Qura", Zî-Qi'deh, 1316. Ji hêla El-Seyid El-Furatî ve hatiye weşandin, Bor-Se'îd 1316, rûp.144. Lêbelê, ew di demên berê de ne di nav zanayên Kurdan de bû, çî ew seydayên (Fiquh=oltêgeh) ola misilmanî û bîrnasiya wê di enstîtuyên Kurdistanê de bûn, çî serkirde û rêberên cûrbecûr fermanên Sufî yên wekî (Fiquh=oltêgeh) nûvekirî yê riya Neqşbendî, Şêx Mewlana Xalidê Neqşebendî 7-1776-1827, û bîrnas, rêberê rêbaza Qadiriyan, Şêx Me'erûf el-Nudhî el-Barzancî, 1753-1838, û yên din ku Tiwêj dikin ku ew dixwaze hukûmeteke misilmanî mîna hikûmeta serdema Pêxember ava bike an dewletekê ava bike ku tê de rêgez ji bo "melayan" tenê bi damezirandina "partiyêke misilmanî" ye ku doza vegirtina tevayî ya reha ji xwe re dike û endam û merivên wê yên çekdar hene. Yên ku dihêlin bi xwe destwerdanê di karûbarên taybetî û giştî yên peristvanên Xwedê de bikin, û bi hemû hêza xwe ya dijwar dixebitin ku li herêmeke taybet amûrên serdest desteser

bikin, û dijber û dijberan bi zora çekan ji holê rakin. Civata Kurdî ya kevneşopî civakek azad bû, û rola zanyarên Misilman û serokên wan bi gelemperî, rolek nîşadan, çaksazî, rêberî û aştiyane bû, dûr e ji nîşandanê hêz, bikar anîna tundûtûjîyê û dîtîna û baweriyên li ser xelkê bê sepandin. Ayeta hêja:

"لا إكراه في الدين قد تبين الرشد من الغي" سورة البقرة 256 .

Wate: Pejirandina ku bawerî û pêbendiya bi olê tenê bi riya razîbûnê tê, ne ku bi riya givaştin, tirsandin û zirawbirdinê re."(Sûreya El-Beqere Ayet 256). Ji ber vê yekê em dibînin ku rêbazên Sûfîtiyê di civaka Kurd de cihekî pesindan û berbiçav e. Bi rastî, ramana "misilmana Hukûmî" an "Dewleta melayan" li Kurdistanê tiştekî nû ye, emê li ser bipeyivin. Ji bo ku rewş bi zelalî ji me re zelal bibe, divê em zanibin ku gihîştina mebestên "Misilmana Hukûmî" an "Dewleta Melayan" bi riya partiyeke siyasî ye çekdar di nîvê yekê ji vê sedsalê de, di navbera Ereba û Pakistaniyan pêşî û dûv re duyemîn car derbasî nav Farisan bû. Piştî wê, ew derbasî nav Tirkan bû, û di dawiyê de û ji destpêka nîvê yekem ji vê sedsalê ve, ewê hindik-hindik û bi nebihêsanîyek berbiçav ji Kurdan re jî bar kir. Min bextek matmayî yê ji nişkê ve hebû ku meriv ji van geşedanan ji nêz ve temaşe bike. Ji ber vê yekê, pêwîst e ku ez hin bîranînên xwe, yên bi vê mijarê ve têkildar in, tomar bikim; lê berî wê bikim, ez dixwazim xalek girîng destnîşan bikim. Yekem mirovên ku bi ramana Hukûmeta Misilman re mebesta bidestxistina hêz û desthilatdariyê bi riya partiyeke hêza çekdarî û tundiyê

bikar tîne, da ku bigihîje armancên xwe, sê kes bûn: Hesên El-Benna 1906-1949, rêber û damezirênerê "Tevgera Birayên Misilman" li Misrê di 1928an de, ku ji hêla sîxurên Misrê ve, di 12-2-1949an de hate kuştin. Kuştina wî bi kuştina Neqraşî Paşa, Serokwezîrê Misirê ji hêla (Birayên Misilman) ve di 1948an de, dihat girêdan; Ebû El-A'la el-Mewdûdî 1903-1997, damezirênerê partiya "Cema'etî Islam - Partiya Misil-man" li Pakistanê, ew hate tawanbarkirin bi bidarvekirinê bi tawana gurkirina agirîjêrke, gilç, ajawegêran, têkildan û dûv re ferman dan bi demkî hate zîndan kirin. Rûhelluh Xumeynî, damezirênerê partiya "Fîdaiyên Islam-şervanên Islam", digel (Newab Sefewî) yê ji aliyê hikûmeta Şahê Iranê, piştî ku wî Serokwezîrê Iranê kuşt. Islam "Tiliya wî di kuştina nivîskar û lêkolînerê Iranî Ehmed Kesrewî de heye, di rûniştina dadgehê de ku di 20-Esfand - 1324 = 11-3-1946 dozek ji hêla komek Axwend ve li dijî Kesrewî ve hatiye vekirin, ji ber pirtûkek ku wî li ser Şî'yan nivîsiye, binihêrin. Binihêrin: Hicet El-Islam A'zîmî serbilindiya kuştina Kesrewî di rojnameya Farisî de, "Nebird Millet" (Xebata Gel), bi Farisî (22-6-1359 = 13-9-1980).

Ji hingê ve, ramana "Wîlayet El-feqîh = Xawendariya Oltêgehî", wateya desthilatdariya reha ya rader, oltêgeh û zanmendekî misilman li ser hemî mirovan, dest pê kir ku riya xwe di cîhana îslamî de, nemaze piştî ku Rûhullah Xumeynî karibû rejîma Şahinşahî li Iranê hilweşîne û "Komara Islamî ya Iranê" piştî serfirazkirina (referandûm) rapirsîna 1979-3-30 ku pergala "Welî El-Feqîh= Xawendariya Oltêgehî" bi tundî bikar tîne. Kudeta û guhertina leşkerî ya

Omer el-Beşîr li Sûdanê di 30-9-1989an de, li dijî hikûmeta Sadiq el-Mehdî û ragihandina "Dewleta Islamî ya Sûdan", ku koma Dr. Hesen el-Turabî, anî ser desthilatê û hêzapaldanê da Tевgerên misilmanî yên Hukûmî, bi taybetî li Lubnan, Cezayîr, Misir, Urdun ... hwd. Divê em ji bîr nekin ku dewleta Si'ûdî li Hîcazê û dewleta Urdiyîn li Pakistanê, nemaze piştî kudeta û guhertina leşkerî ya Zia El-Heq di Tîrmeha 1977an de, û ragihandina wî ya sepandina qanûna misilmantiyê, di 10/2/1979an de, alîkariya wê kir, û ji van tevgeran re bû alîkar, û ne ji bo çavên wan ên reş bû. Lê, belkî herikînek ji ramana sazkirina tewereyek li dijî Komunîstê, ku ev ramaneke Şahê Iranê, Sadatê Misirê û Numeyriyê Sûdanê (gihîştin mafên xwe) ew bikar anîn. Girîng e ku em li vir diyar bikin ku rejîma Si'ûdî ji bo "Raje û peywirên bi rûmet ên ji misilmantiyê re" "Xelata Qiral Feysel" da Ebî El-A'la El-Mewdudî.

Hêjayî gotinê ye ku ev "Wîlayet El-Feqîh = Xawendariya Oltêgehî", bi dîtina gelek zanyaran, mijarek ku berevajî ayîn û zaniyê ye. "Wekî ku di yek ji nivîsarên Ayetullah El-U'zma Tebateba'î Qumî de hate gotin, û Tebateba'î Qumî yek bû ji çar referansên Şî'etî yên li teniştê Şerî'etmedarî, Mir'eşî Necefî û Gilpayekanî, wekî ku ji hêla kurê wî Hucet El-Islam Seyid Mehmûd Tebateba'î Qumî ve di hevpeyvînek digel rojnameya Farişî "Kîhan" de, li London hate weşandin. Bala xwe bidinê ku birêz Mehmûd demek dirêj e li mişextiyê dijî. Bavê wî ji hêla rejîma Xumeynî, wekî Şerî'etmedarî û Muntezerî şerê wî dihate kirin. Hucet El-Islam Seyid Mehmûd Tebateba'î Qumî got:

"Wîlayet El-Feqîh = Xawendariya Oltêgehî, wekî ku bavê min ê mezin diyar kir, bi navgîniya "Belavok" a ku di destpêka şoreşa "misilmanî" de derketî, ji hêla rêbaza ayînî û rêbaza hizrî ve têye xuyakirin. Ji hêla rêbaza ayînî ve, Xwedê Xawendariya reha daye tenê çardeh bêgunehan. Ev rastî, di oltêgeha misilmanî de, hate bicihkirin û di romanên me de, bi rengê vekirî û rast û durist tê gotin. Ji ber ku ev perestvanên ji hêla Xwedê ve hatine bijartin xwedan bêgunebûn in, û di seranserê jiyana van çardeh mirovên bêguneh de, tu şaşî ji wan çênebûye. Ji bo vê sedemê, Pêxemberê Xwedê û Hezretê Fatîma el-Zehra, silavên Xwedê lê bin, û donzdeh melayên me xwedan bêguneh bûn. Di vegotinên rast û pêbawer ên ku di destê her olek de ne ku melayên me yên mezin ji vê xawendariya reha yek carî jî sûd wernegirtin. - Bi embazî - bi sepandina tiştê berevajî zivrandinên mirovan bi riya kotekiyê dixwazin. Ji pêvî xawendarê bêguneh, xawendariya ku beşek ji zanistîya olî ya me (Ce'ferî) ye, xwedan hêmanên bi sînor in û bi pirsgirêkên ayînî û yasayî ve têkildar e. Mînak: Kesek dimire divê yekî an raspêrek ji bo zarokên wî yên piçûk bê dest-nîşankirin, û di rewşên binçavkirinê de, ku ew ji desthelatên oltêgeh, zanmend û rader e. Di dirêjahiya dîrokê de, tu zanayên Şî'a pejirandina vê rastiya xawendariya reha ya ku îro li Iranê tê sepandin, erê nekirine. Di derbarê aliyê hizrê de, Xwedê çawa dikare kesekî bibexşîne, ku mîna her mirovek din mirov e, karbidestê ku giyan, saman û jiyana mirovên mayî reftar bike? Hevpeyvîna çapemeniyê ya rojnameya Farisî "Kîhan" a ku li London bi Hucet El-Islam

Seyid Mehmûd Tebateba'î Qumî re hatiye weşandin, bibînin. Hejmar 166, di Pêncşem 19/6/1997an de, rûpel 12.

Digel vê yekê, serdestên Iranê pirsgirêka " Xawendariya Oltêgehî" ji mijara pêxemberîtiyê girîngtir dibînin, û ew maf nadin kesekî ne oltêgehek, zanmend û rader be ku destwerdanê di siyaset û rêveberiyê de bike. Mihemed Yezdî, serokê Hêza ezmanî li Iranê, di roja Sêşemê 8-7-1997an de, li pêş kombûneke mezin e dadwer, karmendên dadgehê û endamên hêzên çekdar diyar kir ku "siyaset, hikûmet û xawendariya misilmantiyê karê giyankariyan e (Melayan) ku mehane û merc peyda dikin, û hebûna negiyankariyê mafê wî tune ku destwerdanê di siyasetê de bike" Piştî wî got: "Di demek ku (Feqîh=oltêgeh), zanmendek heye ku mercan digire, û serwerekî pergala misilmanî heye, mafê yê din tune ku destwerdanê di pirsgirêkên hikûmetê de bikin." Derbarê şewirmendê wî yê mezin Seyîd Ebû el-Fedil Mûsewî de, wî got: "Ji ber girîngiya xawendariya oltêgehî, ku ji pileya pêxemberiyê bilindtir e, Xwedê xawendar destnîşan dike û ew dikeve erka dozînewe û nîşankirinê ji bo mirovan. Di rêxistina komara misilmantiyê de, mirov bi riya encûmena taybetmendan xawendariya oltêgehî destnîşan dikin. (Rojnameya Farisî "Risalet", 7 Tîrmeh 1376= 7-6-1997). Piştî vê pêşgotina kurt, em niha vegehin ser mijara xwe ya taybet, li ser Misilmantiya Hukûmetê û Civaka Kurdî.

Ez di nivê pêşîn ê pênciyê de, xwendekarek li Zanîngeha Bexdadê bûm. Min li Kolêja Perwerdehiyê fîzîk û bîrkarî

dixwend, û di wê demê de, tevgerêke misilmanî li Bexdayê dest pê kiribû, mîna tevgera (Birayên Misilman) li Misrê, ku doza sepandina Zagona Misilmanî li Iraqê bêyî daxwazeke gelemperî ji bo guhertina pergala heyî, hebe. Şahaniya Iraqê-alîgirê Brîtanya li hember çalakiyên vê tevgerê li ber xwe neda, çimkî wê ew wekî polek dij-Komunîstan, ku bû bizavek girseyî, didît. Pirsgirêka Filistînê di dijwarbûna xwe de bû, ji ber ku tenê çend sal di ser damezirandina Dewleta Israîl re, di 1948 de derbas bûbû. Diruşma "Filistîn Erebe" û "Filistîn ji Cihûyên Sihyûnî azad bikin û wan bavêjin nav deryayê" diruşmeyerêke bingehîn bû ku ji hêla neteweperwerên Erebe (Serxwebûyên wê demê), demokrat (Koma Partiya Neteweyî ya Demokrat bi serokatiya Kamil Çadirçî) û misilman jî. Serokatiya tevgera "Birayên Misilmanî" di destê zilamekî neteweperestê Erebe ji Mûsilê de bû, navê wî Mihemed Mehmûd el-Sawaf bû, û pirtûkên Hesên El-Benna ji Misrê anîn Iraqê. Pirtûkên Seyid Qutib jî dihatin, ew di 29-8-1966) de, hate bidarvekirin. piştî hewildana kuştina Ebdil Nasir ji hêla Birayên Misilman, û Mihemed El-Xezalî, yek ji damezirênerê Birayên Misilman, digel Hesên El-Bana û Seyid Qutib, tê de "Misilman ne Komunîst e û ne sermayedarî ye" û "Misilmanî û derewên lê dibin" û di heman demê de hin pirtûkên Pakistanî yê Ebî El-A'la Mewdûdî jî hebûn, ku ji Urdiyê bo Erebe têne wergerandin, wekî "Bîrdoza Siyasî ya Misilman "û" Bernameya kudeta Misilmanî"(Mewdûdî nikaribû bi Erebe binivîse). Li gorî ku tê bîra min, carekê min di belavokek piçûk e bi zimanê Farisî ya "Şervanên Misilman" xwend, ku di riya Necefê re hate Bexdayê. Yek ji rasthatinên mat ev e ku min xwendekarekî Erebe dît ku di

beşa fîzîkê de, bi min re dixwend. Navê wî Munîb Ebdul Wahid El-Dirûbî bû, û ew ji koma (Birayên Misilman) bû, û sazmandarê xwendekar û ciwanan li refên vê komê bû. Munîb mirovekî nerm bû, pir bi tore û rewşenbîr bû. Dema ku wî ez dîtîm xwendekarekî zanistîya ola misilmanî û wêjeya Erebî, xwe pir nêzîkî min kir. Ji ber vê hevaltîya xwendinê tevî cûdahiyên me, di gelek dîtînan û nerînan de hebûn, hevaltîyek pir nêz û xurt di nav me de çêbû. Ji ber ku Munîb niştecihê navçeya A'zamiye ya li Bexdayê bû, û mala wî di wê demê de, pir nêzîkî Kolêja ayînî ya Misilmaniyê bû, di gelek serdanên min ji Munîb re, û serdana pirtûkxaneyê Kolêja ayînê re, gelek xwendekarên Kolêja ayînê, di nav wan de, hejmarek xwendekarên Kurd, ji wan mamoste Şukur Mustefa, Nûrî Ebdullah, Ihsan Ebdul Hemîd û Nîzam El-Dîn Ebd El-Hemîd, û vana hemî ji Kerkûkê bûn, min nas kirin. Lêbelê, ew ji tevgera Sewaf ne razî bûn, û wan digot ku El-Sewaf û koma wî ji bo serdestîya neteweperwerîya Ereb di bin perdeya misilmantîyê de, dixebitin. Hê jî mamoste Munîb ji El-Sewaf dûr diket û wî wekî mirovekî "Devxweşk, berjewendîperest û tirsonek" dibîne. Gava ku wî hin serpêhatîyên xwe bi wî re vedigotin. Derbarê El-Sewaf de, ew mirovek çalak, bi devûziman, camelûs bû, dema ku wî gotarên xwe yê dirêj di civînên cûrbecûr di komeleyek ku wî damezirandibû de, navê wê nayê bîra min, dixwendin û bi wan gotinên xwe yê qelew û vala tu rexne li rejîma desthilatdar li Iraqê nedigirtin. Gava ku ji guhdarên xwe bêzar dibû, wî dê peyva "Fîlistîn" di şêweyê "Fîlisttîînî" de dubare û ne guncan bikira. Hêvî ji Xwedê dikir ku "Fîlisttîînî ji bin destê Cihûyan rizgar bike" û "mêtingehkarî rûreş bike",

ew " mêtîngêhkariya " yê ku wî bi navê wê hilnedida. Lê min ji gotinên el-Sewaf bawer nedikir, ne tenê ji bo pûçiya gotinên wî, lê ji ber sedemeke din jî hebû. Mamoste Ebdullah Zêbarî, Kurdekî ji Badînan e, ku di despêka salên pêncî de, li Lîseyaya Silêmaniyê mamos-teyê ziman û ola Erebiyê bû, ji min re got ku wî Sewaf û kesekî din bi navê Ela'a el-Dîn û Xerûfe wan li wî û li mamoste Huseyn Reşwanî, Kurdekî ji Hewlêrê ye, dema ku ew li Mizgefta El-Ezher li Misrê, di salên çilî de dixwendin, sîxurî li wan dikir. Zêbarî lê zêde kir ku El-Sewaf û Xarûfe raporek ji Dezgeha Agehdarî (Istexbarat) ya Misrê re bi wan hilda û got ku "Zêbarî û Reşwanî" cûdaxwazên Kurd in, serhildêr in, dijminê misilmantiyê ne û hwd. Dûv re asayîşên Misirî li malên wan ên li Qahîreyê tegeriyan û ew binçav kirin. Reşwanî û Zêbarî xwendekarên zanistên olî yê li Kurdistanê bûn. Ew ji hêla rîsîpiyê navdar ê Kurd Elî Kemal Beg ve li ser kîsê xwe yê taybet, ji El-Ezher re hatin şandin ku taybetmendiya teolojiya (El-Lahût) Misilmanî bixwînin. Xarûfe û hevalê wî El-Sewaf di wê heyamê de, li Misrê diman. Zêbarî û Reşwanî nehatin berdan heya ku Elî Kemal Beg destwerdana mijarê kir û bandora xwe bikar anî da ku bi balyozê Misrê yê li Bexdayê re bibe navbeynkar. Di heman demê de, ev çîrok ji hêla mamosteyekî hevalê dibistana amadeyî ya El-Zubeyr a Besra ve, di sala 1957an de, dema ku ez bi fermana rêveberî, ji Kerkûkê ber bi wir ve hatim veguhestin ji min re hate vegotin. Ev mamoste di wê heyama ku gotî de, li El-Ezher xwendekar bû. Dema ku min di 1960an de, li Lîseyaya Hewlêrê dixwend, ez bûm hevkarê mamoste Huseyn Reşwanî. Min heman pîrsgirêk ji wî piştrast kir. Di dawiyê de, min heman

çîrok ji Apê Elî Kemal Beg bihîst dema ku ew di sala 1965an de serdana min li Miyûnixê kir. Bi tevahî, min el-Sewaf bi "kirinên wî yên baş" nas dikir. Wek helbestvan dibêje û ya rast ev e ku carinan tenê guh berî çav heznake; lê di heman demê de jî, carinan "neyarî" dike. Di vê rewşê de çav û guh lihev kirin. Lê El-Sewaf karîbû bi tinaz û sêrbaziya xwe, û tevî dijminatîya wî ya li dijî gelê Kurd, zanyarê navdar ê Kurd, Şêx Emced El-Zehawî yê li Bexdayê dijiya û mamostetî dikir, bixapîne. El-Zehawî - Xwedê jê razî be - çawa ku min ew bi xwe jî nas dikir - berê xwe dida dikana mamoste Beşîr Muşîr, ku li rex Mizgefta El-Heyder-xane, ku ji bo Kurdan û hevalên wan bûbû mîna "Malek "Li Bexdadê. El-Zehawî dîndarek dilsoz, mêr, xwedênas û oltêgehek çîna yekem bû, ew bi dijwarî bi Kurdî daxivî, lê ji gelek taybetmendiyên Kurdî ve, ji dilnizmî, sadebûn û paqîjiya dil heya nefspiçûkiya xwe dihat naskirin. El-Sewaf ji bo mebest û armancên xwe yên bînirxa, di tevger û rêwîtiya wî de, bi wî re tevdigeriya. Di wê demê de, yek ji zanayên Kurdistan û cîhana misilmanî li Kolêja ayîna misilmanî ya li Bexdayê, ango zana Şêx Mihemed el-Qezleçî ji Mala Tercanî ya navdar e, wane didan, û ew jî diçû serdana dikana Beşîr Muşîr. El-Qezleçî, berevajî El-Zehawî, El-Sewaf wek rastiya wî, baş ew nas dikir. Me çend caran hewil da ku em bi el-Zehawî bidin naskirin bê rastiya el-Sewaf çî ye - û carekê jî, li ber el-Qezleçî- el-Zehawî her gav bi ayeta hêja bersiva me dida. "إن بعض الظن إثم" El-Qezleçî bersiva wî da, vê carê jê re wiha got: "Lê, mamoste, hinek ne giştî ne, û hizir xala destpêkê ye, ji bo lêgerîna li cextkirinê". Lê El-Zehawî, ku temenê wî pir mezin bûbû, nekaribû wî têbigihîne. Ya girîng ev e ku xwendekar û

ciwanên Kurd, ku ramana wan a misilmanî bû, tevî "karwan" ê El-Sewaf û girêdana wî nebûn. Zanyar el-Qezleçî ciwanên Kurd şîret dikirin ku xwe ji El-Sewaf dûr bixin, ji ber ku El-Sewaf, herî kêr, "xwedan kesayetiyê ne nazik û zelal e", û "zelalbûn yek ji taybetmendiyên misilmantiyê ye", wekî ku El-Qezleçî gotiye, xwedê jê razî be. Hêjayî gotinê ye ku, El-Sewaf di tevgera misilmanî de, nûnertiya Sunî dikir, û piraniya bangawazî û gotarên xwe li E'zemyê didan. Di heman demê de, li Bexdadê jî kesekî Şîî yê Iranî ji Axwend (melayên Faris) li Kazimiyê û navê wî Şêx Xalisî ye, wekî tê bîra min, bi zaravayê Farisî yê zelal Erebî daxifî, û ew carina dibû çavkaniyê keyfxweşî û hogiriyê. Gotarên wî bal kişand ser êrîşa li dijî Komunîstan û Komunîstiyê, û ez li bangawaziyên wî, gelek caran beşdar dibûm.

Ji ber vê yekê wî di yek ji bangawaziyên xwe de, ravekirina koka Stalîn, ev tişt digot:

هذا (هذا) أستالين (ستالين) كان اسمه أستة ألي (اسطه علي) (اسطة كلمة كوردية دخلت اللهجة العربية العراقية وهي تعني المعلم في العمل والمهنة، وألي هو "علي" لأن الفرس يلفظون "علي" على شكل "ألي"...). وكان أستة ألي ب إيران (في إيران) چایچیا (صاحب دكان لشرب الشاي) "چایخانه" وكان أستة ألي رفيغي (رفيقي، صاحبي) (لأن الفرس يلفظون الق كال "غ" وال "غ" كال "ق"...). أستة ألي، أستة ألي، أستة ألي... فبمرور زمان (على مر الزمن) سارَ (صار) اسمه أستعلي وستالي وستالين.

Careke din, El-Xalisî bersiva bîrdoza Darwîn a nijad û derûdora mirov dida û digot:

”يغول (يقول) دارويبين (دارون) إن أسل (أصل) الانسان سَمَكِه (سمكة)،
فبالله منو (من) منكم يغبل (يقبل) أن يكون أبوه سَمَكِه (سمكة) .؟“

El-Xalisî û El-Sewaf di warê cado û fêlan, sexteçî û xapandina xelkê de, ji yek cawî û pêkhatî bûn. Ji pêvî ku El-Xalisî ne xwedan jêhatîbûna El-Sewaf û bandora zimanê Erebi bû wekî "رفيغه" (رفيغه) li hevalê wî El-Sewaf. Tevgera "Biratiya Misilmanî" li ser hin ciwanên Kurd bê bandor nemaye. Mamoste Nizam el-Dîn Ebdul Hemîd hewl da ku ciwanên Kurd li dora ramana "Misilmana Hukûmî", ya ku ji raman û dîtinên "Birayên Misilman" bandor bûbû, bîne ba hev. Nîzamudîn gava xwe ya yekem bi wergerandina pirtûkekê ji Erebi bo Kurdî di bin navê "Ji Ciwanan re" avêt. Hêvî kir ku ez şaşiyên wî yên zimanî serast bikim û şewaza nivîsandina wî xweş û paqij bikim. Ji ber vê yekê min jî kir. Paşê pirtûka wî di sala 1955an de, li Bexdadê hate çapkirin. Wî di heman demê de, di bersiva yek ji pirtûkên zanyarê navdar ê Misrî Xalid Mihemed Xalid, "Ji vir... Em dest pê dikin", pirtûkek bi zimanê Erebi nivîsî "Bibêje ... ev rêga min e". Lêbelê, hewldanên Nîzam el-Dîn ji çarçoveya hin têkiliyên takekesî derneket, û di encamê de tu tevger û rêxistinek ava nebûn. Mercên siyasî û rewşên civakî yên gelê Kurd ji bo vî karî ne guncan bûn.

Piştî kudetaya serwer Ebdul Kerîm Qasim li Îraqê, di 14/7/1958an de, û pêla Komunîst ya navdar; komên misilmaniyê yên Erebi li Îraqê, û bi taybetî Sunî, li dijî Qasim, ku bi Komunîstan re di lihevkerineke şanenavkirî de hevalbendî kir. Suniyan dest bi hevkarîya Be'es û Nasiriyan kirin. Di wê

serdemê de, "Partiya Islamî ya Iraqî" hate damezirandin. Di bernameya xwe de gotina mafên gengeşeyî yên gelê Kurd nekir, bi yek peyvê jî, ji bilî cextkirin li ser yekîtiya Ereban, ya ku ew wekî "mafekî surîştî" û her weha xwezayî li ser mafê gelê Kurd. Di bersivê de, komek misilmanên kurd ên li herêma Helebçe, ku piraniya wan mela bûn, hewl dan ku rêxistineke misilmanî Kurdistanî ava bikin. Lêbelê, ew nikarin bigihîjin armanca xwe ji ber hêza komunîst û Markîsîyên Kurd û bandora wan li ser girseyan hebû. Ew neçar man ku dev ji ramana rêxistinê berdin. Lê ew neketin nav komên misilmanî yên Iraqî ku bi dizî dest bi kar kirin, ji ber ku hukumeta Qasim nehişt ku "Partiya misilmanî ya "Iraqî" li pêş giştî kar bike. Ji kudeta Be'esî ya yekem li Iraqê di 8ê Sibata 1963an de û heya hilweşîna rejîma Şah li Iranê di zivistana 1979an de û damezirandina "Komara Misilmanî ya Iranê" de, tu hewil ji bo damezirandina partiyeke misilmanî yan rêxistineke li her perçeyekî Kurdistanê, her çend hin zanayên ku piştgirî didan ramanê jî hebûn. "Misilmana Hukûmî" wek Şêx Ehmed Muftî Zade El-Senendicî li rojhilatê Kurdistanê, û Şêx Osman Abdul Azîz li başûrê Kurdistanê. Li bakur komek mela ji Kurdistaniyên hebû ku şopdarên rênîşaderê mezin Se'îd Kurdî (Newresî) bûn. Piştî ragihandina "Komara Islamî" di bin serokatiya Rûhullah Xumeynî de, ku bi xwe re "Hinardekirina şoreşa Islamî" li her deverên cîhanê girt. Hin rêxistinên Misilmanî li başûrê Kurdistanê hatin damezirandin ku berê hêz û xurtiya xwe ji rejîma Iranê dikişandin. Di nav van rêxistinan de, ya herî kevin (Leşkerî Islamî ya Kurd) e, ku di 1980z -1400 koç. de, hate damezirandin, ango çend meh piştî damezirandina dewleta Xumey-

nî. Ev sipah ji zêdeyî 500 pêşmergeyên ku bi rejîma Be'es a Iraqê re şer dikin, pêk dihat. Di navbera serokên wê û rejîma Iranê de, ku mafên Kurdan wekî gelê xwedî ziman, xak, dîrok û daxwazên wî hene. Nakokiyek derket ew jî ev e: Leşkerê Islamî yê Kurdî daxwazek ji bo rejîma Iranê red kir ku şer li rex sipahê Iranê li dijî sipahê Iraqê bi behana ku "şer ne şerê Kurd e" û ku "Sipahê Islamî ya Kurdî" "Ew wek gel dijminê Iraqîyan nîn e", wek "Leşkerê Islamî yê Kurd" red kir ku navê xwe bi "Sipahê Islamî" yan bi "Sipahê Islamî ya Kurdên Iraqê" li şûna ku "Kurd Kurd in û tu cûdahî di navbera wan de tune ye" biguhêze. Dema ku Elî Xamine'î, Serokê Komara Iranê di wê demê de, ji bo Şî'iyên Iraqê bi navê "Konseya Bilind ji bo Şoreşa Islamî li "Iraqê" ava kir. Wî ji "Leşkerê Islamî yê Kurdî" xwest ku piştgiriye bide vê encûmenê. Leşker ev daxwaz red kir bi behaneyê ku piraniya endamên "konseyê" hevkarên Birîtanya û Emerîkayê ne. Vê yekê Xamine'î hêrs kir, yê ku Şêx Mihemed El-Berzencî destnîşan kir ku têkiliyên tewzim bide ji bo sazkirina pêguhorek ji bo "Leşkerê Islamî yê Kurdî", ji ber vê yekê ya ku jê re "Tevgera Islamî ya Kurdistana Iraqê" tê gotin, di bin serokatiya Mulla Osman lawê Ebdul Ezîz de, hate damezirandin. Li aliyek din, pevçûnek çekdarî di navbera wê û "Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê" de rûda, û "Leşkerê Islamî yê Kurdî" ji Yekîtiyê kêmtir jimarî û lawaztir hêzî bûn. Ji ber vê yekê ew tarûmar, perçe û ji hev belav bûn. Ew neçar man ku ji qada tekoşîna siyasî û şerê çekdarî derkevin. "Leşkerê Islamî yê Kurdî" armancên xwe bi van xalên jêrîn bi kurtahî vegot: "Di nav armancên "Leşkerê Islamî yê Kurdî" de: Yekîtiya Kurdan di nav yekîtiya Misilma-

nan de, bi destxistina mafên ji hêla misilmaniyê ve ji Kurdan re ji yên din re hatine piştrastkirin, û mîna ku bi destê birayên wan ên misilman ji Ereb, Faris û Tirk, li ser bingeha gotina Pêxember (silavên Xwedê lê bin): "Tiştê ji me re heye, ji wan re jî heye, û tiştê li me dikeve li wan jî dikeve". Li ser bingeha ku hate gotin, û ji ber ev bira serwerên welatê xwe ne, dibê yê/a ku li welatê xwe fermanariyê dike, divê Kurd jî fermanarê welatê xwe bin, û çawa ku ew di gerdîşên bav û kalan, kevneşopî, çand, cil û berg, ziman û bazirganiya xwe de azad in. Wisa jî Divê birayê Kurd jî azad be. (Vegerin: "Riya Bawermendan", ji weşanên Leşkerê Islamî yê Kurdî hijmar 2, di 18-8-1981an de, rûp:7-8, bêyî ku cihê çapê diyar be, hatiye weşandin.).

Wisa dixwiye ku serokên "Leşkerê Islamî yê Kurdî" tê nedigihan ku Birayên Misilman ên Faris, Ereb û Tirk napejirînin ku "welatê" Kurdan hebe, heya ku ew serweriya wê bikin. Lê ew welatê kurdan beşek ji xaka welatê xwe dibînin. Ev yekemîn xala pevçûna "Leşkerê Islamî yê Kurdî" û "Rejîma Islamî ya Iranî" bû.

Wekî din, serokên "Leşkerê Islamî yê Kurdî" hêvî nedikirin ku "Misilmanên Hukûmetê" yên Ereb, Faris û Tirk ji aliyê neteweyî ve, ji neteweperwerên jiyarî tundrewîtir in. Şah Fehed di Tîrmeh 1992 de, 800 hezar dolarê Emerîkî bexşand ji bo bernameya fêrkirina zimanê Erebî ji kesên ne-xwemalî re, (Rojnameya El-Hayat, di 7-9-1995an de), û di dawiya heftêyan de, dema ku hukûmeta Elman di Radyoya Dortmund de bernameyek bi zimanê Kurdî saz kir. Bêtir ji 60

komeleyên çandî yên Tirk-Misilman şermezarkirinek pêşkêşî hukûmeta Elmanî kirin û jê xwestin ku bernameya Kurdî di Radyoya Elmanî de rawestîne, ji ber ku "Bikaranîna zimanê Kurdî tê wateya piştgiriya tevgerên cûdaxwaz".

Bi rastî, Necmedîn Erbakan, serokê partiya "Refahê Islamî" û serokê berê yê hukûmeta Tirkî pir bi nav ve neçû gava got: "Heke Etatirk sax bûya, ewê bibûya endamê partiya min." Li vir ew e, "Serokê Encûmena Bilind a Şîî ya Islamî li Libnanê, pêşewa Mihemed Mehdî Şems el-Dîn ê Libnanî, yê ku welatê wî tu têkiliya wî bi Kurdistanê re tune, li ser êrîşa Tirkîyê ya li başûrê Kurdistanê dibêje: "Ku projeya Kurdî li bakurê Iraqê (kurtêlxwer) dikare bibe sedema perçebûna Iraqê ya ku hem di misilmantiyê de, hem jî di cîhana Ereb de, tê nepejirandî û siza kirin. Pêdivî ye ku bi hemû hêzê li ber xwe bidin da ku yekîtiya Iraqê bi erdnîgarî û mirovî were parastin, (El-Heyat, di 20-9-1996) de, wate ew e ku damezirandina dewleteke Kurdî li ser xaka başûrê Kurdistanê divê şerê wê bê kirin, û bi hemû hêzê li ber xwe bide da ku yekîtiya Iraqê, xaknîgarî û mirovî, yekîtiya ku ji hêla mêtîngeriya Birîtanî ve hatiye çêkirin, biparêze. Daxuyaniyên Mihemed Mehdî Şems el-Dîn mîna daxuyaniyên neteweperwerê Ereb û Serokê Filistînê Yasir Erefat e, ku got ew "dijî dabeşkirina Iraqê ye, û ew naxwaze Filistînî li Iraqê bêne bicihkirin, ji ber ku Filistînî yek welatê wan heye, ew jî Filistîn e.(El-Heyat 20-6-1997). Ji bo Kurd, mafê wî tune ku bibe xwedan welatek!

Leşkerê Islamî yê Kurd hewl dide ku tiwêj bike ku damezirandina vê sipahê piştî damezirandina Komara Islamî ya Iranê ne amajekirin e ji Iranê. Ew dibêje: "Ji birayên me yên Kurd re ne veşartî ye ku ev Leşker ne lîstokek di destê Rojhilat û Rojava de, an jî di destê cînarên Kurdan de ye. Belê, ew rastiyeke e ku di dilê hemî Kurdan de veşartî bû û ji bo sererastkirina tiştê şikestî û başkirina tiştê têkçûyî û mafê her kesê xwedî maf bigehêyê. Bi hêviya Xwedê û vî Leşkerî, wê mafê her kesî diyar be û tiştê hatiye herifandin wê serast bibe û aşbûna di pirsgerêkên ol û dunyayê de, bêkêmasî be".(Lêvegera berê)

Li vir pirsek ji bo her têgihîştina hûrgelan diyar bibe. Nexwe çima ev "Leşker" piştî damezirandina Komara Islamî ya Iranê, û ne berî wê, hate damezirandin?

Her çend "Leşkerê Islamî yê Kurdî" ragihand ku ew "bi hemî Leşkerên misilmanî re hevkarî û biratîyê dike, nemaze Sipahê Islamî ya Iranê, ku di bin rêberiya pêşewa Xumeynî ya nû hatî damezirandin. "Xwedê me dilşad kir bi dirêjkirina temenê wî, digel partî û tevgerên Kurdî yên ku ne bêolî, setem û ne bêdadî tê de nîn e".(Rûpelê berê, rûpel 21-22). Lê ev ji "Leşkerê Islamî yê Kurdî" li ba serokên rejîma Islamî ya Iranê re mehderî nekir, ku ew rejîmek neteweperest a Farişî ye ku bi kincê misilmantîyê ji wekhevîyê bawer nake, pêçandî ye. Lewma wan alîkariya mayekî û wateyî jê qut kir bi tu awayê nekaribû ji bo parastina hebûna xwe tiştêkî bike. Ji ber vê yekê, serokê wê, birêz Ebas Şebek (Ebû Usama), berê xwe da Şamê, û di dawiyê de ew li Fransa penaber bû.

Piştî ku "Leşkerê Islamî yê Kurdî" ji hev belav bû, "Tevgera Islamî ya Kurdistana Iraqê" di bin navê "Komela Islamî ya Kurdistana Iraqê" de hate damezirandin bi serokatiya mamoste ku hêzek damezirand - wek ku li jor jî me got - Mela Osman Ebdul Ezîz, sipahek piçûk bi navê "Sipahê Qura'anê", û cihên xwe li deverên sînorî yên di navbera rojhilatê Kurdistanê (Iran) û Başûrê Kurdistanê (Iraq) de girt. Dûv re, di 1980 de, Hizbullah Kurdistanî Iraq (Partiya Xwedê) bi serokatiya Şêx Mihemed Xalid Barzanî û biraziyê wî, Şêx Edhem Barzanî hate damezirandin. Pişt re, ji wî veqetiya û "Partiya Xwedê ya Şoreşger a Kurdistanî" damezirand. Hêjayî gotinê ye ku, ev rêxistin rêxistinên misilmanî yên Kurd ên Sunî ne. Di heman demê de, rêxistineke Şîî ya kurd-misilmanî jî di bin navê "Tevgera Misilman a Kurd a Fîlî" de hate damezirandin. Ev rêxistin xwedî rojname û kovar bûn. Leşkerê Islamî yê Kurdî, berê (Banga Rastî) derdixist, Tevgerê (komele) "Asoya Islam", û "Tevgera Misilman a Kurd a Fîlî" "Dengê Tiving" diweşandin. Tê zanîn ku ev rêxistinên han rêça rejîma Iranê dişopînin, û hewl didin qanûnên Islamî li gorî şêwaza Iranî li başûrê Kurdistanê, angû li deverên di bin destê wê de, bikar bînin. Mela Osman Ebdil Ezîz di rojnameya "Kîhan Hawayî" ya Fariisî de, di Çiriya Paşîn 1987an de, angû berî damezirandina herêma "Parastgeha Ewledar" li başûrê Kurdistanê, van tiştan zelal dike:

"Ji bo birêvebirina Kurdistana Iraqê piştî rûxandina Sedam, em ji qanûnên Qura'anê û ezmûnên Misilmanan sûd werdigirin", (Kîhan Hewayî, rûp:24, Hejmar:752, 8-11-1987

an). Îro, Tevgera Islamî ya Kurdistana Iraqê hêzek piçûk li herêma Helebçe ye, û ji bo mayîna xwe bi rejîma Iranê ve girêdayî ye, û ev rastiyeke ku serokên wê venaşêrin. Yek ji serokên Tevgera Islamî ya Kurdistana Îraqê (Komele), birêz Abdul Letîf El-Berzencî, di Nîsana 1987an de, li rojnameya "Cîhada Kurdî-Şerkirina Kurdî", ya ku bi zimanê Kurdî li Tehranê tê weşandin, bi alîkariya rejîma Iranê derdikeve, danpêdan:

"Armanca tevgera Islamî li Kurdistana Îraqê biratî û nêzîkî Komara Islamî ya Iranê ye. Komara Islamî piştgiriya yekane ya hêzên me yên çekdar e, û ew bi dirav û çekan, û bi hemî pêdiviyên me piştgiriya dide me." (Cîhada Kurdî-Şerkirina Kurdî), rûpel: 2 û 7, hejmar: 118, di 13- 4-1987an de.

Heke ev wisa ye, xwezayî ye ku rejîma Iranê wan neçar dike ku berjewendiyên dewleta Iranê ne berjewendiyên gelê kurd ber çavan bigirin. Rastî ew e ku rejîma Iranê hewl dide ku bandora xwe li başûrê Kurdistanê, nemaze li "Herêma Ewledar" xurt bike. Ew hin kovaran bi zimanê Kurdî diweşîne, wek kovara "Serwa" li Urmiye-Rojhilatê Kurdistanê, û kovara (Jin) li Tehranê, ew komek pirtûkên misilmanî yên hikûmetê bi zimanê Kurdî bi navgîniya "Weqfa El-Belax" "li Tehranê diweşîne. Rejîma Iranê ji bo xwendekar û ciwanên Kurd ên ku li derveyî welêt jî dixwînin komeleyek misilmanî ava kir. Bala xwe bidinê ku ji bo her kes an komek qedexe ye ku partiyek an rêxistinek li wî parçeyê Kurdistanê yê girêdayî Îranê ve ava bike. Dema ku li derveyî welêt Iran piştgiriya dide, û bi diravan piştgiriya dide.

Di 15-1-1987an de, rojnameya (Cîhada Kurdî) nûçeyek belav kir, ku komelek bi navê "Hevgirtina Xwendevan û Misilmanên Kurd" li derveyê Kurdistanê hate damezirandin. Bi rastî, ev "komele" di 1986an de, bi pêşengiya rejîma Iranê hate damezirandin. Ji wê demê ve ew bi navê (Alayî Islam) kovarekê bi zimanê Erebî derdixe. Kovar li bajarê Toronto li Kenada hate weşandin, û piştî ew çû Malîziya, wê hingê navê vê komeleyê hate guhertin û bû "Komela Xwendekarên Misilman li Kurdistanê", ango Kurdistan perçeyê girêdayî bi Iraqê ve. Piştî serhildana bi rûmet a Adarê li başûrê Kurdistanê, dijî rejîma faşîst a Sedam û azadkirina hin deverên başûrê Kurdistanê, komeleyek bi navê "Yekîtiya Islamî ya Xwendekar û Ciwanên Kurdistanê" û ji yekîtiya herdu rêxistinên, Komela Islamî ya Xwendekar û Ciwanên Kurdistanê di sala 1992an de hate damezirandin. Ji sala 1992an ve, komeleyê rojnameyek bi navê "Rabûn" derxist. Komele bi xwe rêxistinek karzan e. "Tevgera Islamî ya Kurdistana Iraqê" beşdarî hîlbijartinên li "Herêma Ewledar" a başûrê Kurdistanê bû, û wê rêjeyek ji dangan, ji (%5) kêmtir bû, tevî ku rejîma Iranê bi çalak piştgirî dida wê. Ev nîşan e ku vê tevgerê li Kurdistanê xwedan guhdariyek girseyî nîn e.

Di sala 1981z/1400 koçî de, "Partiya Islamî ya Kurdistanê" hate damezirandin. Ew ji hêla Tevgera Islamî ya Kurdistana Iraqê û pêvekên wê ve, wekî Komela Islamî ya Xwendekar û Ciwanên Kurdistanê, bi çawanî cuda dibe. Cûdahî digihîje radeyekê dikare bêje ku di dema niha de, di nav Kurdan de, du tevgerên misilmanî hene. Tewjimek îslamî ya serbixwe

heye, wate ew bi welatên ku Kurdistanê demargêrî dikin ve ne girêdayî ye, Iran jî tê de. Ev tevger ji hêla zanyarê navdar ê Kurd, mamoste Mihemed Salih Gaborî (Berê mamosteyê Bingehên Olê li Zanîngeha Riyad bû) û zanayê xwedayî yê xebatkar Şêx Omer Xerîb, tê rêvebirin. Di hevpeyivînek çapemeniyê de digel "Navenda Kurdî ya Agahdarî û Belgekirinê li Bonê", Mamoste Mihemed Salih Gaborî di derbarê partiya xwe de weha got:

"Partiya me mafên olî yên diwîmahî bi mafên cîhanîyê ên welatparêzî û neteweperweriyê re, li hev tîne. Partiya me banga damezirandina Kurdistanê Mezin di dewleteke yekta ye serbixwe de, li ser asta herêmê dike, û ji mafên çandî, civakî, otonomî, federalîzm an konfederasyonê razî nîn e. Partiya me bang dike ku di asta cîhanî de dewletek yekbûyî ya gelên misilman were damezirandin. Partiya me ji hêla rewşenbîrî, rêveberî û darayî ve serbixwe ye û ne girêdayî Îran, Sûriye, Iraq, Tirkiye ne jî partiyek ku dijminatîya Kurd û Kurdistanê bike. Partiya me rêgezên xwe yên bingehîn ragihand, siyaseta partiyê bi rêkûpêk kir, û nexşeya Kurdistanê ji destpêkê ve, bêyî veşartî û demkî hate weşandin. Partiyê têgînên nû wekî demokrasî di wateya girêdana pirsîyarpêkirina pabend de û teror û bizdan şermazar kir û ew şerkirin ne ji bo parêzvaniyê û ne ji bo şerê gawiran e, lê bêtir ji bo dûrxistina setemkariyê û parastina zordarî-lêkirî...hwd. (Rojnameya El-Istiqlal, nûçena-meyek mehane ya Partiya Islamî ya Kurdistanê, hejmar 17 Kanûn 1996z = 1417 koçî= Kurdî 2608, r. 3). Ezê li vir xaleke pir girîng nîşan bikim, ew jî ev e ku "Pirsîyarpêkirina Pabend" ku li ser

bingeha lihevhatinê hatiye damezirandin; ev jî di oltêgeha misilmaniyê de, tişteki nû ye û weki hewldanek lihevanîna misilman û demokrasiyê têye derbirîn. Heya nuha, partiyên misilmaniyê hewl dane ku netewepe-rwerî û misilmantî li hev bikin. Hemû partiyên misilmantiyê, ereb, tirk û faris û... hwd, mînakên wê an di navbera misilman û sosyalîzmê de dibistana Dr. Elî Şerî'etî ye, yê ku di 1977an de, li Londonê di rewşên razdar de mir, (Heta Markisî, Mucahidî Xelq ya Iranî mînakek ji vê yekê ye). Lêbelê, lihevhatina misilman û demokrasiyê tişteki nû ye, û min bi xwe di civîn û konferansên Partiya misilmanî ya Kurdistanê de, hin sepandinên vê rêbaz û şeweyê têvel kirin. Ne bêgane û sosret e ku meriv dewleta "Irana misilmaniyê" û dewleta "Xwedanê Du Mizgeftên Pîroz" ên ku bi Partiya Islamî ya Kurdistanê ra şer dikin. Ji ber ku armancên vê partiyê bi rejimên neteweperestên pozbilind yê Faris li Iranê û yê Erebi li Hicazê re ne li hev in.

Ji bo tewjima din, ew tewjima ku weki Tevergera Misilmanî ya Kurdistana Iraqê tê zanîn, û pêvekên wê ji Yekîtiya Islamî ya Xwendekar û Ciwanên Kurdistanê ye, ku li jor jî hate gotin. Ew tewjimeke herêmî taybet a Iraqî ji bo Kurdistana Iraqê ye, ku xwedan bernameyeke neteweyî nîn e. Ew bandor û hêza xwe ji Iranê digire; û ji bilî Îranê ve êrîşî hemî aliyên siyasî û ne-siyasî yê cîhanê dike. Heta kovara "Helebçe", kovarek girêdayî vê komê ye, ku li Swêdê tê weşandin. Carekê nivîsînek belavkir: "Xwendevanekî ji me re peyamek nivîsand ku tê de weha dibêje: "Hûn xweliber-girtinên li hemî cîhanê hene û ji bilî Dewleta Iranê hemî

cîhanê rexne dikin." Ev pir rast e û ya kortir ew e ku kovara "Alay Islam" di Nîsana 1977an de, pirsgerêkek taybet li ser bizd û terorê derxist. Lê wê babeta bizda rejîma Iranê şermezar nekir. Bi yek gotinê, Tehran li dijî gelê Kurd e û li dijî dijberên rejîmê ye. Kuştina Qasimlo, Şerefkendî û hevalên wan, dadgeha Miko Nous û biryara wê ya dîrokî ku hemû cîhan hejand, yek gotin jî ne hêja bû bihata gotin!? Ji bo ku em çûne mînakî, em bala xwendevanan dikişînin ser gotarek bi navê Karûbarên Kurd: "Têbînî li ser Ramana Neteweyî ya Kurdî" 1943-1980 ya Şaho Hewramî, di kovara "Alay Islam" de çap bû, sala dehemîn, hejmara duyemîn Tîrmeh 1996, Safar 1417, ji bo pêşkêşkirina beşek, hejmarek hindik ji xapînok û pûçiyên vê çîna nezan û winda, ku xwe di bin navê misilmantiyê de, wekî alavek di raje û peywira setemkar û mêtinkarên Kurdistanê de, bicih kiriye. Yekem tiştê ku bala kovara "Alay Islam" dikişîne ev e ku kovar li ser bergê xwe bi dîrokên zayînî û koçî tê û dîroka Kurda ya Medî ya ku rewşenbîrên Kurd di pirtûk û rojnameyên xwe de pê ve girêdayî ne, paşguh dike. Xebata wê berevajî rojnameya "El-İstiqlal", berdevka "Partiya Misilmanî ya Kurdistanê" ye, ku bi yekcarî mijara dîrokên koçî, zayînî û Kurdî bi cih dike. Wisa dixwiye ku di vê kategoriyê de dîroka Kurdî vedigere serdemek "Nezanî" ji ber ku dîroka kurd bi ketina Nînewa bi destên Medî, bav û kalên Kurdan de dest pê dike, û ew sala 612 berî zayînê bû, û ya ku berî misilmantiyê ye "Nezanî" ye!. Bala xwe bidinê ku pergala Islamî ya Iranê, ji bilî dîroka koçî, navên mehên kevnar ên Iranê (berî Islamê) bikar tîne. Şaho Hewramî dinivîse: "Di 1943an de, li Iranê, û nemaze li bajarê Mahabad, komek Markisîs bûn ku bi navê (Komeley

Jiyanewey Kurd) kar dikirin û têkiliyên wan yên nêz bi Navenda Çanda Rûsî ya Mahabad re hebûn û Komele Markisî-Lenînî di pergala xwe ya navxweyî de pejirandin, û di 1945an de, rêxistin berfirehtir bû (...) û her weha daxwaziya Rûsan ji Komeleyê re ku Qazî Mihemed, zanayê olî yê ku li Mahabadê xwedan bandor bû, wekî serok ji xwe re bipejirînin (...). Heya ku Qazî Mihemed beşdarî wê bû, Komele partiyeke bijarde piçûk a Kurdên derbeder bû (...) (Çavkaniya navborî, rûpel 7).

De ka em nuha pirsgrêka danîna bajarê Mehabadê li Iranê û ne li Kurdistanê bihêlin, ji ber ku heke wan wiha nivîsandiba, dewleta Iranê dê nanê wan bibiriya. Lê divê em bibêjin ku Hewramî gotinên xwe li ser çavkanîyeke Ingilîzî ji bo nivîskar Opelans re bingeh girtiye, û vegotina çavkaniya Kurdî ya orîjînal nekiriye, li ber destê her Kurdê ku bi zimanê xwe fêr bûye peyda dibe. Di her hawî de, veguheztina vê bêjeyê tenê nezanîna reha ya Mîrza Şaho ji dîroka siyasî ya gelê Kurd û dîroka Şêlhana ramana Markisî li Kurdistanê nîşan dide. Lêkolînek mijarî ya kovara kurdî "Niştiman" ku berdevka "Komeley Jiyanewey Kurd" (J.K) bû, û ji Tîrmeh 1943an heta Gulana 1944an derket, nîşan kir ku ev partî (J.k) bi taybetî di 16-9-1942an de, hatiye damezirandin. Ew di sala 1943an de, hate weşandin, sal û nîv piştî damezirandina partiyê, û hejmarên vê kovarê "Niştiman" di pirtûkekê de hatin weşandin ku tê de lêkolînek rastîn a kovara "Niştiman" û "J.K" li herdu Zimanên kurdî û almanî, di bin navê "kovara Niştiman, Tîrmeh 1943 -Gulan 1944", berdevka partiya "J.K" û bîrdoziya bûrjûwaziya piçûk a kurdî

neteweyî li Kurdistanê ronî kirî. Bi boneya çil saliya weşandina weşanên kovara Niştiman, di Tîrmeha 1983-yan de, weşanên Akademiya Zanist û Huner a Kurdî - Stokholm (Swêd) 2597 Kurdî- 1985z. Misilmanê ne koçber Birêz Hewramî dikaribû lê vegeriya. Wekî din, "J.K" rêzîkname-yeke wî tune bû, berevajî wî tenê bernameyeke partiyê hebû. Nivîsara vê bernameyê heta nuha di gelek pirtûkan de hatiye weşandin. Di nav wan de, pirtûka "Komara Kurdî ji bo sala 1946an a Eyciltin". Di bernameya "J.K" de, li ser Marksîyê-Lenîniyê, bi tevahî yek peyv tune.

Di lêkolînek din de ku min di sala 1988an de, bi zimanê Kurdî li ser rojnameya komunîst a Kurd "Yekîti Tekoşîn", berdevka Partiya Komunîst a -Iraqê - koma yekîtiya tekoşînê - di wê demê de, li Kurdistanê weşand. Ji her gumanê derket holê ku dîroka şêlhana ramanên komunîst, ango ya Sovyetî li Kurdistanê vedigere heya dawîya Şerê Cîhanê yê Duyemîn, ne ku heya 1943an, wek Hewramî tiwêj dike. Ev şêlhan bi navgîniya Komunîstên Ereb (Partiya Komunîst a Iraq) û Komunîstên Farisî (Partiya Tûde ya Iranî) re hat, ne bi riya Sovyetan an bi riya "J.K". Sîstema hukûmetê li Komara Kurdistanê sîstemeke neteweyî ya lîberal bû, dûrî pergala ku li Komara Ezerbeycanê serdest, bi serokatiya Cafer Pîşorî bû. Hetta Eyciltin ê Emerîkî di pirtûka xwe ya ku me vegot de, vê rastiyê dipejirîne.

Rastiyek sazîrî heye ku divê were bersivdan li hember bêrûmetkirina Şaho Hewramî, ew e ku partiya "J.K" ji Marksî-Lenîniyê re li dahol û zirneyê nexist. Berevajî Şaho

Hewramî û hevalên wî yên ku rejîma Iranê re dahol û zirneyê didan. Bi navê misilmantiyê dijminatiya gelê Kurd dike. Kovara Niştiman, û ji hejmara yekem de, li ser bergê wê gotina Xwedê hebû û di binê wê de jî peyva "J.K" di hundurê xelekekê de, û dora çemberê her ku ayetek Qura'anê nivîsandî, bo nimûne:

تعاونوا على البر والتقوى“ و” من يتوكل على الله فهو حسبه“ و” كم من فئة قليلة غلبت فئة كثيرة باذن الله“ و” نصر من الله وفتح قريب وبشر المؤمنين“

Ew berê gotarên li dijî vexwarina vexwarinên meyvexwer derdiket, bi vegotina ayeta Qura'anê :

”إنما الخمر والميسر والأنصاب والأزلام رجس من عمل الشيطان فاجتنبوه لعلكم تفلحون“

Di sala yekem de, Sermawer/Rêbhindan 1322, li Hejmarên 3 û 4 vegerin. û "Niştiman" dîroka koçî bikar dianî.

Ez di pêveka jimara 2 de, li ser wêneyan, rûpelên pêşîn ên hin mijarên Niştiman diweşînim da ku derew û virên vê koma bikirêgirtî, dijminatiya gelê Kurd û xebata berevajîkirina dîroka wan bi tevahî, zelal bikim.

Wekî din, tiwêja Hewramî ku digot "J. K." "partiyêke bijarde piçûk a koçberên kurd bû ..." derew û vir e. Ez li vir wekî lêkolînerê dîroka gelê kurd û şaristaniya wî ji zêdeyî 40 salî ve, tê bîra min ku min hin serkirde û damezirênerên "J. K."yê bi xwe nas kir, wek helbestvanê navdar ê Kurd Ebdul Rehman Hajar, nivîskarê kurd Ebd El-Rehman Zebîhî, û zanayê misilman Mela Qadir El-Muderisî, yên ku li

dibistanên olî xwendin. Li Kurdistanê, çanda wan çandêke resen a kurdî bû. Wekî mîrza Şaho Hewramî, ew aware ye. Ew ji dîroka gelê xwe nizane ka ew bi rastî Kurd e an na. Li ser çavkaniyên rojavayî yên bê vekolan û bê lêpîrsîn xwe dispêre. Digel vê yekê, bêşermî û bêzelane heya radeyekê dibe sedema ku endamên J.Kê yên derveyî welêt têne pejirandin. Di wê de, ew bi fermanên axayên xwe yên li Tehranê re dilsoz bû. Ji ber ku rejîma Iranê her kesê ku xwedî bîrdozî û ramanêke serbixwe ku ji ramîna wî cûda cûda dirame "Awareye" dipejirîne, divê ew ji holê were rakirin.

Şaho Hewramî dîv re dibêje, li ser bingeha gotina heman nivîskarê Ingilîzî Oblans, ku navê wî bi şaşî nivîsiye: "Komunîstên Kurd hêza çalak a damezirandina Partiya Demokrata Kurdistan li Iraqê bûn, û pejirandina wan Mela Mistefa Barzanî wek serok, tevî çîna wî ya derebegî ye". (Jêdera berê Rû7).

Ev belgeyek din a nezanîna birêz Hewramî ya ji dîroka siyasî ya Kurd e. Bi rastî, di navbera komunîstên kurd û neteweperestan de, li ser pîrsgirêka qebûlkirina Şêx Letîf lawê Şêx Mehmûdê Padîşahê Kurdistanê û Kake Ziyad Koyî wekî kesayetiyan sereke yên Partiya Demokrata Kurd, pevçûnek vekirî heye. Partî di 16ê Tebaxa 1946an de, li Bexdadê, di bin navê "Partiya Demokrata Kurd", ne "Kurdistanî" hate damezirandin. Komunîstên Kurd ji koma Salih Heyderî van herdu kesan bi behaneyê ku ew "derebeg" in nepejirandin. Lêbelê, Barzaniyê nemir di

pejirandina wan de rijdbûn kir. Ji ber vê yekê komunîst ji rêxistina Kurd veqetiyên û ketin Partiya Komunîst a Iraqê. Ji hingê ve, li başûrê Kurdistanê du rewten siyasî hene, yek ji wan "Kurdistanî" û ya duyem jî "Iraqî". Komunîstên Kurd ne hêza çalak a damezirandina Partiya Demokrat a Kurd bûn, belkî, ew di nav Partiya Komunîst a -Iraqê Koma Yekitiya Tekoşînê - şaxê Kurdistanê de, hatin civandin.

Ji bo Şaho Hewramî ku Mistefa Barzaniyê nemir wekî "ji çîna derebegî" binav dike, ew ne tenê berevajîkirina rastiyan e, lê bêtir nezaniyek reha ye ku me dide ramandin: Ma Şaho Hewramî, ku ji siyaset û civaknasiyê nezan e, bi rastî Kurdî? Serok Barzanî, ku kurê Şêx Mihemed lawê Şêx Abdulsalam ê yekem Barzanî ye. Di civakeke misilmanî bi riya Neqşbendî de mezin bûye, û ew birayê pakrewan Şêx Abdulsalam ê duyemîn Barzanî ye, ku di sala 1914an de, ji hêla dewleta "xelîfe" ya Osmanî ve hate bidarve kirin. Herêma Barzan ji milkayetiya takekesî bêpar bû û gundî xwediyên erdê çandiniya xwe bûn. Bavê Mistefa Barzanî hin kevneşopiyên ku ji zordarên Kurdistanê bi cêmayî mabûn, wekî jinanîna bi zorê û yên din rawestand. Mistefa Barzanî di hemû jiyana xwe de wekî kesek sanahî dijiya, û bi mirovan re bi hêsanî tevdigeriya. Dema ku ew li mişextîgehê li Silêmaniyê dijiya, min di zaroktiya xwe de ew nas kir, û min dît ku wî çend çaran tûrikên genim li pişt xwe dikirin û dibirin êş. Barzaniyê "derebeg" wilo bû. Ka em bibînin "pêşverûtiya wî" yên Birêz Hewramî û koma wî di dema ku ew, di kovara xwe "Alay Islam" de, vegotina sewdankirina jinan ji hêla mêran ve wekî şîrovekirina ayeta Qur'anê "Mêr

berpirsiyarên jinan in". "Misilman berpirsiyariya jinê daye destê mêr, ango mêr dibe xwedanê malê û serê wê. Rêdayîn hate dayin ku mêr li jina ku dev ji têtikiliyên xwe yên zayendî berdaye, yek ji peywirên wê yên sereke li hember mêr lêdanê bixwe. (Alay Islam), Sala: Dehemîn, Hejmara: Yekem 6 Adar 1996, Şewal 1416 koçî. Rû. 40.

Wisa dixwiye ku Şaho Hewramî û koma wî xwedan "paşverûtiyeke pêşkeftî" ne, û ji ber vê yekê ew rê didin xwe ku li jinan bixin heke ew dev ji têtikiliya bi wan re berdin, û ew pir baş dizanin ku jinanîna bi zorê bi tevahî pêk tê di civakên misilmanî de, û zorê mêrek ku bi jinekê re karê seks bike destavêtina zayendî sûcek mezin e. Nemaze ku jinanîn bi zorê pêk were. Divê were zanîn ku Tevgera Misilmanî ya Kurdistana Iraqê li deverên di bin destê wê de, pir zorê li jinan dike. Sazûmana navneteweyî vegotin beşek jê kir. Nivîskarên Tevgerê ji bo jinên Kurd derewan çêdikin. Yek ji wan bêbextiyan, di kovara xwe de nivîsand ku Kurd "keçên xwe tazî dikin". Ew sextekariyeke zelal e. Heman xeber e ku kovara "Pêncşembe" a Farisî derhêneriya wê di dawiya Hezîrana 1997an de, kovarek girêdayî bi koma "Hizbullah a Iranî" ve ye, li Tehranê derdikeve, dema ku dinivîse: "Keçên û jinên Kurd rûmeta wan tune. Ew gander in, xwefiroş in". Ev bêrûmetkirina di nav beşên mezin ji Kurdên Tehranê de, bû sedema deng û qêrqêrek mezin û ajawekirin e.

Lêbelê, hikûmeta "oltêgehiyan" li dijî kovarê tu kiryar nekir. Ev bêrûmetî li her kurdekî tê kirin û bê guman, her

kurdek, ango, kurdên "Bizava Islamî" jî heke xwedan hesta kurdewarî bin.

Şaho Hewramî xwe dispêre gotinên kesekî Holendî bi navê Martin Brunesen di tiwêja xwe de ku dibêje "Tekoşîna Barzanî digel Talabanî aliyek eşîrî hebû ku pirraniya zêde ya alîgirên Talabanî ji êl û rewşenbîrên Kurd bûn ku bi zaravayê Kurdî digotin ku bi Soranî tê zanîn, û alîgirên Barzanî bi gelemperî kurmancîaxêv bûn." rû.8.

Martin Brunesen ne tenê kesek e ku ji pirsgirêkên gelê Kurd, dîrok û kelepûra wî ya şaristanî nezan e. Lê ew kesek e ku ji pirsê zêdetir heye! Ev kes tiwêj dike ku zimanê Kurdî tune, lê tenê zarava hene, paşê tiwêj dike ku destana Mem û Zîn ya ramanwer û helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî direwê çêkirî ye. Ev tiştê ku wî got di civînekê de ku bi dehan xwendekar li Zanîngeha Azad a Berlînê, û Dr. Hesên Mihemed Elî Terxanî, serokê civata Kurd li Berlînê, bersiva wî da. Herweha nîşana nezanî û xêvikiyê ye ku meriv têkiliya zaravayên Soranî û Kurmancî bi eşîrtiyê ve girê dide. Têkiliya zaravayê bi çîn an koma civakî ya ku kesek pê re girêdayî ye çi ye? Lê Şaho Hewramî, "Misilman" ê ku dijminê her "derbederî" ye, xwe dispêre vê axaftina bêraman ji kesek Holendî yê zikreş ku xwe bi bêhişiya gotinê ve girê dide da ku berjewendiyên xwe yên kesane derbas bike. Wekî din, Barzanî li herêma Soran ji ya Badînan Kuramanc bêtir piştgirê wî hebûn, û gelek Kurmancên Badînî yên ku piştgirî didan Celal Talabanî hebûn. Di derbarê nakokiya di

navbera Barzanî û Talabanî de, sedemên wê yên kesayetî û bîrdozî hebûn ku, min di hin demên din de, rave kiribûn.

Şaho Hewramî nezaniya xwe her ku diçe zêdetir nîşan dide û dibêje:

"Di destpêka salên pênciyar de, li Elmanya, di bizava neteweyî ya Kurdî de, ji bilî Markisî û neteweperwerên lîberal di nav bizava neteweyî ya Kurd de rewtek sêyem xuya bû. Ev rewte bi kurtahî ji hêla (KAJYK) ve hate zanîn û navê wê (komeley Azadî û Jiyaneke û yekîtiyî kurd) û dîv re bi riya kovara xwe ramanê vê semtê belav kir. kajykname "rû.9.

Ez dixwazim pêşî wekî dîdevanekî bibêjim ku "KAJYK" wekî "Di destpêka salên pêncî de, li Elmanya, di nav xwendekarên Kurd de" çênebûye, wekî ku birêz Hewramî tiwêj dike. Belê, KAJYK, di 14-4-1959an de, wekî rêxistin, li bajarê Silêmaniyê li Kurdistanê, ji hêla komek mamoste, nivîskar, helbestvan, wêjevan û zanyaran ve hate damezrandin. Digel hemû rêzgirtina min ji xwendekaran re, di nav wan de yek xwendekar jî tune bû. Hewramî bi şaşî peyva "Azadî" werdigerîne zimanê Erebi, ji ber vê yekê peyva "Azadî" tê wateya "الحرية" ne "التحرر". Wekî peyva "التحرر", ew di zimanê kurdî de "Rizgarbûn" e, Ji jêdera "Rizgarî" (التحرر). Ev diyar dike ku ew ji serge û rêbazên herî bingehîn ên zimanê Kurdî nezan e, gumanê ku Şaho Hewramî ne Kurd e, belkî bi kirasê navekî Kurdî ye ku hatiye raçavkirin xurt dike. Heke na, wê hingê ew ji pirta bezê guhan ve Kurdek nezan e, û pişeyê wî guhorîn e. Wekî din, Kajykname ne

belavokek vedorî bû, û "Daxuyaniya Kajykî" (Kajykname tê wateya pirtûka Kajyk) çî bû, ku xêzên pehin ên bîrnasiya Kajyk vedigire çî bû. Kajykname di sala 1961ê de, bi berhemeke bi kom li Kurdistanê hate nivîsandin, û di heman salê de, li wir hate çapkirin. Wergera Erebî ya Kajykname di sala 1971ê de, li Ewropa hate weşandin.

Şaho Hewramî dîsa dibêje: "Di destpêka salên heştêyî de, ramanên vê semt û rewta hanê careke din di bîrnasiya Partiya Sosyalîst a Kurd (PASOK) de hate nimandin. Prof. Nebez tewrê vê rewta ramanî ye. Nebez kurteyek ji ramanên xwe di pirtûka xwe de (Bîrî Neteweyî ... hwd.) Ku li Stokholm - Swêd di 1984an de, hate weşandin, kurt kir û wî ji vê rewte re "Dibistana Sosyalîst a Kurdî" gotiye. Mamoste Nebez hewl dide ku ji xwendevan re ev rewte (Dibistana Sosyalîst a Kurdî) wekî ku ramanek Kurdî ya Resen têye diyarkirin, ango tê vê wateyê ku ev Dibistana Ramanî bi tevahî ji ramana neteweyî ya Ereb, Tirk û Faris, û heta ji raman û rewten nasyonâlîst ên Kurd ên ji Rojava hatine derxistin û hawirdin cuda ye. Ew bawer dike ku ramana wî derbirîna ramanek neteweyî ye ku ji mêj ve di hişmendiya Kurd de heye, û di vî warî de hebûna tekoşînek bêdawî di navbera Ereb, Tirk û Farisan de diyar dike. Di vî warî de, ew gotinên Xewace Se'ed El-Dîn (1533-1598) ku di pirtûka xwe (Tac El-Tewarîx) de dibêje: "Wan - padîşah û serdarek - nîn e û ewê tune bin, ji ber ku Pêxember (silavên Xwedê lê bin), li gorî tiwêja El-Xewace, Kurd her û her kireder kir ... hwd. Heman jêder Rû.9.

Beriya her tiştî, ku ji hêla koma PASOK ve tême hejmartin, an nezanîna tevahî ya rastiyanê an jî rûreşîyeke direwîjkîstî kirin e. Ji ber ku ez qet rojekê nebûme endamê PASOK-ê. Wê hingê PASOK û KAJYK du tiştên cûda ne. Derbarê tiwêja birêz Hewramî de ku digotin ez (Nebez) ev e trenda di "Dibistana sosyalîst a Kurd" de guhorînek din e. Ya rast "Dibistana Kurdî ya Sosyalîzmê" ye ku tê wateya "Dibistana Kurdî ya Ramana Sosyalîst" û di zimanê Kurdî de "Qutabxanî Kurdî ya Sosyalîzmê" û ne "Qutabxana Sosyalîzmî Kurdî"; û min pirtûkek li ser nivîsiyê mijara di zimanê Kurdî de ku dikare jê were gotin kirin da ku berzekirin, nedurist û derewên Hewramî û kovara wî bê cextkirin. Wekî din, Dibistana ramana sosyalîst a Kurdî di nîvê salên pêncî de, li başûrê Kurdistanê rabû, û di encama danûstendinek mijarî ye bingehîn û berfireh a bingehîn a kelepûra sosyalîst de. Danûstendinan bi salan di nav rewşenbîrên Kurd de dirêj kir. Ev raman li ser bingeha azadî û wekhevîyê ku hevxiwaz û hevûdu biserpake dikin - li gorî vê rewte - û hebûna dergûşî yek ji wan bêyî ya din tune. Rêgezek ne gengaz a azadiyê ji bo pîvandî, pilepile û perçebûnê heye, ango hebûna wê tenê di rewşa şîyan û tiwanên wekhev û berhev de. (Li pirtûka min veşandin: (Hindêk le kêşe bineretiyekeyan Qutabxaney Kurdî Sosyalîzm) Stockholm 2596K, 1984z.

Wê hingê min negot ku "di navbera Ereba, Tirk û Farisan de girtinhevek bêdawî heye, bi vegotina Xewace Se'ed El-Dîn ... hwd." Ez bi nimûneya Xewace Se'ed el-Dîn hatim ku sultanên Osmanî hewl didan ku bi navê Pêxember Mihemed (Silavên Xwedê lê bin) efsaneyan çêbikin da ku pakane kirin

û pozîşt ku gelê kurd dewleta xwe ava neke. Her kes dikare li nivîsandina min vegere. Lê mirovên ku ji hêla şeytan ve hatine korkirin û perdeyek bi ser çavên wan de, hatiye berdan û wan bi ser nezanî û demargêriya kor û ber bi derew û handanê ve dibe çî bikin?

Şaho Hewramî dinivîse:

"Mamoste Nebez her weha vegotina efsaneyê Kurdî (kurtêlxwer) Mem û Zîn dike ku ji hêla helbestvan û ramanwerê Kurd ê Misilman Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsandin, ku doza yekbûn û serxwebûna Kurdistanê dike." Binihêrin "Nebez" rûpel 34-35. Nebez banga Xanî wekî nîşana şiyarbûna ramana neteweyî ya Kurd dibîne, da ku bigihîje wê baweriyê ku ev raman ji bingeh û rastiya Kurdistanê derdikeve, û ramanek bihên nîn e. Hêjayî gotinê ye ku, pêşbînên rewten din ên di nav ramana neteweyî ya Kurd de, li ser vê mijarê bi Nebez re li hev dikin. Nebez tiwêj dike ku ramana neteweyî ya Kurd, berevajî ramana neteweyî ya Ewrûpa ye, ku ramanek taybet ya çîna bûrciwaziya Ewropî dinimîne, ne ramanek taybet ji bo çînek taybet li Kurdistanê ye. Mamoste bi ser ve dike ku gelê Kurd afirîner e. Ew şiyar û xwedî tiwan e ramanek ji xwe re biafirîne, û ne pêwîst e ku tiştwestin û hawirdin bike. "(Jêderê berê, Rûpel 9)

Di dermafê dastana (Mem û Zîn) a nemir, di wêjeya Kurdî de, ku ew yek ji Afirandinên ramyarzanê Kurd ê mezin Ahmedê Xanî (05. 1651/06. 1707) e. Banga wî ye ku Kurd bibin yek û dewleta Kurdî damezirînin, ew bi cih 302 sal

berê ye. Ez dibêjim erê min got ku ev rêber e ku ev Raman ji mêjiyê bîrnasekî Kurdê bilîmet û ji bingeh û rastiya Kurdistanê tê, û ew ramanek bihên nîn e. Ji ber ku dewleta neteweyî piştî şoreşa Frensî (1789) rabû. Her ku Ehmedê Xanî banga damezirandina dewletek neteweyî 94 salan berî şoreşa Frensî kir, û ew li Kurdistanê dijiya û tu têkilî û danûstendina wî bi Ewropîyan re tune bû jî. Xanî yek ji xwedan şiyarên hiş bû. Sed sal berî ku Xanî pirtûka xwe ya hêja çêbike, ramanwerê din ê Kurd Şeref el-dîn Bedlîsî, pirtûka xwe ya bi navê "Şerefname" nivîsand û tê de tixûbên neteweyî yên Kurdistanê diyar kirin ku di vê semînerê de hate gotûbêj kirin. Bi gotinek din, di pirtûka Şerefname de, tixûbên Kurdistanê 400 salî berê hate gotin. Di wextekî ku li cîhanê dewletek neteweyî tunebû! Belê, di rengê împaratorî an mîrekiyan de, dewletên herêmî hebûn. Van rastiyan, li ser riwê Hewramî û hevalên wî yên nezan sîleyek e. Li vir ezê hinekî paşve vegerim çîrokek balkêş hate bîra min, ku bi hevalê hêja Yûsif Nesro re, ku karker û lêkolînavanek ji Rojavayê Kurdistanê ye û li Hamburgê dijî, rûdaye. Yûsif berê di bûyer û şahiyên giştî de pirtûk û weşanên min nîşan dida. Carekê, xwendekarek komunîstê Iraqî wergera almanî ya "Mem û Zîn", ku di 1970-yan de bû, hat nîşandan. Ji ber vê yekê, xwendekarê Komunîst li dijî vê yekê derket, jê re got: Tu çima van pirtûkên Emerîkî belav dikî? Yûsif lê vegerand: Pirtûk ne emerîkî ye, belkî wergera elmanî ya perûya "Mem û Zîn" e ku ji hêla Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewropa ve hatiye çapkirin. NUKSE, ê Komunîst tengazar bû, û jê re got: "Di pirtûkê de, ramanên Emerîkî hene ku banga veqetandina Kurdistanê û

damezirandina dewleteke Kurdî dike bi serokatiya Emerîka dijî Yekîtiya Soviyetê. Emerîkiyan pirtûk ji we re çap kirin, ji ber vê yekê Yûsif jê re got: "Nivîskarê pirtûkê Ehmedê Xanî ye, yê ku di wextekî de dijiya ku di serî de Emerîka tine bû." Ê Komunîst hêrs bû û got: "Tevî ew, raman hemî Emerîkî ne, û ji ber vê yekê ye ku Emerîkî ew ji bo we çap kirine." Dûv re, wî dest bi dijûn û ciwênan li Emerîkayê kir: "Ew faşîst, çepel, cinawir, bûdela û... hwd." Yûsif wiha bersiv da: "Mamoste! Hûn dikarin li gorî çêj û şiyana xwe bêrûmetkirinê li Emerîkiyan bikin, û hûn dikarin wan wekî cinawir, çepel û ... hwd bi nav bikin. Wekî bêhişî, ew, bi Xwedê, nikarin bi serweriya we re pêşbaz bibin."

Li ser ol û ramana KAJYK, birêz Şaho Hewramî bi ramanên dijber tê, ji aliyekê ve ew dibêje: "Ol di ramana sosyalîst a Kurd de (kultêrxwer) yek ji diyardeyên nîşana neteweyî ye, û Zerdeştî û Êzdayetî baweriyên olî yên herî nêz in, ji peyama ramana sosyalîst a Kurdî" (Heman çavkanî, rûpel 10). Di heman rûpelê de, piştî çend rêzikan, ew dibêje:

"Li ser rola olê di ramana sosyalîst a Kurd de (Kurtêlxwer), bes e ku li vir diyar bikim ku ramana KAJYK di vî warî de tiştêkî nû ne anî. Ramanên Kurd bi tevahî hewl didin ku girîngiyê bidin vejandina kelepûra Kurdan a berî misilmanîyê û her tiştê pê re têkildar û rûmet dikin, û di heman demê de, vê rastiye paşguh dikin ku piraniya Kurdan Misilman in, û ew ji yek hezar û çarsed salî û ku kelepûra gel niha kelepûrek misilmanî ye. Lê, rûmetkirina kelepûra pêş-

misilmanî di heman demê de nîşanek li ser girêdayîbûna Rojavayî ya di ramanê de... hwd. "(Heman çavkanî, rûpel 10).

Ol, li gorî dîtina dibistana ramana sosyalîst a Kurd, baweriyek e. Bawerî jî mîna evînekê ye ku bi tor û bextê mirov, û hest û kûrahiya derûna wî ve girêdayî ye. Mirov nikare rastî û tevliheviya wê bi cih bike. Ji ber vê yekê, divê ew bête rêzgirtin û pîrozkirin, bi mercê ku xwediyê baweriyê nexwaze têgihîştinên xwe bi zor û tundiyê li ser yên din bicih bike, lê bi danûstendin û razîbûnê be. KAJYK ol wekî nîşanek pîroz dipejirîne. Lê ew ji olgehê re her celeb pîroziyê nabexşîne. Oltêgehî ji karê mirovan e, ku ji hêla dem û cih ve, û ji kesayetiya oltêgeh, hewes û pirsgerêkên wî ve bandor dibe. Ol ne yek tewzima nîşana neteweyî ye. Mîrza Şaho ev derew ji kû stendiye! Kî jê re gotiye ku Zerdeştî û Êzîdîtî baweriyên olî yên herî nêz in! Ji peyama ramana sosyalîst a Kurd (kurtêlxwer) re. Zerdeştî û Êzîdîtî du baweriyên olî ne ku li Kurdistanê hebûn û îro jî hene. Ol tiştek e û sosyalîzm tiştekî din e. Derbarê tiştê ku Mîrza Hewramî û koma wî jê re dibêjin "kelepûra pêş-Islamî", em li vir ji wan dipirsin: Gelo hemî kevneşopî, kultûr, rewîşt, nirx û bûyerên Kurdî yên ji serdema berî misilmantiyê berma girtine, kevneşopiyên negihîştî ne? Ma vejîna cejna Newrozê ya bi rûmet û pîrozkirina wê her sal di 21ê Adarê de, û bîranîna rizgariya gelê Kurd ê çewisandî ji (Zehak) şîna pozbilindî yan bi şîna Kawa vejîna kelepûrek negihîştî ye, an ew vejîna pêmayek gelêrî, şoreşger û azadker e? Bala xwe bidinê ku axayên Şaho Hewramî, yek ji rêberên rejîma Iranê, di destpêka desteserkirina xwe ya li ser hukûmetê de, hewl

dan ku pêşî li Newrozê rê bigirin wekî "cejna Mecûs" (kurtêlxwer), lê wan nekarîn pêşî lê bigirin. Ji ber vê yekê, wan hewil da ku meydana wê teng bikin, û ku xwedanên Şaho Hewramî ji koma El-Talib ku demargêr li Afxanistanê pîrozkirina Newrozê qedexe kir û gelek kesên Tacîkî ji ber ku Newroz pîroz kirin, bidarve kirin. Wê hingê em dipirsin kî negihîştî û çi negihîştî ye! "Negihîştî" bêjeyek e ku ji hêla Pêxember (Silavên Xwedê lê bin) ve hate bikaranîn ku hin rewîşt û pîvanên ku di civaka eşîrî ya Ereban a koçerî ye paşdemayî de, serdest bûne ku di serdema wî de hebû, bi nav dikir, wek mînak zarokkujiya keçan. Di Qur'ana Pîroz de wiha hate gotin:

(وإذا المؤمنة سؤلت، بأي ذنب قتلت) (سورة التكوير ص586)

Wate: "Dema giyan careka din li laş vedigere, û dema keç bi saxî binax dibe, tê pirsîn: Bi çi gunehî hatiye kujtin." (Wergêr)- û her weha peristina pûtên ji kevir û daran ... hwd. Lêbelê, ev têgehên û bêje bêguman gelê Kurd nagire nav xwe. Berî misilmanbûna wan, Kurd mirovine şaristanî bûn ku ji pût û nûtan re neperizîn, ji jinên xwe re rêz digirtin, keçên xwe mîna lawên xwe xwedî dikirin, û bi koleyan re mîna Ereban nekirin. Wekî îro, em dikarin kesekî mîna Şaho Hewramî û koma wî di nav xwedan kevneşopiyên berî misilmaniyê de, bibînin. Ereb jinan wek kole dest digirin û baweriya wan bi wekheviya di navbera herdû nijadan de nîn e. Wekheviya di navbera Misilman û ne Misilmanan, ên ol û baweriyên din de, li cem wan nîn e. Ew li dijî mûzîk, dîlan, stran û rengên xweşik ên rengereng û geş in. Belê, Şaho

Hewramî dê axayên xwe, di nav serokên rejîma Iranê de, bi nezaniyê tawanbar bikira. Ji ber ku ew her sal boneya Aşûra pîroz bibîr tînin, û dema ew li rûyên xwe dixin û xwe birîndar dikin, bi sedhezaran mirovan dicivînin. Ev yek ji kultûrên têngihiştinê ye, ji ber ku Pêxember (silavên Xwedê lê bin) got "Ew ne ji me ne yên li riwê xwe dixin, xwe birîndar dikin û doza yekemîn xwesteka negihiştîtîyê dikin.

Gelê Kurd ji dîrok, şaristanî û kultûra xwe ya ku berî derketina misilmantiyê li Kurdistanê hebûn û bernadin. Lê, ya ku jê re tê gotin "Şaristaniya Misilmantiyê", ew di rastiya de, beşek ji "Şaristaniya Kurdî" ye. Ger tiştê gelê kurd li misilmantiyê zêde kiriye, jê hilînin, tiştê hêjayî gotinê namîne. Me li ser vê mijarê gotina pêşewa El-Xezalî bicih kir. Misilmanî beşek ji dîroka gelê Kurd e, lê dîroka gelê Kurd ne beşek ji misilmaniyê ye. Şaristaniya gelê Kurd zincîreke nedabeşkirî ye ku ji destpêka hebûna Kurdan heya roja îro berdewam dike. Ew ji bo her beşekî wê dewlemendbûn û pêdivî ye.

Di dawiyê de, birêz Hewramî dibêje: "Hin neteweperwer hewl didin ku Yezîdîtiyê û Zerdeştîyê ola Kurdên resen bidin xuyakirin, û misilmantî olek biyanî ye ku bi zora çekan li mirovan tê sepandin. Ew rastiya dîrokî ya pir hêsan ku bîrdozên ramana neteweperweriya Kurd nizanin, an jî paşguh dikin, ku Zerdeştî ji hêla şahê Faris Keştaseb ve li ser Kurdistanê hate sepandin. Zerdeşt ne Kurd bû, wekî ku hinek dixwazin wî bikin Kurd, lê ew mirovekî ji Rojhilatê Iranê, bi taybetî ji herêma Xuresan bû (heman çavkanî, rûpel 11).

Di bersiva wê de, ez dibêjim ku min li ser Yezîdiyati axivîme, navê rast "Êzîdî" ye, ne "Yezîdî" ye. (Di vê semînerê de, li doreza hejmar 37, binihêrin). Ew olek mîna olên din ên Sensekrîti ye ku li Kurdistanê çêbûye. Derbarê pirsgerêka Zerdeştî û Zerdeşt Pêxember, silav lê be, ew ne wek Hewramî aşop û sawêr dike, bi vê hêsaniyê ye. Li ser Zeradeşt bi sedan an bi sedhezaran pirtûk û lêkolîn bi zimanên cihêreng hatine weşandin. Ez di lêkolînên Iranî de pisporê im, û ji ber karê xwe, ez li rewşê baş haydar im. Li ser dîroka jidayikbûna Zerdeşt, cihê jidayikbûna wî, û xala destpêkê ya ji bo belavkirina hînkirinên olî, gelek bîrnîşandan, zîrekî û dîtinên cûda hene. Diyar e ku birêz Hewramî pirtûkek xwendiyê, û ew yek ji nivîskarên Rojavayî ye, û yê din nezan an paşguhkirî têne dîtin. Hewramî ji zimanê Avesta, ku zimanê pirtûka pîroz a Zeradeşt e, (Silavên Xwedê lê bin), nezan e. Yê ku pirtûka pîroz (Avesta) ya ola Zeradeştî bergirî dikin, ku tenê beşekî piçûk jê li cem me heye, ji ber ku Erebên Misilman ên ku Kurdistan û Iran dagîr kirin, beşek mezin wêran şewitandin. Her çend Zerdeştî di nav Xudanên Pirtûkê de, wekî Xiristiyan û Cihûyan dihatin pejirandin jî, meriv di wê de wekhevîyeke zelal bi zimanê Kurdî yê niha re dibîne, berevajî zimanên din ên Iranî. Wekî din, şopên ola Zerdeştî li Kurdistanê bi piranî li Taqwesan li nêzê Kermaşan, û li Hewraman, wekî mînak û herêmên din têne dîtin.

Ger em girîmane bikin ku Zeradeşt li herêma Xurasan ji dayik bûye, ev nayê wê wateyê ku ew ne Kurd e. Êlên mezin ên Kurd hebûn û hîn jî hene ku ji demên kevnare ve li

herêma Xurasanê dijiyan. Ebû Muslim El-Xurasanî (Behzadanî Xurasanî) yê ku di 750z de, dewleta Umewiyên nijadperest hilweşand, Kurdekî Xurasanî bû. Li Xurasanê heya niha nêzîkê yek mîlyon mirovên ku li devereke bi navê "Kurdistan Xurasanî" (Kurdistan Xurasanî) dijîn û bi zimanê xwe yê Kurdî daxifin, hene. Nezanîna van tiştan nezanîna dîroka gelê Kurd e, an paşguhkirina wê ji bo nexweşiyekê yan armancekê ye.

Derbarê tiwêja ku ola Zerdeştî li ser Kurdistanê hatiye sepandin, ji bo vê yekê çavênê berbiçav tune. Tiştê ku filan dibêje an bêvankes tiwêj dike, giroveke qutibir nîn e. Lê, ka em ji bo girîmane ku ev ol li Kurdistanê hate sepandin, û paşê çi? Rewşa piraniya olan ev e. Ola misilmanî bi êrîş, dagîr kirin û serketinê, nemaze li Kurdistanê, belav bû. Ev ji hêla çavkaniyên dîrokî yên pêbawer ve tê pejirandin, mîna pirtûka El-Waqidî ya ku hate gotin (li vê semînerê binihêrin doreza hejmar 11)

Hêjayî gotinê ye ku, nehezkirina Selefiyên demargîriya ji Zerdeşt Pêxember re wan gihand qunaxekê, heya ku serokê wan, Ruhullah Xumeynî, Zerdeşt wekî "Mecûs xwedênenas û yek ji perestvanên êgir" binav kiribû. (Li pirtûka "Fedaiyan Islam" "Şervanên - Islam ", berhevoka gotaran e ku ji hêla kovara Farişî "Rehayî" ve hatiye weşandin. Kovar berdevka "Sazman - Wehdet Kumonistî ya Iran"ê, Rêxistina Yekitiya Komunîstên Iranê, Los Encelos, Emerîka, 1362 H. Ş. Rû. 237). Rastî ev e ku Zerdeşt ne xwedênenas bû. Ji ber ku wî bawerî bi Yek Xwedayî, "Ahoramezda" anî û nebû "perestvanê êgir",

ji ber ku wî berê xwe dida Xwedê "Ahoramezda". Min got agir wekî semboleke ronahiyê ji bo kurdên kevnare ye. (Binihêrin: Doreza hejmar 11 ya vê semînerê). Peyva Macûs ji bo Zerdeştîyan wateya "Zanayên olî" dide. Pirsê ku derdikeve pêş ev e: Zeradeşt Pêxember bû an di têgihiştina bi mîlyonan mirovên ku şopdarên wî ne Pêxember bû. Ev hîn jî li Iran, Kurdistan, Hindistan û li tevaya cîhanê hene. Gelo, mafê kesekî heye, pileya wî çî dibe bila bibe, ku bi vî rengî êrîş bike û baweriyê bi olek bîne, û ji yên din bixwaze ku rêz ji ol û baweriyê wî re bigirin! Eger ew wiha neke, wê hingê çarenûsa wî kuştin be? Divê birêz Hewramî bersiva vê pirsê bide! Tenê ji bo Xwedê.

Em niha têne ser KAJYK û mafên hindikahiyên li Kurdistanê, ku Şaho Hewramî nîşan dike. Em pêşiyê ji pirtûka xwe ya bi navê "Bîrî Neteweyî ... hwd" veqetandek bidin. Ew di vê pirtûkê de bi rastî jêrîn dibêje:

KAJYK bawer dike ku nûnertiya nijadî ya gelekî di xaçepirsê gelê din de, tawaneke nayê baxşandin. Mafê hêmana Kurd nîn e ku bi setem û zorê hêmaneke din bihelîne. Ji ber vê yekê, KAJYK ji bo parastina hemî kêmetewan û pêkhatiyên din, ên ne Kurd, dixebite. Li gorî dîtina KAJYK, kêmeteweyên ku ji demên kevnare de, li Kurdistanê niştecih bûne, xwedî maf in ku ji eynî mafên hemwelatîyên Kurd bi wekhevî distîne, bistînin. Mafê wê heye ku neteweyên xwe bipejirîne û kultûra xwe ya kevnare biparêze, dema ku ew jê re rêz û hurmet digire. Ne ji mafê kesî ye ku wê êrîş bike. Pêwîst e ev hindikahî baristbûnê li

dijî Kurdistan, û xiniziyê jî li Kurdistanê nekin. Ango, divê ew Kurdistanê wekî welatê xwe bipejirînin. Binêre Cemal Nebez: "Bîrî Neteweyî ... hwd" Rû. 192, ji bernamêya KAJYK ku wekî "Rêbaza Kudeta KAJYK ya Civakî" tê zanîn. Hêjayî gotinê ye ku, ev pirtûka "Bîrî Neteweyî... hwd" ji birêz Şaho Hewramî re peyda bûbû ji ber ku ew di gotara xwe de destnîşan dike. Vêgavê, em binerin ka Hewramiyê "Misilman" çawa vê nivîsandinê bi mebest berevajî kiriye û pêşî li bibiryarî girtiye gava ku wî nivîsiye:

"KAJYK û PASOK di ramanên xwe de, ji bo hindikahiyên netewe li Kurdistanê cih nabînin. Belê, ew palpişt dikin ku rêxistinên Kurdî ji her piştgiriyeke ne Kurd azad in, ji ber ku ew pêdivî ne - li gorî Nebez - hêmanên din, di nav rêxistinên xwe yê neteweyî de, kar bikin. Lê, divê ew di nav berjewendiyên Kurdistanê de tevbigere. (Jêdera berê, Rûpel 10).

Pêdivî ye ku xwendevanek hêja herdu nivîsan bide ber hev û bi xwe dadbar bike, û ji hêla rêgeza wekhevîyê ya ku KAJYK pê bawer e, berfireh bibe û biherike. KAJYKê maf nedaye xwe ku fişarê li hindikahiyên li Kurdistanê bike da ku derbasî partiyên Kurd bibin, lê pê bawer e ku mafê wan e ku rêxistin û partiyên xwe ava bikin, komeleyên xwe bi xwe bikar bînin, û berjewendiyên xwe biparêzin da ku di xaçparêziya neteweperweriya kurd de, neyên pişivandin. Gelo ev lêborîn û mirovahiya herî mezin e, an KAJYK di ramana xwe de cihekî ji bo hindikahiyên neteweyî li Kurdistanê nabîne, wekî ku di van guhorînên derewîn de hate gotin.

Derbarê KAJYK û civata wekhevîyê, Şaho Hewramî dinivîse: "Civata wekhevîyê, di ramana wan de, xwediya pêşîniyê ye, ji ber ku KAJYK bawer dike ku wekhevî pêk nayê heya piştî bilindkirina pîvanên çandî û jiyana Kurdan, lê xwedan dibistana sosyalîst a Kurd (Kurtêlxwer) de, ne Marksî ne.

Ji wan re, sosyalîzm navgînek e, ne armanc e. Ew dixwazin wekhevîyê pêk bînin û bigihîjin civakeke bê çîn, ji ber ku ew wê yekê ji bo rizgariya civakê takemafek bingehîn dipejirînin. Di rewşa ku wekhevî pêk were de, rola dewletê girîng namîne, û gav bi gav ji holê radibe, çunkî endamên wê dê ji çemeka hesta berpirsiyariyê tevbigerin"(ibid, Rû 1).

Çend rêzan paşê ew dibêje: "Rola ji bo dewletê di ramana sosyalîst a Kurd de hatî destnîşankirin heman rol e ku Markis ji bo dewletê di civaka komunîst de dixwest, ku ew gav bi gav winda dibe û ew roleke nîgaşî ya nîgaşperest e" (Jêderê berê 10).

Ji bo zelalkirina vê, em dibêjin: "Ji bo Marksîsan, dewlet di destê çîneke taybetî de alavek pişaftinê ye. Lê ji bo KAJYK hebûna dewletê tê wateya nemabûna civakê, ango tunebûna lihevhatina civakê ye. Li gorî KAJYK, ne pêdivî ye ku alavê dewletê di bin çînek aborî ya diyar de be da ku çîneke din tepeser bike. Belê, ew alav dikare di destê kesek taybet, malbatek, êlek taybet, partiyek taybet, çînek leşkerî ye diyar, çînek bûrjûwaziya piçûk, an komek mirovên olê, çînek rewşenbîr, komek taybetmend, an jî di destê hevpeymanên ji komên cûda de. Awayê gihîştina civakeke wekhevî ne

zordestiya çîna karker e (wekî ku Marksîs tiwêj dikin), ne jî zordestiya "melayan" e. Belê, ew e ku bi berdewamî asta çandî were bilindkirin, û hişiyariya hizrên bi rêbaz ronî bikin wekheviya mirovî ji bo pêkanîna azadiya berfireh di civakê de, bi mercê ku azadî neyê rencxorîkirin û ne kar pêkin. Ji bo azadî bixwe ji holê neyê rakirin. Dê roj were ku her çûreyek ji çûreyên "dewlet"ê dê bikeve dogeh û belengaziyê, û "dewleta melayan" jî. Seyr e û pir bêgane ye ku ev "Misilmanên hukûmetê" dijminatîya her tiştê ku Kurdî, û her tiştê ku bandorê li gelê Kurd dike, dikin. "Alayî Islam" (eynî hejmar Rû. 6) gotarek bi navê "Dîsa Kurdistanê Sor" nivîsand, û tê de dijayetiya xwe li hember daxwaza Kurdan ya ji nû ve damezirandina komara "Kurdistanê Sor", a ku ji hêla wê ve hatiye daqurtandin, diyar kir. Tûranên Azerî bi alîkariya Stalînê xwîn mij tawanbar in. Van Kurdên lêçan û nerasterê, li ser bingeh û regeza reşkirina xwe ji komunîstê re - her çend taybetmendiyên wan ên hevpar bi komunîstên neserbixwe re hebin jî - bawer dikin ku Kurdistanê Sor careke din vedigere "Hembêza Komunîstiyê". Ez ji van sîxurên nezan re dibêjim: Ji vî perçeyê piçûk ê Kurdistanê re "Kurdistanê Sor" tê gotin, ji ber xaka herêmê sor e. Ev têgeh di zimanê Kurdî de pir têye dîtin. Wekî Çiyayê Sor û Çiyayê Reş, û gotina pêşyan a Kurdî dibêje "Ne ku her kesê simbêl sor e Hemza axa ye!". Wisa dixwiye ku ga ji rengê sor ditirsin. Di dawiyê de, em ji van kesan re dibêjin: Divê wan mêjerên mezin ên ku Şahatiya Si'ûdî, piştî şerê Iran û Iraqê, dabû wan li ser navê "bexşên ji neviyên Selahedîn re", ji gelê Kurd ê belengaz re belav bikirana, ne ji bo ji xwe re xanî û otomobîlên spehî li Londonê pê bikin.

Di encamnameyê de, divê em serî li rêxistineke din a misilmanî bidin, angû "Hereketa Islamiya Kurdistanê", ya ku mamoste Ebdurehman Dura serokê wê ye. Mamoste Dura zanyarekî Kurd e ku bi mêranî û dilsoziya xwe naskirî ye, û ew tevgera xwe ji domdara tevgera pêxember Mihemed (silavên Xwedê lê bin), ya ku ew nêzîkê 1400 sal berê rêve dibir, dibîne. Ew di 1993an de, piştî civîneke bi 30 zanayên Kurd re, li çiyayekî bakurê Kurdistanê hate damezirandin. Kesên beşdarkirî bi yekdemî mamoste Ebdil-Rehman ji bo tevgerê wekî rêber hilbijartin. Tevgera Islamî ya Kurdistanê wekî neteweyek yekgirtî û yekbûyî, mîna hemî neteweyên cîhanê bi serxwebûna Kurdistanê, di hemî perçeyên xwe de bawer dike. Mamoste Ebdil-Rehman neçar ma ku wekî penaber li Ewropa bijî. Lê ew bi rêxistina navxweyî re, ya ku rêza yekem a lê hatî damezirandin dişopîne, di têkiliyê de ye. Birêz Ebdil -Rehman ji me re ragihand ku ew ne berpîrsê Rêxistina Ewropa û kovara wê "Bawerî" ye, û bêtirî heft mehan e ku têkilî bi wan re birîne.

(*)Ramana "Wilayet el-Feqîh/Xawendariya oltêgehî" di serdema Şahê Qacar Fetih'ilişah de, derketiye holê, û Mela Ehmed Neraqî, ku wekî "Fadil Neraqî" tê naskirin, di nav alîgirên herî xurt ên vê ramanê de bû. Lêbelê, hin zanayên Şîî, di nav wan de jî El-Exwend El-Xuresanî yê navdar û zanyar El-Naînî, nivîskarê pirtûka "تنزيه الملة", li dijî ramana wî derketin. Ji ber vê yekê, "Wilayet el-Feqîh/Xawendariya oltêgehî" neket nav "Mercdarkirina Iranî" û pîrsgirêk paşguhkirî ma heya ku Rûhullah Xumeynî di dema mayîna xwe li Iraqê bajarê Necefê de, ew careke din rakir, û di pirtûka

xwe ya bi navê "Hukûmeta Misilmantî" de, li ser wê nivîsand. Mela Dr. Beheştî, yê ku di salên 1960an û 1970an de, li bajarê Hamburgê li Elmanî, mizgefta Şî'î birêve dibir. Piştra li ser destê "Mucahidî Xelq" hate kuştin. Piştî damezirandina Komara Islamî ya Iranê, yek ji mezintirîn parêzerên vê ramanê bû. Beheştî, bi piştevaniya Rûhullah Xumeynî, karîbû têgeha "Wilayet el-Feqîh/Xawendariya oltêgehî" bike nav destûra bingehîn a Dewleta Islamî ya Iranê, di sala 1358 H.Ş. Tevî dijberiya hin zanayên şî'e, wekî Qemî û Şerî'etmedarî û yên din. Di nameyek ku Xûmeynî di 1366 H.Ş de, ji Xamine'î, serokomarê Komara Iranê re şandiye, di wê nameyê de, wî "Xawendariya oltêgehî ya Reha" dupat kir. Bêjeya "Reha" serokê Mihdî Bazirgan, serokê Rêxistina (نهضت آزادی) tengezar kir. Wî di nameyekê de ji Xumeynî re nivîsand ku (Xawendariya Reha) di Qura'anê de, tu bingehê wê nîn e, ne jî di zanîna hevberê de heye. "Ya rast ev e ku Xawendariya Reha berevajiyê deq û giyanê benda 56 e, ya Destûra Bingehîn a Komara Islamî ya ku dibêje: "Serweriya Reha li ser mirovan ji aliyê Xwedê ve ye." (Xwedê) yê ku mirov kir serwerê çarenûsa xwe ya civakî. Mafê tu kesî tune ku wî mafê Xwedayî ji kesekî bistîne, an jî wê bixe bin raje û peywira berjewendiyên kesekî an komeke taybet de, ku gel ewên vî mafê Xwedayî cîbicî tînin çawa di bendên paşîn ên vê destûrê de tê".

Zanayê Ereb, Şêx El-Osmanî El-Wailî El-Necdî, pesnê mala Kurdan, Kurdistanê, welatê zanîn û şaristaniyê dide:

أيا منزل الأكراد بُوركتَ منزلاً لنا فيه اتحادٌ والمعارف تشرقُ
سعدتَ فما أصبحتَ إلا حديقةً بها زهر التحقيق بالدرس مُورقُ
لنا فيك اعلام إذا ما ذكرتم فطرفي دفاق وقلبي مُحرقُ

Nûçeyeke Piçûk


Rojnameyê piçûk bi zimanê Erebî bi navê "Kurdistan" li Oslo (paytexta Nerwêc), û bi navê "Nivîsîngeha Ragehandinê ya Kurdî li Nerwêcê" hate weşandin. Lêbelê, weşanger vê dawiyê navê xwe ji "Nivîsîngeha Ragehandinê ya Kurdî" guhert û kir nivîsgeha "Azmar a ragehandinê", li ser daxwaza axayên Iranî ku paredana vê rojnameyê dikirin. Di rastiyê de, nivîsgeheke çapemeniya Kurdî nebû. Lêbelê, guhertina nav û jêbirina peyva "Kurdî" du tiştan dupat dike:

Ya yekem ev e: Axayên "Misilman" ên Iranî nikarin peyva "Kurd" ragirin, her çend ku ew Kurd ê di destê wan de karmendekî perîşan be jî.

Ya duyemîn: Ew Kurdên ku xwe xistine bin rajeya van axayan, ji bilî berjewendiyên xwe yên kesane, tu xemên din naxwin.


Pêveka hejmara (2):

Hin wêneyên ku bi mijara semînerê ve têkildar in:



Cemal Nebez dema ku li konferansê semînera xwe dixwîne

Gora Sultan Selah el-Dîn El-Eyûbî li Şamê



Gora Sultan Selah El-Dîn El-Eyûbî li Şamê, li teniştâ wî
gora şalyar Fexir El-Dîn e

Mamoste Cewad Mela, Sekreterê Giştî yê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, Alaya Kurdistanê diyarî serokê Şoreşa Erebî, El-Eqîd Mu'emmer Qezafî dike. Ew alaya Kurdistanê di du destên xwe de, li ofîsa Mu'emir li Terablus, di dema serdana şandeya konferansê li Cemahîriye de digirin, û civîna dîrokî di 25-1-1997an de pêk hat.




Yasir Erefat, mezinê Filistînê, xwînxwerê gelê Kurd û xwînrêjê şer Sedam Huseyn li Bexda himbêz dike, û Husnî Mubarek di navbera wan de sekinî ye.

Wêneya Le Water di 24-10 -1988an de hatiye kişandin

Di sala 1988an de, bi bombeyên kîmyawî yê Iraqî, sala komkujiya jenosîdê li ser rûniştvanên bajarê Helebçeyê ye.




Jinek ciwan, ji eşîreke kurdên Xurasanî, kincên xwe yên bedew ên kurdî li xwe kiriye.



Li Bakurê Kurdistanê gora Mem û Zîn


(Çîroka evîna wan wekî evîna Romeo û Juliet).

Ramanwerê kurd ê mezin Ehmedê Xanî ev çîroka bi helbestî nivîsiye. Ew ji 1662 ayetên dastanên herî seyr ên evîna yarî ava dibe. Di destpêka çîrokê de, yek ji şahberhemên ku li ser ramana neteweyî ya Kurdî hatîye nivîsandin.




Wêneyek dîrokî yê belgeyî ku tê de Mustafa Kemal, wekî "Etatirk" tê zanîn. Wateya navê wî "bavê Tirkan" e, xuya dike ku di nav komê zanayên olî yên Kurd de, cilên meleyan li xwe dike, radiweste da ku hestên olî yên misilmantiyê li ba gelê Kurd bikar bîne.


Ji bo xapandina gelê Kurd di berjewendiya ramana faşîst a ne-olî û nemirovane ya Tirk de, û her weha jîholêrakirina gelê Kurd, ku wî bîngeha dewleta xwe ya çêkirî danî, piştî ku bi saya Kurdên şaş hate ser desthilatdariyê .



Wêneyek ku di rojnameyên Elmanî de hatiye weşandin: Jineke kurd e, misilman e, bi navê Şahza Simsak digel du zarokên xwe, nîşan dide dema ku ew li parastina Dêra Xiristiyan li Elmanya ye. Mêrê wê yê ku xwedî mafê penaberiya siyasî li Elmanya bû, piştî ku hukûmeta almanî biryar da ku wî radestî rayedarên tirk bike, yên ku li wî digeriyan ji bo çalakiyên wî yên neteweyî yên kurd, da ku ji wî tolê hilînin, xwe veşart. Dêra Xiristiyan Xatûn Şahza û du zarokên wê ji bo çend mehan, û li cihekî dûrî çav û destên polîsên Elmanî parast. Heya ku dêr, piştî hewildanên dijwar, karîbû welatekî din ê Ewropî razî bike ku birêz Simsak û malbata wê wekî penaberên siyasî bipejirîne. Ji ber vê yekê, ji bo birayên filehan kêfxweş û pîroz in, û spasiya wan dikin. Şêwaza comerdî ya Papa û lavijên wî ji gelê Kurd re, ji bo başî û serfiraziyê di xebata wan a derketina ji êş û azarên wan de, bandoreke bikêr li ser kûrahiya wijdanê Kurdê dilsoz kir, û em di serî de, ji Papa re saxî û tenduristiyeke baş dixwazin.




Rûpelê pêşî yê kovara "Niştiman", berdevka J.K., yek ji partiyên neteweperwer ên Kurd e. Di sala 1943an de, û ayetên Qura'anê li ser wê diyar in.




نیشته

پلار کوردی بیری کومالی ژ ک
گوواریکی کومه لایهتی! نهدهبی! خویندهواربو مانگی کوردیه
 ژماره ۲ - سالی به کهم ۵ خهزله وهری ۱۳۲۲




نیشتمان

پلار کوردی بیری کومالی ژ ک
گوواریکی نهدهبی! خویندهواری. کومه لایهتی ومانگی گوردیه
 ژماره ۵ - ری به لدانی ۱۳۲۲ سالی به کهم



نیشته

پلار کوردی بیری کومالی ژ ک
گوواریکی کومه لایهتی! نهدهبی! خویندهواربو مانگی کوردیه
 ژماره ۳ و ۴ سالی به کهم ۵ سهراوه زری به لدانی ۱۳۲۲



نیشته

پلار کوردی بیری کومالی ژ ک
گوواریکی کومه لایهتی! نهدهبی! خویندهواری و مانگی کوردیه
 ژماره ۱ - سالی به کهم ۵ بوش بهری ۱۳۲۲ جولای ۱۹۴۳

Pêveka hejmara (3)

Navnîşeyek kurt a tawanên ku Ereb, Tirk û Farisên pozbilind û nîjadperest li dijî Kurdên çewisandî kirine

Welatên mezin desthilatên ku Kurdistan dagîr dikin hinartî bûn ku bibin parêzvanên tixûbên Peymana Sykes-Picot di 1916an de. Dûv re wê serî li rêkeftin û peymanên pirker ên Peymana Sykes-Picot da, di nav de:

- Di 1937an de, Peymana Se'ed-Abad, di navbera Iraq, Tirkîye, Iran û Afxanistanê de.

- Di 1955an de, Peymana Bexda di navbera Iraq, Tirkîye, Iran, Pakistan û Brîtanya de.

- Di sala 1959an de, dema ku Iraq ji hevpeymanê Bexdadê vekîşîya, di navbera Tirkîye, Iran, Pakistan û Brîtanya de, navê hevpeymanê hate guhertin bi Peymana Navendî (SANTO).

Digel peyman, qulp û hevpeymanên navborî, di navbera wan de, gelek peymanên veşartî yên du-alî jî hebûn; armanca wan hemîyan parastina sînorên desthilatên çêkirî yên ku Kurdistan û Bilûçistan dagîr kirine, û gelên din jî, ên ku bi domdarî ji nexşeya siyasî hatin paqijkirin, û piştgirî dan serxwebûna van desthilatên çêkirî, li ser berjewendiya azadiya gelê Kurd û serxwebûna Kurdistanê û gelên din ên Rojhilata Navîn. Hevkariya di navbera wan de, ji bo her li tevgera rizgarîxwaza Kurd bixin, di xalên jêrîn de têne diyarkirin:

1- Ligel hemî piştgiriya navneteweyî ji van hevpeymanan re, ew biser neketin ku armancên xwe yên mêtîngehgêrî pêk bînin. Ji ber vê yekê, welatên mezin rêniwênî dan û ji desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin re pêşniyar kirin ku karûbarên asayîşên wan sîxuran û guhdirêjên hêmanên gelê Kurd bikar bînin, da ku ji bo wan bixebitin. Ji ber vê jî, Iraq xebitî ku tîmên sivik (Caşan) damezirîne û Tirkiye hêzên cerdevanan (Qorujîyan) damezirand mîna, dabeşên Hemîdî yên Osmanî ku di destpêka sedsala borî de, ji hêla Osmanîyan ve hatibûn damezirandin da ku bibe amûrek ji bo binpêkirina şoreş û serhildanên Kurdî; û raportan di rîya sîxuran re, li ser xebatkar û tevgerên wan ji asayîşên desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, rê bikin.

2-Bizava Caşan nikaribû tevgera rizgarîxwaz a Kurd bişkîne, û raportên guhdirêjan ên desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, nema bi kêrî wan tên. Nemaze piştî ku General Mustafa Barzanî karîbû hêzek leşkerî ya Kurdî ava bike, û di sala 1974an de, ji 150,000 pêşmerge derbas kir. Ji wê rojê de, desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, ji tîrsa hêza lêdana Kurdî, dilerizin. Razkarên desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin amadekarî û stratejiya xwe ya li hember tevgera rizgarîxwaza Kurd ji nivîsandina raporên heya amadekirina sipahên efserên xwe, yên ku zimanê Kurdî fêr dibin, û di çêtirîn rêbaza sîxuriyê de têne perwerdekirin, û çawaniya bindestkirina tevgera rizgarîxwaz a Kurd de hate guherandin.

3-Van efserên sîxur, bi tenê ji ber xomilbûn û endametiya wan bi partiyeke Kurdî re, parastin û lênihêrîna serkirdeyên

partiyên Kurdî stendin; ew bi hêjabûnên xwe yên bilind re, beramberî endamên partiyên Kurdî bûn, ku piraniya wan ji çînên xizan û nexwendî bûn. Ji konfêransa yekem, karmendên sîxuriyê wekî serkirdeyên wan partiyan hatin hilbijartin. Piraniya partiyên Kurd bûne alavek di destê dezgehên ku Kurdistanê dagîr dikin bi saya efserên xwe yên sîxur yên ku gihîştine cihin bilind di serkirdayetiya piraniya partiyên Kurdî de. Eger ne ew efserên sîxuriyê bûna, desthilatên ku Kurdistan dagîr dikirin dê nikarîbana tawanên xwe bi hêsanî pêk bînin. Kurdistan, ya ku wan li dijî gelê Kurd kir, ku mamoste Cemal Nebez vegotina kokên wê yên dîrokî kir. Mînak dikare were kurtkirin, lê di xalên jêrîn de ne bisînor:

- Tirkiye digel hemî bêşermî û hiyîzîtiyê, Şêx Ebdul-Selam Barzanî û hevalên wî, di zindana Mûsilê de, di sala 1914an de bidarve kir.

- Tirkiye digel hemî pozbilindî û hiyîzîtiya xwe, bêtirî nîv mîlyon kurdên ku di kiryarên mezin ên koçberiyê de (Safar Berlik) di 1914-1918an de, ji ber serma û birçîbûnê mirin, kuştin.

- Hêzên Iraqî û Brîtanî, bi hemî pozbilindî û bêşermiya xwe ve, Şêx Mehmûdê padîşahê başûrê Kurdistanê girtin û wî meşextî Hindistanê kirin.

- Tirkiyê di sala 1925an de, bi hemî bêşermî û hiyîzîtiyan, serokê Kurd, Şêx Se'îd Pîran, bi 46 (48) hevalên xwe ve, bidarve kir.

- Tirkîyeyê serokê Kurd, Apê Osman Sebrî, bi hemî bêçaretî xist zindanê, û apê wî Şukrî axa û Nûrî axa di 1926an de bidarve kir.

- Iranê di 1930î de, bi hemî pozbilindî û zalimî, serokê Kurd, Isma'îl axa Şikakî, birayên wî û diya wî kuştin.

- Tirkîyê di sala 1930î de, bi hemî bêşermî û hiyîzîtiyê, bi çekên kîmyawî û gazên şewitandinê, Geliyê Zîlan li bakurê Kurdistanê xist.

- Tirkîyê di 1937-1939an de, li Dêrsimê, di hemî pozbilindî û hiyîzîtiya xwe de qirkirinek li dijî Kurdan pêk anî.

- Tirkîyê serokê kurd Seyid Riza di 1939an de, bi hemî bêdadî û hiyîzîtiya xwe ve bidarve kir.

- Iranê Qazî Mihemed, serokê Komara Kurdistanê, di sala 1946 de, bi hemî çavnebarî û hiyîzîtiya xwe bidarve kir.

- Suriye, bi hemî pozbilindî û bêşermiyê, bi bûyera asayîşî ya ji xwe-amedekirî ya di 1951an de, serokê Kurd Mîr Celadet Bedir-Xan kuştin.

[Celadet li 15'ê Tîrmeha sala 1951-ê, li gundê Hêcanê nêzîkî Şamê, di bîra qederê werbû û çû ber dilovaniya Xwedê-(wergêr)]

- Tirkîyê, di 1957an de, bi hemî pozbilindî û hiyîzîtiyê, serokê Kurd Fayik Bucak kuştin.

- Sûriye digel hemî bêdadî û hiyîzîtiya xwe, 380 zarokên Kurd şewitandin dema ku wan fîlimek li ser şoreşa Cezayîrê di sînema Amûdê de, di sala 1960î de temaşe dikirin.
- Sûriye di 1962an de, bi hemî pozbilindî û hiyîzîtiya xwe nasnameya xwe ji nîv mîlyon Kurd vekişand.
- Sûriye bi hemî pozbilindî û hiyîzîtiya xwe ve, bi riya projeya Kembera Erebî, ya nijadperest, erdên Kurdan desteser kir û di 1967an de, erebên xemir li şûna wan bicih kirin.
- Iraqê di navbera 1961-1975an de, bi hemî pozbilindî û hiyîzîtiyê Kurdistan bi çekên fosforî û napalm şewitand.
- Iran û Iraq bi hemî tiroyî û hiyîzîtiya di Peymana xiniz a Cezayîrê de, ku dawî li Şoreşa Îlonê ya bi serokatiya General Mustafa Barzanî di 1975an de anî.
- Bi hemî bêhurmetî û tiroyîyê re, di sala 1980an de, Iranê li rojhilatê Kurdistanê bi deh-hezaran Pêşmerge û sivîlên Kurd kuştin.
- Iraqê 5,000 Kurdên Feylî revandin û kuştin, û malbatên wan di 1980an de, digel hemî tiroyî û bêşermiya xwe, meşext kirin.
- Iraqê di 1983an de, 8000 Kurdên Barzanî bi hemî bêşerefî û setemkarî revandin û kuştin.

- Iraqê di 1987an de, di şert û mercên razdar de, serokê Kurd Idrîs Barzanî, bi hemî pozbilindî û tiroyîyê kuşt.
- Bi hemî bêdadî û tiroyîyê, Iraqê di 16-3-1988an de, 5,000 Kurd û bi deh-hezaran windahî li bajarê Helebçe bi çekên kîmyayî kuştin.
- Iraqê, di dawiya sala 1988an de, bi hemî bêdadî û tiroyîyê, 182,000 Kurd li çolên başûrê Iraqê, sax veşartin.
- Iranê di 1989an de, li Viyanayê, bi hemî pozbilindî û setemkariyê, serokê Kurd, Dr. Ebd El-Rehman Qasimlo û hevalên wî kuştin.
- Iraq bi hemî pozbilindî û tiroyîya xwe bû sersedema mirina bi sedan zarokên Kurd ji ber dijiwariya sermayê di mîlyon-koçberiya 1991 de.
- Iranê di sala 1993an de, li Berlînê bi hemî pozbilindî û tiroyîyê re serokê Kurd Dr. Se'ed Şerefkendî kuşt.
- Tirkîyeyê 15 sal sizayê zindanê da serkirdeya kurd, Leyla Zana û hevalên wê, digel hemî bêdadî û zordariya xwe, ji ber ku di 1995an de, li Parlamentoya Tirkîyê bi zimanê Kurdî axifî.
- Tirkîye di 1999an de, bi hemî bêşermî û tiroyîyê, serokê Kurd Ebdullah Ocalan revand, û ew hîn jî girtî ye.

- Sûriye digel hemî bêşermî û xirabiya xwe, di dema serhildana gel a birûmet, di sala 2004an de, li rojavayê Kurdistanê li kolanan bi dehan Kurd kuştin.

- Sûriya piştî 2004an, dema ku ew bi bûyerên çêkirî yên asayîşî xebata leşkerî ya Sûrî dikirin, bi dehan serokên serhildanê kuştin.

- Sûriye di 2005an de, bi hemî setemkarî û bêdadiyê, serokê Kurd, Mihemed Şêx Me'şûqê Xeznewî kuşt.

- Sûriye di 2011an de, bi hemî setemkarî û bêdadîya xwe serokê Kurd, Miş'el El-Temo, kuşt.

- Bi bêbextî û xirabiyek mezin, desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, di her demê de û li her deverên Kurdistanê, kurên herî baş ên gelê Kurd di bin îşkenceyê de kuştin.

- Bi hemî bêdadî û tiroyîyê, desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin mişext kirin û dest danîn e ser mal û milkê kurên herî baş ên gelê Kurd her dem û li her deverên Kurdistanê hatine kirin û kuştin.

- Bi hemî pozbilindî û hiyîzîtîya xwe, desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, bi hezaran gund û bajarên Kurdan wêran dikirin, û bi çîmento ser kaniyên wan her dem û li her deverên Kurdistanê girtine.

- Bi herî hiyîzîtî û tiroyîyê re, desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin êrîşî namûsê kirin, bêrûmetî li jinan kirin û her dem û li her deverên Kurdistanê li sûka koleyan têne firotin.

- Desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, dîrok, kultûr û şaristaniya Kurdî bi hemû şêweyên zir, sexte, vêl, lar û kuşirandî kirine û li dijî ziman û çanda Kurdî her demê û li herçar parçeyên Kurdistanê siyasetek qirkirinê rûdaye.

- Tevî bêşermî û bêdadî, desthilatên ku Kurdistan dagîr kirine, bi planeyê bajarê Kobanî wêran kirin û gelê wî di sala 2014an de, koçber kirin.

- Bi hemî pozbilindî û xirabiya xwe ve, desthilatên ku Kurdistan dagîr kirine, bi destên alîgira xwe rêxistina Da'îş ya ku sala 2014, li Şingalê 9000 Êzîdiyên Kurd revandin.

- Iraqê, bajarê Kerkûka birîndar dagîr kir, digel hemî pozbilindî û xirabiya xwe, çêtirîn kurên wê di 2017an de kuştin.

- Tirkîyê bajarê Efrîna birîndar bi hemû pozbilindî û tiroyîya xwe dagîr kir, dema ku kurên wê yên hêja di 2018an de kuştin.

- Tirkîyê bajarên Serêkaniyê û Girê Spî bi hemî pozbilindî û xirabiya xwe, dagîr kir û bi bombeyên fosfora Spî li wan xist û kurên wê yên çêtirîn di 2019an de kuştin.


- Desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, bi pozbilindî û bêşermiya xwe, li piraniya deverên Kurdistanê 2018-2020, zeviyên genim yên Kurdan şewitandin.

Werîsê setemkariyê, bêdadiyê û talankirinê li hemî herêmên Kurdistanê dijwar û dirêj e, rewş roj bi roj diwartir dibe, bi embazî: Iraq, ji 2003an û vir ve, doza demokrasî û federalîzmê dike, bi mîlyaran dolar, qerebû, tawandan û pêbijêrî daye Kuweytê, lê heya îro jî qurûşek qerebû ji Kurdan re nedaye, heya ku wan lêborîn jî ji gelê Kurd nexwestine. Ji bo tawanên ku Iraqê bi serê Kuweytê anîn e, bi serê kurdan pirtir hatiye. Ev tê wê wateyê ku hizrên fermandarên Iraqê hîn jî nijadperestî û pîsî li hember gelê Kurd û qirkirin û koçberkirina wan û armanca guhertina demografiya Kurdistanê dikin, da ku Kurdistan bibe ya wan, û xwediyên rewa kurd jê derkevin û kurdistan vala bibe û kiryarên nû plan dikin.

Di her dem û cihê de, gelê Kurd ji welatê wî Koçber dikan, û ji bo guherandina demografiya Kurdistanê yê din li şûna wan niştecih kirin.



Di 16.03.1988an de, bi deh-hezaran şehîd û birîndar qurbaniyên bajarê kurdistanê Helebçe, bi çekên kîmyayî yên Iraqî



Di Adar û Nîsana 1991ê de, koçberkirina du mîlyon Kurd li başûrê Kurdistanê ji tirsê êrîşa kîmyayî ya Iraqî.

Di 2014an de, Kurdên Êzîdî di êrîşa hovane ya dewleta Islamî (Da'îş), gund û bajarên xwe yên Şengal vala hiştin û xwe li çiya û deştan girtin.



Di salên 2018-2020an de, şovenîzma Ereb, Tirk û Faris zeviyên genim ên cotkarên Kurd li Kurdistanê şewitandin.


Di salên 2017-2019an de, balafirên şer ên Tirkiye li rojavayê Kurdistanê gelê Kurd bombebaran kirin.



Balafirên şer ên Tîrkiye, bi çekên fosforê gelê Kurd li rojavayê Kurdistanê bombebaran kirin



Li Rojhilatê Kurdistanê bi rojane bidarvekirinên ciwanên Kurd, bi gule û bidarvekirin, di bin îşkenceyê de li zindanan, kuştinên li kolanan û tevî bûyerên çûnûhatinê trafîkê yên dahênanî bi destê sîxurên Iranê pêk tên.



Rejîma Îranî li Rojhilatê Kurdistanê bi rojane ciwanên Kurd bidar vedike.



Di sala 1960-an de, Sûriya 380 zarokên Kurd di sînemaya :Amûda de şewitand, û li vir çend wêneyên wan hene



الشهيد فارس جاسم الدخيل



شهيد إبراهيم سيد علو



الشهيدان محمد وحضر الضيف



Ya jêrîn raya dijberiya Erebi ya Sûrî di derbarê gelê Kurd de, bi hemî zelalî û nîjadperestiyê ye. Weke nimûneyekê ji bo dijberiya Iraqî, Iranî û Tirkî ye...

Her weha, raya hukûmetên desthilatên ku Kurdistanê dagîr dikin, di navnîşê de, û wêneyên jorîn ên ku ramana xwe ya nijadperest, ya li hember Kurd û Kurdistanê bi gotina herî rast vedibêjin, dikare were dîtin:

الدكتور موفق مصطفى السباعي: طز بالأكراد	
الشيخ نواف البشير: الاکراد ليسوا شعباً ولا وجود لمنطقة كردية !	
الدكتور برهان غليون: يشبه الأكراد بـ "مهاجري فرنسا"!	
الناشط الحقوقي المحامي هيثم المالح : يكتشف أن الأكراد هم عرب نسوا انتمائهم القومي عبر مناهات التاريخ ، ويقول في حديث آخر لقناة العربية يقول أن حقوق الأكراد غير شرعية!	

The Oppressed Kurds
and their Moslem Brothers

By

Dr. Jemal Nebez

First Arabic issue by Kurdname, London 1997

Second Arabic Electronic issue by WKA, London 2008

Third Arabic Electronic issue by WKA, London 2020

Forewords by:

Kamil Zheer

Bruska Ibrahim

Jawad Mella

Mohamed Salih Gabori

First Kurdish-Kurmanji issue, translated by:

Dilawere Zengi

e-mail

wka@knc.org.uk

ISBN: 0 9529951 5 8